

HÊVÎ

KOVARA ÇANDÎYA GIŞTÎ



\$ 10 (Etranger)

HEJMAR 6 / TEBAX 1987

50 FF

ESPOIR

HÊVÎ

50 FF

Revue culturelle kurde

N° 6 - Août 1987

Directeur de la publication : Mehmed UZUN

Réalisation : Alî BUCAK, Ibrahîm GHAZAGH,
Mohamad HASSAN, Suleiman JANY

Rédaction : Ibrahîm AHMED (Angleterre), Rojen BARNAS (Suède), Mihemed BEKIR (Suède),
Firat CEWERÎ (Suède), KENDAL (France), MALMÎSANIJ (Suède), Hesên SEYF (Suède),
Mehmed UZUN (France).

SOMMAIRE

- Cigerxwîn, poète des lumières et de l'éveil national, <i>Rojen Barnas</i>	7
- Souvenirs d'Ihsan Nouri Pacha sur la révolte d'Agrî (V)	27
- Un entretien avec Osman Sebrî, poète et écrivain kurde contemporain	40
- Le centenaire de la naissance d'I.A. Orbelî, orientaliste et kurdologue soviétique <i>Rohat et T. Reşit</i>	46
- Les petits porte-faix (II) (nouvelle), <i>Firat Cewerî</i>	52
- Retour au foyer (récit), <i>Ş. Bekir Soreklî</i>	60
- A propos du « Destin de M. Karataş », critique littéraire de <i>Mehmed UZUN</i>	64
- Quelques textes en dialecte dumilî recueillis en 1857 par <i>Peter Ivanoviç Lerch</i>	69
- Deux contes par <i>K. Berz et E.E. Dervişyan</i>	80
- La version dumilî du conte « La Belle du monde » <i>U. Elî et A.V. Le Coq</i>	104
- Le Satan et les Kurdes Cheikhbizini d'Anatolie Centrale (conte), <i>Koyo Berz</i>	109
- Poèmes de <i>Malmisanij, H. Dersimî, Firat et H. Wetenî</i>	112
- Bibliographie dumilî (IV) - <i>Malmisanij</i>	121
- La retraite des Barzani du Kurdistan Iranien, <i>E.H. Tevrîşyan</i>	203
- Un poème d' <i>A. Arif</i>	178
- Pardonnez-moi (nouvelle)	168
- La secte des Ahl-é Haqq (Fidèles de Vérité) en Iran, <i>E. Qadir Mihemed</i>	139

La revue Hêvî (Espoir) est une publication bi-annuelle de l'Institut Kurde de Paris. Elle est ouverte à tous les courants de la vie culturelle kurde.

Les textes publiés n'engagent que la responsabilité de leur auteur.

Pour toute correspondance, écrire à : Institut Kurde de Paris,
106, rue La Fayette, 75010 PARIS - FRANCE - tél. : (1) 48 24 64 64

2€

HÊVÎ

KOVARA ÇANDÎYA GIŞTÎ



HEJMAR 6 / TEBAX 1987

Imprimé en Italie

© INSTITUT KURDE DE PARIS – 1987 – ISSN 0761-1242

**Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm ?
Bîlcimle ji bo çi bûne mehkûm ?**

Ehmedê Xani (sedsala XVII)

Xwendevanên hêja,

Ji ber sebebên teknîkî, ev hejmara kovarê, ji her carî zêdetir, bi derengî ket. Herwekî hûn ê bibînin, rûpeline kovarê ne rast in. Aliyê rastê ye rûpeline bi dûzan derneketine.


Lê me hêvî heye ku kovara we, ji îroj pê ve, hîn çêtir û di wextê xwe de derkeve. Em ji niha ve dikarin bibêjin ku hejmara heftan ê di wextê xwe de derkeve.

Em li hêviya rexne, pêşniyar, name û nivîsarên we ne.

Redaksiyon

SERECEM

- Şaîrê ronahî û hişyariyê Cigerxwîn - Rojen BARNAS	7
- Bîranînên Ihsan Nûrî Paşa (V)	27
- Hevpeyvîn bi Osman Sebrî re - AMED, ZÎN	40
- 100 saliya bûyina I.A. Orbelî - ROHAT	46
- Akademîk Hovsêp Orbelî - Tosinê REŞÎT	49
- Barkêşên biçûk (II) - Fîrat CEWERÎ	52
- Vegera mal - Şahînê B. SOREKLÎ	60
- Siûda Mehmet Karataş - Mehmed UZUN	64
- Çend tekstên dimilkî (zazakî) : 1857 - Peter Ivanoviç LERCH	69
- Na xumxuma kerameta girana pey ra dima - Koyo BERZ	80
- Bey - Elî Eşref DERVÎŞYAN	95
- Ebi zazakî hikaya « Dunya guzelî » - Umerê ELÎ, A.V. LE COQ	104
- Şeytan û şêxbiziniya - Koyo BERZ	109
- Di şaîrî - MALMISANIJ	112
- Di deyîrê (lawikê) dersimî - Haydarê SERSIMÎ	116
- Welat - FIRAT	119
- Yew deyîra destnuşta - Hesreta WETENÎ	120
- Bibliografya dimilkî (zaza) (IV) - MALMISANIJ	121
- Paşekêşey Barzanîyekan li Kurdistanê Îran - Ebû Hesênî TEVRÎŞYAN	203
- Sozî awazekî yêr xurbet - Ehmed ARIF	178
- Dawayî lê bûrdin	168
- Mezhebî Ehlê Heq li Îran - Enwer Qadir MIHEMED	139



ŞA'IRÊ RONAHÎ Û HIŞYARIYÊ CEGERXWÎN

Rojen BARNAS

Mele Şêxmûsê Hesenê Hesarî di çaryeka pêşîn a sedsala bîstî de bi peyafî kete meydana şî'ra kurmancî, li hespê têkoşîna rizgariyê siwar bû, bi navê Cegerxwîn pêncî û neh sal bêî ku raweste hespê xwe li vê meydana bezand. Bi dostan, bi neyaran, bi kalan, bi sûtalan navê xwe da bihîstin û pejirandinê. Ev nav bû mertaleke nependî, zexim û stûr, li ber pêjnên welatparêziyê li hemberî tûr û êrişên propaganda û kirên dewletên Kurdistanê parvekir, û tevkarên wan ên hundirîn. Dengê wî bû tovê hişyariya li şexsiyeta xwe ya milî ya kurdî derketinê, bi taybetî di nav me Kurdên Kurdistanê bakur de.

Dengê Cegerxwîn bi destê feqeh û melayên welatparêz cara pêşîn hate di guhên me de olan da. Ji ber xisûsiyeta xwendina wan ku ew gund bi gund, bajar bi bajar li cih û deverên welêt digeriyan, ji ber ku metoda hînbûna wan li se jiberkirinê bû, û di nav rewşenbîrên kurd ên wê demê de yên ku xwe warisê tevgerên milî yên Kurdistanê wek yên Şêx Seîd, Şêx Ubeydullah, Şêx Şehabêdîn-Seyid Elî-Mele Selîm didîtin, ew bûn ; vê qasidiya mêjûyî li xwe girtin.

Di çûnûhatina xwe ya xwendinê de feqeh bi navtêdan û piştgiriya seydayên xwe, şî'rên Cegerxwîn ji devkî ji ber dikirin, li gora xwe bi awayê bêlimteyê (bêrûte/bêlûte) bi meqam vedikirin, di dawet û dîlanan de wek dîlok distran :

Welatê min tiwî bûka cihanî
Hemî bax û bihişt û mêg û kanî

Di civatên mela, şêx û axayên welatparêz de şî'rên wî bi meqamên xezel û qesîde dihatin xwendinê, ku di wan civatan de ji mêj ve timî Cizîrî, Feqehê Teyran, Bateyî, Xanî û Aqtepî bi wecdeke bilind dihatin xwendin. Di civatên

wisa, hînbûyiyê şî'ra kurdî de bi dengekî zîz û sotî ku melakî destê xwe bide ber guhê xwe û bistrê :

Nalînek tê guhê min, lê winda û nîhan e
Agir berda dilê min, tev bû pêt û dûxan e
Barek da ser milê min, lê barekî giran e
Dane ser hev kulê min, hemû derd û bela ne

Îro roja xebatê, serxwebûn e doza we
Dema jîn û felatê, li kû maye soza we
Hon tev şêrên di latê, rovî kete koza we
Şikestine di matê ; dijmin biriye boza we.

Kî heye gelo ku xwe li berê ragire, şewat, pêt, dû û dûxanên li welêt bi bîr neyne.

Ji civatên mela, şêx û axayên welatparêz herwekî ku xuya ye mebesta me helbet giştahiya mela, şêx û axayên Kurdistanê nîne. Ji xwe ku bi giştan re ev pêjnên welatparêzî hebiwa ; tevgerên milî têknediçûn, qîrîn û nalîna Cegerxwîn jî tebîi ye ku bi vî awayî helnedibû.

Şî'ra Cegerxwîn hêdî hêdî ji hucrik û medreseyên feqeh û melayan derket, li nav xwendevanên xwendegehên, li nav gencên nûhatî, li nav sazband û mitribên Kurdistanê belav bû. Di "mîtingên rojhelat" de dehol û zirne li pêşiya karwanê welatparêzan ku ji Qers, Agrî, ji Cizîr û Hekarê, ji Dêrsim û Ruhayê hatî, meqamê :

Welatê Kurda tev xêr û bêr e
Hemî maden e, tev zîv û zêr e
Lê çî bikim îro maye j'xelkê re

lêdixistin. Li ser kursiyê axaftinê "Helval Paul Robson" dihate xwendin. Di salonên mehkeme û di hewşên bendixanên siyasî de şî'rên wî bi sirûdî ji devekî li hember kirinên kolonyalîzmê dihatin gotin. Li hember biryarên mehkemê yê 8-16 sal hebsa giran, bi sirûdî xwendina "Ala Min" ku ji devekî digotin :

Te bi zîv zêr tev de kil dim
Roja cengê ez te hildim
Ger ez bimrim, ger ez rabim
Cegerxwîn im, serbilind im

Ev xwendin an ev şîrên wî helbet jimara salên bendîxanê danedixist,
lêbelê hêza xwelipiyahiş tinê xurt dikir.

Welatê Kurdistan hemî çîmen e
Egîd û şêr û piling tê hene
Hemî heval û pismamê me ne.

ji devê dengbêj û bi awazên spehî yên sazbandên Radyoya Erîvanê li
panahiya Kurdistanê gava diweşiya, pê re kaxizê piştrastiya huwiyeta milî
dikir berîka gelê kurd.

Îro ji heft heta heftê salî yên ku carek an du car ji Aramê Dîkran,
Mihemed Şêxo, Mahmûd Ezîz, Temo, Şivan-Gulîstan, Ciwan Haco, Dilgeş,
Hişyar li yekî guhdarî kiribin, û nav û şî'ra Cegerxwîn nebihîstibin, pê besta
wan a kurd-bûnê, hêrsa wan a raperikînê geş nebûbe, gelo heye ?

Ne bi tenê di nav Kurdistan de, di van salên dawî yên berî 12ê Îlona 1980
yî, hin şa'rên tirk ên pêşverû wek sembolekê navê Cegerxwîn, Xanî, Mem û
Zîn bi hevdû re di şî'rên xwe de bi kar tanîn.

Seyda çî bigre nêzîkî şêst salî bi mexlesa xwe ya Cegerxwîn jî. Navê wî
herwekî xwendevan pê dizanin ; Şêxmûs bû. Lê wî mexlesa xwe ya
Cegerxwîn ew çend li xwe girt ku gengaz e carna navê xwe yê berayî ji bîr
kiribe.

Di edebiyata dîwanî de mexles çî bigre hêmaneke esasî ya vê edebiyatê
ye û çî bigre zerûrî ye : herwekî navên artistik ên aktor û aktrîstên îroyîn.

Cegerxwîn mexlesa Seyda a didîwan e. Cara pêşîn wî mexlesa "Mûsayê
Hesarî" an tiqûtenê "Mûsa" bi kar aniye. Di nivisandina "Cegerxwîn" de
Seyda tucar bi awakî nenivisandiye : "Cegerxwîn", "Cigerxwîn",
"Cîgerxwîn", "Cîgerxûn", "Ciger (bi)...xûn". Herwekî li ser dîwana pêşîn û
a diduya "Cegerxwîn", lê li ser ên dinê yên dûmahiyê "Cegerxwîn" hatiye
nivisandinê ku gava meriv bixwaze wek Seyda mexlesa wî binivisîne,
bivê-nevê dikeve dudilîyê.

DI ŞÎ'RA KURMANCÎ DE CIYÊ CEGERXWÎN

Cegerxwîn şa'îrekî ji şa'îrên kurmanciya jorîn e ku rûpela şî'ra kurmancî
ya sedsala me bi navê wî geş biye. Giringî û mezinahiya wî dergehê şî'ra
têkoşînê li edebiyata kurmancî vekiriye.

Şî'ra kurmancî helbet bi Cegerxwîn dest pê nake. Hetanî Cegerxwîn
şî'ra kurmancî pênc sed - şeş sed salekê li pey xwe hiştiye ku di destpêka wê
de hê hisûpisa hin ziman, gel û dewletên modern ên îroyîn tune biye.

Çawa ku şî'ra kurmancî bi wî dest pê nekiriye her wisa jî ostayê mezin ê şî'ra kurmancî yê pêşîn jî ne ew e. Di rûpelên şî'ra kurmanciya jorî de Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqehê Teyran, Melayê Bateyî (Batî), Axayê Bêdarî, Ehmedê Xanî, Smaîlê Beyazîdî, Siyehpûş, Axayok, Mela Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Hacî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hadî, Şêx Nûredînê Birifkanî, Şêx Evdirehmanê Taxê, Şêx Evdirehmanê Axtepî (Aqtepî), Mensûr Gergaşî, Mîna, Macin, Sadiq, Bekir Begê Erzî, Pertew Begê Hekarî, Evdirehîm Rehmî hatine înzayên xwe avêtinê. Ji vana yên di huner û edebiyatê de herî xurt sê-çar osta ne ku her yek ji xwe re rêke arizî vekiriye, yên mayî çî bigre bûne dûajo, an texlîtkirên wan. An jî di şa'îrî û arizî bûnê de lewaz mane.

Di rêzeçiyayê şî'ra me ya bûrî de ostayên navser ev in :

1. Melayê Cizîrî
2. Feqehê Teyran
3. Melayê Bateyî
4. Şêx Ehmedê Xanî

Çî bi osta, çî bi şagirt û nîv-ostayên xwe ve şî'ra me ya heta dema Cegerxwîn, şî'ra dîwanî bû.

Bêî pêzanîna bi xisûsiyetên edebiyata an şî'ra dîwanî, têgihîştina ji şa'îrên me yên wê demê ne gengaz e, û tesbîtkirina ciyê Cegerxwîn di şî'ra kurmancî de wê yaxurî be. Ku kevin neyê zanîn ; hêjayî bi nû dayinê, li rû dimîne. An di xisûsa "qels" de pêzanîneke me tune be, dê emê çawa bizanin ku "xurt" çî ye ? Ji ber vî çendî ji bona pêzanînen hin xwendevanan taze bikin, divê piçekê li ser xisûsiyetên şî'ra dîwanî rawestin, di pey de wê û ya Cegerxwîn bidin ber hev, da bikaribin jê bigihîjin netîcekê.

XISÛSIYETÊN ŞÎ'RA DÎWANÎ

Bi derketin û belavbûna dîne îslamê, je ber ku zimanê Qur'anê bi erebî bû, erebî di nav gelên musulman-bûyî an musulman-kirî de bû zimanê resmî yê dîni û kete rewacê. Li Misrê û li bakurê Afrîkayê zimanên gelêrî yên medeniyetên kevin ji meydanê birand, zimanên samî yên rojhelatanavîn di nava xwe de asîmîle kir.

Erebî, herwekî welatên dîne bi rêgeha Qur'anê kete nav jiyana gelên îranî û tûranî jî. Îran di navbera Roma (rojawa) û rojhelatadûr (rojhelat) de merkezeke siyasî ya nawendî bû. Ji ber vê xisûsiyetê di adapte bûn û adapte kirinê de zîrek bû. Bi deriyên xwe vekirina ji zimanê erebî re, şî'ra farisî û şî'ra erebî leqayî hevûdu bûn. Cazîbeya muzîka wezîna şî'ra erebî ; 'erûz li xweşa şa'îrên îranê çû. Sîstema wezin, qafiye, redîf û hunerên belaxetê yên

erebî anîn tevî terkîb û mezmûn (sembol) ên erebî-farisî adapteyê zewqa jiyana xwe kirin. Ji vê, moda edebiyateke nû afirî ku ev edebiyata bilind bû. Ev edebiyateke bilind bû, lewra xîtabî ehlê serayê û medreseyan dikir, şa'irên wê kultureke bilind a zadeganî stendibûn û xîtabî tebeqa bilind dikirin. Şa'irên vê ; ş'i'rên xwe li gora herfa paşîn a qafiya ş'i'rê, ji "elif"ê heta "yê" li rêzê di defterekê de dicivandin ku ji vê defterê an berhevokê re dîwan dihate gotin. Navê ş'i'ra dîwanî ji vê "dîwan"ê tê.

Ev edebiyata ha di Îranê de hate dinyayê, givrik bû. Hêdî hêdî şewqa xwe da ser edebiyatên hawirdorî. Tirkên azerî, çagatayî û osmanî ketin binê tesîra wê û hewil dan xwe ku bigihîjin ostaya şa'irên farisî.

Kurd jî xelkekî ji xelkên rojhelatanavîn bûn, Îranî bûn. Bivê nevwê ew jî li gora moda wê rojê li riya ş'i'rê kudandin.

◊ Ev edebiyat bi ziman, kultur û zewqa xwe xîtabî tebeqa bilind dikir. Cî û warê wê seray û koşkên şah, sultan, mîr û tekya û medreseyan şêx û melayan bûn.

◊ Wezin an pîvana ristê (misraê) 'erûz e. 'Erûz ji gelek behran û her behrek jî ji gelek qaliban pêk tê. Qalib li ser hîmên kîteyên (heceyên) kin (an vekirî) û drêj (an girtî) hatine avakirin.

◊ Yekîneka nezmê beyit (malik) e. Beyit du rêzik in. Mane û mentîqa gotinê ji serê beyitê dest pê dike û di dawiya beyitê de diqede. Di xezelek dwanzdeh an di qesîdeyek bîst û çar beyit de tiştinên ku beyitan bi hevûdu girê bide, ne mane, ne mentîqan jî ne mijara tevahî ye, lêbelê tiqûtenê qafiye, redîf û wezin e. Beyita pêş an ya di pey de yekînekên serbixwe ne.

◊ Ev edebiyat bi jêderk û xîtabkirina xwe ya şêx, mela, mîr, şah û sultan an ya xwenda û hakîma ye. Şair ji wan e û xîtabî zewq û kultura wan dike. Ji ber vê jî zimanê wê ji yê xelkê awartetir e. Ji terkîbên erebî-farisî yên giran û mezmûn (sembol) ên mîtolojiya kevin zimanekî çêkirî tê pê ku carna zimanê eslî yê milî di ş'i'rê de nayê xuyan kirin. Herwekî :

Mezmûnê miraselatê lareyb
Meşhûdê mikaşefatê bîlkeyb

Mehbûbê qulûbê men lehul-qelb
Qelban tu dikî bi bal xwe ve celb

Xanî, Mem û Zîn (1/6,7)

Di Şi'ra Dîwanî de Mijar û Tem

Di şî'ra dîwanî de awayê jiyana zadeganî ya Îranî û zewqa honandina bêjeyê ji ya farisî hakimê mijar û temayê ye.

Mîtolojiya Îran û Ereb a musulmankirî ku di eslê xwe de bi çend sed an çend hezar salan berî Îslamiyetê hebiye, tevî qehremanên xwe ve mijarên vê edebiyatê ne.

Cografyake ku tixûbên wê li ser riyê erda dinya me bi xumam e ; çîn û maçîn, milkê freng, çiyayê Qaf cografya wê ye.

Evîn

Evîna şî'ra dîwanî bi xetên xwe yên gelemper en evîna însanî ye. Aşiq heye, maşûq heye. Aşiq şa'ir bi xwe ye ; zelîl e, mexdûr e, mezlûm e, hêsîr e. Maşûq di sifetê keçekê an jinekê de tê wesif kirin, lêbelê ew bi eslê xwe Xweda ya (li Cizîrî binêrin), resûlê Xwedê ye (li Bateyî binêrin), şah e, sultan e, mîr e. Di Mem û Zînê de Zîn dewlet e.

Dibe, ji ber ku dewleta me tune biye û gelê kurd bê şah û sultan bûne, şa'irên me yên dîwanî Cizîrî, Feqiyê Teyran, Xanî Xwedê û Bateyî jî pêxember ji xwe re kirine maşûq.

Pêjin bi mezmûnan (sembol) tîn vegotin ku pêzanîna van mezmûnan bi serê xwe şaxeke ilmê ye di nav edebiyatê de. Merîx, Zelîx, Zuleyxa û Sureya ya ku Cizîrî çêl lê dike, ne stêrkên rût ên li asîmana ne ; ew di mîstîsîzmê de îşaretên hin derece û meqamên gihîştina fenafflahiyê ne. Bi van maneyan jî ew kesên ku kultureke bilind a mîstîsîzmê nestendibin, pê nizanin.

Felsefa Şî'ra Diwanî

Can û cesedê şî'ra dîwanî ku pîvan (wezin), teşe (form), mijar, tem, evîn û zîhniyeta cografî ya wê be, bêguman ruhê wê jî felsefa wê bi xwe ye.

Felsefa şî'ra dîwanî, ne felsefeke bi xasê şî'rê bi tenê ye, lêbelê di her awayê jiyane de hakimê dîtina yê vê derûdorê ye.

Ev felsefe ji sê hêmanên girîng tîn pê :

- a. Mîstîsîzm (mysticisme),
- b. Sê hêmanên baweriya îslamî,
- c. Dupereştî (Dualism) ya Misir, Hind û Îranî.

a. Mîstîsîzm

Mîstîsîzma herî kevin û ya biye bingehê mîstîsîzma Yewnanî û rojhelatanavîn, ya Misira kevin e ku jê re Hermesîzm jî tê gotinê. Li gora vê ruh ronahî, made jî tarîti ye. Ronahî ji tebeqa hefta ya esmana datê dinya tarî, dikeve made ku ev jî cesed e. Ev dahatin îmtîhan e. Ji bona ku ruh dîsa bigihîje nemirinê divê lê bitêkoş e ku here tebeqa hefta ya jê hatî. Di vê de heft gehînek hene :

Heyv : Li tebeqa pêşîn a esman e, dehaya ramanê ye.

Utarî : Li tebeqa didiwan a esmana ye, dehaya torinîyê (esalet) ye.

Zuhre : Li tebeqa sisiya ya esmana ye, dehaya evînê ye.

Roj : Li tebeqa çara ye, dehaya bedewiyê ye.

Merîx : Li tebeqa pênca ye, dehaya dadiyê (edalet) ye.

Muşterî : Li tebeqa şeşa ye, dehaya zanînê (ilmê) ye.

Zuxal : Li tebeqa hefta ye, cihê sirên eqlê kaînatî ye. Ji vê derê meriv, yanî ruh derdikeve bêmirinîyê. Di destpêkê de ruh wekî ronahî ji vê derê dahatibû dinyayê, cihê made û tarîtiyê.

Kesên ku ne ehil bin, ne layiq bin, nikarin bigihîjin vê bêmirinîyê. Ev bêmirinî heqîqet e, heqîqeta mezin e. Yanî Xwedê ye. Lê ne ew Xwedayê ku Mûsa, Îsa û Muhemed jê behs dikin. Ji ber ku herkes ne ehil e, divê bi vê heqîqetê herkes nizanibe, ev nependî bimîne. Tiqûtenê yên ehil hêdî hêdî di pey hin îmtîhanan de pê bizanîn. Orfeyîzm û Pîsagorasî ya Yewnana kevin, batinitî, hurûfitî yên Îranî ya musulman duajoyên vêne, lêbelê di nav herikîna zeman de hin reng û rûçikên nû welgirtine.

Bi kurtî mîstîsîzm (nependî) ev e : ji ber ku herkes ne ehilê xwe gihandina rastî û zanîna mezin (an mutlaq) e, divê rastî û zanîn nependî bê hiştin, ji herkesî re neyê gotin.

b. Sê hêmanên Baweriya îslamî

Di bareya felsefa jiyane ya dinyayê de felsefa îslamî di sê niqteyan de dihêwire :

1. Bê hewil û qeweta Xwedê tu tişteki nabe, çênabe, nayê kirin, nayê guhartin. Razîbûna bi qedera xwe çara tiqûtenê ye.

2. Qedera ku Xwedê hê di wextê «qalûbela»yê de li eniya meriv nivisandiyê, bi tu awakî betal nabe, nayê guherandin. Li hember vê têkoşîn û kefteleft bereday e. Divê meriv di her awayî de bi tewekul xwe bispêre li hêviya Xwedê.

3. Li dinyayê rahetî tune ye. Dinya bi mirin e, fanî ye, lewra jiyana li vê dinyayê ne hêja ye ku meriv serê xwe pê re biêşîne. Li vê dinyayê li rahetiye gerîn karê ehmeqa ye.

«La hewla wela quwete îla bîlahî-l elî-yul ezîm», «El qeder la muxeyyer» û «La rahetî fî-dunya» di baweriya felsefa îslamê de ewçend hişk û qutibir in ku wek qanûn in û reda vana kirin an nerastiya vana gotin, kufr e : Cezayê wê jî di rêzika şerîetê de kuştin e, yanî qetila yê gotî helal e.

c. Riya Gilî û Gazinan : Duperestî

Dualîzm (dualîtî an duperestî) dîtineke felsefî ya gelek kevin e. Li ser bingehê duyîtiya maldaran û bêmalan ava biye ; di dîn de xwe wek qencî û xerabî daye nîşan danê. Xwedeyên erdê û esman ên Sumeriyan, xwedeyên qencyê û xerabiyê yên Misiriyên kevin, xwedeyên ronahiyê û tariyê yên Çîn, Hind î Îrana kevin numûneyên dualîtiya dînî ne.

Di Îslamê de herçend Xwedê û Şeytan hebin jî, Şeytan xwede nîne. Qewet û qudreta li ser qederê û dahatûya mirovan tiqûtenê di destê Xwedê de ye. «Cuza îxtiyarî» di destê meriv de heye, lêbelê ev jî nikare qederê biguhêre. Û ev li ser ber «îrada kul-lî» yanî îrada Xwedê ne wek di qeweta ronahiya gûstêrkê li hember qeweta ronahiya Rojê de ye.

Ku mirov ji rewşa xwe ya têdayî razî bûna, zûbizû wê negihîştina gehîneka medeniyeta îroyîn. Xisûsiyeteke mirov bûnê jî ev e ku li hember bendên qedexê û qanûnan ; çî yên tebîetê, çî yên dîn û ekonomiyê tucar destgirêdayî nemane. Wan qedexê û qanûnên hêdî hêdî gêrane, kirine bin emrê xwe.

Şa'irên edebiyata dîwanî jî bi vî awayî ji xwe re riyekê bijartine. Ev rê nerazîbûna ji qederê nîne, lê rexnegirtina li bext, talih, qirdê xwe ye... Li hember derketina Qadirê qederê (Xwedê) nîne, lê raperikîna li hember eva ku çerx û dolaba bextê meriv digêrîne : 'feleka xayin, feleka bi fetl û ger, feleka bêbext'e.

«Qeder, qencî û xerabî ji Xwedê ne» şertekî ji şeş şertên îmanê ya dînê Îslamê ye. Ji bilî Xwedê tu hêz û tişt nikare bi serê xwe tişteki bike, ev jî hîmekî ji hîmên baweriya Îslamê ye. Li bervajiyê vê fikir kirin şerîk û heval ji Xwedê re çêkirin e ku ev jî «şirk» e û şirk jî kufr e. Li hemberê vê «felekek» heye ku li ser bext (talih, qird) ê meriv, bi rastî li ser qedera meriv xwedî qudret û gotin e, lê ev wek «şirk» nehatiye dîtin. Ev «felek» biye kevirê çikandî yê kevirê gilî û gazinan avêtinê.

Ev bermayera dualîtiyek jibîrkirî ye. Yê ku nikaribiye bi zîhniyetê re têbikoşe, kevirê xwe dawêşandiye felekê.

Form û Pîvanên Nezma Dîwanî

Li ser hîmên malikê (beyit) xezel, qesîde, mesnewî, mustezad û yên bi teşeyên xwe ji vana rakişandî ne.

Li ser hîmên rêzê (misra) rubaî, tuyûx, musammat in.

Pîvana nezma dîwanî pîvana (wezîn) 'erûzê ye.

XISÛSIYETÊN ŞA'IRÊN ME YÊN OSTA YÊN Ş'IRA DÎWANÎ

Melayê Cizîrî

Ostayê mezn ê pêşîn yê edebiyata kurmancî Melayê Cizîrî ye. Di lîrîzm û hunermendiya edebiyatê de tu şa'irekî me hê negihîştiye dereca şarezatiya wî. Herikîna ş'iriyeta ş'ira wî û mîstîsîzmê wî ya kûr û bilind di ş'ira kurmancî de numûna yekta ye. Zimanê ş'ira wî zimanê seray û medresê ye, giran e.

Di tesewufê de ji ehlê «Wehdet el wicûd» e.

Di warê xezelan de Şiraziyê kurdî ye.

Feqiyê Teyran

Di edebiyata kurmancî de çîroka menzûme ji wî dest pê dîke. Di mîstîsîzmê de kûr e. Ji ehlê «Wehdet el-wicûd»ê ye. Zimanê wî yê ş'irê ji yê Cizîrî siviktir e, lêbelê di bikaranîna pîvana 'erûzê de bi qasî Cizîrî şareza nîne.

Melayê Bateyî

Di tesewufê de aşîqekî mirî yê pêxember Muhemed e. Mewlûda xwe ya kurmancî jî vê mebestê nivisandîye. Di ahengê de xurt e, nezma wî herikandî ye. Zimanê ş'ira wî çî bigre zimanê şivan, gavan û gundiye kurmanca ye. Ew bi xwe bi zimanê bilind î serayê bi qasî hevalên xwe dizane, lêbelê ji ber ku erka propaganda Muhemed pêxember û dîne wî li xwe girtiye, zimanê propagandayê yê xelkê ji xwe re bijartîye ku viya jî bi zanîn kirîye.

Mewlûda wî bi forma mesnewî hatiye nivisandin. Ji bilî Mewlûdê xezel û musammatên wî jî hene ku gelek spehî ne.

Sêx Ehmedê Xanî

Bavê fikra dewlet danîn û rizgarîxwaziya Kurda ye. Di mijarê de milî ye. Herwekî şa'irên di dema wî û yên berî wî di mijara çîrokên menzûm de ji xwe re «Leyl û Mecnûn». «Ferhad û Şîrîn», «Wamiq û Azra», «Yûsif û

Zuleyxa» dibijartin, lê Xanî mijara çîroka xwe ya Mem û Zîn ji çîrokeke gelêrî ya kurmançî ji ya Memê Alan û Zîna Zêdan helbijart.

Di tesewufê de sofîyekî musulman e.

Zimanê wî yê şîrê nemaze di Mem û Zînê de gelek giran e. Wisa ku meriv dikare bêje di aliyê ziman de tu şa'îrekî kurmanç bi qasî wî zimanekî ji terkîbên erebî-farisî tevlihev û giran nenivisandiye.

HETA DEMA CEGERXWÎN REWŞA SIYASÎ Û CIVAKÎ YA KURDISTANÊ

Xanî şa'îrekî mezin bû. Mezinahiya wî ev bû ku rewş û dahatûya mîletê xwe dît, vê tesbîtê kir ku heta Kurd dewleta xwe ya serbixwe daneynin ji ber tomik û teşqeleyan nafilitin, di nav mîletên dinê de serfiraz najîn.

Ew di nav kelfîna reş-êwrên li ser serxwebûna mîrîtiyên Kurdistanê de çavê xwe li jiyânê vekir. Hê 125 sal di ser lihevkirina Sultanê Osmanî Yavûz Selîm û mîrên Kurdistanê de derbas bûbûn an nebûbûn ku Osmanîyan niyeta xwe ya kirêt a di mijara Kurdistanê de hêdî hêdî azlû dikirin. Di 1639a de serxwerabûna Çiyayê Şengalê, di 1665a de berxwedana Evdal Xan mîrê Bedlîsê xwe nîşan dan. Çi bi serxwerabûnî, çi bi berxwedanî tevgerên gelê kurd li hember niyet û kirên Osmanî ranewestan. Di 1805a de serxwerabûna Evdirehman Paşayê Babanî, 1820 serxwerabûna Kurdên Zaza, 1828-39 serxwerabûnên Rewandûzê, Hekarê, Tûr-Abidîn, Çiyayê Şengalê, Diyarbekirê, 1847 serxwerabûna bi mebesta dewlet danîne ya Bedir Xan beg mîrê Botan, 1857 tevgera Yezdan Şêr, 1890 tevgera Şêx Ubeydullah, 1909 tevgera Şêx Mehmûdê Berzencî, 1910 tevgera şêxên Barzaniyan, 1914 serxwerabûn û cara pêşîn alaya serxwebûna Kurdistanê helkirina Seyid Elî, Mele Selîm û Şêx Şabedîn li Bedlîsê, tevgera Koçgirî, 1925 serxwerabûna Şêx Seîd efendî, serxwerabûna Agirî û 1936-38 ya Dêrsimê xelekên zincîra têkoşînên rizgarîxwaziya milî yên Kurdî ne.

Gava Xanî çavê xwe li dinya siyaset û zanîne vekir, bîhna xetereta li ser serbestî an nîvserbestiya Kurdistanê hilanî. Ji ber dûrbênahiya xwe ya rewşenbîrî hunerê edebiyatê kir xizmeta îdeolojiya xwe ya siyasî ku ev jî fikra «Dewleta Kurdî» danîne bû. Xwest dengê xwe bigihîne xan û mîrên Kurda. Lêbelê çi ji ber kurtebênahiya wan çi ji ber hoyên siyasî û civakî yên wê rojê, ew dengê Xanî nebirin xwe. Di pey Xanî de gelek şa'îr hatin meydana edebiyata kurmançî, lê ew jî wek mîrên Kurda kurtebîn bûn, heqîqeta komelayetiyê nedîtin, rîya navdarbûyîne di dûvajoyiya mîstîsîzma Cizîrî û Feqiyê Teyran, di softiya an heyraniya Muhemed pêxember de

dîtin. Texlît her texlît dimîne, nabe orîjînal. Lewra ew jî texlît rêber, lêbelê ji ber lirûbûyina kûrayiya xwe ya rewşenbîrî ; dêlva ku ewê aliyê Xanî yê siyasi ji xwe re hilgire, aliyê wî yê sofitiyê hîlbijart.

Ji 1898 bi derketina rojname "Kurdistan"ê pê de pêlên pêjnên kurdayetiyê hîlbûn, mîlmîlîn. Li paytextê Osmanê Îstanbûlê desteke xwenda û rewşenbîrên Kurd ên bilind derketin ku di cîgahên bilind ên seltanetê de xwedî nav û nîşan bûn. Tenê ne di cîgahên burokasiyê de, lê di jiyana kulturî û rojnamegêrî, di jiyana siyasi herwekî damezrandin û têdekarkirina Itîhat Tereqî de xwedî paye û gotin bûn. Ev desteya bijarte ya rewşenbîrên Kurd li gora rewş û hoyên rojê bi baldarîke nûjen bîra kurdayetiyê geş dikirin, li hember despotîzma seltanetê têdikoşîn. Bi Kurdî-Tirkî rojname û kovar derdixistin. Li bajarên Kurdistanê yên nawendî «Qlûba Kurdî» dihatin damezrandinê ku serekên wan ew rewşenbîr bûn ku di nav rewşenbîrên Împaratoriye de naskirî bûn.

Feqe Şêxmûs di van hoy û rewşan de li gora îro li çar, li gora wê gavê li du perçeyên Kurdistanê çi bigre ji serîkî heta seriyê dinê gund bi gund peyatî digeriya, feqetî dikir. Di wan gavan de dengê Hacî Qadirê Koyî çiyê, neçiyê pê nizamim, lêbelê di hicrikê medresê de piçek texlîta Xanî û lê bêtir dûvajotiya Melayê Bateyî kir. Şi'ra wî ya herî pêşîn ku di dawiya dîwana wî ya sisiyan de bi navê «Sebebê Çêkirina Ristê Min» çapkirî, vê baweriyê dide meriv : Seyda bi dengê Melayê Bateyî û bi texlîta Xanî dest bi kudandina li riya şî'rê kiriye, 1925.

Wextê min dî qewmê kurdî pir delal
Ew di nêv ehlê cihan de bê heval

Ba sexawet, ba diyanet, ba hiner
Min lê goşê lewhê qelbim kir xeter

Ko beyan kim esl û ewsafên di wan
Milk û hikm û padîşah û hem ziman

Der belaxetgahê çûme pêşî ye
Da nebêjin : Qewmê kurdî wehşî ye

Tevî ku bi çend sed salan berî wan şî'ra nivîskî ya kurmançî dest pê kiriye û dêwekî mîna Cizîrî wê kompleksa kêma dîtina kurdayetiyê nedîtîye ; tiştêkî per ecêb e ku çi Xanî, çi Axtepî (Aqtepî) û çi Cegerxwîn sebebê bi kurmançî şî'r nivîsandinên xwe anîne bi vê girêdane : "Bila mîletên dinê nebêjin ku qewmê Kurd hov e, wehşî ye, bê marîfet e... Bi zimanê wî şî'r nehatiye nivîsîn û h.d" Helbet bi zimanê xwe yê neteweyî nivîsandin, eser

afirandin welatparêzî ye, ji ziman û edebiyata gelê xwe re xizmet e. Lêbelê ku qabiliyeta şa"irî an nivîskariyê di meriv de tune be herçend meriv bi pêlên welatparêzî û xîretkêşiya neteweyî dagirtî be jî gelo meriv dikare rîstekê an rêzekê binivîsîne. An jî ku ev qabiliyet bi meriv re hebe jixwe dê meriv bi zimanekî binivîsîne ku zimanê herî çêtir ê bîr, raman, xwezî û daxwaziyên meriv axleb di şîrê de dê bi kêrî vegotinê bê, zimanê meriv î gelerî ye. Wê gavê jî ne hewce ye ku meriv mineta nivisandina xwe li gelê xwe an li zimanê gelê xwe bike.

JI ŞA'IRÊ MEDRESÊ BÛYINA ŞA'IRÊ SERXWEBÛNÊ

Mele Şêxmûs di 1924 de li ber destê Şewqî Begê Erxenyê li bîra Kurdayetiyê şiyar dibe (Keyo Cegerxwîn, Hêvî hej.3 - Sebat 1985). Di tenga xwe de ez ji vê kira Şewqî Begê re spasdar im ku xizmeteke mezin bo me kiriye.

Di pey serxwerabûna Şêx Seîd efendî de dest bi xebata siyasî dike. Di 1928a de dibe seyda û dizewice, di 1930 de şoreşa nefsa xwe dike ; şaşîk, cube û rihê melatîyê davêje.

Seyda cara pêşîn li ser destê Şewqî Beg li siyasê şiyar dibe. Lêbelê di pey de bi kîjan rewşenbîrên Kurda re dide û distîne, ji kî îstifade dike, an kî ne ku dîna wî ya kurdayetiyê pêş ve dibin, mixabin ji ber ku nehatine nivisandinê, an jî çavê min pê neketiye pê nizanîm. Bîranînên wî yên çapkîrî tune ne. Li gora ku min ji Azad Cegerxwîn bihîstiye, bîranînên Seyda yên nivisandî hene li gora programa wan dê bîr çapkîrî. Hêvîdar im ku Seyda çêl li vî aliyê xwe kiribe da ku ev aliyê wî derkeve ronahiyê.

Serxwerabûna Şêx Seîd efendî di 1925a de dest pê kir û di nava çend mehan de mixabin têk çû. Lêbelê hê berî vê hin rewşenbîrên ji pêşewayên doza kurdayetiyê yên bijarte derbasî Sûriya bin hikmê Fransîz bûbûn, li wê derê xebata xwe ya siyasî dimeşandin. Tevî lihevkerina peymanê Lozanê ya di navbera Tirkiyê û dewletên alîgir jî, heta dawiya Şerê duduyan ê cihanî hêviya van rewşenbîr û kurdperwerên hanê ji danîna Kurdistanê serbixwe an otonom nehatibû birînê.

Ji alîkî ve li Kurdistanê dû û dûxan hildibû û ji aliyê dinê ve pêşkêşên vê dozê li gora hoy û rewşên wê rojê û di tenga karîna xwe de xebatên rêxistinî, siyasî û çandeyî pêş ve dibirin. Pêşkêşên vê dozê ew kes bûn ku di nav civaka kurdî de hem ji aliyê rewşenbîrî hem jî ji aliyê cîgahê civakî de xuyanî bûn : yanî torî bûn, maqûl bûn. Di wê gavê de ji xwe kurdayetî karê maqûlan bû, lewra di Kurdistanê de sinifa karkêr tune bû û gundîrî jî bi tîkiliyên şîdandî yên êl û eşîrê girêdayê bi sermiyanên xwe yên feodalî ve bûn.

Seyda jî bi rêgeha xwendatiya xwe yek ji maqûlên, rewşenbîrên civaka kurdî bû. Wî jî di vê çeperê de ciyê xwe yê ber bi pêşveçûna tarîxê fesiland û girt. Ji şa'ir «Mûsayê Hesarî» gêra bû Seyda Cegerxwîn.

Netewayê kurd an doza kurdayetiyê li benda şa'irekî gelêrî bû ku wî vê pejnê hilanî, bersîva erînî ya vê hewcedariyê dayê.

Rewşenbîr û pêşewayên doza kurdayetiyê rûmetek bilind dan Seydayê Cegerxwîn. Mîr Celadet di hejmarên 26, 27 û 28 ên Ronahiyê de bi qedirzanîneke bilind û pesindayinên hêja çêl li Cegerxwîn dike. Mîr Kamûran di Roja Nû de şîrên Seyda wergerandiye Fransizî. Bi munasebeta ola Yêzidiya Osman Sebrî bi şêxên Yêzidiyan re roportajek an lêkolînek çêdike, di vê nivîsara xwe de gava çêl li Cegerxwîn dike, wî «şa'irê me yê milî Cegerxwîn» dide nasînê ku paya «şa'irê milî» payeke wisa hêsan nîne. Ji Haco axa heta Qedrî Cemîl Paşa gelek welatparêz û rewşenbîrên kurd çî madî çî manewî piştgiriya Seyda kirine. Bi dîtina min ku piştgiriya wan hêzan tune biwa êrîşên Seyda yên li hember xurafe, şêx, axa, beg û «dewlemendên bêşeref» yanî yên newelatparêz an negelperwer wê piçek dijwar biwa. Ew kesên ku kuştina mêrekî û ya mêşekê li cem wan wekî hev bûn, ku paxava wan ji van hêzên piştgirên Cegerxwîn ên welatparêz tune bûna bi dîtina min an wê Seyda ew çend nejiya an jî wan şîrên xwe yên xweş ên dîdaktîk dê nenivisanda. Lê divê meriv ji bîr neke piştgirî tevkar e, lê cewher bi xwe cewherê Seyda ye, Seyda bi xwe ye.

XISÛSIYETÊN ŞIRA CEGERXWÎN

Şa'ir û seydayê me yê gelerî Cegerxwîn bi tarîxa ku em pê dizanin ji 1925 heta mirina xwe bêrawestan nivisand. Di warê ferhengê, gramerê, tarîxê, cografyayê de jî nivisand. Îro di kutubxana kurdî de heşt dîwanên wî hene, dîwaneke wî jî li ber çapê ye, ku di nêz de dê bikeve destê xwendevanên Kurd.

Di van heşt-neh dîwanan de ji heşt sedî bêtir bi formên cihê cihê şîr hene ku tu şa'irekî Kurmanc ewçend şîr nenivisandiye. Helbet di aliyê hejmarî de pir an hindik şîr nivisandin nabe sedemê hêjabûn an nehêjabûna şa'irekî. Hejariya şa'irekî ; bi hêjayî, nûyîtî û xurtiya hunera edebî ya şîrê wî ve girêdayî ye.

Ji bona têgihîştina hêjayî an nehêjayiya şîra Cegerxwîn, divê meriv şîra wî li çar bêjîngên şîrê xe. Ev bêjîng jî ev in : Mijar, teşe û pîvan, nûyîtiya bi nîsbeta ya kevin an têkiliya bi ya kevin re, felsefa hunerê û jiyane.

I. JI ALIYÊ MIJARÊ VE

A. Şi'rên siyasî û komelayetî : xisûsiyeta herî nû û mezin a şî'ra Cegerxwîn ji vê tê. Di şî'rên xwe yên li ser mijara siyasî û komelayetî de Seyda dîdaktîk e. Yanî hînkir e, şîretkir e. Ev di şî'ra kurmançî de nûyîtkî ye ku bi wî dest pê dike.

Aa. Şî'ra Cegerxwîn têkoşer e : ji bo rizgariya Kurdistanê, ji bo serbestiya gelê kurd, ji bo wekheviya qor û çînên civakî, ji bo rakirina damezranên kevnare ku li ber serbestiya gel, û wekheviya qor û çînên civakî dibin bend, ji bo maliştina xurafe û baweriyên pûç û ji bo avakirina dinyake aşîûxwaz têdikoşe. Êrîşên şî'ra wî yên li ser dewletên Kurdistanê dagirkir bi mebesta rizgarkirina Kurdistanê û gelê kurd e. Piştî ku Kurdistan rizgar bibe, gelê kurd bigihîje serbestiya xwe, wê çi dijminahiya Cegerxwîn yanî ya gelê kurd li hember Erebb, Faris û Tirkan bimîne. Divê meriv viya jî ji bîr neke ku gava çi Cegerxwîn çi yekî mîna wî bi êrîşê kirin ji «Ereb», «Faris» an ji «Tirk» xeber dide, mebesta wî ji bilî hêvotkarên dewletê û çînên hakim ên wan welatan pê ve tiştekî dîtir nîne.

Şî'ra Cegerxwîn têkoşer e :

Kurdino, merdino, pir xweş e serxwebûn
Ew demên tar û teng ko me dîn vane çûn
Dest bidin hev hemî pêş kevin em hemî
Da biçin bo welat yan mirin yan felat
Roj li me hate der, zû şiyar bûn ji xew
Ev dema ceng û şer, paş ketin êdî hew
Dest bidin hev hemî pêş kevin em hemî
Da biçin bo welat yan mirin yan felat

Ab. Şî'ra Cegerxwîn ronîkir e : Ji ber şer û êrîşên lejkerî yên Romî, Bîzansî, Mongolî, Erebb û h.d. welatê me Kurda timî biye ciyê talan û tajanê, dû û dûxanê. Di zemanê Osmanî û dewleta Kemalîst de jî çi bigre ji deh salan carekê ev hatiye carîkirin. Herçend me serî li ber dijminên xwe dananîbe jî, ji aliyê lejkerî ve em têkçûne. Di vê têkçûnê de hebûna me ya madî yanî dewlemendiya me ya aborî ji aliyê talankiran ve hatiye maliştin. Di pey vê têkçûnê de gelê me li jiyana û aboriya xwe xebitiye, piçek piştî xwe rast kiriye dîsa bi ser de lehiya êrîşeke nû hatiye. Gava şerê lejkerî li Sêrtê, Hekarê biye ew der ji xwe hatine talankirinê lêbelê pê re jî Kurdên Sêwas û Malatya yê jî bi riya bertîlên şexsî an alîkariya ji bo dewletê hatine

talankirinê. Ev bûyer bi sedsalan her wisa berdewam biye. Xizanî maka nezanînê ye. Hingî em têk çûne em xizan bûne, hingî em xizan bûne em nezan mane. Xurafe û baweriyên pûç di tarîtiya vê nezaniyê de xwe li me rapêçane. Cegerxwîn bi vê zane û lewra di her firsetî de dixwaze gelê xwe ronî bike :

Bes e paçik ji guh derxe çî hawar û çî qîrîn e
Xwe rapêçe ji bo cengê bi zor heqê xwe bistîne

Dizî û cirm û bêş û zor, bes e millet li te şerm e
Dema tang û firoka ye, çî xişt û def û tizbî ne ?

Bixwîne da ku serbest bî, bi xurtî bighê doza xwe
Binêr her tişt li dinyayê wekî cenga Filestîn e.

Cegerxwîn tim dikî qêrîn, sitem dimrî bi hikmê dem
Ji min bawer ke ey millet nebê dîn e ne bê dîn e.

Di ronîkirina xwe de Cegerxwîn rexnekir e jî :

Nifrînekê ji Yezdan dikim, tu bêje amîn
Şêx û melayên Kurdan belengaz û geda bin

Lewra yekî ji wana qanûn bi zarê kurdî
Ji bo me çênekir e qet, ji ber vê em nezanin

Feqî bi xwe nezan e, seyda dinêrî qamûs
Her yek bi dil dibêjin em miftiyê zeman in.

Bi kurdî ger bixwînin bê renc û bê giranî
Bê qeyd û şerh û haşî cahil bi xwe dizanin.

Ac. Şî'ra Cegerxwîn qîrîn, hawar û gaziya gelê kurd e : li ber çavê dinyayê, li ber çavê azadîxwaz, demokrasîxwaz, aşîûxwazên dinyayê welatê Kurda dû û dûxan, gelê kurd li ber zor û sitemê di gola xwînê de bê dost û heval û perîşan e. Mafê gelê Kurd ê di dest de bi tenê qîrîn û gazina wî dimîne. Diqîre ka ku dengê wî bibihîzin, ka ku yên ji wî bi xwe dengê xwe bibihîzin :

Welatê Kurda tev xêr û bêr e
Hemî maden e tev zîv û zêr e
Lê çi bikim îro maye j'xelkê re

Welatê Kurda hemî çîmen e
Egîd û şêr û piling tê hene
Hemî heval û pismamê me ne

Koma miletan ma qey tu ker î
Çavê te kor e tu l'me nanêrî
Yaxud dijmin î, ji me nagerî

Gunhê me çi ye bo çi deng nakî
Pirsê ji halê me Kurdan nakî
Em kêm ketine, tu me ranakî

Ma ne hêja ye, em herdem ba kin
Ax û xweliyê bi ser xwe dakin
Yan bibne dewlet, yan bêne kuştin
Yan dilxweş bimrin, yan dil bi matem.

Xakî Kurdistan bi qurban pir ciwan û paqij î
Xwîn rijandin pir kurên te wa li her alî rijî
Miletê kurd ta ku sax e ew ji vê rê nagerî
aferî... aferî...
Qadî Mihemed aferî

Ey Tirûman kuştina Qadî Mihemed ka çi ye ?
Qey edalet tim wisa ye, hukmê dîmûkratî ye
Lê bi kuştin û bi zîndan miletê kurd namirî

aferî... aferî...
Qadî Mihemed aferî

Meriv dikare şîrên siyasî û komelayetî yên Cegerxwîn li gora temayên wan bi vî awayî par veke :

1. Li ser rizgariya Kurdistanê
2. Li ser yekîtiya an yekîtîxwaziya gelê kurd

3. Pesnê qehremanên tarîxî-mîtolojîk ên kurd û îranî

4. Êrîşên li dijî şêx, axa, beg û dewlemendên ku li ber yekîtiya gelê kurd û rizgariya Kurdistanê bend in û tevkarê dijmin in.

5. Aşîti û demokrasîxwaziya cîhanê

6. Li ser têkoşîna çîna proletar û gundiyan

• 7. Şîretên li ser pîr û pergal, rabûn û rûniştinê.

Şîrên wî yên siyasî komelayetî bi piranî bi mebesta propaganda û ajîtasyonê hatine nivisandinê. Ji ber vî çendî dengê wan gurr e. Yên xwendina li meydan û kolana ne, yên li xwexistin û serxwerabûnê ne.

B. Şîrên evîndariyê : Şîrên Seyda yên evîndariyê di du tofan de berhev dibin. Tofa pêşîn ew in ku dilketiya Seyda jin e an keç e, lêbelê ev jin, keç an dayik bi xwe sembola Kurdistanê ne. Di xwendina Şîrên ji vî celebî gava çêl li dilketiya xwe dike, jineke bi ser û sinc, bi laş û gewde dixuyê. Lêbelê ev jina ji aliyê Seyda ve hembêzkirî û li ber ramîsana nişka ve dibe «dayika welat», «dayika Kurdistan». Şîrên wî yên ji vî tofê, meriv dikare bêje ku berdewama Şîra me ya klasîk e, bi vî têveliyê ku di Şîra klasîk de «Xwedê» di ya Cegerxwîn de cihê xwe daye «welat» an «Kurdistanê».

Şîrên wî yên tofa diduyan rasterast yên li ser evîna muşexes (konkret) e. Dilketiya Seyda jineke an keçeke zindî ye : bi çente, qundere, kember, bazin, guhâr e. Bi Seyda re li konser, meyxane û tiyatroyê ye, di locayê de carina bi hev şadibin. Bi hev re şerabê vedixwin, Seyda bi sêvên wê dileyize.

Şîrên Seyda yên tofa pêşiyê dûmahîka Şîra me ya klasîk e ku Şa'ir evîna xwe ya beşerî ji ber şerm û fediya dînyayê ku bixwesta jî nikaribû bîaniya ziman, çêl lê bikira. Kirasê Xwedê li dilketiya xwe kirin meşrûiyetê dida evîna Şa'ir. Ku meriv hin Şîrên Cizîrî ji «kirasê Xwedetiyê» bişêlihîne, ewê rasterast bibin Şîrên evîndariya beşerî, belkî piçek bîhna mustehceniyê jî jê bînin. Seydayê Cegerxwîn vî «kirasê Xwedetiyê» jê şêlihandiye, lêbelê «kirasê welat an Kurdistanê» lêkiriye.

Di Şîrên tofa diduyan de Seyda rêçîka evîndariya folklorîk ajotiye. Di stranên folklorîk an gelêrî yên kurdî de ji hezkirina keç û xort, jin û mêr re tixûbek kişandî tune. Nemaze di dûrikan de ji navê berjêr û ji navê berjor ewçend tişt tene gotinê ku yên hîn nebûyî ji berê şerm dikin. Ji aliyê bi serbestî gotinê li ser evîna beşerî Seyda rêçîka folklorê ajotiye, lê di aliyê form, aheng û gotinê de en'eneya xezelê meşandiye.

II. JI ALIYÊ TEŞE Û PÎVANÊ VE

Çi yên siyasî-komelayetî çî yên evîndariyê şî'rên Cegerxwîn ji aliyê teşeyên (form) xwe ve klasîk in. Piraniya wan bi teşeyê xezel û mesnewî hatine nivisandinê. Wekî Paul Robson mustezadên serbest û hin ên mustezad jî hene. Wekî dinê bi teşeyê musammat jî şî'rên wî hene ku ev gişt ji aliyê teşe ve teşeyên klasîk in. Ji bilî vana Seyda bi teşeyê dûrikên ber tembûrê jî çend şî'r nivisandiye ku «Ji Hevalekê re», «Gulperî», «Padîşeha Evînê» ji vana çend numûne ne.

Ji aliyê pîvanê (wezin) de şî'rên Seyda pîranî bi erûzê ne.

Çi ji aliyê teşe çî ji aliyê pîvanê de şî'ra Cegerxwîn şî'reke nû nîne, bi maneya kevinî klasîk e. Lê divê meriv vê jî ji bîr neke heke ew bi teşe û pîvana xwe ji ya kevin awarte biwa ji aliyê xelkê ve belkî ewçend nehata girtin û hezkirinê, di xwendina li meydan û kolanan belkî ewçend tesîr li gel nekira.

III. JI ALIYÊ NÛYÎTÎ Û KEVINTIYÊ VE

1. Ji aliyê teşe, pîvan, deng û ahengê ve şî'ra Cegerxwîn şî'ra Cizîrî ya bê mîstîsîzm, ya jiyana sed sala me ye. Qalib kevin e ruh nûjen e.

2. Ji aliyê ziman û xîtabî xelkê kirinê de Cegerxwîn Bateyî yê sed sala me ye. Bi zimanekî ku herkes jê têbigihîje û bi mebesta propagandayê herdû jî şî'r nivisandine. Bateyî propaganda dînî, ya hezretî Muhemed dikir, Cegerxwîn ya rizgariya Kurdistanê dike.

3. Xanî fikra dewlet danînê bi diyarî berpêşî mîletê kurd kiriye. Lêbelê Xanî di vê de bêtir wek alim, filozof û dîplomat xebatê kiriye. Xanî dayetî û mamostayîya vê fikrê kiriye, lê Cegerxwîn mîlîtan û ajîtorê vê dozê ye : gotina xwe rasterast bi hêrs, qîrîn û navtêdanê dibêje. Ji bona ku meriv ji Xanî fêhm bike divê ku meriv xwenda û zana be, lê ji bona fêmkirina ji Cegerxwîn ne hewce ye ku meriv xwenda û zana be. Herdû jî hunererê (sen'et) kirine xizmeta siyasî û civakê, lê hunera Xanî arîstokrat e, ya Cegerxwîn gelêrî ye.

IV. JI ALIYÊ FELSEFA JIYANÊ VE

Di şî'ra kurmançiya bakur de şî'ra pêşîn ku felsefa jiyane ya komelayetî û şî'ra kevin girtiye avêtiye, Cegerxwîn e. Di hoyên îroyîn de ev ji me re gelek manîdar neyê jî, di hoyên salên 1920 hetanî 1960 yên Kurdistanê de

gelek gelek manîdar e. Şa'îrekî ku ji melatîyê hatiye, bi salan bi vê felsefa kevnare ya di ruhê mirovan de hestî-girtî xwendin û gihîştina xwe birîye serî, belkî heta wê demê ew û felsefa nûjen a rojava qet rûbarê hevûdu nebûbin, di nav komela kurdî de bi carekê radibe li dijî prensîbên bingehîn ên vê felsefê derdikeve. Li hember «La hewla wela quwete îla bîlahî-l elî yul ezîm», «Er rizqû 'el-ellah», «El qeder la muxeyyer», «La rahetî fîd-dunya»; ji bona ku mîletê kurd, karkêr û gundî, mirovên li dinyayê ji sitem û bindestiyê bifilitin, di dinyake xweş û şîrîn de bi hev re bijîn rabûn û qîrîn, navtêdan di komelake mîna komela kurdî paşvemayî de tiştekî hindik û hêsa nîne, rasterast şoreşa bîr û ramanî ye. Gava ku meriv bide bîra xwe di hoyên îroyîn yên 1986 de tevî pêstûrî û sitema kemalîzmê li ser dezgeh û damezranên dînî yên Tirkîyê, ji bo ray stendîne partiyên Sosyal Demokratên endam an nîvendamên Enternasyonala Sosyalîst diçin xwe davêjin şêxên Bîngolê, Bedlîsê, di ber wan digerin. Hebûna van «şêx», «dede», «pîr» û ruhbanan, nîşana bi hêz bûnê vê felsefa kevin û hê ji hev nebişkîfîna avahiya komelatiyê kevnare ye. Di vê rewşê û di hoyên 1920, 30, 40, 50yan de bê piştgiriya siyasî an îdeolojiya resmî ya dewletekê li hember vê felsefa kevin têkoşîn barekî giran, karekî zehmet e.

Ruhê ku jiyane dide şîrên siyasî û komelatiyê yên Cegerxwîn ev felsefa wî ye. Ev felsefa wî ye ku bizota têkoşînê û ji kurdbûna xwe nefedîkirinê, berevajî ji kurd-bûna xwe serê bilind ragirtinê da nîşana me.

BÊŞANSIYA CEGERXWÎN

Rewşenbîrên hevalên Cegerxwîn yên wekî Bedir-Xaniyan, Cemîlpaşazadeyan li Îstînbûlê, li Ewrûpayê xwendina li gora hoyên wê rojê ya bilind û nûjen xwendibûn. Bi hindikî bi çend zimanên rojavayî zanibûn, ew û kultura rojava rûbarî hevûdu bûbûn. Bi hindikî di aliyê şîr û edebiyatê de naskiriyên Namîk Kemal, Tevfîk Fîkret û Halî Zîya bûn ku ev jî neynika edebiyata fransîz ya li Dewleta Alî Osman bûn. Îstînbûl merkeza tevgera huner û edebiyatê bû. Cegerxwîn ji van îmkanên hevalên xwe bêpar bû. Teoriya wî ya edebiyatê teoriya belaxeta li hucrîk û medreseyan, ya di navbera melayan de bû. Feqehên ji malan şîv berhevkir, melayên mirî-şo ne bi alîkariya hin «musulmanên ehlê xêr» be, nikarin kitêbên xwe yên xwendinê bikin, di ku de ewê kitêbên kultura giştî ya ji dervayê xwendina mecbûrî an yên li ser huner û edebiyata nûjen bikin.

Cegerxwîn di van hoyan de jî. Di jiyana xwe de timî çî bigre «qaçax» bû. Gava ku Nazîm Hikmet ji Tirkîyê reviya cihekî mîna Sovyetê lê sitarî kir, lêbelê cihekî ku li Cegerxwîn sitarî bikira tunebû. Ne Tirkîye, ne Sûriyê, ne Îraq û heta şoreşa 1961-1975 jî lê sitariyê nekir.

Şa'ir, nivîskar, hunermend ku dîsa dîsa nexwîne, negere, nebîne lênekole dê çawa pêş ve bibe ? Ku ew pêş ve nebe dê çawa bikare tiştên nûtir û hêjatir biafirîne ? Ji Sûriyê heta Îraqê, ji Îraqê heta Lubnanê, ji Lubnanê heta Swêdê Cegerxwîn ji ber zor û sitemê reviya, ne ku geriya. Ev ger ne gera kulturî bû, lê reya zerûrî bû. Loma ji dîwana diduyan Sewra Azadî pê de êdî nûyîtyek, xweberiyek di şî'rên wî de dîtî, dengê nûtir bihîstî zor e.

GOTINA DAWÎ YA VÊ NIVÎSARÊ

Şî'ra kurmanciya bakur ku bi şî'ra Cizîrî li asoyê edebiyata me geş bûbû, bi şî'ra Xanî kete xizmeta îdeolojiya milî. Di pey Xanî de hebûneke xurt nîşan neda, di nav mirin û jiyane de ma. Cegerxwîn bi giyaneke nû jiyane dayê, şî'rê ji dîwan î dîwanxana derxist, bire meydan û kolanan.

Cegerxwîn rûpela dîdaktîzmê li şî'ra kurmancî zêde kir. Dîdaktîzma Cegerxwîn di hindava guhartina rewşa siyasî û komelayetî de ye : hişyarkir e, ronîkir e, têkoşer e. Heta şoreşa Kurdistanê serkeve wê şî'ra Cegerxwîn ji aktueliya xwe, ji jîndariya xwe tu tiştêkî wînda neke, wê her van erkên xwe bi cih bîne û bi wî awayî jî Cegerxwîn dê bijî.

BÎRANÎNÊN IHSAN NÛRÎ PAŞA (V)

Roja din qomandarê kurd zanî ku tîpek hêzên Yekîtiya Sovyetî ji bo yarîdeya bi hêzên pelamader ên Dewleta Tirkîyê ji çemê Aras derbas bûye, palên bakurê rohelat ên Agriya Piçûk dagir kirine. Ev êdî ji bona têkoşeran girîng nebû, ji ber ku ew li nav deryaya neyar ketibûn, ava wê deryayê ji bona xeniqandina wan zehf zehf bû, çiqas zêdetir bibûya bê tefawut bû. Têkoşerên Agrî li pêşiya ev hêzên mezin û hevkarîya dewletên Sovyet û Iranê bi dewleta Tirkîyê ji bo jinavbirina* navenda têkoşerên kurd ên azad têgihîştibûn ku bergiriya qors hêç kelk û faîde nîne. Bi taybetî ku jin û zaro ji hemû aliyên de ketibûn bin guleyên neyar, rizgarkirina wan gelek giran bû, dîsa dilê wan nedihejîya. Serokên Agrî civînek pêk anîn û paş axaftin û wurdûnan* qerar dan ku ku ta giyanê wan heye ji Agrî dernekevin, şer dirêjî bidin û bergiriya Agrî bikin. Biryar dane ku paş teqîna fişenga dawîn bi xencer û kulm bikevîne nav neyar. Wan ên ku dixwazin kela azadî ya Kurdan helşînin zikê wan bidirrin, bi diran tike tike bikin, bi hevra bimirin, ev rêya azadî ya neteweyî ku êdî nikarin ta amancê bipîvin, qenebe bi bîrewerîya xwe ku hatine kuştin bi serbilindî û nebezî ji bona girtina mafên neteweyî yên kurd bi diyarî bi cî bihêlin, ta ser meşqê ji bona ên mayî û zar û piçûkânên neteweyê kurd bin.

Çi çak dibû wan ên ku meznayetiya hissa canbihurî ya kurd li pênavê destxistin û parastina azadiya neteweyî ya xwe de dudil in, bawer nakin, vê menzera bi şehamet bi çavê xwe bidîtin. Mîna ku çiya û newalên Agrî bi lawên xwe hemawaz bûne dibêjin :

*Neyzeyên Tirkan
Ji xwîna Kurdan
Dengê tîfîngan
Mêrxasên welat*

*dirandin zikan
sor bûn newalan
çiyayan hildan
hawar bigihên*

DERYA NEYARAN

Pelamarên dilêran ên Kurdan dest pê kiribûn, Belam çî faîde ! Wekî guleyek li nav deryayê bavêjin di pêlên xêşîngîn de dişkevî, diçû êdî nedizvirî, li dawiyê

xurekê avê dibû. Li rastî de tenasubê hejmara hêzên Kurd û Tirk dilopek av li nav derya bû. Jiyan hêjahiya xwe ji çeng dabû, kuştin û kujran karekê adî bûbû. Li berê bakur ji aliyê Qorxan bi çiyayê Kûpgol ku bi destên Tirkan ketibû rikêbên qors kirin, hin ciyan girtin, Tirkan bi aliyê Qabaq Tepe paşekêş kirin, aliyek bi Mîx Tepe aliyê din bi zinya Agrî şalavayeke xurt birin, neyar pare direviya, belam beramberê hejmareke bêhisab ê neyar akamê* ku dixwastin bi dest nehat. Dîl ku digirtin çekên wan distendin û wan di cî de berdidan. Ew navçeya ku di destên Agriyîyan mabû, şewat tê nebû, av jî kêmbû, birçîtî zêde dibû. Çend rojek her çawa bû, şer dirêjî kêşa. Frokeyên tirk kela azadî ya Kurdistan timî bombaran dikirin, qurban zor bûn. Birîndarê kurd di ev halê şerpezeyî de jî dîsa vîneyeke* azayetî û bicergî nîşan dida, bomb hestiyê çongê wî çend tike kiribû, hêviya jîna wî nemabû ku parepareyê wan ên çongê şikesteyê xwe li pêşiya wan ên ku hatibûn serî dilivî, çaxê qomandar li halê wî pirsî gote wî : “Ez zehf pîr im, çak dizanim ev birîna min êdî çak nabe, ezê bimirim, şukir ji Xwedê dikim îro me qurbanê rîya azadiya kurd kir, hêç xesarek din bi zariyên Agrî nehat, têkoşeran parast.” Min ji wî re negot Edo Emkî hatiye kuştin.

Paş çend roj hêzên Agrî ji tariya şevê kelk girt, xwe bi nêzikê bajêrê Başkend gihand. Başkend li bakûrê rohelata Agrî û rohelata deşta Ixdîrê, navenda navçeya Araliq bû, rûniştevanên wê tirkziman, nêzikî çemê Aras -sînore Sovyet- bû. Berî beyanî şer dest pê kir û saetek paş derketina tavê hêzên Kurd bajêr dagir kirin. Eskerên tirk bajêr berdan, hêzên kurd bi dû wan ketin. Şer dirêjî kêşa, Kurdan rêya Ixdîr li wan birrîbûn, ew nikaribûn xwe bifilitînin, bi aliyê sînore Sovyetî paşekêş kirin, paş dayîna xesarek zehf nivê esker dîl ketin, ku hejmara wan sed û pêncî kes dibûn. Sî esker jî li nav bajêr dîl ketibûn, ên mayîn xwe gihand qerexê Çemê Aras, bi sînore rûs. Rûsan Kurdan li bin agirê reşaş û guleyan girtin, eskerên tirk ji destên Kurdan rizgar kirin, pena* bi Rûsya birin. Paşê hate bihîstin ku dewleta Yekîtiya Sovyetî gelek qedrê wan girtiye û wan bi çek û cebxana wan ji perrê Narqara bi şarê Ixdîrê rewan kiriye.

Rûniştevanên Başkendê ji hatina hêzên Agrî gelek xweşhal bûn, bi germî bixêrhatinî kirin û li pêşiya ala Kurdîstana azad ku li ciyê ala Komara Tirkîyê li ser banê xaniyê hikûmetê yê nahiya Başkendê kêşan pez qurbanî kirin.

Mela Huseyn, têkoşerê eyan û niştimanî ku ji navçeya Wanê hatibû Agrî û li nav xêla Geltûrî dijî, li gel Emerê Besê, serekê xêla Geltûrî, li gel hêzên pêwîst hildabûn ser xwe ku çaxê pelamardana Başkendê, Taş Burun dagir kin û rêyan ji hêzên arîkarî yên tirk bigirin. (Ev Taş Burun ne Taş Buruna Bayzîde ye, cîyek e li ser rêya Ixdîr û Başkendê). Belam ew jî ta nivê rê çûbûn, dîtibûn ji Tirkan xeber nîne, zivirîbûn ser Başkendê. Ev şer heşt saet kêşa. Ji vî şerî jî Zuhdî Güven bas kiriye, dibêje ku pey vî şerî, roja din Tirkan alayek esker şandiye, vê Taş Burunê girtine. Paş çend rojan, Emerê Besê, serokê hêza Geltûrî ji bona cubrana heleyê pêş, xwe rasperdira bi hêzên xwe pelamara Taş Burun bide û bigire. Wan bi mêrxasî û fedekarî rikêb kirin, eskeran ji çadirên xwe derxistin, belam bedaxewe* di vê demê

de guleyek neyar singê vî qaremanî qul kir, tevî şuhedayên azadiya kurd kir. Şerkaran şer domandin, çend giran ji destên Tirkan derxistin, belam wê çaxê hawara Tirkan ji Ixdirê bi maşînên* barî gihîşt, êdî nikaribûn ev ciyên ku dagir kiribûn biparêzin. Serokê wan jî şehîd ketibû, ji pêşiya bomb û mîtralyozên neyar zivirîn şûna xwe ya berê.

Zuhdî Güven li ser vî şerî jî dinivîse : "Li tarîxa 7 avgust* şaqiyên malbenda Araliq helperanek numayîşî çêkirin. Li ser vî, tabûrek peya û çar top, li bin fermana qomandarê alayê Kamil Beg bi Taş Burun, navbera Ixdir-Araliq şandin xeyn ji wî bolûkek siwarî û tabûra sînorî ya Ixdir li jêr fermana alayê danîn. Li Taş Burun em li çavnêriya karesat* bûn. Li Tarîxa 9 avgust bi telefonê bi qomandarê alayê gotin ku li navçeya Araliq Kurd dixwazin şebxonek* xin. Bolukek sînorî û tabûrek ji alaya me li bin fermana Fuad Beg li gel hêzên din bi navçeya Araliqê çûn. Paşê tê gihîştin ku bi şev Kurdan bi Taş Burunê şevxon dane, bi zabitên û eskeran kuştî û birîndar dane. Paş lêkolînewe em tê gihîştin ku Ihsan Nûrî ji bona ku çek û muhîmatê Taş Burunê bi dest xe, li rapêrîna girîng a xwe kelk bigire, çun zanî ku li wê derê hêzên esker gelek e, ji bona ku ew hêzan du beş ke bi çar sed mêr li aliyê Araliqê numayîşê daye, qomandarê me xapandîye, midirê navçeyê tirsîyaye feryadê bilind kiriye, me jî vê hêzê şandîyê aliyê Araliqê, wê çaxê Ihsan Nûrî li jêr fermana Emerê Besê hêzek şandîye Taş Burun û xesaretê daye hêzên me."

Rojnameya Tirkîyê bi navê Cumhuriyet rûdavên ku çil sal berê çêbûnê dinivîse, li nava wan ên ku li ser Kurdistanê bûne û bi destên min gihîştine li vê derê dinivîsim.

Ji Cumhuriyeta 27 julî* 1930 "Kurdên Hekariyê". "Eşqîya ku ta îro li sînorê me û erdê me pelamarê kirine, ji beyn birine, îcar jî ji aliyê Iraq hedîseyek derxistine. Şêx Herzêl ku li navçeya Mûsilê rûdinê, 500 suwariyên wî 21-22 julî li malbenda navçeya Hekariyê pelamar dane, hêzên sînoran qors pêşiya wan girtine, zor xesaret dane wan, ji sînor derxistine. Mebesta wan her çi be hêzên me di nivro de bêhêztir kirine.

Li Çiyayê Agrî rûdave mîna berê ye. Qomandarê hêzên mezin ku li ser şaqiyên Agrî wê pelamar bike, Salih Paşa - Omurtag- di vê babetê de wisa gotiye : «Pelamara me ya diduya wê di van nêzikên de dest pê dike. Şaqiyên ku ji ev ciya car-caran bi deşta Ixdirê dikevin, xesaretê didin, emê bi tevayî bigirin. Wan ên ku li Çiyayê Agrî rûniştine, piştê wan hatiye girtin, di gemaro de ne, nikarin bi Iran biçin...». Evê ku li Çiyayê Agrî şaqiyên idare dike Ihsan Nûrî ye. Ew zabitekî ye ku ji ordûya me revîye. Xaîn berê tevî Kongrey (helperan) bûye, bi Hezretî Gazî* erzî tazîm kiriye. Ihsan Nûrî di vê kongreya şer de li babetê kurd hinek tiştan xwastiye, dîtiye qebûl nebûye, xeyidiye, xwe hilkêşaye çiya. Eşqîya ji wî re Mişîr xîtab dikin, ev xelkê Bedlîsê ye, jina wî tirk e".

Ji Cumhuriyeta 29 julî 1930 :

".. Wez'ê Agrî mîna berê ye. Şaqiyên ku li bin bombên frokeyên me naumîd û bêhal bûne, taqeta pelamara wan nemaye, tenê van rojan beyaniyan avêtine ku sûretê wan li jêr e : "Gelê brayên kurd liyaqeta we heye bibin neteweyekî mezin ! Temamî

neteweyan ji bona serbixoyiya* xwe qors dixebitin. Îro neteweyê aza yê me kurd hê li bin destên mezalima tirkan dîl maye. Gelo ji vê şûnde jî ji vê jîna dîl tehemul dikin ? Bi me li rojava ta sînorê iran û li nivro ta sînorê Iraq erdê fire hatibû dayin. Ev zeviyên ku ji zor kevn de malê me bû, em ji bo girtina wan bi ser xwe rabûne, helsane, bi ev cîhada muqedesane bizeliqînin !..“ Di aliyê din jî xeyn ji civata Xoybûn me bihîstiya komeleyek din jî pêk anîne ku amanca wê yekkirina temamî Kurdistan.”

Dîsa ev rojname di tarîxa 3 julî 1930 de nivîsiye : “Giliyê axir ê me bi Iran” “Muxbîrê rojnameya **The Times** ji Istanbul li rojnameya xwe nivîsiye : “Li Çiyayê Ararat bi hezaran şaqiyên kurd ciyên mustehkem ji xwe re girtine. Kurdên Iran jî bi wan alîkariyê dikin, yarmetî didin. Erkanî Herbiye ya Tirkîyê ji bona temirandina Şoreşê hêzek 66 hezar esker û cendirme û 100 froke bi navçeyên Wan û Bayzîdê şandîye, ev hêza mezin ji bona temirandina wê bes e..” Hikûmeta me siyasetê di kêleka Dewleta Iranê ber bi çavên xwe girtiye, di nav 4-5 rojan de giliyê axir bi noteyek dayê wê. Ev note ku tewsiye û tenbîhek e bi Iranê, zor şedîd bû. Iran di welama noteya yeka de gotibû “munasebetên muşterek ên me semîmî û brayane ne. Tîştê ku li nav note nivîsîne neheq e û li babetê ev helsan tucar têkeliya me nîne”. Di noteya duwemîn a me de : “Di munasebetên dostayetî de pêwîst e sînorê mişterek bi hevra biparêzin. Berê kesan ji zeviyên xwe helperîn bi sînorê cîran re tê gotin tecawiz. Dewleta ku li gel şaqiyan yek be iddiaya dostayetî ya ev dewlet pûç e, bê ehemiyet e. Heke îmkandayina muzaheret bi helsanê şaqiyan dirêjî bidin, li gel çekên meşrû yên parastina xwe ji beynbîrîna şaqiyan li Iranê pêwîst dizanin !”

Çend roj beriya wî li Iranê karesatek qewimî ku bû sebebê têkçûn û pejarey zehf Agriyîyan û arîdana Iran bi Tirkîyê, bi ev çeşne rûxana* binageya Agrî pêk hêna. Paş şkana Geliyê Zîlan, birek jin û zariyên wan çûne nav xêla Celalîyên Iranê ku li nav sînorê Tirkîyê çadir daçikandibûn. Zozanê hoza Xelkan ji Celalîyan li rûyê xeta sînorê Iran-Tirkîye, li navçeya Ovacîk bû. Hêzên tirk bi bihna hatina mihacirên kurd bi Tirkîyê pelamar da ser vê malbendê, bi çeşnê ku frokeyên wan navçeya Çaldîran, li Iranê, bombaran kir. Xalid Axa, serokê xêla Celalî, û reşmalên xêla wî di ber pelamara Tirkan ketibû. Ji bona ku jin û zaro û keriyên Xêlê bi destên Tirkan nekevin û ji ber ku ji xwe çaxê daketin ji zozan jî ghiştibû, paş şerek li bin gulebarana Tirkan geriyên deşta Ovacîkê. Tirkan şûna wan dagir kirin. Di welama ev dagirkirin û bombaran erdê Iranê, fermandarê sînorê Iranê hêç karê berberekanî nekir, tenê fermandarê navçeya Mako ferman da xêlê ku ew tevî jin û pez û dewarên xwe bi ew şûna ku li ber pelamara Tirkan ketî, hêzên Tirkan dagir kiribûn, bizvirin ! Ev ferman ji bona xêlê diyar nekiribû an bizvirin tevî jin û zariyên xwe werine kuştin, an teslîmê Tirkan bibin ! Ji bona wî ku ji aliyek sar û serma, ji aliyê din birina jin û zaro û keriyên nav agirê neyar ! Ev ne tu rê bû !

Xalid Axa, di welama vê fermanê de bi fermandar got : «Hêzên Tirkan pelamara erdê Iran kiriye û birrekî dagir kiriye. Em ji bo parastin û derxistina neyar ji axa Iran

bi hemû çeşne amade ne. Zabitek û çend esker bidin. Em tamamî tifingên xwe bidin bin fermana vî zabitî û tev bi hevra herin axa xwe ji destên neyarê dagirker derînin. Ji ber ku birina jin û zaro bi nav şer nabe, bipezirin ku reşmalên me dîsa li vir bimînin.» Belam fermanarê Mako di qiseya xwe ya pêşî de israr kir.

Roja din, yawer -bînbaşî- Fethullah Xan li gel desteyeke siwar, ku birrek wan ji rûniştevanên tirkziman ên Mako bûn, hate nav Celaliyan. Mihemed Emîn Axa, ku brayê Xalid Axa û reîsê ev beşê xêlê bû, çû peşiya wan, bixêrhatinî got. Yawer destûr dide :

- Ji Mako bar kin, şûna zozanê xwe, bi aliyê sînor herin !

Mihemed Emîn bi welamê dibêje :

- Şûna reşmalên me eskerên tirk girtine, birina jin û zaro, kerî û malên me di hewla me de nîne. Belam ez bi xwe û çekdarên min li jêr fermana te ne, li ku ferman didî, em diçin !

Yawer Fethullah dibêje :

- Pêwîst e li gel jin û mindal û pêz û dewar tev herin, û niha jî dest pê bikin !

Mihemed Emîn Axa lê vedigerîne ?

- Ji bo çî jin û zariyan bavêjin pêş guleyên neyar, bidin kuştin. Em bi xwe hazir in biçin.

Di vê axaftinê de Yawer Fethullah heftîra xwe hildikşîne, Mihemed Emîn Axa li pêşiya konên wî di kuje û hespê xwe dibezîne direve ! Mirovên Mihemed Emîn Axa ku hemû çekdar bûne, ji bo xatirê Dewletê li pey wî guleyek jî navêjin, tenê siwarên çirîk* ku li gel wî hatibûn digirin, tifingên wan ji destên wan distînin, ber didin.

Xalid Axa, çaxê hate ser cenazeyê brayê xwe, kaxizek bi serokayetiya Mako dinivîsê, dibêje : «Brayê min hatiye kuştin, bi qurbana Şahensah be ! Çun payîz e, xêl ber bi şûna nişteci ya xwe diçe, tikam wa ye peşiya wan negirin !»

Bi şev bar dikan, dikevin ser riya xwe ya zivistanî. (Xêl di hatin û çûyina zozanan de bi şev diçin, bi roj dimînin, pez û dewarên xwe diçêrînin). Nêzîka nivêşevê digihên tenga Gacot. Postê eskerî pê dihise, jin û zariyan gulebaran dike, çekdarên xêlê jî rikêbê ser postê eskerî dikan, eskeran û zabitê wan digirin, çekên wan distînin, rêya xwe vedikin.

Yawer Fethullah Xan bi ev çeşne pîlan û nexşeya çepelê xwe ku yarîdeyê Tirkiyê bûye bi rê ve dibe û xizmeteke baş bi Tirkan dike.

Roja din ev deng û bas ghişte Agrî. Ji ber ku ev karesata naxoş bi çakî tamam bibe, fermanarê kurd li gel çend kes ji serekên mezin ên Agrî çûne nav xêla Celaliyan, wan zabit û eskerên Iranî ku dîl ketibûn û Kurdan li gel xwe anîbûn dane berdan û çekên wan dan şandin aliyê Mako. Ji bo bicihkirina vê karesatê û dawîpêhênanê bi qomandarê leşker Hesên Xanê Muqedem xeber şand got :

«Li babeta vê karesatê her çawa ku Dewlet pê xweş be û her fermana ku bidin wê di layê fermanarê kurd de cî bi cî bibe.» Qomandarê leşker general Hesên Xan, zabitek bi navê Agalarof şand cem qomandarê kurd, gotûbêj kirin. Agalarof

got : «Mûsa Ibrahîm, serokê hoza Sakî, raportê daye, gotiye ku siwarên Agrî xwe hazir kirine, rikêbê sînorê Iran bikin !»

Mûsa Ibrahîm tevî binemala xwe li ser girê Ayibey, li kêleka sînorê Iran kon vegirtibû. Tê gotin Mûsa Ibrahîm ji aliyê Yûsûf Xan, naib-serokê postê sînor ê Ayibey vadar bi nivîsîna vê raportê bûye, zabitê navberê jî tirkziman bû, ji bona temamkirina nexşeya reîsê xwe Yawer Fethullah Xan ji wî destûr girtibûye. Belam qomandarê leşker di dawîya lêkolînan û bi cêribandinên xwe yê çend salan amanc û mebesta Agriyîyan çak dizanibû, gotibû «Bawerkirin nîne ! Ihsan Nûrî vî karî nake !»

Ji bona mutme'în kirina dewleta Iranê Xalid Axa ji serokayetiya xêla Celalî hildan, kurê mezin ê wî Emo Axa kirin reîsê Celalîyan, brayê wî Mistefa û kurapê wî Hesênê Xalid ji bo nîşandayîna hesta pakî ya xwe şand Mako xizmeta qomandarê leşker. Qomandarê leşker Mistefa li gel xwe bi Tebrîz bir, bi riz û hurmeteke zehf dîsa anî Mako, ji rehma dewletê mutme'în kir.

Xalid Axa li nav bajêrê mako de dostên berêz hebûn ; her wê rojê ji wan yekî bi Mistefa kurê Xalid dibêje : «Îşev hêzên esker û çirik her aliyên konê bavê te gemaro dikin, wê Xalid Axa bi jîyan an mirî bigirin, zû here ji wî re bêje.» Mistefa bi lez ji Mako bi rê dikeve, bi zomayê bavê xwe diçe, li mala bavê xwe nexşeya emîrê leşkeran dibêje. Xalid Axa ciyê zomayê xwe diguhire, hinek dûrtir diçe, çunkî bawerî zehf bi ew dostê xwe hebû. Kurapê Xalid Axa, Hesoyê Eyûb, ku konê wî parre li nêzikî Irxin bû, bawer nekir, ji ciyê xwe nelibitî.

Giliyê dostê Xalid Axa rast derket. Wê şevê desteyek ji hêzên dewletî çûbûn, esker û çirik-evanan esker nîn in ji bo arîkariya dewletê bi destên xwe çek dane - dor û berê ciyê zomaya Xalid Axa dixwazin bigrin, dibînin cî vala ye, pêş de diçin, çadira Hesoyê Eyûb gemaro didin. Sibê zû, Hesoyê Eyûb çaxê dixwaze pez û dewaran bi rê ke lê dixin, dikuji, çadiran jî gulebaran dikin û jina wî jî tê kuştin. Şivan û gavan û çend mêr ku li zomayê bûn dest bi şer dikin. Bi dengê tîfingan desteyek siwarên kurd tîn, tevî şer dibin, hêzên dewletê dişkênin. Pey şkestê Kurd pey wan bernadin, xesarek zehf didin wan, bi taybetî ji çirîkan gelek hatin kuştin.

Serokên Agrî ketin navê, pêşiya xêla Xelkan girtin û îtaeta wan bi dewleta Iranê temîn kirin. Belam tê gotin ku ji dewletê sar bûbûn, êdî baweriya wan nemabû. Ev karesatan ku bi hêç çeşnê Kurdan tavanbar nebûn, ez nizanim deng û basên wan çawa bi dewletê gihandine ku li layên Dewleta Şahensahî Kurdan hemû şaqî dizandiran, ku serencî e'la Hezretî Şah bi layê Tirkan rakêşa û yarîdeya wan kir ta Kurdan ji beyn bibin û Agrî belav bikin. Her çend pêş de gotibûm, zor tê ihtîmal dayîn ku ji rûyê raporta derew û muxrizane ya Yawer Fethullah ê tirkziman, ku li gel binemaleyê Serdarê Mako jî xizmayetî kiribû, bibe belam nedibû karê çarsale yê Agriyîyan beramber bi dewleta Iranê ber çav bigirin li vê raportê, fikir bikirana tenanet fermandarê kurd, zor pêş vê rûdavê de çaverewanê rojeke wa bûna pêşî girtin ji dewleta Şahensah re çend tîk û sekalayeke kiribû.

Bedaxewe hinek tirkzimanên Azerbeycanê binaxeyê* xwîn û rêgezê xwe nizanin ! Heke di vê babetê de lêkolîne vebin, mêjûyê kevn ê Iranê bixwînin, bi çakî dibînin ku berî ku Moxolan û serdarên tirk hatine Iranê, rûniştevanên pir ên vê malbendê Iranî bûn û paşê jî niştimanê* bav û kalên xwe nehiştine, bi ciyên din neçûne. Ev qas salên dûr û dirêj, li jêr Azarên hakim ên tirk ji tîrsa xwe fêrî zimanê tirkî bûne, zimanê dayik û bavê xwe ji bîr kirine, îro jî xwe Tirk dizanin û Tirkan dixwazin. Bi ev çeşnî ji rêgez û netewayê rasteqîn ê xwe xiyanet dikin. Belam di nav wan de zehfên têgihîştî henin ku rêgezê xwe dizanin.

☆☆☆

☆☆

Ji welat dûrketinan (mihacir) ên Geliyê Zîlan hatin Çiyayê Agrî. Bi vî teherî jin û zaro zor rijiyane Agrî, di babetê xwarin de zor tengasî peyda bû. Di vî şerê dûr û dirêj de pêşmerge tîfing û fişengên xwe ji destên neyarên xwe digirtin, belam fişeng têra wan nedikirin û ji hêç ciyî yarmetî nedihat.

Zomayê Lezgîn Silo, mezinê serokên Sakî ku li nav Zinya Agrî konê xwe vekiribûn, pez û dewarên xwe ji kaniyek ku ji wê derê derdiket av didan. Saeta dûrketinan ên welêt ên Geliyê Zîlan gihiştine ser kaniyê, ava ev kaniyê ku xuşexuş dikir, çikiyâ, êdfî qet av nehat. Xwedê dizane temenê vê kaniyê çend hezar sale bû, ev av bi ku çû ne eyan e !

PELEMARA DAWÎN

Frokeyên Tirkiyê bi nexşeyek, rûniştevanên Agrî li bin bombên derzî yên qolkirî yên xwe girtibûn û zû bi zû li ser esmanê Agrî difirin. Carcaran Kurdan bi guleyan lê dixistin, salim bi şûna daxistina xwe nedizivrin. Yek ji wan frokeyan ji bona xwe zehf bilind firiye, xwe bi bilindtirîn qocê Axrî gihand. Ev êdfî ji bona Axrî qabilê tehemul nebû, li ber mezinatiya wî giran dihat, sirrên ku ta îro jî çavên Benî Adem veşartibû îro Agrî nedibû rê bide neyarê lawên xwe, ê ku ev qas cesûr bibe, bilind bifire, serê wî bibîne ; kulmeke xurt a bayê Agrî frokeyê bi navçeya Araliq avêt xwarê !

Ser û bendê geranê ji bo serbinî û avadanî hatibû. Konên Agriyan hinekî berjêr hatin. Kurê aza û nebez ê Huseyn Paşa, Nadir Beg, li gel siwarên xwe ji Agrî derket çû xwarinê peyda bike. Li vir pêwîst e bêjim ku Huseyn Paşa Memo û Nadir, bi pêçevaneyê bavê xwe, li pênavazadî û xebat bi neteweyê kurd canbaziye kirine û li layên hemî niştimanperweran riz û hurmeta wan gelek bû. Pêwîst e dişa bêjim ku kuştina Huseyn Paşa, tevî hemû sûc û tavanên ku bi qewl û li pênavazadî neteweyê xwe kiribû hemû niştimanperweran mutesif kir, bi çeşnê ku qatilê wî Medenî, ku kurê Hecî Mûsa Beg, mezinê navçeya Mûş û netewexwaz bû, bi tavankar û xayin zandin.

Fermandarê Mako ev hemû bawerî û hêviya ku Agriyîyan bi wî û bi dewleta Iran hebûn ber ba da, bi çeşnê ku mulazimê ewel Agalarof bi sînorê Agrî şand, bi fermandarê kurd spart ku Argriyî dikarin karwanek bi Mako bişînin, her tiştê ku ihtiyaca wan heya, bigirin, bibin, ta roja ku balyozê sovyetî, yê ku li Mako dima, hatina karwanê me didît û bi Tirkan xeber dîda. Heke bi rastî ev pêşneyar rast û bêxerez bibûya yarmetiyek mezin dibû ji bona Agriyîyan di van rojên tengiyê de. Belam bedaxewe ev jî ajavaneyek* bû ji bona fêl lê kirina xebat û kêmkirina hêzên bergirî yên Agrî !

Agriyîyan, her wekî di laperên pêşî de min nivîsiye, xwe ji rêgezê pakê Aryayên Iran dizanî, çaverêya hêç çeşne karê neyarane ji Iran nebûn. Ji bona wî bi yarîdedana qomandarê Mako gelek kêfxweş bûn, bi şukrane û imtihane karwanek mezin durist kirin û bi rê xistin. Mixabin Agriyîyan êdî rûyê vê karwanê nedîtin. Çunkî roja din a birêketina karwanê ordûyek sî û sê hezar Tirk, bi top û bomb û frokeyên duwayîn û mezintirîn êrîşa xwe ser bingeya Agrî dest pê kiribû. Ew beşê axê Iran ku ketibû piştê Agrî ji bona serkubî Kurdan ji aliyê dewleta Iran dabûn bin destên ordûya tirk. Wa derket ku fermandarê Mako li ciyê ku vê axa navberê daye bin destên ordûya Tirkan bi fermandarê Kurdan bighîne, wî xapandiye, hinek hêzên çekdarên wî û dewarên wî ji destên wî girtiye bi Iran biriye. Keyn ji wî, bi dûrxistina xeta Iran ji sînorê Agrî bêşik ji xêla Qizilbaşoglu ku çend sal bûn hatibûn bi Tirkiye, di ev şerê azadî de rasperdeya parastina bakurê-rohelat a Agrî -Serdar Bulaxê- kiribûn, ji aliyê fermandarê mako axaftin, bi wan dayina dilxoşî û emandanê bi Iran kêşa bûn. Çendik li navber jî hikûmata Tirkîyê bi dek û dolab, fêl û fişal û li gel tirsandin dixwast têkoşeranên Agrî ji Agrî biqetîne û di bin fermana xwe ke. Bi taybetî di nav ji welat dûrketinan ên Heyderî gelek hewil da. Kaxizek ji Bro Heskî û Şêx Abdulqadir re nivîsî û dilxoşî dane wan û ji tavaneyan bihurî û pêşneyar dikir ku çekdarên Celalî û Heyderî bizvirin bi ser gundên xwe yên berê. Fedayînen kurd bi pêçevaneyê vê pêşneyarê, birçîtî, şerpezeyî û tenanet mirinê li jêr sîbera* ala netewayî ya xwe ji zivirîn bi jêr hikmê Tirkan çaktir didîtin. Li nav wan de tenê Hesên Axa Heyderî li gel kurê xwe Bayzîd Axa zivirîne Tirkîyê. Gerçî pêşmergeyên Heyderî pêşiya wan birrîn, xwastin wan bikujin, belam serokên Agrî pêşiya wan girtin, nehiştin bi ew kalemêr azarî bighînin ! Paşê hate gotin ku pey şkeşta Agrî Tirkan bi ev kalemêr ew qas lê dabûn ku ew li jêr şellaq de miribû.

Pelamardana bi Agrî dest pê kir. Firqeyên leşkerên tirk bi pêş ve dihatin, Agriyîyan ji pişt, ji sînorê Iranê emîn bûn, vê navçeyê bêlayan* dizanîn, jin û zaro, pez û dewarên xwe bi vî aliyê nêzikê sînorê Iranê verê kirin. Pêşmerge pêşiya rikêba Tirkan girtin, dixwastin mîna salên pêş hêdî hêdî neyaran bi aliyê navenda Agrî bikêşin, biwestînin, li nav kevirên mezin, zinarên bilind û newalên kûr belav bikin û ji nav bibin.

Desteyek frokeyên neyar li esmanê Agrî difiriyan, bombên xwe bi ser jin û zariyên bêtavan direşandin. Çaxê ev deste diçû, desteyên din diyar dibûn, bombaran dikirin. Broyê Heskî li gel çend kesên Hesesorî bi layê rastê biribû,

rojawayê me girtibû, weka bizmar xwe bi zewiyê kutabû. Pelamara peyderpey a Tirkan nikaribû wî ji ciyê wî bilibitînin; tenê ecel dikaribû dengê tifinga Bro bitemirîne.

Roja duwemîn şer awa bû ku herdu alî bi hesabê xwe ji akamên şer razî bûn. Roja sisiya pêşmergeyên Agrî ji xwe re bi fedakariyek zêde bi berdên bîrewer ên bav û bapîrên xwe pal dabûn, ketibûn şerekî qors û xwînîn. Wê çaxê ji Ayibey, postê sînorê Iranê, berê dengê topê, pey wî dengên tifing, reşaş û mîtralyozan bilind bûn û dirêj kêşan. Ji bo pêşmergeyên Agrî zehf naxoş û nalebar bû ku li gel nîzamiyên Iran bikevine şer. Fermandarê kurd ev hatinê ji bed tê gihîştin qewimiye zanî, bi wî alî çû, bi hêviya ku bikare meselê bi çakî temam bike. Destûr da ku li pêşiya hêzên Iranê şer mekin, belam çaxê gihîşte ser sînor, bi pêçevaneyê çavnihêrî, dît ku hinek hêzên tirk ji erdê Iranê jî di pişt de dest bi pelamarê kirine. Wa derket ku dewleta Iran li ser daxwaza dewleta Komara Tirkiyê ev beşê ciyê xwe ku ketibû pişt Agrî, ji bona jinavbirina navenda têkoşerên netewî yên kurd, xaka rêgezê Arya yê Iran bi jêrî fermana serokayetiya tirk daniye. Nivîser* li vir de heq ya neheqbûnê, giliyên Agriyîyan ku xwe bi kevntirîn rêgezê Aryayê Iran dizanin û di nav ev çend salên helperanê li gel dewleta Tirkiyê de li pêşiya dewleta Şahensahî ya Iran xeyn ji sêdaqet û dilpakî karê xîlaf nekiribûn, li ber çavên ronakbîr û niştimanxwazên Iranê datînim.

Dewir guhurîbû. Wez'ê şerê Kurd bedtir bûbû. Dagirtina vê cepheya zor freh ji bona kulmek pêşmerge mimkin nebû. Ji ber wî, naçar, ber bi bilindahiyên Agrî hilkêşan û ew roj jî şev gihîşt. Roja çaran pêşmerge her bihust axa xwe ta bi xwîna sor avyarî nedikirin, ber nedidan, tenanet dest bi pelamarên zor dan. Bergiriya zêde û êrîşa aza ya Kurdan general Salih Paşa mecbûr kir, ji serokayetiya giştî hêz yarmetî bixwaze ta biqedîne şûna eşkerên kuştî teji bike û pêşiya rikêba Kurdan bigire. Ji hêzên yarmetiyê taqimek di roja axir de bi destên Kurdan dîl ketin, hate zanîn ku wan -alay- ji navçeya Başqele şev û roj rê hatine, xwe gihandine Agrî. Bi pêçevaneyî, Kurd ji hêç cî hêviya yarmetiyê nebû. Çawa ku min ji rojnameya tirk wergerand û di nav laperên jorîn de nivîsiye, dewleta Tirkiyê ji bona temirandina agirê Şoreşa Kurdan, şêst û şeş hezar esker û cendirme û sed froke şandibûye. Ji wan hêzên mezin, beşê zêde bi ser Çiyayê Agrî pelamar daye, ên mayîn ji bona nehiştina yarmetîdana Kurdan bi Agriyîyan, çi Kurdên Tirkiyê çi Kurdên Iran bi çav nedigirt, reşmaleyên Mûsa İbrahîm Sakî, ku li kêleka postê sînorê Iran li girê Ayibey bûn, bombaran kirin û çend kesên wan kuştin. Jin û zaro li jêr guleyên top û tifingan vî alî, wî alî dibezîyan di nav pêlên mirinê de; jinan lava dikirin ku bi destên mêrên xwe bîn kuştin, ew û zariyên xwe bi destên neyar nekevin, dîl nebin.

Rêzên gemaro wisa teng bûbûn ku neyar ji her alî dikaribû agirê xwe li şûneke taybetî bicivîne; êdî mîna meydana Kerbela bûbû, bi vê cewaziyê* ku pelamarên ereb karê wan bi jin û zaro nebûn, belam pelamardernanên tirk zikê jinên avis ên kurd bi nîzê* didirfî, zariyan bi serê nîzê ji zik derdixistin, diavêtin. Şekir, jina

Dîwane, brazayê Bro Heskî û jinên din ku bi destên Tirkan diketin rastî vê sernivîştê bûn.

Endîşeyên namûsperestî û xîretperwerî dîlwarên Agriyî yên me mecbûr kir ku tesmîma berê ya xwe biguhêrin, jin û zariyên xwe bi destên neyar nehêlin. Desteyek ji xêlên Heyderî û Gelturî pelamar ji aliyê Başkendê bi hêzên Tirkan birin, wan dûr avêtin, berjêr kirin. Di vê pelamarê de hêzên bergirî gihîştibûn helqeya gemaro. Çaxê rojê, pez û dewar bi cî hiştin, li gel jin û zar li du şûnan helqeya gemaroyan têk şkenandibû, roja din çend saet ji rojê bihurîbû, derketibûn. Ihsan Nûrî li gel vê desteyê bû. Ev deste li ser rêya xwe çend esker dîl girtin. Desteya duwemîn nikaribûn derkevin, li nav kîşargeha newala Axorîk de mabûn. Şeva duduya ew jî derbas bûn. Bro Heskî li gel wê desteyê bû.

Resûlê Silo serokê nebez ê hoza Bikran li gel mirovên xwe û Seyîd Resûl li gel çend kes ji aliyê Qorxan çûne navçeya Ixdirê. Reşoyê Silo li gel mirovên xwe maweyek li nav Geliyê Zîlan ma, çend car hêzên Tirkan çûbûn ser wî, wan şkandibû. Di dawiyê de di şerek de hate kuştin. Seyid Resûl Berzencî li gel çend kes li serê çiyayek nêzikê Bayzîdê çend roj birçî ma, dawiyê bi destên Tirkan ket, şehîd kirin. Bi vê çeşnê Çiyayê Agrî, navenda azadî ya kurdî bi destên neyar ket û Tirkan êdî siyaseta kurd kuji li hemû layek dest pê kir.

Mihoyê Temir, ji serokên Adenî, zehf kal û nexweş bû, ji kar ketibû, nikaribû rê here. Paş şkana Ercîş bi her çeşnê, bi yarmetiya peyayên xwe, xwe bi Agrî gihandibû û Elîkoyê Hesenî, ku ji ber nêştirkarî ji serê xwe nexweş û bêhiş ketibû, û hin peyayên kal ên din ku vir de, wê de mabûn, bi destên Tirkan ketibûn, di çaxê dîlûniyê de laşê bêhal ên wan amanca têgihandin a tûj a nîzeyên eskerên tirk bûbûn. Heval, jina Elîko, jineke ciwan û salim bû, çun bi mêrê xwe wefadar û emekdar bû, di çaxê tengasiyê de wî li cî nehiştibûn, li gel pita -qîza piçûk- xwe li cem wî mabûn. Qîza dina wî ku pêşiyê jina Ferzende bû, zivirîbû, xwe bi nav û dayika xwe gihandibû. Her çar jî amanca nîzeyên Tirk bûbûn. Ruhên wan çaxê firî bi esman ji hev neqetiyên, wefadarî û emekdariya xêzanên kurd bi numayîş danîbûn.

Tenanet paş ketina Agrî, bîst û heft jin û zaro û xêzan ên Ehmedê Hecî Bro yê Heyderî û brayên wî ku ji şerkarên navdera Agrî bûn, li nêzikî sînorê Iran, li malbenda Serê Kanî bû, bi destên eskerên tirk ketin, temamî 27 kesên bêsûc û bêtavan û bê difa' ratirbaran kirîbûn. Laşên wan midetek cuda man.

Ehmedê Hecî Bro, ku brayê wî Safî Paşa li dawiya şerê Agrî de hatibû kuştin, li gel du brayên din ên xwe, Arslan û Abdullah, çaxê gihîştine kuştaren jin û zariyên bêsûc ên xwe dîtin ku di nav xwîne de digevizin ! Ewan dawaya qurbanîyê nebûn, ku xêzanên Hecî Bro li pênavazadiya neteweyî ya kurd de nebûn. Belkû ev fexr û şanaziyê ji bona Ehmed û du brayên wî, Abdullah û Arslan, hiştibûn. Ewanan jî paş çendîn ev cinayetên şermawer ên Tirkan, şerê Tirkan kirin û li cem şuhedayên azadiyê ciyên xwe girtin.

Qomandarê tirk, li ser û bendê şerên Agrî de bi Xalid Axa, serokê xêla Celaliyên Iranê ku ji aliyê qomandarê Mako xesarek zor dîtibû, welam şand, wî xapand, li gel xêla xwe bi Tirkîye gazî kir. Paş ketina Agrî, ji tirsê dewleta Iranê li gel xêla Xelkan xêla Celaliyên Iranê welatê xwe Iran bi cî hiştin, çûn nav Tirkîyê. Di vê babetê de Zuhdî Güven dinivîse : “Li pêşan, di meha avgostê de bihîstibûn ku ji hozên Iranê serokê xêla Xelkan Xalid Axa maweyek li gel hêzên Iranê li hev dixin. Di van şeran de ji sed zêdetir telefatê bi Iran daye û bi Çiyayên Ayibey hilkêşaye. Di van rojan de zabitê sînorê ye Sovyet bi zabitê sînorê ye me wisa xeber şandibû : “Çar sed malên xêla Xelkan ku van rojan bi navçeya Dîl -Aralaq- bi erdê Tirkîyê derbas bûne. Ev xêl heşt sed çekdarên wê hene. Rûniştewanên sovyetî ku li qerexê çemê Arasê rûdinên zehf ji xwe ditirsin. Heke hun vî karî nakin, bihêlin em vanan parre bizvirînin !”.

Dibe ku ji vê bûnê bûye ku hêzên sovyetî bi yarmetîya hêzên Tirkîyê hatibûn û bakurê-rohelat a Agriya Piçûk girtibûn. Nuwînerê Taşnaq, Vahan, çend roj berî têkçûna Agrî, çaxê ji navçeya Agrî derdiket, ji tariya şevê kelk girtibû, çûbû, li ser rêya xwe Rûsan dîtibû, bi zimanê rûsî welamê daye, tariya şevê derfet zanî, xwe derbas kiribû.

Li pêşiyê gotibûn ku firehiya helsana neteweyî ya kurd li pênavê azadiyê ji nava Agrî ta sînorên Iraqê û Sûriyê dikêşa. Ev rapêrîn her mexsûsê navçe û dor û berê Çiyayê Agrî nebû. Tenê hêzên Agrî vê navçeyê dagir kirî, îdareyek azad a kurdî çêkiribû û ala serbixoyî ya Kurdistanê daçikandibû. Di navçeyên Kurdistanê yên din de desteyên canbêzarên binecî yên kurd çêşnê çete dixebitîn.

Li ber ev e ku tenê mêjûyê kurt a Agrî ber bi çavên xwendevanan bighînim, basa canbihuriya kurd li pênavê bi destxistina mafên neteweyî yên xwe li navçeyên din ên Kurdistanê Tirkîyê de bi Tirkan xesar didan, hêzên tirk ku li gel wan li hev dixistin, nakim. Zehf ji wan paş şkesta Agrî jî xebata xwe dirêj didan. Li çiyayên Sason û Dêrsimê, bi çêşnê ku Doktor Kamuran Bedirxan jî li gotera bi navê Kurdistan li rojnameya “Le Jour” bi zimanê fransawî ku li Beyrût derdiket nivîsibû, ev xebat ta sala 1938 dirêjî da.

Rûxan* û têkçûna Agrî bi zimanê karbidest û qelema nivîserên tirk can dida. Mahmûd Esat, Wezîrê edliye yê Komara Tirkîyê di gotarek de ku li bajarê Ödemiş daye û rojname “Milliyet” li berwara 19 septembir* 1930 de belavkiriye, gotibû «Dost û neyar divê bizanin ku efendiyê vî welatî Tirk e ; Wan ên ku xwîna pak û zelala tirk di reh û damarê wan de nebe li nav niştimanê Tirkîyê tenê mafek wan heye, ew jî xulamî û dîlbûn e !».

Neteweyê aza yê kurd bi vê siyaseta Komara Tirkîyê hisiyabû. Nikaribû xulamî û dilî bigire stûyê xwe. Ji bona parastina şerefa neteweyî ya xwe û bidestana azadiyê bi hezaran qurban da, îro jî li ber mehkemeya edaletê azadîxwazan ev belgeya ku bi xwîna şuhedayên azadî yên xwe hatiye nivîsandin bi destên parezderan ên mafên xwe daye.

Mahmûd Esat bi sifetê wezîrekî Komara Tirkîyê dîtina rêgezê tirk ragiyandibû Rojnameya "Milliyet" vê serketina dewleta Tirkîyê, ew jî bi şêst û şeş hezar esker û cendirme, sed froke û top û reşaş û bi saya yarmetî û yarîdeyiya dewleta Şahenşahê Iranê, paş çend sal xwîn rijandin dikaribû bi çeng bîne, dawiya helsorana Kurdan ji bona girtina mafên neteweyî bi wêneyek* nîşan dida : qebrek* li ser Çiyayê Agriya Mezin, piyê wê li ser Agriya Piçûk dikêşa, li ser kêlikê qebrê nivîsandibûn : "Kurdîstana xeyalî li vir çal kirine". Hêç nizanîbû ku bîra azadî ya neteweyî mîna sûlave ya ku ruhê bêzar û zecir dikêşe, benda ku ji bona girtina pêşiya wê çê dikin her çiqas qaîm û mehkem be, di axirê de bi feşarê zêde ku ji serhehatina vê avê çê dibe bendê hildişîne, gelek xerabiyên ku nayên durist kirin çê dike. Çêtir ev e bi vekirina cih û cobar ji ava vê sûlavanê ji bona avdayina zevî, zêdekirina mahsûl kelk bigirin. Nivîser li vir li ser nivîsara kêlikê qebrê bîr û rayê xwe nabêje, dahatû* wê nîşan bide aya Kurdîstana Xeyalî an hakimiyeta Tirkîyê li ser Kurdîstanê li nav vê qebrê de çal bibe û daîm bixewe. Tiştê ku diyar bûye ev e ku, pey ev tîmsala ku rojnameya Milliyet kiriye, merivê li singê Agrî de "çalkirî" li nav çiyayên Kurdîstana Tirkîyê çend car teqînî bi xwe daye, nîşan daye ku nemiriye û namire.

Niha ku xwendewarê berêz* ta radeyek basa çunyeta fedakarî û canbihurî ya Kurdan li pênavazadiya neteweyî de ronak bû, îcaze dixwazim li berzibûna şehîdan ên azadiya kurdî ku xwîna ji bona rizgarkirina neteweyê xwe rijandine, di qurbanîya giyanê xwe de kêmasî nekirine û jiyana û şanaziya ebedî bi dest anîne, li pêşiya ruhên wan mezinan banîhayet ihtiram û tazîm serê xwe xwar dikim, ji ên mayî yên wan re silav û terbiyet pêşkêş dikim.

PAŞGOTAR

Xeberçînê rojnameya *The Times* ku di babeta Çiyayê Agrî de deng û bas bi rojnameya xwe dabû, diyar e ev deng û basan ji Erkanê Şer ê giştî yê Tirkîyê girtibû. Min li hêç cî de hejmara şerkarên kurd ên Agrî nenivîsiye. Çun ev karesata şkeste xwar û dewleta wê çaxê ya Tirkîyê û rojnamenivîsên wan zor şananazî dabûn, bi vê xisûsê piçek mijûl bim. Ev mîrxasên ku pênc sal û nîv li nav Tirkîyê cîyek diyar girtine, îdareyek kurdî çêkirine, ala serbixoyî ya Kurdîstanê li ber çavên hikûmat û hêzên çekdar ên Tirkîyê li ser qûçên Agrî dacikandine, her çar pelamarên hêzên çekdar ên Tirkîyê şandine, çaxê min hejmara wan difikirî, bi neteweyê kurd aferîn gotim, çun ez bi xwe jî Kurd im, zehf girûr û şanazî pê dikim.

Tenanet hejmara van qaremanan hinek zêdetir ji wan nivîsîne ; tenê evî bêjim ku li şerê Kanî Kork de hêzên çekdarên Agrî hemî ewanan bû ku ketibûn şer, ewan ên ku paşê hatin, li gel hêzên siwar ên tirk ên ji bona parastina frokeyan çûbûn, li gel wan ketin şer, ewanan bûn çûbûn Zinya Agrî, dîtibûn li ev alî xeber nîne, zivirîbûn li gel siwarên neyar ketibûn şer. Kesê ku li frokê dabû, anînbû xwarê Ibrahîmê brazîyê Bro û kurê Eyûb Axa bû. Li pelamara dawî ya Tirkan bi ser Agrî ku bi

gotinên xeberçînê rojnameya The Times Erkanî Şer ê Tirkîyê şêst hezar esker û cendirman û sed froke bi navçeyên Bayzîd û Wanê şandibûn. Ji wan hêzan qe nebe nivê wan, yanî sî û sê hezarên wan û pêncî froke bi şerê Agrî beşdar bûne, bi pêçevaneyê xeberrivîsê rojnameya *The Times* ku gotiye, «bi hezaran Kurd ên çekdar li Çiyayê Agrî, çiyayên mustehkem de cî girtine», heke li vî şerî de tenê pênc sed çekdarên kurd li Agrî hebûna û bi vî şerî beşdar bibûna, çawa Salih Omurtag Paşa mecbûr kiribûn ku ji hêzên navçeya Wanê yarmetî bixwaze û bîne, dibe ku aqama -netîca- şer jî diguherandin.

Mebesta min eva nîn e ku bi kifayetê eskerên Tirkan nişan bidin. Ez bi xwe çendîn sal li nav ordûya osmanî û tirk de kar kirî, li kêleka eskerên tirk di şerên Arnawutliq û Yemen, Rûs, Gurcî û Ermenistan hevbeş bûme û şahîdê mêrxasî û şerkariya wan, bi taybetî ê şehameta hevmeslekên xwe zabitên tirk bûme. Belam tercrûbeyên şerên Agrî bi hemûyan diyar kiriye ku ew li pêşiya Kurdan nikarin dewam bînin. Kurd di şer de agirpare ne, qet jimara xwe nafikirin ; neteweyê kurd heke bi dil şer bike, ji hevra xiyamet neke, ji bona neyarên neteweyê xwe yarmetî nede, hêç neyar tucar nikare piştta wî bişkêne, pê re serî derkeve.

NEMA

HEVPEYVÎNEK BI OSMAN SEBRÎ RE

ZÎN Û AMED

Zîn : Apê Osman, bona ku hevalê Amed wê biçe Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ji aliyekî de, û ji ber ku tu endamekî damezrandin a Enstîtuyê ye, di aliyê din de, û li ser arîkirina bi daxwaz a serokê Enstîtu, birader Kendal Nezan, ji aliyê sisyan de, me dil kir em hevpeyvîneke bi te re bikin.

Apo : Hûn dikarin bipirsin. Piştî ez bizanbim ezê ji we re bêjim.

Zîn : Hinekê ji kurtiya jîna xwe, nemaze jîna te ya rojan e?

Apo : Mesela jîna min çîrokeke dirêj e. Gotina wê gelekî wext jê re dixwaze. Ne karê rojekê ye, mehekê ye, salekê ye, lê şêst sal e. Ev şêst salê hane mero nikare serhevdu bîne. Tenê ez dikarim tiştêkî bêjim : ez merivekî gundî me, lawê axayekî me. Bavê min burciwaziyeye mezin bû. Paşê, me e'malên (karên) axan û xirabiyên wan ji millet re da fam kirin. Ji wê roja ku ez şiyar bûme heya niha ez şerê beg û axan, û şêx û melan dikim. Ji ber ku me dît evana xirabiya milletê xwe dikin e, milletê xwe bi şûn de hiştin e, û berê millet dane rêya xirab. Jîna me bi vî hesabî çûye. Me gelekî tiştên nebaş dîtî e, Ev tiştên nebaş dîtî, gotina wan tiştêkî ne rast e. Îro, milletê me bavê me ye. Xelk dikare li ser wî bibê : xirab e, lê, merov nikare xirabiya bavê xwe bêje. Gava merov bêje, ew neheqyan li xwe dike. Îcar ji bo van tiştên ku li ser buhirên, di warê siyasî de, ez nikarim tiştêkî bibêjim. Wekî dinê jî, çiqas îmkanên min hebe ez ji bo ziman hez dikim bixebitim. Gelek kes henin ku ez alîkariya wan dikim, nivîsarên xwe ji min re tînin û ez ji wan re rast dikim. Hinik din tîn, dixwazin ziman hîn bibin, ez ziman hînî wan dikim. Tiştê ji destê min tê ez dikim ! Û ez bi vê jî dilxweş im. De kerem ke.

Zîn : Bûyina te, Apo, kîjan sal û li ku derê bû ?

Apo : Ez sala 1905an, li nav eşîra Mirdêsa, ji gundê Naricê, hatime dinê.

Zîn : Kengî tu hatî Sûriyê ?

Apo : Sala 1929an, taliya salê, di meha 11an de, ez hatime Sûriyê.

Zîn : Kengî û çawa te dest bi xebata xwe ya siyasî kir ?

Apo : Berî ku ez werim Sûriyê, me dest bi xebata siyasî kir. Ne me dest pê kir. Tirkan hiştin em dest pê bikin. Me bi xwe xebata siyasî nas nedikir. Îcar, Tirkan rabûn bi gewriya me girtin, û em xistin hebsa. Tê de çavê me vebûn, me camêr dîtin, û me berê xwe da xebata siyasî.

Amed : Apo, sala ku te dikirî sertefîka bibira, mamosteyekî te hebû, bîr û baweriyên wî ya ... ?

Apo : Na. Piştî ku min sertefîka xelas kiribû, mamosteyek şandibûn gundê me. Navê wî Îsmâîl Efendî bû. Ew jî kurd bû. Mamosteyê E'dadî (mekteba navîn) bû, ji ber ku ramanên sosyalîst pêre hatibû dîtin rabûn kirin mamosteyê ibtîdayî (mekteba pêşîn), û şandin gundê me. Îcar wî jî ez dîtîm di nava gund de, û ramanên xwe xiste serê min. Ji wê rojê de, ez û axatî, melatî, û şêxîtî ji hev dûr ketin.

Amed : Çep bûna te çawa hatiye nas kirin ?

Apo : Ji berê de ez çep im. Ji xwe li ser vê yekê min helbesteke dûr û dirêj nivîsiye. Çepbûna min, min holê naskiriya : Li Parlemana Fransîzî hatiye gotin : Ên ku di aliyê melekê xwe dane hêla rast e, û ku di aliyê milletê xwe dane hêla çep e. Çepbûn, me ji wê biriye. Me jî xwe daye aliyê millet. Ji bo vê yekê em dibêjin em çep in.

Zîn : Çend kur û keçên te hene ?

Apo : Sê law û sê keçên min hene.

Amed : Navên wan, Apo ?

Apo : Kuran : Hoşeng, Hoşîn û Kemal. Keçan jî : Kewê, Hingûr û Hêvîn.

Amed : Hingûr, Apo ?

Apo : Hingûr, bi kurdî "Şefeq". Hing + ûr. **Hing** : mêşhunguv e. **ûr** : wexta ku mêşhunguv radibe. Mêşhunguv di şefeqê de radibe xebatê. Piştî ku bûne Misilman, hinga girtine "şefeq" ji ereba birine.

Zîn : Berbang ?

Apo : Ha, ew jî piştî ku bûne Misilman ; ango, berî bangê ; berî azanê.

Amed : Tu roja xwe, ango, jîna te ya rojane, çawa derbas dikî?

Apo : Bi rûniştinê ez derbas dikim. Serê min nema alîkariya min dike.

Amed : Çûn û hatinên hevala li ser te çawa ye ?

Apo : Hinek însan hene ku ji min hez dikin. Ne ji bo menfe'etê hevalên min bûne, ji bo qewmîyetê hevalên min bûne. Ewana hên derin û tîn, û xwe jî bi min re diwestînin. Hinek jî tîn li ser min casûsiyê dikin. Hinek tîn dixwazin ziman hîn bibin. Hinek tîn dixwazin min nas bikin. Her yek bi awakî tê.

Amed : Sebra te, Apo, wilo tê ?

Apo : Ne xema min e. Hatîn ser çavan, nehatin bi tenê bîna min teng nabe. Di hebsê de, min lingên xwe di ser text dirêj dikirin û rûdiniştîm.

Zîn : Apo, koçbar kirina dêya Hoşeng çî salayî di jîna te de peyda kir ?

Apo : Îsanekê 46 salan bi min re maye. Helbet, gelekî bi min re westiyaye. Hema ew bi min re bûye û ez nêzîka deh caran bêtir ketime hebsê û tim wê zarok xwedî kirine û hevalên min arîkariya wê dikirin.

Amed : Sebra wê dihat, Apo ?

Apo : Ew xurt bû. Gava dihate hebsê cem min, dilê hebsiyar gişan bi min diman. Jinên wan gişan rûyên xwe tîrş dikirin û her gav rûyê wê bi ken bû. Min bawer dikir ku mala me tijî xwarin e. Dilê wê xurt bû. Qîza mêrekî çê bû. Di nava Çerkezên de hemberê wî tine bûn. Giraniya mirina wê hebû, ne tune bû. Min bawer dikir ku ezê berê wê bimrim çima ew ji min 10-11 salan biçûktir bû.

Amed : Alîkariya heval, dost û hogira di rahiştina termê wê de, Apo ?

Apo : Gelek baş bû. Herdu seriyar - ew çerkez bû û ez kurd bûm - kêmanî nekirine.

Zîn : Heya bi ku te beşdarî di kovarên kurdî de kiriye ?

Apo : Serekê, ez bi Celadet Bedirxan re, di Hawar û Ronahî yê de, xebitîme.

Amed : Te alîkarî ji bo danîna Elfebêya kurdî kiriye ?

Apo : Na, Celadet Elfebe danî ye. Gava wî dannî min jî î'tîrad dkiriye. Min gotiye : çar tîpên wê kêmin "p.ç.k.t" lê gişan gotin ev bes e.

Amed : Apo, her du dengdar "a" û "e" carna di ristê de dibin "ê". Çawa ye ku merov (a = è) û (ê = é) dayne da ku guhartina herduyan digel dengdara "ê", ji ser hev werin naskirin ?

Apo : Ezbenî, ew guhartin heye. "welat" dibe "welêt". Jê re tewandek tê gotin.

Amed : Apo, gava yekî biyanî an kurdekî ku tewandek di zaravê wî de tine be, rastî şoreke nenas were an vê ristê bixwîne : "rêz", wê çawa bizane ku "pez" di ferhangê de heye, ne, ne "rêz" dema ku bixwaze wataya wê şora nenas ji ferhengê derîne û bizane ?

Apo : Gava rêzimana kurdî bixwîne wê bizane.

Zîn : Îro, tu rewşa jina kurd çawa dibînî ?

Apo : Keça min, berî gişî, divê mêrkê kurd keça xwe nefroşe. Paşê bide xwendin û rêya xebatê li ber wê veke. Divê jin û mêr li ser esasî hezkinê hevudin bikin, ne li ser esasê qelng. Divê em heqê jin nas bikin, ew jî heqê nasbike. Lê bila keça kurd bizanibe wacibê wê yê mezin dê ye. Dêbûn li ser hertiştî re ye. Gava ew bikaribe lawekî hêja an qîzekê hêja ji bo miletê xwe bighîne, di çavên min de ew tiştê mezin e. Dêbûn her tişt e di jîna merov de. Gava dê wacibê xwe nikaribe bike, civak wunda dibe. Civaka Kurd ji dest dê wunda bûye. Dê hatiye kirin û firotin.

Zîn : Di warê parastina zimanê kurdî de, Apo, gotina te çiyê ?

Apo : Ne hewceyê gotinê ye. Yek ji zanayên civakî dibêje : "Gava tu dixwazî gelparêziya însanekî fahm bikî ta kîjan derecê pêşve çûye, binêre çiqas der bi zimanê xwe re bendewar e." Mirovê ko bi zimanê xwe re bendewar nebe, nikare îdf'a bike ku ew ji welatê xwe hez dike. Neteweyetî ziman e û hinek adet in, ne tiştê e dinê ye. Xwîna me gişka yek e. Merov ku ehemiyet nede zimanê xwe, di jîna neteweyî de tune ye. Mixabin, ta îro, xortên me ehemiyeta ziman fam nekirine, tevî ku xwe xwenda dizanin û xwe pêşverû dizanin, hîn nizanin bi zimanê xwe bixwînin.

Amed : Mirov kovarnî kurdî dixwîne, rastî pir peyvên xwe dest û çêkirî tê ?

Apo : Binêre, ezbenî. Ev şaş e, ziman nizanin û dixwazin destê xwe têxinê. Min li ser vê yekê gotarek ji Berbangê re nivîsî bû. Min gotiye : Her bêjeyek kevirekî avahiya ziman e. Hinek keviran dibirin, hinek şê dikin û hinek jî dîwar lê dikin. Evane yek karê ê dinê nizane. Herkes karê xwe dizane. Gava yek karên yê dinê jiyane nizane. Herkes karê xwe dizan e. Gava kevirekî neçêkirî binî, têxî nav kevirên şekirî û çêkirî, dîwar wê xwar

bibe. Ha, peyayên ku bi zimanan nizanibin û li ser ziman nexebitîbin, gava tînin pîrsa li cem xwe çêdikin welê zimanê xwe xirab dikin. Pir yê wilo henin. Ên ku du roj dest bi ziman kirine xwe feylesûf dihesibînin. Karê nezana holê ye. Ziman wek asoyê behrê ye, nêzîk xuyanî dike, lê tu çiqas diherî tim ew e. Heya merî pir bi nava ziman de neçe, merî ehemiyet ziman û mezinatiya ziman nizane. Ê min bû 35 sal pê dikxebitim, ji zaravê kurmancî pirtirî 3000 bêje - eger hin ne pir be - ez nizanim çima ziman nehatiye civandin û nehatiye xwendin.

Zîn : Apo, di vê kalbûnê de, çi ji te ve, warê kurd û Kurdistanê diyar e ?

Apo : Bi Xwedê, tevî ku ez xwe diyarê gorê dibînim, ez wilo bawer im ku ezê Kurdistanê bibînim û paşê bimrim. Ez di vê baweriyê de me.

Zîn : Apo, ev ne... ?

Apo : Keça min, em kurd negîhanin warên bikaribin welat xelas bikin, lê neyarê me pir ehmeq in. Wê bi kêrî me bên. Bi Xwedê, sê ehmeqên mîna Kenan Evren, Xomeynî û Saddam kêr têne dîtin. Ewê me hişiyar bikin. Milet bi du tiştan hişyar dibin : Yan bidarê zulmê yan bi xwendinê. Kurd dê xwe xelas bikin, lê heyf wê pir hevudu bikujin.

Amed : Belavbûna hêzên millet û pira partiyên, gotine te di vî warê de çiye, Apo?

Apo : Ezbenî, ew, şûndebûna millet e. Milet di şûn de ye.

Zîn : Gotina te Apo, ji braderên Enstîtuyê re çiye ?

Apo : Berî her tiştî, Xwedê bi qeweta wan re be. Divê bizanibin ku ew xizmekteke mezin ji bo welatê xwe dikine. Heger ew bi ziman mijûl dibine, meselekî girîng xistine destê xwe. Divê pir xurt pê bigrin û gelekî xwe pê re biwestînin. Em Kurd divê em hêdî bikin. Em miletekî bê ziman bûne. Em ji zimanê xwe re nexebitîn. Em çûne ji zimanê xelkê re xebitîne. Ev şerefekî mezin e ji bo wan ku ji bo zimanê xwe bixebitin. Lê ez gelekî hêvîdar im ku her yek ji wan divê berî gişî qelsiya xwe bizanibe heya bikaribe pêşve here. Em Kurd çiqas pêşkevin, emê bi şunda bimînin. Çima ? Mecala ku em tê bixebitin hên dirêj e. Zimanê me li erdê maye. Di nava 800 eşir de belav bûye. Ev ên kurmancî û ên dinê di nava 600 eşir de maye. Ên me yên ku bi ziman nizanin bawer dikin ku mesele ziman tiştekî gelekî rehet e. Zimanê erebî piştî 120 salan xebitîbûn û tevî Quran, Ehadîs û helbestên Cahîlî bi vî zimanê hatibûn, gava dane ber zimanê farisî di dema Harûn el-Reşîd de, zimanê erebî ket çima zimanê farisî wê çaxê 1400 sal bû. Binêre, 120 sal û hên negihabûn mecalekî hêja. Ango, bila bizanin wacibê wan gelekî mezin e

di nava mîlet de. Xebata wan ji a Pêşmerge pêştir e, ji a her tiştî pêştire. Xebata wan li ser zimanê mîletê kurd. Ez bi xwe ji wan re xêrê û kamîranîyê dixwazim.

100 SALIYA BUYÎNA Î. A. ORBELÎ (1887 - 1987)

ROHAT

Îsal pê ra li ser bûyîna Î. A. Orbelî re 100 sal derbas dibin. Ew di sedsaliya bîstan de li Sovyetê wek rojhelatzanekî herî bi nav û deng tê zanîn. Ji bo pêşvabirina çanda gelên pişt Kavkazyê, gelên ermenî, guncî û kurd wî karekî bêhempa û bêpîvan pêk aniyê. Wek kurdzan (kurdolog) Î. A. Orbelî li Sovyetê bingeh û hîmên kurdzaniyê avîtiye. Di vî warî de heta roja dawiyê, Orbelî bûye organizator û rêberê mezîn.

Orbelî di sala 1887'an de hatiye rûbarê dinê. Ew paşê di Unîversîta Petersburgê de dixwîne û di sala 1911'an de xwendine xwe diqedîne. Wî du fakulte li ser hev xwendine, fakulta Dîrok-Fîlolojiyê û fakulta Zimanên rojhelatê (ermenî, guncî, farisî).

Rojhelatzane yê mezîn, piştî xelaskirina xwendinê, ji bo zanina xwe li ser çanda van gelan pêş de bibe, ew di navbera salên 1911 - 1912'an de diçe hêla bajarê Wanê li navça Muksîyê da lêgerîn û lêkolînan çê dike. Ew di warê ziman, zarav, etnografiya û jiyîna civakî ya gelên ermenî û kurd de gelek materiyelan berhev dike, ew paşê tîne çapkirin. Ji van materiyelan beşek, di sala 1982'an de wek pirtûkek e cûda tê çapkirin (1).

Orbelî di sala 1934'an de dibe doktorê arkeolojiyê. Wî di sala 1914'an de mamosteyî li fakulta rojhelatê de kiriye û sala 1955'an de jî dibe dekanê vê fakultê. Ew wisan jî di sala 1943'an de wek serokê pêşîn yê Akademîya Zanistîyan li Ermenîstanê kar kiriye. Di navbera salên 1934-1951'an de li

1. Folklor î Bit Moksa (Folklor û Jiyîn L. Muksiyê) Î.A. Orbelî, Moskova, 1982, 140 rûpel

Muzeya Ermitajê da (Muzeke her bi nav û denge li hemû Cîhanê) dibe serok.

Orbelî di gelek zanîngeh, unîversite û sazgehên lêgeri (vekolinan) de xebitiye, gelek kadro amadekirin.

Akademîk Orbelî ji berê de guhdarîke mezin daye li ser pêşketina karên kurdzaniyê. Li Lenîngradê di sala 1959'an de cara pêşîn beşekî kurdzaniyê tê vekirin, Î. A. Orbelî dibe serokê ev beş. Çawa tê zanîn, ev beş di warê pêşçûyîna kur mezin, di warê lêkolîn û lêgerînên li ser Kurd û Kurdistanê. Orbelî du salan li dzaniyê de, heta niha, roleke gelek girîng lîstiyê. Ev beş, bûye navçeke here ser vî karî dimîne, ew di sala 1961'an de diçe dilovaniya xwe. Piştî mirina Orbelî şagirtê wî Qanatê Kurdo cihê mamostê xwe digre, û heta sala 1985'an li ser vî karî dimîne.

Î. A. Orbelî bi taybetî li ser çandên gelên ermenî, gurgî û kurdî kar kir, nêzkaya 200 xebatên wî yên zanistî hatine weşandin. Orbelî giraniya xwe dabû ser safîkirina pirsên van gelên rojhelatê, di dewra navîn de.

Zanayê mezin ji aliyê din de, li gelek welatan mabû, wek Emerîka Yekbûyî, Ingîltere, Elmanya Federal û Iranê, endamê gelek zanîngeh û sazgehên arkeolociyê bû. Di sala 1944'an de ew tê hîlbijartin wek profesoreke bi hurmet li Unîversîta Tehranê.

Piştî Şoreşa Oktobê, cara pêşîn Orbelî baweriyên xwe diyar dike, ku alfabeke bi tîpên latînî ji bo Kurdan bê amadekirin. An gorî Orbelî alfaba ermenî û rûsî têrî zimanê kurdî nake û ew li hev nayên (2).

Orbelî, di nivîsareke xwe de, dema ku li ser edebiyata rojhelatê disekine, ew navê sê helbestvanên rojhelatê gêri herî mezin dide; ji Iranê Fîrdewsî, ji Gurcistanê Rustavelî û ji Kurdistanê Ahmedê Xanê (3). Ev bawerîya mezin paşê tesîreke girîng li ser karên lêkolîna edebiyata kurdî de dilîze.

Di dîroka ferheng nivîsandina kurdî de, cara pêşîn, di sala 1957'an de ferhengeke kurdî-rûsî ji aliyê Prof. Çerkez Bakaev ve tê nivîsandin. Heta wê demê ferhengeke kurdî-rûsî nehatibû çapkirin. Ev ferhenga hêja di bin redaktoriya Orbelî de tê amadekirin, Orbelî bi xwe jî, pêşgotinek ji ferhengê re dinivîse (4).

2. Kurdskiy Alfabit (Alfabaya Kurdî), zara Vostoka, 1927, Hejmar 1444, Tîblîs.
3. Pametniki Epoxi Rustaveli (Abîdeyên Dewra Rustavelî), Lenîngrad, 1938 rûpel 3, 6.
4. Kurdsko-Ruskiy Slovar (Ferhenga Kurdî-Rûsî) amadekar, Çerkezê Beko, Moskova, 1957.

Arkeolog, rojhelatzan, filolog, kurdolog û zanayê navdar Î. A. Orbelî, di warê amadekirina kurdologan de û di nav rojhelatzanîyê de ji bo nîşankirina cihê kurdzanîyê, bi aktîfî kar kiriye. Di sala 1959'an de vekirina beşa kurdzanîyê dibe armanceke cedandiye ku kurdzanî di nav rojhelatzanîyê de cihê xwe yê bi rûmed bigre.

Wezîrê Eşo çawa di nivîsareke xwe de nîşan dide wekî li ser Î.A. Orbelî gelek dokumentên nû ji arşîvên cuda-cuda hatine dîtin. Ev dokumentên ku di navbera salên 1904-1960'an de hatine nivîsandin, ji wana 118 heb, ev cara pêşî ye ku tene zanîn, û derketine ronahiyê. Wezîrê Eşo dîsa çawa diyar dike ku hin dokument hene nîşan didin wekî Orbelî di sala 1915'an de Unîversîta Lenîngradê dersên zimanê kurdî-fransîzî xebitiye (5).

Pişti mirina Î.A. Orbelî, gelek pirtûk, bend û lêkolînên zanistî li ser karên wî, şaxsiyeta wî hatine weşandin, wek xebatên K.N. Yuzbaşyan (6), Qanatê Kurdo (7), Î.V. Megrelîdze (8).

5. Dokumentêd Arxivêye Teze Derheqa Akademik I. A. Orbelî de, Wezîrê Eşo, Rîya Teze, Erîvan, 4.8.1980.

6. Akademîk Isuf Abgroviç Orbelî, K. N. Yuzbaşyan, Moskova 1964, 159 rûpel (Ev pirtûka li ser Orbelî, wisan jî di sala 1971'an da li Erîvanê wek 199 rûpelan jî nûh va bi zimanê Ermenî hatiye çapkirin.

7. Akademîk I. A. Orbelî i Kurdovedenie (Akademîk I. A. Orbelî û Kurdzanî), Qanatê Kurdo, Kovara Dîrokî û Filolojîyê, Erîvan, 1973, rûpel 61-70 (Ev benda di sala 1975'an da ji aliyê Dr. Abdul Rahman Hacı Maruf da hatiye wergerandin û di Kovara Korî Zanyarî Kurd, hejmara 3'an da çap bûye rûpel 113-142).

8. Isuf Orbelî, I. V. Megrelidze, Tîblîs, 1983, 156 rûpel.

AKADEMİK HOVSÊP ORBELÎ

Tosinê REŞÎD

Di warê lêgerîna ziman, dîrok, lîteratur û çanda gelê kurd zanayên ermeniyên karekî berbiçav kirine. Wan di sedsalên navîn de destpêkirine, mijûlî pirsên kurdzaniyê bûne û di dîroka kurdzaniyê de erhede cihên xwe yê hêja girtine ; nivîskar û ronakbîrên ermeniyên yê bi nav û deng, Xasatûr Abovyan, kompozitor, û zanayê sazbandiyê Komîtas û rojhelatnasê naskirî Hovsêp Orbelî û hinên din.

Rojhelatnasê bi nav û deng serokê Akademiya Komara Ermenîstanê Zanyariyê pêsîn H. Orbelî dostekî gelê kurd yê şîrhelal, pêşewitîkî çanda kurdan yê êgîn bû. H. Orbelî êdî di salên xortaniya xwe de mijûlî pirsên kurdzaniyê dibe. Sala 1911an jî bo lêgerîna zaravayê ermenî navça Moksê Akademiya Urisêtêye zanyarê H. Orbelî yê xort dişîne wîlayeta Wanê. Ew wîze pênc hefteyan nimûna ziman û zargotina Ermeniyên dinivîse, malûmatên netewenasîyê (etnografîyê) berhev dîke. Lê zûtirkê ew di nava zaravayê ermenî yê Moksê da rastî ewqas gotinên kurdî tê û yekşîvêtya wisa nava peyivandina Kurdan û Ermeniyên de dibîne, wekî tê ser wê baweriyê, ku lêgerîna zarav, zargotin û deba gelê navçê gerek bi hev re bête kirin. Paşê jî mîna seydayê xwe yê mezin Nikolay Mar, Orbelî jî têdigihîje ku lêgerîna Kurdan dê gelek pirsên dîrok, ziman û çanda gelên Rojhelata Nêzîk û pişkavkazê rohnî bike. Lema jî nîsana sala 1912an ew dîsan vedigere Moksê û vê carê dibe mêvanê Murtule begê, qaymeqamê navça Moksê. Orbelî di derheqa Murtule begê de dinivîse, ku ew mirovekî zane û tîgihîştî, gelek pirsan de xwedanê bîr û baweriyên pêşverû û piştovanê dostaniya Kurdan û Ermeniyên bû. Orbelî di nivîstokên xwe yê wan salan de dinivîse ku dem û dezgê mala Murtule begê ewrûpî bûn, li mala wî di nava mêvanan de tenê gava ku memûrên Tirkan hebî wana bi tirkî dihate peyivandin.

Cihê bê gotin, wekî dema qira Ermeniyana sala 1915an kurdê Moksê bi seroketiya Murtule begê nehîştin ermeniyên cînarê wan bêne xezakirin.

H. Orbêlî di dema mêvandariya xwe ya li Moksê mijûlî pirsên rêzimana kurdî dibe, ferhenga kurdî-rûsî çêdike û pir nimûnên zargotina kurdî dinivîse ; di nav wan de wilo jî perçakî ji destanê *"Mem û Zîn"*.

Zanayê marîfet yê dilpaqij, tragedya gelê kurd ya ji aliyê dîrokê de jîbîrkirî zû texmîn kir. Wî dît, wekî ku pêşberî wî gelekî xweyê çanda dewlemend e. Lê tragêdya wî gelî, çawa Orbêlî paşê bi xwe dinivîse ew bû, ku lawên wî yên here bas bi navê Tirkan, Eceman, Ereb û Ermeniyana dîroka Rojhelatê xemilandine.

Kurdzan M. Rûdênko di gotareke xwe de dinivîse ku Orbêlî ji wan re digot, pirseke kurdzaniyê ya girîng jî ew e, wekî wan mirovên bi nav û deng, zanyar, nivîskar, hunermend û şuxulvanên çandeya ku di dîrokê de bi navê gelên mayin bi pêş de hatine, dîsan vegeirîne ser navê gelê kurd.

Ji bo pêşdebirina lêgerîna ziman û zargotina Kurdan H. Orbêlî sala 1927an diçe nava Kurdên Ermenîstanê, navça Axbaranê û gelek nimûnên zargotinê berhev dike. Nava wan nimûnan de wisan jî şaxên destanên *"Mem û Zîn"* û *"Leyl û Mecnûn"* hebûn.

Sala 1914an, gava bi berpêyvkirina Mar, Orbêlî dibe Seydayê zanîngeha Petersbûrgê yê zimanê kurdî, ew krêstomatya (berhevoka têksta) kurdî amade dike.

Di destpêka sedsala bîstan li Kurdistanê çend komeleyên ku dixwestin xwendin û zanebûnê di nava gelê kurd de belav bikin û bi wî tehrî Kurdan ji tarîtiyê û ji rewşa zelûliyê derxin, têne avakirin. Komeleke wisan ya bi navê "Gîhandin" sala 1913an nonerê xwe Ebdûl Rezaq ji bo pirsê sazkirina alfabeya kurdî ya nû disîne Petersbûrgê (Lenîngradê). Ebdûl Rezaqê ji malbata Bedirxanan bi nav û deng bû. Bi gotina Orbêlî ew merivekî xwende û têgihîştî bû. Wî gelek bas bi zimanê tirkî, fransîzî û farişî dizanîbû. Wî qeyd û çîdar bi xwe re anîbûn Petersbûrgê, bi kîjana ew li hebsên Tirkiyê de xwedî dikirin. Wî ji bo wan qeydan digot, ku gelê kurd gişk bi qeyd û çîdarê wisan zîndankiriye.

Bi biryara wezîreta Urisêtê yê karê der, Akademiya zanyariyê pirsê sazkirina alfabeya kurdî dispêre Orbêlî. Orbêlî alfabekekê li ser binaxa tîpên ermenî û rûsî saz dike, lê dawiyê bi xwe jî tê ser wê baweriyê ku ji bo zimanê kurdî alfabe ya baştir dê ser binaxa tîpên latînî be. Hema bi berpeyvka Orbêlî jî Erebe Şemo û Isahak Maragûlov sala 1929an alfabe ya kurdî ya bi tîpên latînî saz dikin.

Zanyarê dilpaqij yê mezin Orbêlî, di nava nivîsarên xwe de gelek caran di derheqa wê rola mezin, ya ku gelê kurd di dîroka gelên Asya Nêzîk de leyistiye, nivîsandiye.

Li Yekîtiya Sovyet Hovsêp Orbelî zanayê pêşîn bû, ku nîrxê "Mem û Zîn" a Ahmedê Xanî yê nemir nîsan da. Wî di nivîsarên xwe de navê Ahmedê Xanî bi rastî datanî kêleka navên hozanên mezintirîn yên Rojhelatê, Fîrdewî û Rûstavêlî.

Hovsêp Orbelî di dereca amadekirina kadroyên kurdzaniyê de karekî mezin kiriye. Hê sala 1928an, gava komîteya Navbendî ya Partiya Komunîst ya Ermenîstanê, komeke xortên Kurdan ji bo xwendinê dişîne Lênîngradê û ew bi xwe jî dibe seydayê wan yê zimanê kurdî yê pêşîn. Salên cenga cîhanê ya duwemîn de, gava ew prezident bû, li ocaxên Ermenîstanê yên zanyariyê mecal têne sazkin.

Sala 1955an H. Orbelî dibe serokê para Lenîngradê yê Akademiya Yekîtiya Sovyet ya zanyariyê. Di sala 1959an de (1'ê Adarê) li Akademiya beşê kurdzaniyê tê sazkin. H. Orbelî dibe serokê vî beşê û paşê jî serokatiya komê dispêre Qanatê Kurdo.

Hovsêp Orbelî di sala 1961an de mir. Rojhelatzanê mezin tu caran zanebûn û êqînya xwe nehêvşand bona pêsvebirin û amadekirina kadrên kurdzaniyê yên jêhatî.

BARKÊŞÊN BIÇÛK

Firat CEWERÎ

(II)

Di rê de Îbrahîm wa bi hêrs got :

- Ez di şansê xwe nim. Şansê min her tim wisa xerab e. Roja ku ez çend quruşan kar bikim, ewê her tim bobelatên wilo bi serê min de bèn. Ewê her tim tiştin bibe. Ma nayê bîra te Ferzend ? Nayê bîra te ku carek din jî eynî wilo bi serê min de hat ? Dîsa çi bûbû ? Hîi... Hingî waliyê Mêrdînê hati bû vir. Bi derewan gotin, ku yanî min ji walî re xeber daye. Rabûn ez girtim û dîsa weke îro ez dame ber kulm û daran. Şansê min xerabe ! Şansê min tuneye ! Ez di şansê xwe nim !

Ferzend henek pê kir :

- Ku şansê te hebûya, dê diya te tu keçik bianiya.

Bi vê gotina Ferzend Îbrahîm êşiya. Ew xwîna hişk, ya ku li bin çenga wî mabû bi neynûkên xwe xeritand û bi kelegirî got :

- Bes e lo, Ferzend ! Tu jî hertim henekê xwe bi mirov dikî. Weleh hevaltiya bi te re heram e.

Ferzend li ber wî geriya :

- Min henek kir Îbo. Ez peyya xwe bi paş de digirim.

- Çi, lo ! Weleh tu hertim wisa dikî. Ma qey kêfa te bi vê rewşa me tê ?

Ferzend dîsa got :

- Weleh min henek kir, malxerab. Ma çawa dê kêfa min bê ? (Destê xwe avêt ser stûyê wî). Min bibexşîne, ez peyya xwe bi paş de digirim.

Herdiwan li çavên hevdu nihêrîn, keniyana û bi gavên xurt ketine hewşa nexweşxanê.

Li hundir nexweşxanê mirov ax biavêta li erdê nediket. Nêzîkî pêncî şêst kesan li ber deriyê oda doktor hatibûne ser hev. Piraniya wan kesan jî ji lixwekirina wan mirov zanî bû ku gundî ne. Nêvî ji wan pîrekên bi zarok

bûn. Nêviyê din jî kal û pîrên ku ji dest û lingan keti bûn. Yê herî li dawî kalekî rihspî, bi şalwar û şewqe, bi wê pişta xwe ya tewiyayî xwe dabû ser gopalê xwe û laşê wî weke hêlkanê dihejiya. Li pêşiya kalo jî jineke ciwan, biskên wê yên reş weke serê du maran di bin kofiya wê ya kesk de dixuya, hêsirên ku ji çavên wê yê şîn dihatin pakij dikir û zaroka di destê xwe de aş dikir. Ser çavê zarokê ji pîrzikan winda bûbû. Ji girî qet tebatî nedikete keçikê. Diya wê her destên xwe li pişta wê û li kûna wê dixist û bi gotinên xwe yên xweş dixwest ku keçika xwe aş bike. Her carê ku wê destê xwe li pişta keçikê dixist, mêşên ser çavên wê difiriyan, bîskê li hundir digeriyan û dîsa bi paş de dihatin xwe li ser ruyê keçikê datanîn. Lê çend mêşên ku ji ser ruyê keçikê firiyan, çûn xwe li ser gepên Îbrahîm danîn û xwestin ku xwîna li ser ruyê wî hişk bû ye bixwin. Lê Îbrahîm bi hêrs destê xwe li ser çavê xwe xist, destê wî li şûna diranên wî yên rabûyî ket, êşiya û janê da dilê wî. Îbrahîm bi dengê bilind kire axîn. Bi axîna wî re hemî li paş xwe zivirîn û li wî nihêrîn.

Îbo li ser tûtikan rûnişt, serê xwe xiste nava herdu çokên xwe û xwe epişande ser hev. Ferzend jî li ba wî rûnişt. Çend hebên din jî li ser wan kom bûn. Gava ku hemşîrê deriyê dayira diktor vekir, ew kesên ku li ser wan kom bûbûn hemû reviyane cihê xwe. Hingî herdu zarok jî rabûn û ber bi dayira doktor ve bazdan. Îbo kirî destê xwe biavêta deriyê doktor, peyakî girs û bi simbêlên boq, bi destê wî girt û bi ser de qêriya :

- Tu dikî bi ku de herî bêjî ? Here têkeve dorê !

Ferzend got :

- Diranên wî şikestine apo, berde bila here hundir.

Mêrik hema bi lez bişkokên gomlegê xwe vekirin, birîna xwe nişanî wî da, bi hêrs û bi dengê gur got :

- Ma diranên wî ji vê birîna min xerabtir e ? Herê ?

Birîna mêrik şûna kêrekê xuya dikir. Pêşî bi ta hati bû dirûtin, dû re bi çengelan bi hev hatibû cebirandin. Lê du çengel jê vebûbûn. Ji ber vê yekê nêmeke zer ji birînê dihat. Xwîneke sore-reş jî li dor birînê hişk bûbû.

Gava ku Ferzend çav li wê birînê ket, diranên xwe qiriçandin û çavên xwe girtin. Serê wî gêj bû, dilê wî li hev ket û kirî vereşiya.

Mêrik dîsan got :

- De bêje ha, ma diranên wî ji vê birîna min xerabtir e ?

Ferzend tişt negot. Îbo jî dest avêt gepa xwe û dîsan çû dawiya wan mirovan rawestan.

- Weleh ku wa be heya bi êvarî dor nagihêje me. Ma tu nanihêrî her ji saetekê carekê yek nakeve hundir.

Îbo :

- Ma em çi bikin ? Ma emê çawan bi vî awayî herine mal ?

Ferzend milên xwe hejandin û tişt negot.

Piş tî demekê dîsan deriyê dayira doktor vebû, lê îcar hemşîrê bang kesî nekir. Doktor çakêtekî spî heya bi çokê lê bû, cigara wî di devê wî de bû, berçavka wî di dest de bû, derket der ve û di ber koma wan mirovan de derbas bû û çû oda çayvexwarinê.

Li odê sê-çar doktorên din jî runişti bûn, çayê û cigara wan li ber wan bû, dipeyvîn, henek dikirin û dikeniyân.

Doktor jî ji xwe re çayek dagirt, li ba wan rûnişt û bi wan re kete sohbetê.

Nexweş hîn di dorê de bûn û bê sebir çavên wan li riya doktor bûn. Deh deqîqe derbas bûn doktor nehat, bîst derbas bûn nehat, nîvsaet derbas bûn nehat. Lê tenê dengê ken û henekên wan dihat.

Kalekî ji nav wê komê bang kir :

- Lawo hela yek ji we yê ku bi tirkî zane here bang doktor kin. Ma emê heya kengî li vir bimînin ? Niha ne tirimpêlên gund mane, ne tu tişt. Ma emê xwe çawan bigihînin gund îşev ?

Hingî Ferzend çû, li derî xist û kete hundir. Lê ew qet li Ferzend hayî nebûn, ken û henekên xwe domandin.

Ferzend sê-çar caran li ser hev got :

- Doktor beg, doktor beg.

Lê doktor her bi dengê xwe yê gur kenê xwe didomand.

Ferzend dîsan got :

- Doktor beg, doktor beg em...

Doktor bi hêrs li ser stûyê xwe zîvirî û bi sert got :

- Çi ye ? Derkeve der ve !

Ferzend derneket, dîsan got :

- Doktor beg tu...

- Derkeve der ve !...

Ferzend serê xwe kil kir û bi hêrs ber bi nexweşan ve çû. Bi dû wî de jî doktor derket, bi bayê bezê deriyê dayira xwe vekir û kete hundir. Piştî ku doktor kete hundir bi çend deqîqan, hemşîre derket. Bi derketina hemşîrê re nexweşên ku di dorê de bûn, ber bi pêş ve kişiyân ku têkevin hundir. Lê hemşîrê nehişt û got :

- Saeta doktor îro xelas bû, ew hew kare kesî bigire hundir. Lê hun sibehê karin dîsan werin. Cihê xwe jî ji bîr nekin ku hun hatin.

Çend kesên ku li dawiyê bûn xwe dane pêş ku ji hemşîrê re tişteki bibêjin, lê hemşîrê zû derî girt.

Hum û gum kete nav wê koma mirovan, yên ku di ber xwe de ji doktor û hukûmetê re xeber dan, yên ku ji rewşa xwe re kufur bûn û yên ku hêrs

bûn û nizanî bûn ku ji hêrsan çî bibêjin. Bi wî awayî hemû hêdfî hêdfî ji hundir nexweşxanê derketin.

Wê roja ku berî niha bi saetekê paş stûyê mirov dişewitand, teyr û teba, kûçik û heywanên din hewcedarî siyê dikir, niha bê tesîr mabû. Ew jî weke wan nexweşan hêdfî hêdfî winda dibû.

Hinî gundî ji bo ku bigihîjin ser otobusên gund, bi gavên xurt ber bi sûkê de baz dan. Yê din jî hêdfî hêdfî dil bi kul û keder meşiyên. Îbo û Ferzend jî bi wan re dimeşiyên. Êş û jana diranên Îbo zêdetir dibû. Wî jî bi xwe nikarî bû, her zimanê xwe di şûna diranên xwe de dibir û tanî, êş û jana diranên wî zêdetir dibû.

Ferzend ji nişkê ve bi milê wî girt :

- Min dît.

Îbo şaş ma :

- Te çî dît ?

- Dermanê diranê te, min dermanê diranê te dît. Dermanê diranê te xwê ye. Ji xwê pê ve tu tişt arîkariya diranê te nake. Û em ji sibehê bêsebeb li vê nexweşxana mîrat sekenîne. Dermanê diranê ji xwê pê ve ne tiştek e. Berê li gundê me diranên kê têşîya xwê datanîn ser. Yê hinan jî bi şîşa sor dikewandin. Lê diranên te kurmexwarî nebûne û êş neketiye wan. An na me karî bû bi şîşeke sorkirî bikewanda. Lê niha dermanê wê xwê ye. Xwê bi yek carê re dikewîne. Xwê bîra bîra ye.

Îbo pê kenîya :

- Malxerabo ma ji ku xwê bîra bîra ye ? Xwê mala mirov xerab dike, birînan dişewitîne.

- Hela tu bi a min bikî, bê dibe an anbe.

- Baş e, ezê bi a te bikim.

Êdfî ketine nava bajêr, di ber çend dikanan de derbas bûn û çûne dikanekê nas. Hinek xwê ji dikandar stendin û derketin der ve. Ku ew derketin, li ber devê dikanê çavên wan li hevaleyê wan bi navê Ziya ketin. Emrê Ziya li dor çardehan bû. Bejna wî dirêj bû. Gava ku dimeşîya bi hêlekê dibû. Hertim çakêtekî eskeran lê bû. Porê wî yê dirêj û zer ser çavên wî winda kiribû. Kebabek di nav nanekî tenik di dest de bû û dixwar. Ziya bi xwe li wan hayî nebû, lê Ferzend bang kirê :

- Ziya, ziya !

Ziya li paş xwe zîvirî, qertek din jî li nanê xwe xist û bi lez ber bi wan ve çû.

- Kuro min bihîst ku hun hatibûn girtin, rast e ?

Ferzend :

- Erê, rast e. Ma te çî kir îro ?

- Hih... Min çî kir ? Îro kar weke axê bû, ax...

Bi destekî bi kebaba xwe girt, destê din jî xiste bêrika xwe û neh deh pelên deh lîra û pênc lîra derxist û nîşanî wan da :

- A min îro ev kar kirin. Ku min bixwesta min karî bû hîn bêtir kar bikira. Hun jî dev ji kar berdidin û diharin çentê xelkê ji destê wan direvînin. Şerm e, şerm... Ma qey gunehê we bi gundiyan nayê ? Kî çî zane bê rebenê bi çî awayî ew bi pere bi destên xwe xisti bû ? Şerm e, şerm... Weleh min ev ji we nedipa. Îro bajar hemî bi we zanin. Navê we êdî bi dizîtiyê derket. Kes hew tu karî jî bi we dike.

Ferzend bi milê wî girt :

- De hela tu bimeşe lo !

Hersê bi hev re meşiyar, ji nav dikanan derketin û çûne cihekî xalî. Ferzend xwest ku wê xwêya ku ji dikandar standibû deyne ser şûna diranên Îbo, yên rabûyê.

Heta bi wê kêlikê jî Ziya bi çîroka diranên Îbo neheseya bû. Ku çav lê ket, xwe avêt herdu milên wî û bi hêrs jê pirsî :

- Çî bû ye Îbo ? Te û hinan li hev xistiye, an eskeran li te xistiye? De bêje ! Çî bû ye ?

Îbo milê xwe hejand û bê deng ma.

Ziya dîsa milên wî hejand :

- De bêje ha, ma çî bû ye ?

Ferzend Ziya da aliyekî û ew xwê danî ser. Gava ku wî xwê danî ser, janekê da dilê Îbo, ji cihê xwe pekiya, kire qîrîn û herdu destên xwe avêtin devê xwe.

Ziya êdî hêrs bû :

- De ka bêjin ha ! Ji bo çî hun ji min re nabêjin ? Ma qey hun baweriya xwe bi min naynin ?

Ferzend bi kurtebirî serpêhatiya xwe jê re got. Lê Ziya dîsa bawer nekir.

- Na, na. De bêje, bêje, rast bibêje.

- Bi şeref ez rast dibêjim. Ma çima emê derewan bikin.

Êdî kete serê Ziya. Diranên xwe qiriçand û serê xwe hejand. Ew jî carekê wilo bê sûc hati bû girtin, îşkence û lêdan lê hatibû kirin. Şevê eskeran girtibû ser mala wan û ji berdêla birayê wî yê mezin ew girtî bûn. Her çiqas Ziya li ber xwe da bû û gotibû : «Ez cihê birayê xwe nizanim» jî, dîsan pere nekiribû. Eskeran ew kiribûn felaqê û heta ku binê lingên wî werimandibûn, lêxisti bûn û goti bûn : «Cihê birayê xwe ji me re bibêje». Ne Ziya, ne jî dê û bavê Ziya zanî bûn, ku lawik bi ku de çû ye. Hinan digotin çû ye Îrakê, li wir bi Kurdan re li hember hikûmetê şer dike. Hinan digotin bi refek xortên din re derketiye çiyar li hember eskerên tirk şer dike. Hinan jî digotin çûye nava filîstîniyan, li wir bi wan re li hember cihûdan şer sike. Her kesî tiştek digotin. Lê dawî dawî li paş qereqolek eskeran meytê wî hatibû dîtin. Hîngî Ziya hati bû berdan.

Ziya weke birayê xwe siyasî kar nedikir, lê yek caran wî jî bi xortan re belavok belav dikirin. Piştî wê girtina xwe, carek din jî hati bû girtin. Cara didiwan ku hati bû berdan êdî xwesti bû ku ji wî bajarî bar bike. Lê ji xwe re li hevalan digeriya.

Ziya destê xwe yê rastê kir hutik, li kefa destê xwe yê çepê xist û got :

- Weleh heyata li vî welatî heram e. Heqê mirov ji vir bar bike û here cihekî dûr. Lê hun zanin, werin em herin bajarên mezin. Em herin bajarekî dûr, bajarekî ku tirs û birçîbûn lê tune be. Bajarekî ku kar lê hebe. Bajarekî ku esker bi şev û roj li kuçan nagerin. Bajarekî ku polîs zarokan nagirin, li wan naxin û îşkencê bi wan nakin. Werin, werin hevalno em herin ! Em herin Izmîrê, herin Istanbûlê, herin Ankarayê... Em herin dûr...

Îbo peyva wî birî :

- Imh, ma qey çûyina wan deran rihet e ? Divê ku perên mirov hebin, bajarê ku mirov dihariyê divê ku nasê mirov lê hebin. An na mirov dê ji birçîna bimire. Bajarên mezin ne weke bajarên bicûk in... Xelk hevdu li kuçan dikujin. Ma te wî çendê berê gazete nexwend ? Di rûpelê pêşî de rismê jineke mirî lê hebû. Di ser risim de jî bi herfên mezin nivîsî bûn, ku jinek sî û çar salî ji bo bazinê xwe yê zêr heft kêr xwarî bû. Û destê wê jê kiribûn û tevî bazinan revandibûn. Kesî nizanî bûn ku kê kiribû. Polîs şop nebiribû ser tu kesî.

Ziya :

- Na, lo. Gazete zêde tiştan mezin dike. Nêviyê gundiyên me li Izmîrê ne rojekê tiştêk bi yekî nehat. Ku mirov kar û îşê xwe bike û pozê xwe nexwe nav karên xelkê, tu kes jî karê xwe ji mirov naynin. Û tu dibêjî gerek nasên mirov hebin. Çi nas û çi hal... Weleh bajarên mezin cenet e, cenet... Tenê ku em xwe bi wir ve bigihînin bese. Ku em bigihêjin wir her tişt li min. Cihê razanê, pere, kar...

Ferzend xwe avêt ortê :

- Ma tu kesî li wan bajaran nas dikî ?

- Lo lo, ma ez kesî nas dikim ? Nêviyên gundiyên me li Izmîrê ne. Karê hemûyan jî baş e. Hin ji wan şeytanokan difiroşin, hin ji wan meywe, hin cigaran û yên hinan jî dîkan û çayxanên wan hene. Rojekê yekî gundiyê me ji min re got :

«Were Izmîrê û li çayxana min şagirtiyê bike.» Lê min nexwest û ez neçûm. Lê bê dilê dê û bavê min bû, ez loma neçûm. Hun zanin ku wê çaxê jî hîn nû birayê min hati bû kuştin. Ku ez çûbûma, niha ez ji vê humaltiyê xelas bûbûm. Niha wê perên min pir bûya. Min ê karibiwa hem bisiklêt û hem jî motorbisiklêt ji xwe re bikirya. Lê ez neçûm, ma ez çi bikim ?

Gotinên Ziya di serê Îbrahîm û Ferzend de cih girtin. Heta bi wê deqîqê jî ew qet li çûyina bajarê mezin nefikirî bûn. Ku li ber guhên wan keti bû jî, guh nedabûnê.

Ferzend ji Ziya pirsî :

- Ê baş e, va em çûn, ka kî dê ji me re kar bibîne ?

Ziya kenîya :

- Tu dîsa qala kar dikî. Malxerab, ez dibêjim nêviyên gundiyên me li Izmîrê ne. Ma qey yekê ji wan ji me re kar nebîne ? Bi firotina cigaran mabe emê xwe xelas bikin. Zarokên gundiyên me yên di emrê me de hemû cigaran difiroşin. Ku em rojê bi tenê deh pakêt cigare bifiroşin dê roja me derkeve. Ne tenê deh, lê ez baş zanim ku emê rojê bîst pakêtan jî bifiroşin.

Kaxiz û pênuş ji bêrika xwe derxist, li ser kaxizê nivîsand û peyva xwe domand:

- Ku em rojê bîst pakêtan bifiroşin her yekî sed lîra di destê me de dimîne. Ew jî liba kirîna pakêtê bi deh lîran dihesibînim. Ku em li ser hev bikin, em ê liba pakêtê bi heşt-neh lîran jî bi destên xwe bixînin. Ku serê pakêtê heft-heşt lîra di destên me de bimînin ne hindik e. Rojê sed lîra, mehê dike sê hezar. Salê tam dike sî û şeş hezar. Em bêjin bila salê şanzdeh hezar li mesrefa me here, dîsan heryekî bîst hezar di destên me de dimîne. Ez baş zanim ku tu caran şanzdeh hezar li mesrefa me naçe. Lê em wa bihesibînin çêtir e. Ev karê cigarefirotinê jî rojê tenê du-sê saet in. Em li vir şefaqê radibin û heya bi roava kar dikin dîsa jî bi zorê bîst-sîh lîra di destên me de dimîne. Rojînan jî em destevala vedigerin malê. Weleh hun bi a min bikin, a emê niha herin. Lê hun zanin, li wir esker merker jî tunene. Mirov çi bike kare bike. Kes têkîlî karê kesî nabin. Li wir tu bi çi zimanî jî bipeyive tu kare bipeyive. Tu dixwazî bi almanî, bi gawirî, bi ermenîkî, bi kurdî... Li wir qet kurdî ne yasax e. Tew kes nizane ku kurdî ye. Gundiyekî me li wir bi kurdî distirê, bantan dadigire û dû re bantên xwe li bajêr digerîne û difiroşe. Tu kes jî karê xwe jê naynin. Ew wan bandên xwe di gel bandên kurdî yên din li erebokekê dike û di nava bajêr de digerîne û difiroşe... Esker û polîs tê de derbas dibin, lê qet têkîlî wî nabin. Lê li vir? Ma mirov kare li vir jî wisan bike ? Ma we nebihîst ku wê rojê du heb li sîkê bi kurdî bi hev re peyivî bûn, eskeran ew girtibûn û ew biribûn Mêrdînê. Li wir jî ew xisti bûn hepsê. Weleh ê min ez hew disekimim. Ku hun neyên jî ezê bi tenê herim. Ez hew li vir îdare dikim.

Îbo :

- Belkî gundiyên te tenê arîkariyê bi te bikin. Ma ewê ji ku ji me hersiyar re kar bibînin û me bi cih bikin?

- Ew li min. Razana we jî, kar jî, pere jî... Her tişt... Her tişt li min.

Ferzend :

- Baş e, emê heqê rê ji ku bînin ? (Destê xwe xiste bêrika xwe, deh lîrayê di bêrika xwe de derxist û domand.) Yê min ji vî deh lîrayî pê ve perên min tune ye.

Îbo :

- Yê min jî tune ye. Ji bo ku em bigihêjin heta bi Îzmîrê an Stenbolê divê ku bêrika me tije pere be. Dibe ku em qet gundiyên we nebînin. An ku em bibînin, li me xwedî dernekevin. Yê min ez bê pere naçime tu deran. Min pir rezîlî dîtiye. Ez naxwazim carek din jî rezîl bibim. Yê min ez hew karim bisekinim. Diranên min bi min diarin. Bi xatirê we.

Kirî ber bi mal ve bimeşiya, lê Ziya ew da rawestan û got :

- Wêêw... Hun çî tirsonek in lawo ! Hema hun dibêjin qey emê herin wir û li ber deriyan bimînin. Malneketno, qe bila cesaret bi we re hebe gidî ! Çi hun biziyan e.

Hersê heval jî ber bi mal ve meşiyar. Hersê cîranê hev bûn û malên wan hebekî derveyî bajêr, li ba pîra alman bû. Heta ku gihîştin mal jî her qala çûyina xwe û bajarên mezin kirin.

(Dûmahik heyê)

VEGERA MAL

Şahîne B. SOREKLÎ

«Yadê, bavo ê kengê vegere ?» pirsî Azad bi dengê nizim. Te digot belkî ne dixwest kesek din xeyn ji dayka wî vê pirsê bibihîse. Nazê kir ku wê dengê kurê xwe ne bihîst, lê niherî û got : «Zû qedeha xwe vala ke, bo ez ji te re dîsa tijî kim. Zû, zû, hengê çay sar ne bûye.» Azad dest ne avêt qedehê û ne jî li dayka xwe niherî. Ber çend salan, dema ew hê mindalek biçûk bû, wî sê çar qedeh çay li ser xwarina firavînê vedixwarin, lêbelê çaya îroj wek ava dilopan soravîn bû, ne tama xwe tama çayê bû û ne jî şêraniya xwe. Wek rojên kevin şekirê kapikîn jî di tasê de tune bû, bo mirov çeke devê xwe û çayê li dû bi ser xwe ve ke. «Yadê, bavo ê kengê vegere ?» Dîsa pirsî Azad ji dayka xwe, ya ku ji dest ne hat der carek din guhên xwe di derheqê pirsê lawê xwe de ker bihêle ; rabû ser xwe, bervê Azad meşîya, li ber wî danişt, her du destên xwe li dora wî gerandin, ew hembêz kir û bi dengê pîr nizim di guhê Azad yê çepê de got : «Azad, min jî bîra bavo kiriye, wek te ; an belkî hê bêtir. Ew ê were; îşellah hefta li pêş. Ger na, meha tê ew ê were. Têye bîra te ew çawa şevêkê tev hevalek xwe rakirî û tûrikên şekir û xurman kirin destên te. Ew ê di van rojan de dîsa were ; ez dizanim.»

Hejmara lêxistina dilê Azad bi bersîva dayka wî re rabû jor û baş hat bîra wî, çawa bavê wî ew di kûraniya şevê de cara berê ji xew rakir. Berf wê demê hê tune bû ; dawîya payîzê bû, li derve vîze vîza bê bû. Ew seeta wê şevê wek xewnek şêrîn dihat bîra wî. Hindir xaniyê wan ji dûyê cixaran tijî bûbû. Mirovek zexim, damençe li piştê, tîfing li pêş, ser dawîya doşega wî rûniştibû û bavê wî jî ew kiribû hembêza xwe, radimûsa û tûrikên armûxanan didan wî. Dû rohilat, dema ew ji xew rabû, ji şeva çûnî tenê bîna dûyê cixaran di hindir de mabû. Dayka wî tûrikên şekir û xurman veşartibûn. Diva bû ku ew haya kesekî ne gihîne hatina bavikê ya şeva buhirî, Nazê, dayka wî, tenbe li wî kiribû.

Azad hê di hembêza Nazê de bû, dema dayka wê hat bîra wê. Zarokiya dayka wê jî wek ya Azad derbas bûbû. Kalê Nazê, Heme, di navbera salên 1946 û 48 an de tenê sê caran di nivên şevan de hatibûye mal û dûvre şevê li ser sînor hatibûye kuştin. Çavên Nazê ne dikaribûn êdî hêstiran paşve vegeîn, yên ku dest pê kirin li ser rûyê Azad bibarin. Kur û dê dilên xwe bi girî honik kirin.

Mam Reşîd ji bîrê av dikişand. Vê sibê dinê pirr sar bû ; bayê şeva buhirî berf li ser erdê işk û luht kiribû. Her roj keça wî Bihar diçû avê, lêbelê îroj Mam Reşîd zû ji xew ra bûbû, nimêja sibê kiribû û hatibû ser bîrê avê ji ber qîza xwe ve bikişîne. Rojên Mam Reşîd hemî li vî gundî derbas bûbûn. Di wan de yên xweş jî û yên reş jî hebûn, lê tev hemî kêmasiyan jî, ew ji jiyana xwe razî bû, ta sala buhirî, dema kulfeta wî rojekê nexweş ketibû û dû sê rojan miribû. Mirina şûya wî şahiya dilê wî jî bi xwe re kiribû axa gornê û nema êdî kesekî ken li ser lêvên wî dîtibû.

Ji zaroyên Mam Reşîd tenê Bihar hê bêkar bû. Ewên din hemî xudan kulfet bûn û îroj li şûnên din diman. Lêbelê nuha bûkek wî tev mindalê xwe bi wî û Biharê re li gund rûniştibûn, çiku kurê wî Seyid jî wek mêrê Nazê pêşmerge bû.

Mam Reşîd satila xwe tijî kir, ew li şûnê hişt û hebki wêde çû, li ser keviyek reş rûnişt, tûrikê titûnê ji beriya xwe derxist û dest pê kir cixarekê bipêje. Keleboxa ji satila avê radibû bi kinî bala wî kişand ser xwe, lê dûvre her du çavên wî xaniyên gund bo xwe kirin nêşan. Hat bîra wî ku çawa wî û Resûl Mamend, xezûrê Nazê, ber salne pirr xaniyên xwe di hindir zikê sê heftan de, yek li kêleka yê din lêkirin. Bê ku bixwaze, stûyê wî berve hêla merzelê gund leviya û çavên wî têkoşiyên ku gora Resûl di nav yên din de bi cih bikin. Dûyê cixarê giran giran di her du bêvîlên wî re derdiket û xwe di nav bayê sar de wenda dikir. Tama cixarê ji her dem bêtir tal bû di devê wî de û li kêfa î ne dihat, lê carekê hatibû vexistin û divabû ku were kişandin. Di dilê xwe de Mam Reşîd li pêçandina wê poşman bûbû, çiku wî pirr caran biryar dabû ku êdî li xurînê cixarê ne kişîne. Waye cixareyek li vala çû, di ev rojên teng de, dema ku tiştên wek titûn û çayê û şekir bûbûn wek dermên.

Mam Reşîd kutek din li cixarê xist, ew di bin lingek xwe vemirand, rabû ser xwe, satila avê bi destê rastê rakir û hêdî hêdî ber bi mal meşiya. Valabûna destê çepê di qafê wî de fikrek peyda kir, ku xweziya wî satila Nazê jî bi xwe re anî ba, bo tijî av bike. Her der vê sibê gewr sipî xuya dikir xeyn ji malan. Serên kaşên li derdora gund ji mij xuya ne dikirin. Xeyn ji

dengê segekî tu dengên din ne dihatin guhan, lê dirêj ne kir, dema dengê segekî bû yê duduyan û sisiyan û çaran. Mam Reşîd satil danî û li dora xwe mêze kir. Tişteke ne dihat xuya kirin ku mirov bibêje ew ê bikaribe bibe sedema ewte ewta kûçikên gund. Hê Mam Reşîd di vê girikê de mijûl bûbû, dema dengê balefiran ji dûr ve ket guhên wî. Wisa, ew tê ghişt çima deng bi segan ketiye ; dîsa dest avêt satilê, ew rakir û meşa xwe domand. Hatina dengê balefiran di van rojan de ne tişteke eçêb bû.

Dengê ji ezmên heku diçû bêtir dibû. «Tu caran weha nêzikî gundê me ne kirine» di dilê xwe de digot Mam Reşîd, dema ku gurmînyek wek dengê tavek meha nîsanê hat guhan, pirr dirêj ne kir gurmînyek din wek bêtaran îcar ji hêlek gund hat û erd di bin lingên wî de hizand, satil vê re ji dest xist. Gurmîniya çaran Mam Reşîd li ser qûnê xist, yê ku ber xwe da bo rabe ser xwe û dît çawa xaniyê wî û yê Resûl di hindir dûmanek gewr û reş de winda bûne. Her du çongên wî ketin ber, dîzên wî sist bûn û janek zirav xwe berda kûraniyê dilê wî ; ew li ser zik ket xwar û rûyê wî di komikek berf de winda bû.

Dinê hê sar bû, lê yekî dizanibû ku zivistan êdî mala xwe hêdî hêdî bar dikê ye. Sê hefte û çar roj mabûn ku Newroz xwe bigihîne holê. Şêrko, mêrê Nazê, di şeva reş de nêzikî li gund dikir. Îroj ew bi tenê xwe bû. Du hevalên wî li gundek din mabûn û ew ê ber rohilat dîsa li şûnekê hevûdu bidîtina. Barê Şêrko ne sivik bû. Xeyn ji Klaşnîkovê, du derax û malek gullan li pişta wî bûn ; çar bombeyên destan, her dudu di tûrikekî de, bi qayîşa wî de hatibûn girêdan û li ser milek wî jî tûrek mezin hebû, yê ku di hindirê xwe de şekir, çayî, şûşak qazaxî û tiştên din yên ku ji qaçaxçiyên hatibûn kirîn, dihewandin. Îro kurê Mam Reşîd jî hin titûn û hûr mûrên din bo malbata xwe tev Şêrko şandibûn.

Ev bûbûn nêzikî pênc mehan ku Şêrko û şûya xwe hê pênc deqe ji çavên yên din dûr bi hev re derbas ne kiribûn. Dilê wî dikir gupe gup û gavên wî bi lez pêş ve dihatin avêtin. Destên wî yên îşk û sar ê bi canê Nazê yê nerm û şêrîn germ bibana. Wey hawar, wî çiqas bîra Nazê û Azad kiribû ! «Şekir û xurmeyên Azad, ez ê ber ji mal derkevim bidimê», di dilê xwe de digot Şêrko. Dûvre ew demek din di hindir derd û xeman de winda bû : ta kengê ê bidomîne ev rewşa xirab ; kengê aşitî ê vegere van dorhêlan ; kengê azadî û serbestî ê têkevin şûna sitemkarî û zordariyê...? Dengê segên gund Şêrko dîsa hişar kir, yê ku ji kêfxweşiyê hema hindik mabû bifire. Kîşandina cixarak din û ew ê bigihiştta mala xwe, bo xwe têxe binê lihêfê û bedena xwe û ya Nazê bike yek, bo winda bibe di evîna dilan de, bo dûr keve ji

derd û kulên dunê... Ew ê dûvre qazaxî berde paporê, avê bo çayê bide ser, cixareyek qalind bipêçe, guh bide ser dengê Nazê û ji wê re bipeyive. Dema wan têr şor kirin, ew ê deng li Azad ke, wî di hembêza xwe de bide rûnişkandin û ramûse, dîsa ramûse û carek din. Dûvre ew ê tûrikên naylon yên tijî şekir û xurme bide wî...

Tirseke sivik bi nişka ve ket dilê Şêrko, yê ku bi dengek nizim ji xwe pirsî : «Kuro lawo, ka xanî ?» Wî baş dizanibû ku wî rê şaş ne kiriye. Wî û segên gund hev nas kiri bûn û kûçikê Mam Reşîd bi wî re dimeşiya, yan xwe davêt ber lingên wî, wek ku dixwaze haya wî bikişîne ser tişteki. Tirs heku çû bêtir bû û tamarên Şêrko sist kirin. Bi carekê ve wî dît çawa tirs nuha daye ser tirs ji mirinê. Rojek derbas ne dibû, bê ku ew û mirinê li çavên hev ne nihêrin, lê tu caran tirs mirinê tamarên wî wisa sist ne dikirin, ew êdî fêr bûbû wê rewşê. Dema ew ghişt dara ku bavê wî di roja bûyina wî de çandibû, tenê komên kevir û xweliyê li şûna xaniyê wî û yê Mam Reşîd xuya dikirin.

Pêşmerge pişt xwe da darê û kir ne kir bigirî, lê ne dikaribû. Jan û gurr û şewat û qehra di dilê wî de ne dixwestin xwe têxin hindir hêstiran bo werin der.

SIÛDA MEHMET KARATAŞ

Mehmed UZUN

Gelo edebiyata ku bi kurdiya jorê, yanê bi kurmancî tê nivisîn, niha di destpêka heyameke nû de ye? Gelek kes niha vê yekê ji xwe dipirsin. Ji lewre di warê edebiyatê de tiştên nû tên pê ; kovarên siyasî hîn bêtir cîh didin edebiyat û ziman, li ser tarîxa edebiyata me kitêb diweşin, nivîskarên kevnar û nûjen tên nasîn, munaqêşe tên holê, kovarên me yên klasîk, ji nû ve, tên weşandin, kitêbên şûr û pexsan dertên. Û ya herî girîng, nivîskarên nû derdikevin û berhemên xwe diweşînin...

Edebiyata ku bi kurmancî tê nivisîn, ji zû ve bû ku di nav bêdengiyêke tûnt de bû. Digel ku carina tişt hatibin pê jî, meriv dikare bibêje ku edebiyata bi zaravayê kurmancî piştî kovarên giranbiha Hawar, Ronahî û Roja Nû ket bêdengiyekê. Lê ev pêşveçûna roja me bi her awayî ji bêdengiya dehsalan vediqete. Bi her awayî jê bi dûr e...

Lê belê, tevî vê pêşveçûnê, tişteki pir berbiçav divê ji bîr nebe; kêmanî bi hezaran in. Niha hîn bêtir bi kurmancî tê nivisîn, lê hê jî standarên zimanê niviskî baş nehatine pê. Kovarên edebî dertên, lê hê jî kovarên ku bi rastî bikanbin rîya heyamên nû vekin, -bi her awayî- nehatine pê. Nivîskarên nûjen derketine û dinivisînin, lê hê nexuyaye ka kî yan jî kîjan ji wan dê bi her awayî tesîr li pêşveçûnê bikin û bibin nivîskarên heyama nû... Bi navê rexne û rexnegirî tistine tên nivisîn, lê hê jî rexnegirên hay li edebiyat û zimanan, zane, xweser, bîhnfireh û pisporê karê xwe naxuyin. Hêdî hêdî xwendevanên kurd çêdibin, lê hê jî ew kêman in û di navbera wan û nivîskar de tekiliyêke xurt ava nebûye.

Ji ber vê yekê, em divê hay lê bin ku edebiyata me li ser rîya pêşveçûnê ye û jê re tekûzkin, xurtkin, kûrkin, firehkin divê. Û bi awir û rêveçûneke ku di xizmeta pêşveçûna edebiyat û zimanê me de ye...

Bê guman nivîskarên nû di vê pêşveçûnê rolekî bijarte dilizînin û ew dê di rojên pêş de hîn çêtir rolê xwe bi cih bînin. Û yek ji van nivîskarên nûjen

ku bi best û daxwazî dinivîsînî, Şahîne Soreklî ye. Şahîne Soreklî -bêrawestan- her dinivîse ; ji îngilîzî û Almanî sîrîne vedigerîne Kurdî, nivîsar û bendên siyasî û civakî dinivîse, şîrî dinivîse û herweha kurte-çîrok. Digel vê xebata nivîskariyê, ew wekî gerinendeyê bernama Radyoya Kurdî li Awistiralyayê jî dixebite û bernamên spehî û xweş diweşîne. Kurte-çîrokên Ş. Soreklî di piraniya kovarên edebî de diweşin. Heta niha xwendevanên Kurd bi vî awayî hay li kurteçîrokên wî hebûn. Yanê tu kurte-çîrokên wî wekî kitêb nehatibûn weşandin. Lê niha kurteçîrokeke wî wekî kitêbokekê çapbûye, -îlon 1985 ; Azadbûna Mehmet Karataş (Ev xebata Enstîtuyê jî helbet gaveke berbîpêş e. Em hêvî bikin ku Enstîtû bi berhem û çapên nûve me kêfxweş bike.)

Kurte-çîroka Ş. Soreklî li ser merivekî Kurd e, yanê yek ji me, ji civata me; Mehmet Karataş yek ji wan sedhezaran e ku -ji ber sedemên neçarî, siyasî û civakî- dev ji welatê xwe berdane û ketine welatên xerîbîyê. Qehremanê kurte-çîrokê ji Kurdîstana Turkiyê ye. Gava em bi qehreman re bi rû dibin, ew li Awistiralyayê, li bajarê Sydney e. Lê *"ev bûbûn şeş sal ku Mehmet Karataş welatê xwe li dû xwe hiştibû. Ew berê çûbû Alemaniya Roava lê hukmeta wî welatî ji du salan pirrtir rê neda bû ku ew li wir bixebite. Wisa wî ew welat li şûn hiştibû, xwe bi alîkariya hevalekî salekî li Fransîz bi cîh kiribû û li wir dûre kaxezên xwe bo çûyîna Australya pêşkeşî qonsilosa wî welatî kiribû. Şansê xwe zor baş bû ku ew li wir hatibû qebûl kirin û berya sê salan gihiştibû bajarê Sydney."* Mehmet Karataş bê kar û şixul e. Ew carina li derine dixebite, lê ji bo demên pir kurt. Ew keserkûr, bîhteng û nebextiyar e. Kêfxweşî û serfirazî jê pir bi dûr in. Bav û mala Mehmet Karataş her jê gazinciyan dîkin. Ew dil hene ku Mehmet Karataş, kurê malê, her ji wan re pere bişîne. Namên du jê re tên ne wekî yên hevalê wî yê Alman Helmut in. Gava name ji Helmut re tên, Mehmet Karataş her weha difikire ; *"xweziya min bi dilê te be,(...) namên te her dem tijî kêfxweşî û dilşadiyê û yên min gazinc û şîne."* Lê bavê Mehmet Karataş wekî kurê xwe nafikire. Ma kurê wî ji bo kar û perçivandinê derneketiye dervayê welêt ? Ma ew nizane ku mal belengaz û neçar e ? Hingê ? .. Di destpêka kurte-çîrokê de bavê Mehmet Karataş, Mistefa Karataş di quncikeke xênî de rûniştiye û weha difikire; *"Ev bûn salnîvek ku me tu pere ji vî bênamûsî negirtine. Nameyên wî jî heku deherin hindiktir dibin. Ez dikanim sond bixwim ku wî em ji xwe bîra kirine û wexta xwe tev qehpikan derbas dîke."* Belê, daxwazî û hêvî cihê ne.

Mehmet Karataş li bajarê Sydney tevî du xortan, xortê Alman Helmut û xortê Awistralyeyî Johnny, di xaniyekî de dijî. Lê tu hevalên wî hê tunene û *"ev tişt valabûnek mezin di jiyîna wî de çêkiribû."* Mehmet Karataş di bajarê mezin de weha bê ser û ber deger, dixwe, vedixwe, dipeyive û dijî.

Lê tiştê herî girîng ku di welatê xerîbiyê de pê diqewime ev e ; *"dema Mehmet Karataş gihîşt Aleman, wî dît ku xelkê wir ji welatîyên wî hez nakin. Wek hin merovên din, wî jî dest pê kir bibêje, ku ew perên navneteweyî, ku netewe bo wî rolek mezin nalîzin, ku karkerên cîhanê hemû birane, (...) lê dûre hêdî hêdî wî baş fêhm kir, ku çawa trumbêl be numre û merov bê nav nabin, wisa kes jî bê netewe nabin ji ber ku, ger yek bixwaze yan na, yê din her dem demxê li meriyan dixin. Merov nedikane bê kok û benate tev yê din bijî ; (...) çawa darek bê reh û hej kes nabe, merovek jî bê esil fêslê xwe tu xweşiyê ji jiyînê nabîne..."*

Herweha Mehmet Karataş jî tu xweşî di jiyana xwe de nabîne û xwe dikuje ; xwe ji kendaleke pir kûr davêje nav deryayê... Pîrika Mehmet Karataş ji avê dixuye û deng li torînê xwe, Memê xwe dike. "Memê" jî xwe pê re berdide û dere nik pîrika xwe. Mehmed Karataş li pey xwe nameyekê berdide û di namê de dibêje, *"bila kes bi mirina min tucarete neke, ne jî bila laşê min bo hinan bibe hacetek propagandayê."*

Bûyera kurteçîroka Ş. Soreklî, bi kurtebirî, weha ye. Ew bextê me yê reş, jiyana me ya rojane û neçarî, nezan û rebeniya me salix dide. Bûyera Mehmet Karataş ne ji me pir bi dût e. Nivîskar Ş. Soreklî bi hostetî vê jiyana malkambax berpêşî xwendevanên xwe dike. Kurte-çîrok li nik bavê Mehmet Karataş dest pê dike, bi dût re, dipengize û diçe bajarê Sydneyê, nik qehremanê kurte-çîrokê. Lê ew li wê derê jî namîne ; carina bi şûn de, li jiyana Mehmet Karataş ya rabirdû vedigere û herweha li ser derd û kulên Mehmet Karataş hûr dibe. Bi vî awayî xwendevan têdigihê ka çima Mehmet Karataş bêgav dimîne ku xwe bikuje.

Stîl û teknîka ku Ş. Soreklî ji bo kurte-çîroka xwe hilbijartîye, ne hêsan e. Ew bi alîkariya xewn û xeyalan di nav îro û do de diçe û tê, lê her ji bo armancekê. Em vê celeb nivîsînê bêtir li nik nivîskarên Amerîka Latînî û Fransîzan dibînin. Nivîsar (kurte-çîrok yan jî roman), *"tev li hev"* e, lê bi dûtan, bi rêk û pêkî, bi zanîn. Yanê ew bi zanîn tev li hev bûye. Mebes bi vê celeb nivîsînê ev e ; xwendevan jî -bi qasî- nivîskar xwe biêşîne, pê re here û xwe di bûyeran de bibîne. Yanê xwendevan jî bibe şîrkê berhema ku di destan de ye. Di ev celeb nivîsîn de girîngî û giranî ne bi tenê li ser bûyer û naverokê ye, herweha nivîskar bi qasî naverokê li ser şekil jî hûr dibe. Yanê bi qasî çî, çawan jî girîng e. Edebiyat divê edebiyat be, ne tenê bûyerên *"tahzî û serqot."*

Ş. Soreklî di ev celeb nivîsîn de bi ser ketîye ? Bi ya min, eger meriv bi awakî giştî li kurte-çîrokê binihêre, bersiv belê ye. Ş. Soreklî bi awakî wisan di nav îro û do de digere ku xwendevan jê eciz nabe û dikare perçên kurte-çîrokê li hev bîne. Lê qelsî û kêmanî jî hene ; dinya nefîsî û hundirî ya Mehmet Karatas baş naxuyê, şexsên din bas nehatine salixdan, bûyer

"çîprût" e, yanê der û dorên bûyerê û Mehmet Karataş baş nehatine kemilandin, û bê ku hewce be danezan hatine reşandin.

Herwekî ku tê zanîn di ev celeb nivîsîn de dinya nefsi, dinya hundirîn taswîrkirin, pir u pir girîng e. Wekî xwendevanekî min dil hebû ku fikir û dinya Mehmet Karataş ya nefsi hîn bêtir bidîta, ew hîn bêtir berbiçav bûya û min ew hîn ji nêzîk ve binasiya. Herweha kesên din yên kurte-çîrokê de kesekî ecêb balkêş heye ; Johnny. "*Johnny ji xelkê Australya yê kevn bû û ji bakûrê welêt hatibû Sydney bo têkeve zanîngehê.*" Johnny hay li rewşa xwe heye û pê dihese ka çi bi gelê wî qewimiye. Di kurte-çîrokê de Johnny dikaribû bûbûya wekî kozeke agir û dilê xwendevan jî germ bikira...

Lê bi qasî ku ez dibînim, di van qelsî û kêmaniyan de ziman rolekî esasî dilîze. Ji me hemûyan re nas e ku zaravayê kurmancî hê li ser riya zimanê nivîskî ye. Ji aliyê devkî ew dewlemend e, lê ne ji aliyê nivîskî. Ev yeka -bivê, nevê- tesîr li nivîsînê dike û qelsiyên tîne pê. Herweha kurdiya Ş. Soreklî jî, wekî hemû kesên ku bi kurmancî dinivîsîn (nivîskarê wekî Osman Sebrî ne tê de), ne ewçend xurt e... û eger kurdiya me ne xurt e, ev yeka ji bo me kêmani ye, lê ne tawan. Rewşa ku em tê de dijîn, lê weha kiriye. Wekî xelkên din ku bi xebat, xwîdan û keda salan ve zimanekê nivîskî anîne pê, em dê jî vê yekê bijîn. Mixabin, rewş ne tu rewş e, lê nivîskarên me divê bêgav nemînin. Ji ber ku riya zimanekî nivîskî jî bi tenê derekî derbaz dibe ; *xwendin-lêgerîn û nivîsîn, xwendin-lêgerîn û nivîsîn û dîsan xwendin-lêgerîn û nivîsîn...*

Ez bawer dikim ku yek ji sebebên qelsî û kêmaniyên kurte-çîroka Ş. Soreklî jî, kurte-çîrokbûna wê bi xwe ye. Yanê bi tenê di nav çend rûpelan de salixdan... Ş. Soreklî diviya, ya bi awakî firehtir li ser bûyerê hûr bûya yan jî xwe li ser tiştê ku kakilê çîrokê ye, bicivanda.

Tiştên ku li ser zimanê Ş. Soreklî werin gotin, ne zêde ne. Ji ber ku -wekî min li jor jî got- hê standardên zimanê me yê nivîskî baş bi cîh nebûne. Bi qasî ku ez têgihîştim Ş. Soreklî bi devoka xwe dinivîse, lê herweha ew dixwaze xwe bigihîne zimanekî gelemper û edebî jî. (Ş. Soreklî ji Kurdistana Sûriyê ye, lê bavanên wî ji Kurdistana Turkiyê, ji Siweregê ne.) Meriv zimanê wî têdigihê û awayê edebî tê de dibîne. Ji bo roja me, ev ne tiştên kêmin.

Ş. Soreklî gelek peyvên devoka xwe bi kar tîne. Û bi baweriya min ew baş dike. Ji lewre bikaranîna devok û peyvên wan, ne kêmaniya zimanê me ye, ji bervajiyê, dewlemendiya wî ye. Em dê weha bigihên zimanekî dewlemend, yekgirtî û nivîskî.

Ş. Soreklî gelek peyvên jî li gor awayê xwe dinivîse, wekî pir. Ew di dewsa pir de pîr dinivîse, -wekî nivîskarên me yên hêja Osman Sebrî û Mehmet Emîn Bozarlan. Di kurte-çîroka Ş. Soreklî de peyvên weha pir in.

Ev yeka ne xem e. Em dê, di roja me de, weha binivîsin da ku em bigihên celeba yekgirtê ya nivîsînê. Lê di kurte-çîroka Ş. Soreklî de tişteki heye ku bi baweriya min nivîskar lê hûr be, baş dibe. Di kurte-çîrokê de baş dixuye ku nivîskar li gor qaîda û prensîpên ku rehmetî mîr Celadet û Kamuran Badirxan di kovarên Hawar, Ronahî û Jîna Nû de anîbûn pê, divivîse. Lê hingê çima peyv û cimlên weha : *"Helmut lawek wisa bû, ku nedizanibû xeyandin çiyê (...) Jinên ew welatan doxîn sistin (...) Ew bo te zor siwabe (...) bi rê ve keçek tev lawek por dirêj (...)* . Ma meriv divê lawek wekî lawekî, nenivîse û ye ji çî, inji sist, e ji siwab veneqatîne ?...

Ez bawer dikim, pêş gotina kurte-çîrokê jî ne hewce bû. Ji lewre meriv divê xwendevan bi serê xwe bihêle. Çawan ku gava nivîskar dinivîse, bi tena serê xwe ye, herweha xwendevan jî divê bi serê xwe be. Ne hewce ye ku nivîskar jê re tiştine bide zanîn û rê nîşan bidiyê ka ew dê kurte-çîrokê çawan bixwîne. Xwendevan digire, karê wî ye. Û bê guman her xwendevan li gor xwe difikire û lê dinihêre. Yanê ne wekhev.

Ez divê, di dawiya dawîn de, bibêjim ku min kurte-çîroka Şahîne Soreklî di hilmekê de xwend û pir kêfxweş bûm ku nivîskar bi hostefî, bi best û bi awakî edebî jiyana me careke din nîşanî me dide.

ÇEND TEKSTÊ DIMILKÎ (ZAZAKÎ) : 1857

ARÊKERDOX : PETER IVANOVIÇ LERCH

I. ESTANEKA HÎRÊ BIRAYAN

Cay ki bi çinê bi, hîrye (hîrê) beray bî. Namey beray qicî Hesaneke, namey beray miyanênî Qasim, namey beray pîlî Şaban bi. Çidê yîne çinêbi, hîrye vayş turî xoe bî. Hesaneke(î) va:

- Beraryênî, warzî, ma eno melmeket ra vecî, ma şêrî xoe rî yewna aşîret, ma xoe rî kar bikerî, pey debara ma bibû.

Enîye hîrye heme werişî şî, veciyay serî yew koy, awnay yew deyš te asena pîrû xele a. Hesaneke va :

- Beraryênî, warzî, ma şyerî xeley ena deyš te biçînî, helbet wayerî enîye xelî estû, ma rî yew hewle bikerû.

Enîye beray werişî şî, neyay xele a, xele çîna di rocî. Hesaneke awna yew dûma. Aw dûma dêw bu. Vêca w awca ra veyn da, va ke :

- Şuma kam î, şuma qawî xelê mi çînenî, ez nekay ameya, serey şuma hîrye hemîne wena.

Hesaneke va :

- Beraryênî metersî, awe estû awe dêw û, yenû ma het, ma ra vanû "Şuma qawî enoe xelê me çînenî ?" Şuma çew vengê xoe mekirî. Ez cebabê dêwî dana.

Xele çîna, awnay ke dêw ame, dêwî va :

- Şuma çi kare yî, şuma namey mi neş nawutû ? Ez ke esta ez dêw, ez nekay serey şuma hîrye hemîne wena.

Hesaneke va :

- Efendim îzmê mi bide, ez toe rî yew laqardî vaca.

Dêwî va :

- Lacî mi de vaci.

Hesaneke va :

- Ma hîrye hemîne beray cê yî, ma amay, enoe xele ma etîya di, ma neyay pa çîna, (ma) va helbet wayerî enîye xelî estû, helbet ma rî yew hewle kenû.

Dêwî va Hesaneî ra :

- Lacî mi, aferim biçîne !

Dêw vinert Hesaneî het, Hesaneî ra va :

- Laci mi, te vayş tûray xoe bide mi, ez helye xele çînena, ti gamye roşe, asan be.

Dêwî çîna, Qasim û Şaban hîrye hemîne xele çîna heta nemacî yerî.

Dêw werişt, yew qaxit nuşt, da Hesaneî, va ke :

- Enoe rayer bigî, şue bawnî serî ayê koy, qunaxî mi ha aye koyû, cenîyay mi, hîrye keyney mi ha qunax de roniştey, qaxit bere, bide cenîyay mi, ya zana.

Hesaneî qaxit gerawt, kewt a rayêr, şî. Di sa'atî şî, qaxit akerd wend, awna ke dêwî qaxitî(di) nuştû :

- Eke enoe merdum enîye qaxitû anû keye, mi rî serey enîye merdumî tira ke, mi rî pîlaw pawje, serey enîye merdumî mi rî pîlaw ver ke, berşaw mi rî, ez wena.

Verî, ma bawer nêkerdnîme ki roşan yeno. Labrê yew roj nimajî (şefaqî) ma ki amey hewş ow ma waşt ki zey timoyini, vewra serê hewzi ser ra xo bisurriknîme, nişka ra ma hewzi ro şîyme war. Ma zanaynîme ki hinî roşan amewo, vewra hewzi bin ra helnaya, cora hewzi ma hetanî naki devistîne xo miyan ow ma xapênaynî.

Ebi halê hetanî naki hîybiyayîşê xo, ma hêdikî şîynîme oda ow pey perdî ra tersî û lerzi reydi ma xo marda xo nawitînî me ki halê ma bivîno.

Serdî û tersî ver ma lerziyaynîme. Tersî ma ney ra bi: nêbo ki Bawo fahm bikero. Ow na Dayêya belengazi bî ki şalwarê ma vurunaynî (bedelnaynî), kişta bîni ra zî nequsî hêta ma di tadaynî û destê xo daynî xo ser ro.

Ma lerziyaynîme, cadê xonê tewayî û kewobiyayî rê 'ecêb mendînîme û ma çizzî û nalîya xo dekerdnîme pîzedê xo. Demew ki ma jan û ezêti ver xo tê pîringnaynîme, Dayê bi xo zî pey nî halê ma dejaynî û pencurrî rîy xo ro bîynî.

Labrê çiki bi. Nêbo ki Bawî fahm bikerdînî. Eke ma biveşaynîme, eke bikewtînîme û cay ma bişikiyaynê ow eke ma çî vîndî bikerdînîme; nêbo Bawî fahm bikerdînî. Ow na rênckêşa timoyini maya ma bî ki heme qahr û qotikî bi vatiş bê xo "antînî xo pîze".

Ow roş an enahewa ameynî.

Dayê qandê ma hergû yewî yew çengê xelî yû mercî dekerdînî yew eskura, tede (tey) hîy kerdînî ki zîl bidê. Hergû roj ma tira (ci) hewniyaynîme ow ma gûş daynîme cîfê xelî yû mercî:

– Pis... fis... pis... s...

Şewan Dayê dest bi pînekerdiş kerdînî û pêrdê mi ra vatînî:

– Zeki 'erd eşkara cîf bigîro, ha!

Pêrê min zî zey kesê ki awka serdini ser ro bo, pey serey qelûna xo çeney xo wurnaynî û vatînî:

– Ha. Ee, e girewto.

Ow ma heme bêveng vindertînîme. Hindi bêveng vindertînîme ki hima hima ma vengê sînî eşnewitinîme:

– Pis... fis... pis... s...

Her şewi ma qumbaray xo berdînîme goşandê xo hetî, tê şanaynîme, tira (ci ra) veng vetînîme. Ma waş tînîme pey dêsandê xillikinanê qumbarayan ra, zeredê înan ra bewnîme. Ma xo bi xo ra vatînîme:

– Raş ta çend biyê! Hima hima ki pir biya!

Perey qumbara herkesî, qandê yê bi xo nêbî. Ganî serri di finî yewerî rê cilî bierîniyaynê, kam o ki cilê yê herkesî vîşêr pînekerde bî.

Şewan binê kursî di, erînayîşê cilan sero ma pê kewtînîme:

Piçpiçê Ekber'î eşnawiyaynê ki vatînî:

– Ez vana Esxer! Emser ê min o ha! biray mi:

Ow Esxer'î tikê lebiyayîşî reydi vatînî:

– Par ê to bî biray mi. Qey to vîr nîno. Emser ê min o, wazenî ma pîneyanê xo bihûmarîme.

Duma Ekber'î û Esxer'î dest pey kerdînî hûmaritînî, pey vîşeya pîneyanê xo Esxer'î qezenc kerd, labrê fina zî piçpiç û witwitê înan eşnawiyaynê.

– Piçpiçpiç... par... witwit... piçpiç...

– Witwit... pîne... witwit...

Duma, nişka kursi pêt têş aniya û vengê xirrî yû pufîya kesê ki gilba yê bişidiyo ameynî. Dayê qîjaynî:

– Ya Hezretê 'Ebbas yewbînan xeneqna!

Bawî, ebi yew nunçika ki leheyfî serra daynî Ekber û Esxer'î ro witwit birnaynî.

Yew roj ma dormarey yewbînan di ronîştîme. Ma qumbarey ardê. Dayê zî ê xo ardî. Çeher teney qumberey bî, Dayê pey qedum şikitê. Çend gilangî perey yînî hûmaritê. Duma ebi şik mi ra hewniyay. Perey mi ê hemînî ra kemêr bî. Ez bander bîybiyo ki kes senêwa peran qumbara ra vejeno. Şayî dekewti ma. Milûleya timoyina ki zey yew vîya layê sîyay her gami lewandê Dayê ra bî, hinî nêmendibî. Perey dekerdî pilêşê çarşefa xo ow ma pîya çarşu.

Ca'de çendi rind bi! Dikanê ki kilîncey tede pewjîyaynê. Çi bûyê weşî! Kilîncey ruwenê kelî, reng bi reng şekerî, tîrş û şîrinî, vilînce. Mi xo pîze di vatînî:

– Eke ez gird biyo, bi namebê Hûmay ez ganî peranê xo hemînî bido pey kilîncanê ruwenê kelî bigîro. Mi Ekberî ra va:

– Eke ti gird bibî, ti peranê xo se kenî?

– Ez dano pey tîrş û şîrin gêno. Bi namebê Îmam Rizay ez ganî her şewi şêro sînema. Hergû şewi.

Awka ki fek di ameynî tiro kerdînî û hetî ra zî letey nanîyo ki xo di ard bi, gaz kerdînî. Mi ra persa:

– Raşt a ma key gird benîme?

Mi va:

– Merdim ganî zaf çî biwero ki lezi gird bibo.

Ekberî bi bêhêvîyey va:

– Eke wina wo ma caran gird nêbenîme. Ay dayê ay!

Ma dikanê çakêt û pontoran resaybîme, Dayê wayîrê dikanî di qisey kerd û Esker yê nawit.

Dikandar hindi bi dîqqet Eskerî ra hewniyanî ki to vatînî qey yew heybano yabanî diyo. Weş hewniyayîşî ra pey yew kîşt a dikanî ra yew şeyta barî kaş kerdî ow citey çakêt û pontorîdê wîrdêkî cordê dikandê xo ra ronay.

Eskerî ebi ardimê Dayê, çakêt û pontorî xo ra day û di hîrê nunçikî zî Dayê ra wardî. Gocagê yê ki tivistî, zeki Ekber qirrika yê bigîro bişidêno, xirî yê ra amey.

Dayê rîy xo tada dikandarî va:

– Biray mi, no zaf teng o û weş zî niyo. Yewna biyare. Nika do leyîrê mi bixeneqno.

Wayîrê dikanî, rayna cilî seredê şeyta xo ra kerdî, leqnay, hetî ra çilana xona pîsi pey estuyê xo esteriti ow cor ra citeyna cilî ronay.

Rengê nê çaket û pontoran weş nêbi. Zera Esxerî nêwaştîni ki ma eniyan dey rî (ci rî) bierînîme. Wextano ki Dayê çakêt pira da, Esxerî xo kişta na. Destê xo esti ra nêkerd. Polê xo zaf vîşî berz kerdbi. Herçiqas ki Dayê ebi zor polê yê nimiz kerdîni, Esxerî fina polê xo berz kerdîni. Di-hîrê teney nuçikî Dayê ra wardî. Dayê nuçiki reydi pêt daynî polê Esxerîyê berz kerdî ro. Herdi polê yê ameynê raştê yewbînan, labrê hewna zey verî yew polê yê berz biynî. Esxerî meşka xo va kerdîni ki gocagê yê ta nêfîniyê, hima gocaga peyeni nêpadaybî ki xirrî yê ra ameynî.

Waştişê Dayê sero, na cita zî vurînay. Min û Ekber ma binê çiman ra dikan ra hewniyaynîme. Çi çakêt û pontorê weşî. Goreba mi, goreba Ekberî. Zewbîna cenî zî qeçekandê xo reydi amey bê ki cilan bierînê.

Nişka ra waqî dekewti Ekberî. Waqîda asarêni ki ze biveşo yan zî demaşkul pede do. Herkes nerehet bi. Destê dikandarî lerziyay ow yew çakêt cordê dikanî ra yê ser ro gina. Tersî reydi ma heta Ekberî ra şîyme. Fahm bi ki qeçekan ra yewerî firset ra îstîfade kerd bi ow gazî day bî nanî ro ki Ekberî dest dir o. Ma va qey destê yê gaz kerdo labrê ney, gazi day bî nanê yê tena ro.

Gewz ay qeçekî ra nêmendbi, recefiyaynî, vinderte bi ow zor-çiqiyam nan cawitîni. Mara yê hima hêrsî reydi yew lekmati pa visti û alişka yêya zerdi kerdî zey yew gula suri. Dima piro bî o girewt da 'erro, şalê gedî acêr day ow ebi dindanan hêta yê ya sipî û bêgûnî gaz kerdî. Dayê qahrî reydi cenêki ro qîrray:

– Çirê ti dana qeçekî ro maya mi? Cay kafirey kerda? 'Eyb tede çino.

Duma vera xo Ekberî kerdî ki no sehne ra tersa bi û hêrsî reydi va:

– Tufi bi to bêro! Hey nankor! Çi ciriya! Goştê ganê to ward?

Cenêki qeçekdê xo ro qîrray:

– Gidî parseko veyşan! Ez meşka to parçe kena. La ku şan di pîy to nêro keye. Wa tîra sûrkerda meşkda to ra kero.

Piranê nanî ebi alîya fekî ra, bindê paşkilî di pa'çol bibi.

Hermele nişt û bi raya diyini waştişê Dayê, yew cita çakêt û pontoranê bînan corê dikanî ra roniyay. Munasib bî. Ma ageyrayme keye.

Ma çakêt û pontorî dêsê oda ra leqnayme. Esxer se'etê di di gilangî şî sendoqa werdikeka ma bindê xo nay û tanekê çakêtê xo sa'nay. Hetana ki şewi zî demewo ki ma heme hewn di bîme fek çakêt û pontoranê xo ra vera nêda. Yew parçey qaxidî tanekandê xo ra yewi di dîybi ki tede nuşte bi "36". Ekberî ay qaxid yê ra tirawit ow çend rojî yê sero da'wa bî.

Esxerî vatîni qey ganî ay qaxid timo yê hetî bo. Yewna parçey qaxidî peyda kerd bi, sero nuşt bi "32" ow tanekda xo miyan na bi. Labrê no hîna rind nêbi û Esxer timo maney geayrîni û Ekberî ra lekmatî werdîni. Se gilangî ra vîşêr tanekanê xo ra geayra.

Şewa roşani ebi bûya rizê şutî, ebi bûya ereqê guvdey keynekan ameynî. Ay şewan di vengê "ax" î ameynî. Vengê "ax" î zeki yew dara qoçikêra key cîranî bo ki vişkuwiyaynî. Vengê "ax" î zeki yew koyo pirr aw bo ki vewra yê heliyaynî bîynî aw ow zeki vengê "ax" î Dayê bo.

Vengê tewir bi tewir patpatan û fişekanê hewayîyan ki rengareng şewq daynê, şewa şaristanî têmiyankewta kerdîbî.

Şewa roşanî, qandê mi zaf zerşiktox bî.

Ma yew kujê oda di ronîş tînimê. Bawî pêsero pêsero cixara antîni. Dayê karê rojî ver beteliyaye bî, na heta a heta şîynî ameynî û riz vîjnaynî.

Bawo ma ra nêewniyaynî. Serey xo xo ver na bi. Timo paltoy xo eştîni polandê xo ser û kujê oda di cematkî ronîştîni. Dexeriyaynî. Tebera fuzeyanê qestikênan tarîyê asmênî di xêzî kaş kerdînê. Vengê qîrrî yû hermeley qeçekan berz bîynê. Min û Ekber û Esxerî ma hêdî hêdî ow nimitikî xo antînimê pey camê pencera oda. Ma cîfê xo sêney xo di hefs kerdînimê û pey camê pencera ra ma zêq tebera ewniyayîme. Ma xo xo vîra kerdînimê. Fuzeyanê qestikênan reydi serey ma ver bi asmên berz bîynî, zeki ma bi xo fuzey eyştbîme. Mi vatîni:

– Ay, ay estareyin ê min bi.

Ekberî keyfî reydi vatîni:

– Ay yew zî ê min.

Û Esxer yew fuzeyê bêestarîrê wayir vejîyaynî. Ma ay fuzeyanê qestikênan sero şert kerdînimê ki tira kamî estareyin ê, kamî bêestare yê. Şertkerdiş aver şîynî. Cîfê ma qefesê sêney ma ra vejîyaynî teber û nişka ra Bawo qirraynî, ma tersnaynê û waş tîni ki ma pencera ra dûrî bikewîme.

Ma lezkanî ageyraynîme cadê xo, ebi vengê fişekanê hewayîyan ki rayanê dûrî ra çi nezdi çi dûrî ra ameynê û keyan û kuçan di teqaynê, ma zerweş bîynîme.

Roşan bi. Ma pîza girewt ow ma kutiş ward. Ma qumberey newey girewtîme ow ma pabey serra ki yena vinderîme veynî dora kê ya.

Ehendi ki giraney çakêtê Esxerî sert bi darmarey milê (vileyê) yê sur bibi.

Ta'tîl zaf lezi qediyaynî. Ma binê tanekanê xo ra geyraynîme, wurdîyê kilîncan, mûyan û gemari reydi tira (ci ra) vetînîme û hesreti reydi ma wardînîme. Dayê, Esxerî rê girane deşt û milê yê birînbiyayîş ra xelesna.

Şewanê peyenan, ma ronîştînîme lezi reydi dersê xo nuştînîme û ma bermaynîme. Bermi, qandê rojanê ki ma dest ra şîy bî, qandê şîriney ki hinî çînê bî, qandê ta'tîlê viyartî û qandê dersanê xonê nênuşteyan.

Newe ra şiyayîşê mektebî dest pey kerd. Kursî hinî miyanê oda di nêbi. Zeki ma çiyêk vîndî bikerîme. Piy mi şewan yew kujê oda di ronîştînî. Cixara antînî û şîrê Baba Tahîrê 'Uryanî wendînî.

Çend rojî bi ki Esxerî xo ma ra nimitînî. Nimitikî ameynî û şîynî, kesî di pêro nêdaynî, yarî nêkerdînî. Zeki yew kişta yê felc biyaye ba. Kitabê xo yew kişti ra tebîştînî û ameynî keye. Kesî nêzanaynî çakêtê xo kura (ça) ronano. Gewzê yê kewte, milûl bi, reng pa nêmendbi. Ma di hîna kemî qisey kerdînî. Di-hîrê finî Dayê vat bi wa giraney çakêtê xo biyaro ki a bişuwa, labrê yê vat bi "giraney mi pak o".

Yew roj demewo ki ez mekteb ra ameynî keye, mi embazanê sinifda Esxerî ra Huseyn dî.

Yê xo mi resna û ebi lezi lezi cîfgirewtîşî reydi, lezkanî va:

-Biray Esxerî! Ti zanî se bi Esxerî?

-Ney ez nêzano. Hîna lezi vaje, se biyo?

Dormarey xo ewniya û yew vengê tikê vingvingkerdî reydi va:

-Esxerî yew beya girdî erînaya û dekerda tanekda xo. No yew hewte wo ki taneka yê ra nêvejiyêna ow gama ki sinifi di şino textey siyay hetî, yew kitab nê zî yew defterî xo dir beno ow taneka xo vera nano. Bey zaf gird a. Gama ki sira sero roşeno kiştkanî roşeno wa pey qeçekê ki yê hetî nerehet nêbî.

Zeki yew çî bidê mi ser ro. Vazdayîşî reydi ez şîyo keye mi Dayê ra va:

-Bey tanekda Esxerî di menda ow nêvejiyêna. Dayê demeyki mi ra ewniyay ow дума ki fahm kerd se biyo, nalî reydi va:

-Axxx! Enka bey kotî ra şîya tanekta ay beywerê kutikbavî?

Mi ki mesela ya rê vate, Dayê hina vîşî hêrs bî. No hing di Esxero gewzkewte ame. Kitabê xo taneka xo vera nabi, ebi dexeriyayeyey silam da. Dayê va:

-'Eleykumsilam, 'egîtê mi biye taneka to bivîna.

Esxer recefiya. Rengê yê hîna sipî bi û nişka berma.

Ma çakêtê yê tira vet û koşey oda di rona. Vengê ma ki pêt vejîya, cîranê ma, pîy Huseyn'î yo ki sinifa Esxer'î di bi, cenîya xo ra persa:

-Na barrî yû çizzîya çî ya cenêkî?

Canêki cewabê mêrdey xo da:

-Ê hê, feqîro hima ti pey nêhesiyay! Bey tanekda çakêtê newî yê Esxer'î di menda. Yew hewte esto! Ti kura yî?

Şewî, giran, bêhal û veyşan, zey pêrê mi ameynî keye ow oda ma pîrr kerdîni. Ma bêveng ronîşte bîme, xumîya Aşûra û 'ew'ewa kutikan vîşêr veng nêvejiyaynî. Çakêtê Esxer'î ebi beya girdi ra ki miyanê tanekda yê dir, ma kinarê oda di rona bi. Pîy mi demew ki mesela fahm kerdi, çend ray pêsero cixara anti. Xeberi day Dat Pîr'î ki bêro. Dat Pîr û 'emcinî amey. Ma bêveng yewbînan ro kurri kerdi.

Dat Pîr persa:

-Se biyo, xeyro?

Dayê ebi bêsu'udeya xo va:

-Willay ti xeyr vîni. No yew hewte esto ki yew beya zaf girdi tanekta çakêtê Esxerê nêbiyayî di menda.

Dat Pîr, çakêt ra ki taneka yê zey yew rêş a girdi berz bîybî ewniya û hêrsî reydi Esxer'î ra va:

-«Werrekîna bey loqera to miyan di bimendîni ow ma to ra pak bibîynîme.» Ow dest pey kerd destî reydi a "rêşî" sa'nay.

Min û Ekber'î awa ki fekdê ma di ameybî ma tiro kerdi. Esxer yew kuj di vinderte bi û recefiyaynî. Dayê vera xo yê kerdi û va:

-Nika qinestey to zî şikito. Çira ti nêroşenî nêmendel!

Esxer yew kinar di ronîşt û xo tê pîringna.

Bawo gamî çakêt di xebetîya ow bêhêvîyey reydi Dat Pîr'î ra va:

-Anika senî beno? Weş niyo ki her roj ebi na "rêş" a hêta xo ra şiro(şoro) mekteb. Şarî miyan di weş niyo.

Dayê qahrî reydi va:

-Der bigeyrê (Vera dê) wa hetanî peyniya serri no tewir şiro ki-wa tewbe bikero.

'Emcinî vera xo taday Esxer'î va:

-Hero ti hinda herî benî! Çi karê to bi bey bi, meşka to quli ba, qesebey to to fek ra bêra!

Dat Pîr'î va:

-Yew kardî biyarênê vîno.

Bawî va:

-Ti wazenî se kerî? Ti ma rê girweyêna nêvejê?

Dat Pîrî payî reydi va:

-Ayo ki dest bi karê keno îllehim çî zano ki keno. Îllehim ez do karê bikero.

'Emcinîya Pîrnazê amey va:

-Ti çakêtî lajekî nêdirnî, bela serî ser di ameye.

Dat Pîr zeki nêş nawo, kardî Dayê ra girewti. Ebi recefiyayîşê destanbê xo, kardî dekerdi taneki zerre. Zerdeya bey asay. Ma hemînî milê xo derg kerd, ewniyayme.

Dat Pîr'î nişka ra fek tira vera da, ma ra cigiriya, va:

-Şima nêverdanê tikê roşneya çilay bêra?!

Ow kardî kişta beya asaya ro kerdî, tiro cenay. Nişka ra kardî yê (ci) dest ra seremetiyay û serey yay çakêt ra vejîya teber...

-Axxx...

No "ax" ê ma hemînî bi; Kardî yew kişta çekêtî dirnay bî.

'Emcinî yew lepê xo reydi da Datoy ser ro. Dat Pîr sur bi.

Bey vejîyay bî, labre çî fayde.

Ma heme hêvîşikite ronîşte bîme. Dayê patafîzê pewtey sero kerdînî. Cenîya cîranê ma, serey xo berê oda ra derg kerd zere, va:

-Hûmay kenê, çakêtê Esxer'î se bi?

Semedo ki gewzê ma kewte dî, bê ku pabey cewabî vindera, şî. Vengê yay ameynî, mêrdey xo ra vatînî:

-Ez vana qey na bey yînî rê bîy yew bela. Tikê cadê xo ra têgeyre, şo vîyne hela se biyo, mêrdo!

Ekber û Esxer yew kişti di ronîştîbî û piçpiç kerdînê. Esxerî peynî di bey xo dest vistîbî.

-Piçpiç... witwit... bey bey...

-B... piçpiç...

Ekberî hêdî vatînî:

-Ez yew gazi tena dana piro, bi namebê Hûmay. Yew gazi tik û tena.
Veng tikê biriya û nişka ra waqî dekewti Esxerî. Ekberî bey reydi
engişt ta Esxerî zî gaz kerdibî.

Bawî rê maney vejîyay û herdi (wurdî) mirda xo kutî, hintika yînî veti.

Fariskî ra tadayox : Malmîsanij

(*) *bey*: Lehça Kermaşahî di zî «bey» vajiyêno. Herçiqaş ki Fariskî «bêh» vajiyêno
zî 'eslê na hîkaya di namey hîkaya «Bey» o.

benî : 'elî Eşref Dervîsyân, Abşûran, Tehran (?), Entesaratê Yar Muhemed, çapê
heftom 1358/1979, riper: 39-51

(**) *Aşûra* : Namey Absûran ê mehelli yo. Abşûran yew çem o ki awa yê bûyin a
û miyanê Kermaşahî ra vêrena. Herdi kiştanê nî çemê awbûyînî di keyey estê.

EBI ZAZAKÎ HİKAYA "DUNYA GUZELÎ"*

Kurmancî ra tadayox : 'UMERÊ 'ELÎ
Arêkerdox : A.V. LE COQ

Wextê verê di, koliçî est bî. Di (du) lacekê xo, cenîda xo, mayênda xo pîre est bî. Fuqare bî, her roj şîyê şalagê kolîyê xo ardîn bi di (du) quruşîn (qruşîn) rotîn, pey geçînmîş bîyê. Rojê ancîna şî bi kolîya, darê bin di teyrê pera, şî bi herûne, akêndo dî, ak wedart, ame bi kê, ber(d) bi çarşû. Yahudî va :

-Nê akî bi mi de.

Va :

- Ez nêdana.

Yahudî va :

- Ez seh quruş (qruş) bi to dî (dê).

Va :

- Ti (tu) bi min huwenî ?

(* *Dunya Guzelî* : bi Tirkî ya û ma'na ci "Rinda Dîna" ya.

'Eslê xo di sernuştey na hikaya, yanî namewo ki A.V. Le Coq'î pa nawo winî yo : Hikayetî Dunya Guzelî Fi Lefzî Zaza.

'Umerê 'Elî (Omar ibn Alî : 'Umer Lajê 'Eli), na hikaya 15 ê şubata 1317/1902 di Şam di Kurmanckî ra tadaya Dimilkî (Zazakî). A.V. Le Coq û Yusuf Efendî zî nuşt. Dima A.V. Le Coq'î 1903 di Berlin di çap kerda (b'ewnî : *Kurdische Texte, gesammelt und herausgegeben von A.V. Le Coq, Berlin, 1903, r.:63-65*).

'Umerê 'Elî (ci ra Xalo zî vanê), 'eşîreta Kosan ra wo û 'eslê yê Çermûgij o. Dima şîyo Şam di Mehela Salihîye di mendo. Wexto ki na hikaya tadaya (tercume kerda), hewtay û heşt serre biyo.

Vernîya na hikaya di ebi Almankî û Kurmanckî wina nuştewo :

Notiz des Übersetzers, Omar ibn Ali Kosa, gennant Xalo, über sich selbst, in Kurmanci :

Ez ji Oymaxa Kosan im, welatê min berê Çermûge, paşê rizq û neşîb bi emrê Xodê (Xwedê) çû ez hatim Şamê Şerîf, li Mehella Salihîyye rûdinim, salê min heftê û heşt (in).

Va :

- Ez'ò di sey quruş bi to dî.

Ancîna va :

-Ti bi min huwenê ?

Nîhayet va :

- Panc (pac) sey quruş bi to dî.

Kolîçî ewna va :

- Eke rast a bîya bide.

Va ke "bide pera", panc sey quruş da bi ci. Ard ame xo rê xerc kerd. Sebahna şî bi herûna akî, akê ancîna dî, ak girot ard da bi Yahudî bi panc sey quruş. Her roç (roc) akêndo xo ardî panc sey quruş day. Çend rocî cenîeki berd Yahudî rê panc sey quruş day û amên. Yahudî bi cenîeki mişewrê xo kerd, va :

-Mêrdê to wa şoro herûna ako ki kenû herûna ey di bîrê bukolo, ba'do kesê dano bi teyrî ro urkmîş beno, ba'do şino bi cayêdo bîn aka keno.

Mêrde şino çale keneno, serê ci naxin nano teyrko bêro ak bukero a game gêno yeno bi kê, yem keno. Her roc akî keno. Kolîçî mireno, Yahudî cenîeki rê vano :

- Teyrî sere ci ke.

Cenêk vana :

- Rocê panc sey quruş ana.

Yahudî vano :

- Ya ti ko sere ci kerî ya ez dewrna nîna bi to het.

Cenîeki serê ci kena, pur kena o girênena. Laceko kolîçî sere w bi zerî wenû. Yahudî şew di yeno bi cenîeke het vano :

- Kanê teyr ?

Cenêk bado nana bi vera, vano :

- Kanê sere w bi zerî ?

Vana :

- Lacê mi werd.

Vano :

- Teyrî jî bûre ! Ya ti ko lacekê bikişî, ya ez'ò dewrna nêrî bi to het.

Vana :

- Ez'ò serê ci kerî.

Dapîra laceka bi dizî laceka werzaynena bi şew remnena, vana :

- Maya to bi Yahudîya o ku şima bukişo.

Şîne sūkêna azêne Helebê roşenê. Laceko zerî werde roc di panc sey quruş di piştinê xo di vînenê. Pîrika xo merena, vano :

- Werzê ma şime bi Stambol.

Şîne, ray bi di bi dicay benê, beray zerî werda vano :

- Ti bi na ray de şo, ez'o jî bi na ray de şorî.

Jew şinû bi Misir, jew jî şinû bi Stambol. O ki sere werdo daxilê Misirî bî, Şahî Misirî merd bî. Teyrî Dewletî vera da, şî o ke sere werd bi ey serey sero anişt. Va : "Şaş bî., azmîş bî", tepîa berdi ver da, banê, numitî, teyr vera da, ancîna ame bi lacekî serey sero anişt. Va : "No jî nêbî". Lace(k) kerdî de banê, numitî, teyr vera da, di locine ra ame bi serê lacekî anişt. Lacik berdî, çekî day pira (va) "*Padîşahê ma no yo*", îta'at kerdî ci rê. Ma (Wa) o şahalixê xo bukeroy, ti bêrî o ki zerî werda doxrî şî bi Stambol. Roc di panc sey quruşê xo est bî. Keyneka Dunya Guzelê dînî (dîyînê) xo panc sey quruş bî, her roc panc sey quruşê xo berdî, Dunya Guzelê dîyê. Des û hîri rocî temaşa kerdî. Şewa xo bi hazar bî, hazar day bi ci, şî bi Dunya Guzelî het. Kiş tênda qonaxî pur kerd, peynîya peranê lacekî nîamê. Şewî ancîna şî bi keyneke het, va :

- Ez a to a, tu jî ê min ê, mi het ra meşo ! Araqakê hawt serî mende vî, da bi lacekî, lacekî vêrit, zerîya ci feke ra kewt. Zeri şiti, soli kerdi, daqultenî. Bi ningê lacekî girot, eşt bi teber. Lacek seba ra werişt, tebera o. Ewna bi cêba xo, perey çinîyê, şî bi Dunya Guzelî het, qawurna. Rocê di roca, ewna perey çinîyê, va "Ez'o serey xo wedarî, şorî". Şî, ewna hîre merdimî yenê, Amey bi het, va :

- Sera şinê ?

Va :

- Pîyê ma merd, na sufra, no qamçî, no kuluk ci ra mend, ma bi sero werê nînim.

Va :

- Na tîri b'ertzê, kam şima ra verê resa bi ci, sufra ey a, ê pêynî kulukê ey o.

Tîri eşti.

Hunerê kulukî, kamê nao xo sera, kes ko nêvîno. Sufra ki "abo mubarek" turlu turlu ta'amî ci ra vecî, jew jî nişt to ci bi qamçî piro do, fulan ca min di bî.

Hîre heme bi tîri dima şî. Ey kuluk nao xo sere, nişt o sufra ser, bi qamçî da piro, va :

- Bi Dunya Guzelî hete to wazena.

Ame bi Dunya Guzelî het. Kuluk nao xo sere, kes nêvîno. Biroc pera dukançîya ra tîrenû. Va :

- Dunya Guzelî cemaletê xo bi mi mojena vace, to rê panc sey quruş. Bişew ame, kewt de Dunya Guzelî het. Hawn ci rê bîbi hasret, va :

- "Ez ê to a, ti ê min ê" qandirmîş kerdî.

Va :

- Bêrî pay ne ona sufra.

Pay na sufra, qamçîyê da puro, va :

- Cayê kes çinîyo to wazena, koyêndo îssiz di to wazena.

Bi koyêndo îssiz di rona, rocê-didi bi Dunya Guzelî di kêf û zewq kerdî, ba'do şewê Dunya Guzelî sufra ro nişt, qamçî da piro (va) :

- To di qonax di wazena !

Qonax di peye bî, lacek werişt bi xo ser, ne Dunya Guzelî, ne qamçî, ne sufra ; "ax !" va, kuluk na xo sere vêca, geyra, hewzê dî, ewna hîre gogerçînî bi sero aniştî, xo bi veran kerdî, bî hîre keynekî, kewtî di hewzi, meger keynekê Şahê Perîyan bî. Bi dizê ame, çekê keynekê berdî, kuluk nao xo sere, keyneke ewna merdimî di hetir o. Didîna çekê xo day bi xo ra, peray. A ki di hewz di mendi, sond werd, va :

- Ez îta ra nêvecêna.

Qandirmîş kerd, çekî day bi ci, di (du) perî day bi ci, va :

- Nîna weda, kotî ke ti sixilmîş bîya wîca buweşine ez' o hazir a, ez keyneka Şahê Perîyan a. Her girwe min dest ra vecyênû.

Keyneki lacekî wedana bena bexçê saya mîya, say ci kena dana bi lacekî, beno bi here. "Wax !" vano, "Dunya Guzelî ez hindi mal ra kerda, nara ez kerda bi her." Sayênda bîni da bi ci ancîna beno bi merdi (m), heqîbe say îna ra day bi ci, vana :

- Bere bi qonaxê Dunya Guzelî, bi ci di.

Ano bi qonax cila wesarê erînenû, saya roşenû. Dunya Guzelî bi dima ewna sayêdê hewl î, vana :

- Bîya ez' o hemînê biherîni !

Ana sayê sepê keno, dano bi Dunya Guzelî, wena, bena bi here. Cili nano o ci wesarî keno de serê nerdîwan ra anceno heyano bi Misrî, qamçî û sufra wedano, şino bi Misir. Şahî Misirî qonaxê lacekî rê bugero (?) sîya o ku ba(n)co. Şar barê ano o di barî ano, şew di torbey veng bi sere fineno. Xebere danê Şahî Misrî, vanê:

- Merdimî heywanêndo xo beno, şar barî ano o di barî ano, şew di yem nêdano.

Şahî Misirî vano :

- Veng dê wa bêro !

Veng danê bi ci, vano :

- Ez herê xo nêverdana nêşena !

Xebere da bi Şahî Misirî, va :

- Wa bi herya bêro !

Her and, di nerdîwa ra şî bi Şahî Misirî het, va :

- Lace ti çennê zalimixîne kenî, yem nêdanî bi heywanê xo ? Şar barê ano, ti di bara anî.

Vano :

- Malê min nîyo, ez senî bukerî ?

Lacek nas keno Şahî Misirî berayê xo yo, va :

- Mi rê xawlet buke hîkayetê herê xo to rê bacî.

Va :

Xawlet !

Herkes şî, va :

- Wextê di pîyê min est bî, ma kolî ardîn, rofîn. Rocê di talîya (çalîya) bin di akî vînenû, ano bi panc sey quruş dano bi Yahudî, vano "ti ko teyre bîya bi keye", ano bi keye, pîyê min merenû, maya mi teyrî sere ci kena, berayêndo mino bîn est bî, sere ay werd, zeri ez werna. Berayê min şino bi Misir, ez' o şorî bi Stambol. Dunya Guzelî estebî dînê (dîyînê) xo panc sey quruş bî. Ewwelê ci b'axirê ci ez vana.

Pêşiyay tê ra, va :

- Ti berayê min î, rica kena ti say bi na here dê, ancîna bi Dunya Guzelî bo.

Say dano bena Dunya Guzelî, qonaxêndo newe viraşt, da bi berayê xo, Dunya Guzelî mahre kerd, tuyê keyneka Şahî Perîya veşna, keyneke yena, a hawna Dunya Guzelî rindêr a. A jî berayê xo bînî bi emrî Allahî mahre kenê, çewres depi bi çewres zurna. Bi xo ro mahre kenê, 'emrê peynî kêf û zewq kenê, şinê Yahudî kişenê, maya xo kişenê, tepîya yenê bi Misir, di cenîya xo di kêf û zewq kerdin. Ê resay bi muradê xo, şima jî muradê xo resî (*).

(*) Peynîya na hikaya bi Dimilkî (Zazakî) û Tirkî wina nuştewo :

Temam bî na hikaya, wa bêrî ma şîme jewda bîne.

Hîre (hîri) sey û des û hewt tarîx di *Yusuf Efendî Hikayesi, Musî (Mösyô) Koko Efendi'ye tab' olunmuşdur, fi om (on) beş Şubat 1317.*

Şam-i Şerif de mukayim Salihiyye Mahallesinde Omar ibn Ali ma'rufatiyle bu hikayeyi Zaza lisaniyla tercume Musî Koko Efendi'ye ve Yusuf Efendi vasitasiyla tab' olunmuştur.

ŞEYTAN Û ŞÊXBIZINÎYA

Arêkerdox : KOYO BERZ

Şeytan vano : " însanî pêro zey mi biyê şeytanî, ez'î nêşea kesî bixapeyna, e do se kera, senî bikera ; kê bixapeyna, kê nêxapeyna". Aqildê xo dî ca keno, vano "E do şira Şêxbizinîyan bixapeyna. Çimê Şêxbizinîyan hewna rind nîyabîyay. Ez şena înan bixapeyna". Şino, jew Şêxbizinî vînenno, vano:

- 'Erdê to bol îyê, çirê ti yê nê 'erdanê xo nêkarenê ?

-Ez jew merdim tenîya ya, quwetê mino nêbeno ez 'erdanê xo pêrinî bikara.

- Ez to di bena ortax, bê ma pîya nê 'erdanê to bikarê.

- Beno, bê ma pîya bikarê.

- Ma 'erdan pîyaz bikarê, pîyaz weş perey keno, ma do pîyaz bikarê.

- Beno, ma pîyaz kerê, pîyaz bikarê.

A sere 'erdan kenê pîyaz, wextê pîyaz û çînayîşî beno, Şêxbizinî veyn dano Şeytanî, vano :

- Ortax, bê ma pîyazê xo 'erdî miyan di pê ra bara kerê, bahdo wa zerîya ma pê ra nêmano.

- Beno ortax, ma pê ra bara kerê.

- Ortax bewnî, no serê çî weş o, kiho yo. Wa serê pîyazî ê to bo, no ki 'erdî bin di maneno wa ê mi bo. O ki 'erdî bin dir o nika pêro helisîyayo.

- Wa bo ortax, ti senî vanê wa zey to bo.

Şeytan qelbdê xo di vano "mi Şêxbizinî xapeyna, mi ey rê qazixêdo weş eşt". Şeytan serê pîyazî arê keno, ortedê 'erdî di kom keno pê ser. Şêxbizinî 'erdî bin ra pîyazê zey serandê arwêşî vejeno, beno çarşi di roşeno. Ê Şeytanî bahdê şeş-hewt rojan tepeya pêro helisêno, ke do perê pîyazî se kero, kes nêgêno. Şeytan vano "willi ortaxê min emser mi rê qazixêdo bol weş eşt, ez xapeynaya, serna e do nê heyfî ey ra bigîra".

Beno sera bîni, Şeytan vano :

- Ortax ma emser 'erdan çiçi kerê, çiçi bikarê ?
- Ortax ma emser riz bikarê. Esmer riz weş perey keno.
- Wa bo ortax, ma riz bikarê.

'Erdan pêrine kenê riz (çeltûg). Wextê çeltûgî yû çinayişi beno, Şêxbizini veyn dano Şeytanî, vano :

- Ortax, bê ma 'erdî miyan di çeltûgê xo pê ra bara kerê.
- Beno ortax, ma pê ra bara kerê.
- Ortax, to par seredê pîyazî ra pêro zerar kerd, wa emser serê nê çeltûgî mi rê bo, wa binê ci to rê bo, wa emser jî ez zerar bikera.
- Beno ortax, wa zey to bo.

Şeytan qelbdê xo di vano "par mi serdê ci ra zerar kerd, emser jî ortaxê mi do zerar bikero. Mi emser ey rê qazixêdo bol weş eşt".

Şêxbizini şino sereyê çeltûgî qalûçana çineno, ano ciwenî ser, çarneno, keno riz, beno çarşi di roşeno. Qota ci Şêxbizini çineno, sapê ci Şeytanî rê maneno. Şeytan sapê çeltûgî çineno, arê keno pê ser, binê 'erdî aşaneno, winêno bi rîçandê çeltûgî çiyê çiniyo. Sapê çeltûgî jî kes nêherînenno, Şeytan fina zerar keno, vano "willi emser jî Şêxbizini ez xapeynaya, e do ancax ey di lej bikera ki ez heyfê xo ey ra bigîra". Dano piro şino keydê Şêxbizini, veyn dano Şêxbizini. Şêxbizini vano :

- Ortax ti xeyr ameyê, bê zere.
- Ez xeyr nîyameya, ez ameya lej ! Hele ti mi rê bivijî teber, ma lej bikerê !

- Ortax se bîyo to ? Ti bîyê xînt-mînt ? Hele bê zere, çayêda ma bişimi, ma bahdo lej bikerê.

Şeytan yeno zere, çaya xo şimeno. Şêxbizini vano :

- Ortax, derdê to çiçi yo, ti yê çiçi wazenê, ti yê çiçi ra kemî nêkenê ? Ganê to yo lej wazeno, ma lej bikerê !

- Eeee e ! Ganê min o lej wazeno ma do lej bikerê !

- Wa bo, ma lej bikerê.

Şêxbizini cinîyerda xo rê vano :

- Keçê, şorî axuri ra jew çuwe, jû jî misasî bîya !

Cinîya ci şina, jew çuwe û jû jî misasî ana. Şêxbizini misasî dano Şeytanî, çiwî xo rê gêno, vano :

- Ortax to bol zerar kerdo, ti na misasî bigîr, misasî derg a, zerîya to ya bol veşena, qenê ti na misasîya weş danê mi ro zerîya to bena honik. Wa çuwe mi rê bimano.

- Beno ortax, ti misasî bidi min, wa çuwe to rê bo.

Şeytan misasî gêno, keno berz ki Şêxbizini ro do, misasî gunena maxandê banî ro. Şêxbizini çıweyê xo gêno kewno şeytanî se, mirdîya xo şeytanî kotekî keno, vano :

- La oxil, la kutik, ti kam ê ki ti ameyê mi di lej ?

Şeytan senî keno senî nêkeno, nêşeno misasî Şêxbizinî ro do. Misasî maxandê banîya manena. Şeytan vano :

- Nêêê nê, ma do bivejîyê teber, ma do tebera lej bikerê.

- Xa bo, hadê ma bivijîyê teber!

Vijênê teber, teber di Şêxbizinî şeytanî rê vano :

- Ortax to nê çiwîya bol kotekî werdê, na misasî bênamûs a. Ti na misasî bidi mi, ti nê çiwî xo rê bigîr ki ti nê çiwîya mi ro dê. Beno ki ti heyfê xo mi ra gênê.

Şeytan çiwî gêno, Şêxbizinî misasî gêno. Şêxbizinî senî misasî gêno, di metroy kewno dûrî û repisneno Şeytanî ro. Şeytan na kişta şaneno, a kişta şaneno, nêşeno çiweyê Şêxbizinî ro do. Şêxbizin mirdîya xo Şeytanî kotekî keno û hîrê-çehar caya sereyê Şeytanî şikneno, gûnî kewna şeytanî ser. Şeytan çiwî viradano û remeno, birem ki ti biremê.

Rojê, Pêxember qewman arê keno pê ser. Her qewm ra merdimê yeno Pêxemberî hetî roşeno, en bahdo Şêxbizinî yeno, vano :

- Merhaba Ap Mehmed, ti yê se kenê, senîn ê, çi hal dir ê ? Emrêdê to esto, êgandê xo rê vaji, wa êganê to hal kero.

Pêxember çorşmeyê xo winêno, merdimê ki ci kişta înan ra pers keno, vano :

-Şima nê merdimî silasnenê (şinasnenê), no kamcî qewmî ra ya ?

O vano "nê", o bîn vano "nê", herkes vano "ma ney nêsilasnenê". Pêxember vano :

- Hele mi rê veyn dê Şeytanî, wa Şeytan bîro !

Veyn danê Şeytanî, Şeytan yeno Pêxemberî hetî, Pêxember pers keno :

- Şeytan, no merdim kam o, ti nê merdimî silasnenê, qewmdê to di merdimîdo wunasî esto, kamcî qewmî ra yo ?

Şeytan vano :

- Ez bextê namûstê şima dana, şima ey hetê mina mekerê ! Ey finê na di marda min, wa o fina hetê mina nîro. Ez ey qe nêsilasnena. Ey wexte di fek û zincî û sereyê mi şiknayo, ey di serî mi rê qaxixêdo zey mêxî eşto. Ez ey qe û qe nêsilasnena.

DI ŞAÎRÎ

MALMÎSANIJ

I - HEYRAN XANIMA DUNBULÎ

Heyran xanima Dunbulî herçiqas ki weş nêşinasiyêna zî deraqdê ya di çend kovar û kitabên di ma'lumat dêno (1)

Goreba ki nî kitab û kovarî nusenê, Heyran Xanima Dunbulî, key mîranê Dunbulîyan ra keyna Kerîm Xanê Dunbulî ya. Key yîni, şaristanê Xoy ra bar kerdo şiyê Naxîçevan (Xoy : ewro Kurdistanê Iranî dir, Naxîçevan zî ewro Azerbaycanê Sovyetî dir o). Naxîçevan ra zî key xo berdo nezdî Wurmê (Urmîye, Rizaîye). Dima key xo berdo Tewrêz (Tebriş), wica di mendê. Heyran Xanimi, Naxîçevan di marda xo ra bîya.

Ma nêzanîme ki ki Heyran Xanim key marda ra biya û key merda, labrê na şîra ya ra fahm beno ki wextê çorê (webaya) 1247 ê hicrî qemerî/1831 ê mîladî di weş biya.

Heyran Xanima Dunbulî, na şîra xona Fariskî di winî vana :

"Ey Xoda ! Moslîmîn helak şodend
Nowcevanan be zîrê xak şodend
Maderan delşikeste vo nalan
Morde şüyend behrê ferzendan
Ey Xoda ! İn bela şedîd şode
Ferec ez xelq napedîd şode."

Me'na na şîra Fariskî, bi Dimilkî (Zazakî) winî ya :

"Hûmayo ! Bisilmaney helak bîy
Ciwanî debîy bindê herri

Marê zerşikte û nalayey
Merdan şuwenê qeçekan vera
Hûmayo ! No bela hina vîşî biyo
Zerweşîya şarî hinî vîndî biya."

Heyran Xanimi, nezdî heştay serre 'emir viyarnavo û herçiqaş ki 'aşiq biya zî mêrde nêkerdo. Mihemed Cemîl Rojbeyanî, yew parçey şîra Heyran Xanimi Fariskî ra winî tadawo Kurmancîya Cêrêni (Sorankî) :

"Rê mede be waney hewa w hewesîperest in bêne dîwanit
Xelk le dewrûberî şekir meges dûr exenewe
Gulzar ke xalêk e le çarey gulrengî to da
Dirke le dilî min da, hezim lê ye legel to da le qefesa bim."

Yanî :

"Meverde kesê hewesperestî bêrênê dîwanê to
Şar meyesi dormarê şekerî ra durî fînenî
Gulîstan ki çarey to yê gulrengênî di zey yew şamik o
Tellu zerra mi di, ez sînenî ki to hetî qefes di ba."

Dîwanê Heyran Xanimi di nezdî panc hezarî (5000) beytê Kurdkî, Fariskî û Tirkî bîy. Vîşaney şîranê ya, 'Ebbas Mîrzay Qacar (naîbê seltene) û mar û warey yê sero yê.

Şîranê Fariskîyanê Heyran Xanimi ra yew na ya :

"Ey hosnê to robûde zi kef êxtiyarê del
Pejmorde şod zi hîcrê roxet lalezarê del
Geşte xerab ez xemê to şehre bendê can
Ez dest şod zi firqetê rûyet qerarê del
Çon golşenî ke badê sumûmî ber an vezed
Ez sûzişê firaq, xezen şod beharê del
Ey men fedat, rûz û şebem bî cemalê to
Coz ah û nale nîst konûn kar û barê del
Ez zolf dam saxte, ez xal daneî
Nîrengha birîxtzi behrê şikarê del
Tîrî ke ez kemanê vey ez rûyê naz cest
Hem der zeman niş est bibîn der kenarê del
Yek bar xod negoftî k'ey mobtelayê men
Bî rûyê men çesan gozered rûzîgarê del ?

Nalîd del çonan ke felek gûşê xod gerîft
Ta neş newed fexanê men û ah û zarê del
Heyran ! Ne yek del ez to robûde est an cevan
Der kûyê vey ftade ço to sed hezar del."

Dimilkîya na şîri winî ya :

"La ti ya ki rindeya to qewetê vîjnayîşî (îxtiyarî) mi dest ra
girewto

Rîyê to ra ciyamendişî ver bexçey laleyanê zerri pullisiya
Xemê to ver, şaristanê ganî xirabe bi
Riyê to ra ciyamendişî ver, asaneya zerri nêmeni
Ze gulistano ki vayêdo jahrin serra vêro
Veşê ciyayey ver, wesarê zerri bi payîz
La ez to rê feda ba, roj û şewa min bê rindeya to
Kar û girwey zerri nika ax û nalî vîşêr çîyna niyo
Porê xo ra to dami ronaya, şamika xo ra zî (to) teney rokerdê
(qandê seydbazey rê)
Qandê seyde zerri rê (to) xapî viraşta
Tirkemano ki kemana yê ra, riyê nazî ra erziya
Bewnî a game kişta zerri ra nişt
To qe yew ray zî nêva ki ey zerrdevistaya min
Bê riyê min wextê zerri senî vêreno
Zerri nalay, felekî goşê xo girewtî
Ki qîrîya min û ax û bermî zerri nêşnawo
Heyran ! Ay ciwanî zerra to tena to ra nêgirewta
Yê hetî zey ê to hezaran reydi zerrî kewteye."

II - PÎR ÎLYASO DERSIMIJ

Baba Merdûxê Rûhanî, kovara Gelawêj (çapa Bexdadî) ra neqil keno,
vano ki :

"Pîr Îlyas, Dersimij o. Yew merdimo fazîletin û şairêdo wayîrê zewqî
bi. Bi zîwanê Kurdkî û Tirkî şîrî vatîne û yew Dîwan yê ra pey mendo.

Pîr Îlyas, peynîya seserra 13. a hîcrî di şîyo rehmet ow Amasya (yew
şaristanê Tirkîya wo) di wedarito (dekerdo tirbi)." Ze ki zanêno seserra 13.
a hîcrî, miyanê serranê 1785 û 1881'ê mîladî dir a.

(*) Bewnî nê kitabên û kovaran ra :

Baba Merdûxê Rûhanî (Şîva), Tarîxê Meşehîrê Kord ('Urefa, 'ulema, udeba, şu'era), cildê evvel, Tehran, Entîşaratê Sorûş, 1364 hş./1985, r.:340-341

- Danişmendanê Azerbaycan, r.:126
- Bêhterîn Eş'ar, r.:813
- Meclleyê Ermexan, sal 9, n° 5,6, r.:307
- Maşahîru'l-Kurd, r.:233

M. Law - 10 (A/L.B.), Jinêk Biwêjî Kurd : Heyran Xanimî Dunbulî, Niştîman (Bilawkirewey Bîrî Komeley J.K.), sal : 1, no : 3-4 (Sermawez û Rêbendanî 1322/1943), r.: 29-30 ; çapa newa : Govarî Niştîman, Stockholm, Binkey Çapemenî Azad, 1985, r.:86-87

Mihemed Cemîl Rojbeyanî, "Fermanrewayî Dunbuliyekan le Tewrêz û Dewrû berî da", Karwan, Hewlêr, sal 3, n° 33 (Huzeyranî 1985), r.:22

Nê kitabên corênan ra Tarîxê Meşahîrê Kord ê Baba Merdûxê Rûhanî behsê nî di şairanê Dunbuliyânê bînan zî keno :

SAHÎBE SULTAN XANIMA DUNBULÎ (ŞEHBAZ) : Goreba ki Baba Merdûxê Rûhanî, Asar el-şî'e (cild 4, riper 212) û Xeyratû Hisan (riper 117) ra neqil keno, Sahîbe Sultan Xanim, keyna Kerîm Xanê Dunbulî ya û cenîya Ebu'l-Feth Xan lajê Murteza Qulixanê Dunbulî yê diyin a. Yew xanima zanaya biya, 'ilmê estaran ('ilmê nucûm) sero kitabî nuştî ow şîrî zî vatî. Namey yawo bîn Şehbaz biyo.

Sahîbe Sultan Xanim, nuştisê edebî û sen'etanê rindanê bînan di wayirê hunerê vişî biya, xetê yay (destî reydi nuştisê yay) zî weş biyo. Yew rubaîya Fariskî di wesfe Hesên 'Elî Xanê lajê Feth 'Elî Şahê Qacarî dana. Sahîbe Sultan Xanim, miyanê seserra 13. a hicrî (seserra 19. a mîladî) di weş biya. (B'ewnî : Kitabê Baba Merdûxê Rûhanî, riper 341

XERÎBÊ DUNBULÎ : 'Elî lajê Muhammed lajê 'Ebdurrezaqê Dunbulî, şairan û zanayanê Dunbuliyân ra yew o. Peynîya seserra 13. a hicrî (seserra 19. a mîladî) di jiyawo ('emir viyarnawo). Namey yêwo bîn Xerîb bi.

No şair, xanedananê Kurdanê Dunbuliyânê Xoy û Makû ra yew bi (Makû ewro Kurdîstanê Îranî dir o). Darulfunûna (Unîversîteya) Tehran'î di wendişê xo temam kerd, duma mektebê eskerî di wend 1275 hicrî qemerî (1858-1859' ê mîladî) di Hukumatê Îranî o rişt (erşawit) Paris. Wendişê xo ra pey, Paris ra ageyra Îran.

Kitabanê yê ra yew, aver şiyayîşê Awrûpa sero yo. Yewna kitab zî Firensizkî ra tircumey Fariskî kerdo (no kitab leje Frensa, Îngilistanî û Çînî sero nusiyawo.

B'ewnî : Kitabê Baba Merdûxê Rûhanî, riper 408 (O zî Danişmendanê Azerbaycan riper 285 ra neqil keno).

DI DEYÎRÊ (LAWIKÊ) DERSIMÎ

Arêkerdox : Haydarê Dersimî

(I)

DERÊ LAÇÎ

De hala hala, halê ma çi yaman o,
Ordî ardê ma ser de, dorme qapan o ;
Esker zaf o, cay welaxe ma nêdano.
Qemerê Hesên verê mixara de sare no ra,
Şêrê min o beron o.
Hesê Kalê Goncî kuno qewxa, beşlî ve doşû ano,
Hemê Civê Kêjî persena, xismê tavuran o.
Îvîşê Sey Kalî xo sano darê Pîrxatune,
hem dano pero, hem kî qeydû vano.
Ordî qumandanî xo sano darê anabarê,
durbîn ra nadano
Qumandan vano : "Goş dê, vengê Îvîş î yeno,
hela Îvîş se vano ?"
Îvîş vano : "Zalim, to hîre ordî ardê ma ser de
nêvana axir dîno Îslam o ?"
Îvîş vano : "Heqî ke dest da vî mi,
na wa hen ke danû pêro,
kokê ordîyê to anû.
Ordîyê to ra tek neferî,
na fa ranêverdanû."

Îvîş vano : "Heq adirê aşîron wedaro !
Kes ma Demenan rê "Ala qutare" nêvanû."
Vano : "Aşîro ra vajê, xo de qe şa mebê !
Nika ke teselîya xo, ma Demenan re gurete,
cor de, cêro de ;
na rê fênda şima fênda Hermeniyan
kokê şima bi rê ra ano.

Derê Laçî, Îvîşê mi ha ve çet o,
Şêrê darê Derê Laçî, tede mij û qamêt o,
Dame pêro asmê ra roj vineto.
Qir keme qir nêkeme nêqedîno ordîyê dewlet o.
Merdena Koyî persenê, Ma Demenon rê kêf o, saltanet o,
Ma ra ewro kam ke Derê Laçî de bimiro, roj Îmam Husên a,
Axrete de cay xo cenet o.
Ma dowe pêro hêfê xo yê hot bedelî gureto

Derê Laçî Îvîşê mi, suya hîre
Lerze meke, ravêr meşo, rew memire !
Pî vano : "Aşîrênê ! Heq rê vajê,
Qerş ûna polate ze ke gina ro Îvîşê mi,
Ordîyê Mistîî kêwto Dere."
Maye vana : "Heq ti bena Heqê mina kore,
Merdena şêrê mi rêyna bena zurê."

SEVDÎNO

Şay mi Sevdîno, bira bira Sevdîno,

Şay mi Sevdîno, keko Sevdîno.

Vano : Roj vejîno tifangê ma erzîno,

Mistefa Beg'î durbîn gureto, xo şano qoriyê Hêrdifi,
hurdi hurdi fikirîno.

Mistefa Beg vano : "Xiremalo şale qeremêno,

Sevdîn ra eskerê Urisî dima meteriş ve meteris fetelîno."

Durs vano : "Şa Heyderê mi,

ti hêdi hêdi pero de !

eskerê Urisî zaf o,

qerş ûna min û to ra nêqedîno."

Şa Heyder vano : "Pero de Durso, ma pero dîme !

Dewleta Osmanlî ra ma rê pere vejîno."

Durs vano : "Şay mi, perê Dewleta Osmanlî persena,

fincana qewadê axu yo, nêşimîno...

Perê Dewleta Tirkî persena,

fincana qewadê axu yo, nêşimîno."

Koy Sevdîni bivêşo,

Şa Heyderê mi, ha ve yalê,

Qersûna vera gina ro ci, pey de gureto lifê şale,

Hevalon cineza Şay mi arda Hêrdifo şewtîmal,

Sîya valê.

Gonî dirvetonê to ra şona Şay mi,

Ti hêdi binale.

Termaş e balixî berz o, tede va yeno, vayê vêrî,

Va şaneno semtê kemêrî.

Durs vano " Hevalênê, cinaza biray mi girê dê,

ez bîjerî, wertê aşîronê Dêrsîm ro

ma (maya) feqîre rê berî."

WELAT

FIRAT

Ez ju gul a çolê vêsayî de,
Tu aw a, tu can dana be mi.
Ez domon o, ez paçikon de,
Pîl ke, girs ke, bîya waxtê çekon ke.

Zerê mi de gul, sosun xo (ho) newe keno,
Wela şaye tepa hurdî hurdî vorena serî.
Her çî zerê mi de xo xemelno.
Xeleşîyena ma hona durî, hona durî...

Kun be rayê çetî xo tepa ra verdanû,
Welatî ortê gul, sosun de vînenû ;
Yelkanê yena tepa, dest kena be serî.
Na zalimî zorê qamçiya çura, fetelînê Kirmançîye sera.

YEW DEYÎRA DESTNUŞTA

HESRETA WETENÎ (*)

Weten nemrî, qurban tû ra,
Şemsî weten, mi rî tû ra,
Hesret cî ma, min xeniqî,
Min kerd xerap, bîcan murad,
Zerrî min gûn, adirî can,
Min nêşine, hesret weten,
Serî Saltîk, Tujik, Baban
Ênîyê kon, Koyê Maran
Rojê ma kon, rojê zef weş,
Hesret (a) weten min kerd nêweş,
Çiqas giran bibî nêweş
Şêrî welat, tef bînan weş.

(*) Prof. Qanatê Kurdo nuseno, vano Muzey Etnografîyê Ermenîstanê Sovyetîstanî di bi Dimilkî (Zazakî) çend deyîrê (lawikê) *destnuştey (manuscrit)* estê. Na deyîrî, yew parçey deyîra Hesreta Wetenî ya. Qanatê Kurdo'y no parçey na deyîrî tadawo Kurmancî (Kirdasî) zî:

Weten nemrî, qurbana te bim,
Şemsî welat, bimrim bo te,
Hesreta min cî ra ma, ez xeniqîm,
Min xerab kir, bêcan miraz,
Dilê min bû xwîn, agir li can,
Min naçim (bû) hesreta weten,
Çiyayê Saltîk, Tujik, Baban
Kanî kevn, Çiyayê Maran
Rojê min (me) kevn, rojê zef xweş,
Hesreta weten ez nexweş kirim,
Çiqas giran nexweş bibi (m)
Herî (m) welat, tamam qenc dibi (m)

b'ewnê : Qanatê Kurdo, "Bîr û Bawerrî Niştimanperwerî le Folklor û Edebî Kurdî da", Pêşeng (Govarêkî ramyarî w roşinbîrî ye, rageyandinî nawendî Partî Dîmûkratî Geli Kurdistan derî dekat), sal : 2, jimare : 4 (Kanûnî Yekem, 1983), r: 35.

BİBLİYOGRAFYA DIMİLKÎ (ZAZA)

(IV)

MALMÎSANI

- 264 - Adirin, Umero, "Bêbextî", Hêvî, Paris, no: 5 (Gulan 1986), r: 101-105
265 - Arfa, Hassan, "Kürt Tarihi İzerine", Türkçesi : Şihoğlu; Doğu (Aylık bilimsel dergi), İstanbul, no: 2 (1970), s: 13
266 - Ayre (Mecmuaya Ziwanî), Stockholm, no: 5 (Hezîran 1986), no: 6 (Temuz 1986), no: 7 (İlon 1986), no: 8 (Payizo verên 1986), no: 9 (Payizo peyên 1986), no: 10 (Çile 1987), no: 11 (Adar 1987), no: 12 (Gulan 1987), no: 13 (Agustos 1987)
267 - Berz, Koyo, "Di Fiqrey bi Dimilkî", Armanc, Stockholm, no: 70 (Adar 1987), r: 8
268 - Burkay, Kemal, Dersim (Şiirler), Ankara, Toplum Yayınevi, 1975
269 - Backstedt, Eva, "Mitt Sprak (Dimlî) är som moget vete det måste målas för att överleva", Dagens Nyheter/Runt Stan; Stockholm, 28-XI-1986, s: 17
270 - (Çend Embazên Şima), "Kurdistan Press'i rê (Mektub)", Kurdistan Press (Rojnameya 15 rojîn), Stockholm, no: 2 (8-10-1986), r: 2
271 - Dehuda, Luxatnameyê Dehuda-D, r:186
272 - Dersimi, Vet. Dr. M. Nuri; Hatıratım, Stockholm, Weşanên Roja Nû, 1986
273 - "Dêrsim Cardın dı Bın Singuya de", Armanc, Stockholm, no: 65 (Cotneh 1986), r: 1, 6
274 - Dilêr, Azad; Dıyarbekıro Xopan o, Sinn (Federal Almanya), 1986
275 - 'Ebdurrezaq Begê Necef Qulî Xan, Tarîxê Denabile (destnıvıs, Kutubxaney Matinedaran ê Ermenıstanê Sovyetî)
276 - Eşengin, General Kenan; Kürtçülük Sorunu, İstanbul, Su Yayınları, 1978
277 - Feyrüzabadi, Mecdeddîn; Qamûs el-Mühît, cild: 3, s: 377
278 - Firat, "Folklorê Dersimî ra", Hêvî, Paris, no: 5 (Gulan 1986), r: 105-111
279 - Gökçe, Enver, "Heme bê Herri û Xwi ra Cêr Diyayey", Hêvî, Paris, no: 5 (Gulan 1986), r: 92-94
280 - "Hevpeyvîn", Armanc, Stockholm, no: 63 (Tebax 1986), r: 8,6
281 - Hewramî, Muhammed Emîn, Zarî Zimanî Kurdî le Terazûy Berawurd da, Bexdad, 1981, r: 9, 20, 25-27, 39-40, 54, 57, 68-69
282 - Heyder, "Hiri Goni", Hêvî, Paris, no: 5 (Gulan 1986), r: 97-99
283 - Huznî, Dersimli, "Bir Hikaye", Jîn (Hayat), İstanbul, no: 11 (Şubat 1335/1919), s: 8-11; yeniden basımı: Jîn (Kürdçe-Türkçe Dergi), Arap harflerinden latin harflerine çeviren: M. E. Bozarslan, cild: 3, Uppsala, Deng Yayınevi, 1986, s: 512 (527)

- 284 - Kırzioğlu, M. Fahrettin, **Kürtlerin Kökü**, 1. bölüm, Ankara, Diyarbakır Tanıtma Derneği Yayınları, 1963, s: 20, 29
- 285 - Kıvılcımlı, Dr. Hikmet, **Yol, İhtiyat Kuvvet : Milliyet (Şark)**, Stockholm, Arşiv Yayınları, s: 36, 37, 77, 78, 97, 98, 187
- 286 - Koyo, "Gam bi Gam Uppsala ra Heta Stockholm", **Armanc**, Stockholm, no: 65 (Cotmeh 1986), r: 2
- 287 - Kurdoev, K. K. - Vasilova, Z. A., **Kurdsko-Ruski Slovare / Ferhengî Kurdî (Sorani) - Rûsî**, Moskova, 1983, r: 340
- 288 - Kurdo, Qanatê, "Dimilkî (Zazakî) ya Batûmî" **Hêvî** (Kovara Çandîya Giştî), Paris, no: 5 (Gulan 1986), r: 85-87
- 289 - Kurd, Xortê, "Dayê Welat Bol Şirin o", **Hêvî**, Paris, no: 5 (Gulan 1986), r: 100
- 290 - Law, M (A. / L. B), "Jinêkî Biwêjî Kurdî : Heyran Xanima Dunbulî", **Nîştîman** (Bilawkirewey Bîrî Komeley J. K.), Mehabad, sal: 1, no: 3-4 (Sermawez û Rêbendani 1322/1943), r: 29-30; çapa nwe: Govarî Nîştîman, Stockholm, Binkey Çapemenî Azad, 1985, r: 86-87
- 291 - **Le Jour Nouveau / Roja Nû** (quotidien Kurde), Beyrut, no: 53 (13-8-1945), r: 2; no: 56 (10-9-1945), r: 3; çapa nû: Roja Nû, Uppsala, Weşanên Jîna Nû, 1986
- 292 - Lerch, P. I., "Qawxê Nêrib û Hênî", **Hêvî**, Paris, no: 5 (Gulan 1986), r: 88-91
- 293 - Malmîsanîj, **Zazaca-Türkçe Sözlük** (Ferhengê Dimilkî-Tirkî), Uppsala, Weşanên Jîna Nû, 1987
- 294 - Mes'ûdî, Murûc, el-Zeheb, cild: 1, s: 253
- 295 - Muhemmedî, Muhemmed Salih İbrahîmî (Şepûl), **Jînawerî Zanayanî Kurd le Cîhanî İslamêti ya Gencîney Ferheng û Zanist**, Tehran, Çapxaneyê Meharet, 1364 hş. / 1985, r: 674-679
- 296 - Mukrîyanî, Huseyin Huznî, **Nawdaranî Kurd**
- 297 - "Munzur Dağı Üzerindeki 10 Köy ve 30 Mezra Birleştiriliyor", **Tercüman** (gazetesi), 3-5-1986
- 298 - Nêwerê Bahoz, **Çiya** (Kovara Çanda Kurd e), Ewropa, sal: 5, no: 8 (Befranbar 1970), r: 18
- 299 - Nikitine, B., **Les Afşars d'Urûmiyeh** (extrait du Journal Asiatique, janvier-mars 1929), Paris, Imprimerie Nationale, 1929
- 300 - Nîzameddîn, Fazîl, **Estêregeşe** (Ferhengî Kurdî-'Erebî), Bexdad, 1977, r: 374
- 301 - Pamukçu, E., (Armanc rê Mektub), **Armanc**, Stockholm, no: 63 (Tebax 1986), r: 2
- 302 - Rojbeyanî, Muhemmed Cemîl, "Fermanrewayî Dunbuliyekan le Tewrez û Dewrûberî da", **Karwan**, Hewlêr, no: 32 (Gulana 1985), r: 17-24; no: 33 (Huzeyrana 1985), r: 12-23
- 303 - Ronahî (Supplément illustré de la revue kurde Hawar), Şam, Çapxana Sebatê, Çapxana Tereqîye, 1942-1945; çapa nû: Ronahî, Stockholm, Weşanên Jîna Nû, 1985, s: 323-324, 398, 423
- 304 - Rûhanî, Baba Merdûx (Şîva), **Tarîxê Meşahirê Kord**, cildê ewel, Tehran, Êntêşarate Sorûş, 1364 hş./1985, r: 366, 340-341, 408, 427
- 305 - Sa'dulla, Salah, **Hewle'l-Luxe'l-Kurdîyye**, Bexdad, 1405 h/1985, r: 53
- 306 - Sakaoglu, Necdet, **Anadolu Derebeyi Ocaklarından Köse Paşa Hanedanı**, Ankara, Yurt Yayınları, 1984, s: 47, 50
- 307 - Sakin, Mehmed, "Kürt Tarihinden : Asar-ı Kadimesi", **Jîn** (Hayat), İstanbul, no: 11 (Şubat 1335/1919), s: 3-6; yeniden basımı: **Jîn** (Kürdçe-Türkçe Dergi), Arap harflerinden Latin harflerine çeviren: M. E. Bozarslan, cild: 3, Uppsala, Deng Yayınevi, 1986, s: 508-512 (523-525)

- 308 - Say, Ahmet, "Mehmed Şerif Efendiyo Gorizij", Hêvî, no: 5 (Gulan 1986), r: 112-117
- 309 - Senar, E., "Ter û Ciwan", Hêviya Gel, sal: 1, no: 4 (Ç. Pêşîn 1987), r: 14
- 310 - Şazade (Şehzade) Nadir Mîrzay Qacar, Tarîxê Dunbulî
- 311 - Tarîxê Xoy, r: 136, 153, 156, 173, 178
- 312 - Todd, Terry Lynn, A Grammar of Dimilî (Also known as Zaza), Published by University Microfilms International, Michigan (USA), London (England)
- 313 - Xal, Şêx Muhammedî, Ferhengî Xal, Cizmî yekem û duwem, Silêmanî, Çapxaney Kameran, 1960, 1964; cizmî yekem (r: 25-27), cizmî duwem (r: 212)
- 314 - (Zazaların Nüfusu), 22 Ekim 1950 Genel Nüfus Sayımı (Sonuçları), İstanbul, T.C. Başbakanlık İstatistik Genel Müdürlüğü Yayınları, 1961, s: 142
- 315 - (Zazaların Nüfusu), 24 Ekim 1965 Genel Nüfus Sayımı %1 Örnekleme Sonuçları, T.C. Başbakanlık Devlet İstatistik Enstitüsü Yayınları, s: 5
- 316 - Zekî, Muhammed Emîn, Meşahîrû'l-Ekrad-I, s: 168
- 317 - Zekî, Muhammed Emîn, Tarîxû Duwel we'l-Îmaratî'l-Kurdîyye Fî'l-Ehdî'l-İslamî, s: 383, 385
- 318 - Zîlfî, "Ferhengok : Zazayî (Dimilî) - Kirmancî Serû - Kirmancî Xwarû", Muhsîn Ehmed 'Umer îmlayekey le Lafîniyewe gorîwe w le ciyatî Turkî, Kirmancî Xwarû danawe, Govarî Korî Zanyarî 'Êraq - destey Kurd), bergî pazdehem (1986), Bexdad, r: 235-280
- 319 - "Zonî Ser", Dengê Komkar, no: 13-14, r: 11

دوور نییه به‌شد اربوونی شافرهت ، له کاتیکی گرنگی وه‌کو قوربانی
 کردن دا ، ته‌سیری ژیان و داب و نه‌ریستی ئییران بیټ .
 یان هر بو‌ شه‌ویه شافره‌ته‌کانیان نه‌که‌ونه به‌رچاو ، چونکه زور جار
 موسولمانه شیعه‌کان ژن له شه‌لی حه‌ق دینن . ناشیانه‌وی له ریگه‌ی
 ده‌مه‌وه‌ری و زوربلیبی ژنانه‌وه نه‌ینیه‌کانیان شاکرا بیټ . هر
 چنده‌شو شه‌لی هه‌قانه‌ی ژنیاں موسولمانه ، زور وه‌سپیان ده‌که‌ن
 و ده‌لین به‌ هم‌ووشتی‌وه‌یه‌ک نه‌ینییه ئایینی یه‌کانی شه‌لی هه‌ق
 ده‌پاریزن .

له و شوینه‌دا ، کله‌کاره نه‌ینییه‌که‌ای تیدا . شه‌نجام ده‌دریټ ، تا
 شه‌وساته‌ی قوربانی‌یه‌که‌ دینن ، ریگه‌ی گف‌توگو و ته‌نانه‌ت جگه‌ره‌و
 قلیان کی‌شان و پیکه‌نینیش هه‌یه . به‌لام هرکه هینایان ئیتر باسی
 دنیا‌یی له ناودا . نامینی و بالی بی‌ده‌نگی یه‌کی قورسی تا‌عه‌سه‌ت
 به‌ سه‌رکوره‌که‌دا داده‌دا . ده‌رگا داده‌خه‌ن ، شه‌م‌کاره‌له‌موسولمانه‌کان
 ده‌شارنه‌وه ، چونکه (سه‌لاحی جه‌م) وا پی‌ویست ده‌کات . دووای جی‌به
 جی‌کردنی به‌ شه‌نجام‌در او‌جمع‌بستن " ده‌ژمیردریټ .

مه‌ولووده‌که ، قوربانی‌یه‌که ، گرنگ هر شه‌ویه بخوریټ ، ئی‌تبر
 هر شتی بیټ : شه‌کر ، چکل‌یت ، به‌ران یان گابیټ . سووکی‌و
 قورسیش گرنگیه‌تی روودا وه‌که دیاریسی ده‌کات ، بو‌نموونه :
 مه‌ولووی دووای روژوو ، ناوانانی مندال ، یان که‌سی ، که‌سه
 دی‌ته سه‌ر دینی هه‌ق ، ده‌بی قورس بیټ و به‌شتی سووکسه
 هه‌لناسووریټ . شه‌گه‌ر قوربانی‌یه‌که‌ حیوان بوو ، ده‌بی نیرینه‌بیټ .
 خوینه‌که‌شی له شوینی‌کدا کو ده‌که‌نه‌وه ، تا له سه‌گ یان حیوانیکی‌تر
 نه‌که‌ویټ ، ئیسقانه‌کانیشی دووای کراندنه‌وه ده‌شارنه‌وه .

پاشاوه‌ی شه‌و نووسراوه‌تان له ژوماره‌ی داهاتوی هیوا دا پیشکesh
 ده‌که‌مین .

ئەھلى ھەق ، كاتى باسى بىروباوھ پرى خۆيان دەكەن ، باس لىھ
 سەرھ تاي مەسەلەى ھاورپىياتى دەكەن . خۆيان بە ھاورپى - يازىيەكتو
 دەزانن (رەمزی باوھ پره ، د ، ۵) ، ئەم براپەتى يەشيان بە پاك مېھر
 خۆشەويستى پاك دەزانن (د ، ۱۲) ، كە بەئاشتى و براپەتسى
 پىكەوھ دەژىن . بىجگە لەمەش (باوھ پريان واپە) بە ئەقین ھەموو
 پەيوەندىي نىوان مروؤف و تەنانتەتھەيوانىش بەرپۆھ دەچىست .
 شىوھ يەكى تونىيە و " بلىسەى خووايى " بە ھەرچووار لادا بىلاوھ ، بۆيە
 تەنانتەتھەيوان ئازاردانىش سەرىچى يە لە فەرمانى يەزدان . ھەر
 بۆيە ئەسەلانى ئەم " براپەتى ھەقە " دژى كارى خراپن . ئەو كىلارە
 بە دانەى پاكى رەوشت دەشىوئىن ، لە بىنرە تەوھ دژى كەسايەتى و
 خووايەتى شاخوشىن .

ئەگەر كەسانى ئەم مەزەبە ، گوناھى بچكۆلە بكن ، ئاگادار
 دەكرىنەوھ و دەبىي لە گوناھەكانىيان پەشيمان بىنەوھ . بەلام لەكاتى
 گوناھى گەورە كردندا ، ئەوكەسە لە رىزەكانى خۆيان دەردەكەن ،
 ھاورپىكانى لىي لووتە لادەبن و وازى لى دىنن . (ئەوكەسەى گوناھى
 وەكو پىاو كوشتنى لى روودات) . لەم حالە تانەدا پەشيمان بوونەوھ و
 تۆبە كردنىش ھىچ دادىك نادات . كەواتە رەوشتى بەرز بىسەردى
 بناغەى ئەم مەزەبەيە ، ئەو راستىيە يە ، كە ئەھلى ھەق ھەولى بو
 دەدەن و بۆى تى دەكوئن .

ھاورپىيايەتى لای ئەھلى ھەق ، خەسپەتى داب و نەرىست
 وەردەگرىت . گرنگترىنى ئەم داب و نەرىتەنش لای ئەوان ئەوھىيە ،
 كە كومەل پىكرا جى بەجىي دەكات .
 كورى قوربانى كردن ، گۆرانى بە ئالەتى موسىقاوھ ، بەچەپلە
 لىدانەوھ ، وای كردووه ، كە موسولمانەكان بەند و باوى ناشايستەى
 مەزھەبى بو ئەھلى ھەق ھەلبەستەن .

قوربانى - نىياز (دىرى ۲۳ ى شىعەرەكەى رەمزی باوھ پره) ، بە
 دوو شىوھ دەبىت : واجىب و سوونەت . ھەموو رووداوىكى كرىنگى
 لە بابەتى : لە داىك بوون ، مردن ، شاپى ، روژوو قوربانىيان بو
 دەكرىت . ئەمە تا رادەيەك دەورى نوپژى لای ئىمە دەبىنى . ئەم
 حالە تەنەش ھەموو ھۆى خۆيان ھەيەتەركى ئابىنى ونھىنى يان ھەيەو

گرنگترین لایه نی ئایینی ئەهلی هەقیش . قوربانێیەکه لە هەموو وەخت و کاتیگدا . دەتوانرێت بیکرێت . دەشبێت بەلگەی تەواوی دڵسۆزی و باوەر قایمی کەسی قوربانێ کەر ، کە پێشکەشی هاو ئایینهکانی دەکات .

لە هەر دوو حالەتەدا . (واتە : واجیب و سوونەت) دابیی قوربانێ یەکه وەکو یەک جۆر بە جۆر دەکرێت . لە رۆژێکی دیاری کراودا ، هەموو ئەهلی هەقی گوندەکە ، بۆ بەشداریی کردن لەم ئاھەنگەدا ، بانگ دەکرێن و لە شوێنێکی وا شادا کۆ دەبنەوێ ، کە جێگەی هەمووانی تێدا بێتەوێ . چونکە نە مزگەوت ، نە کەنێسە و نە جێگەیەکی لەم بابەتە لای ئەهلی هەقی نییە بۆ بەخشینەوێ قوربانیش رۆژی یەک شەممەیان لای پەسندە . هەرچەندە هیچ لە رۆژەکانی تر جێگەیان ناکرێتەوێ ، بەلام زیاتر ئێمیان بەلاوێ باشە ، دەلین :

یەک شەممە تاکەن ، زاتەش بێ عەیبەن
سەری (بەلا بەل) ، کارخانە ی عەیبەن

لەم کۆبوونەوێدا هەموو ئەندامە دڵسۆزەکان بەشداری دەبن . بە تایبەتیش ئەو کەسە بەتەمەنەنەنی نەک هەر لە باو پیریانەوێ ، ئەم شەرفەیان بۆ ماوێ تەوێ ، بەلکو خۆشیان بە کردەوێ و هوشیارییان لەگەڵ گیانی حەقیقەتدا دەگونجێن . ئەو کەسانەش کە لە باوەر و ئایینیکی ترەوێ دینە سەرباوەری ئەهلی هەقی . دووای ئەوێ تەساقی دەکرێنەوێ و لە دڵسۆزییان گومان ناکرێت و دەردەکەوێ ، کە بە شیوێیەکی وەختی نەهاتوون ، ئەوسا دەتوانن ئامادە ی ئەم کۆرانیەبن . چونکە کەسانی وا هەبوون ، هەر بۆ فزووولییەت و بە ناراستی هاتوونەتە ریزەکانیانەوێ . نە منداڵ و نە هەرزەکار و نە ئافرەت ، هەقی ئامادە بوونی ئەم کۆرانییان نییە . بەشداریەبوونی ژنان شتیکی سەیرە ، چونکە بە ووشکی لە گەل ئافرەتاندا ناچوولێنەوێ . هەمیشە لەگەڵ پیاواندان و تەنانەت روویان بێجگە لە (شار عەممە) لە بێگانهش ناشارنەوێ . (۱)

۱ - کەسانی سەر بەم مەزھەبە تەنیا یەک ژن دینن و تەلاق دانیش
لە ناویاندا نییە . وەک هەموو کوردەکانی تریش (تەنانەت ئەمەلای
تورکەکانی ناوچە ی هەمەدانیش باوێ) ، کە بە کومەل ژن و پیاوگۆرانی
دەلین . ژنیش وەکو پیاو مافی دەستە سەر راوەشاندنی هەیە .

سه سلهی تووانه وهی زاتی خواا له هه موو گهردوون و دنیا دا ، واز له خوئی و ژیا نی دنیا یی هیان ، سه رنج دانه گه وره یی و شکوئی یه زدان ، ره تکرده وهی ئایینی سه رزاره کی و به رووالت - که خواا پیویستی پی نییه - له سوفی یه تا شتیکی سه یر نییه و ئاشکرایه . ده توانین به پاریزه وه بلین ، که ئه مه له بیرو باوه یری ئه هلهی هه قه وه نزیکه . ووشه ی حق یان حقیقت ، یه کیکه له زارا وهی سوفی یه کان . لای سوفی یه کان ، حقیقت ئه و حاله یه کاتی ئینسان پیش مرجن ، له خواای خوئی نزیک ده بیته وه و تییدا ده تویته وه ، به م چیژی له یه زدان نزیک بوونه وه یه ، شاد و کامه ران ده بیته .

← رومی ، که بچی له مالی ئه رمه نیه ک ، یان جووله که یه ک قای شهبه راب بکری و بیه نی . هه رچه نده جه لاله دین زور لای سه یر ده بی ، به لام بی سی و دوو فه رمان به ری رابه ره که ی به چی ده هی نی . جه لاله دین به خوئی و سوراجیه شه رابی سه ر سه ری وه لووتی به لووتی داروغه دا ده ته قی ، لای ده پرسن چی پی یه و بو کوی ده بات ؟ جه لاله دین زمانی ده چته کلله و هیچ وه لامیکی بو نادرته وه . له شیرزه ییدا شه رابه که ده دات به داروغه ، ئه میش بونی ده کات و ده دات وه ده سی جه لاله دین و پی ده لی : بوو جه لاله دین واقی ورده می نی . ده بی نی شه رابه که بووه به ئاوکی ئالی زور به به ها و نرخ .

((جاریکی تر)) شه مسی ته بریزی له گه ل جه لاله دین دا " له ته ورینز " پیاسه ده که ن . جه لاله دین فریای ئا ور دانه وه ناکه ویت ، شه مس له چاووون ده بیته . له پر دا جه لاله دین ده بیستی ، که له سه ر دوورترین مناره وه شه مس بانگی ده کات " وه ره بو لام . جه لاله دین به په له سه رووه و مناره که ده روات و ده بی نی ، که شه مس له سه ر مناره که وه ستا وه . تا جه لاله دین به په لکانه کانا سه رده که ویت ، شه مس وون ده بیته وه . له ئه و په ری شاره وه چریکه یه کی تر بیت : " جه لاله دین وه ره بو لام ! " .

۲- ده رباره ی پروانه :

Clement Huart, Journal Asiatique , VIII serie , tome VI , P.513
Dorn. Mélanges Asiatiques, V , 418.

ته بریزی (۱) و تا هیریش دتیت ، (۲) که هیشتا نووسه ریکی که م ناسراوه .

۱- شهلی هق زور با وه پریان به وه ههیه ، که شمسی به بی باوک لهه دایک بووه و دایکشی دووای تم مندال بوونه ، ههر به کچیتسی ما وه ته وه .

باوکی دایکی شمسی جاریکیان ، له سر کانی په ک بیان له که ناری رووباریکدا . ده بی ، ده که ویتته سه رنجدانیکی قوولته وه . له پریکدا . هه ورپیک پهیدا ده بیته و لیزمهیه کی به خور داده کات . باوکی شمسی له بهر بارانه که دا داده نیشیت و سهیری ته و بلقانه ده کات ، که به هوی دلوی گه وره گه وره ی بارانه که وه ، له سر ئاوه که پهیدا . ده بن . یه کی له و بلقانه ده گری و دهیکا ته شووشهیه که وه ، سه ری توند توند قایم ده کات و له ماله وه له په نایه کدا . دهیشاریته وه . چند سالییک راده بووریت ، باوکی دایکی شمسی خوی بو سه فهریکی دوور کو ده کات وه . له کاتی دوعا خوازیدا . به کچه که ی ده لی ، که شووشه که بیاریزیته و نه خله تابیت و به هیچ شیوهیه که ته و ئاوه ی تیدایه تی بیخواته وه . ئاشکزا و نیاره ، ههر دووای له مال ده رچوونی باوکی ، کچه که یه کسه ر دلویه ئاوه که ی خواردوته وه و دووای نو مانگ و نو روژ و نو سهعات کورپیک واته شمسی بووه . ههروه ها ده لین ، با پیری پیش له دایک بوونی شمسی گه را وه ته وه و یه کسه ریش زانیویه تی مه سه له چی یه . ئاخو ئه مه همان له دایک بوونی عیسی کوری مریم ، له گیانی پیروژ نی یه ؟ ((شایانی باسه له و " سه رئه نجام " ه دا ، که ف . مینورسکی کردویه تی به رووسی همان روودا و ههیه ، به لام به شیوهیه کی تره ، لیتره دا (دایکه جه لیله ی) کچی (میرزا مه عنا) له باتی ئا و ، چه پکه تیشکی قوت ده دا و ئه مه ده بیته هوی سک پر بوونی ۱۹-۲۴ . بی گومان ئه مه ش روودا ویکی دوورودریزه و پیویستی به زیاتر له سه ر نووسین ههیه . وه رگیر))

له نا و هه که کانداه رباره ی شمسی ئه فسانه ی زور هه ن . بو نومونه من خوشم ئه مه م لی بیستوون ، ده لین : له ئیزاره یه کی زور خوشدا ، دووای روژ ئا و بوون ، له " ته ورپیز " جه لاله دینی رومی و چه نده که سیکی تر لای شمسی ته بریزی ده بن . شه مس ئه مر ده کات به جه لاله دینی

نه خوینده واره کانیندا. بلاون و هه رده م هه لیان ده گرن و ده یار پارا یزن ۱.
 نه وکسانه ی ئه م شیعرانه یان داناوه ، هه ندی له که سانه ی
 نه هلی هه ق-دیده داریان پی ده لین * . ئه م دیده دارانه زور به توانا
 و زیره ک بوون ، چاکتر له جه وهه ری ئه مه زه به گه یشتوون و توانیویانه
 بو خه لکی تری لیک بده نه وه . له بهر نه وه ی خو یان زور ئایین قایم
 بوون ، بوونه ته ره مز و سه ره شقی هاو ئایینه گانیان . هه ندیکه یان
 کورد و هه ندیکه تریان فارس بوون .

ئهم ناوانه : ته یموور ، شیخ ئه میر ، سه ری به روکه ، لاچیک ته نیئا
 له کوردستان دانا سراون ، ته یموور له ناویاندا به دژبه ئیسلام
 ناسراوه . ئهم ته یمووره نه ک هه ر حاشای له وه نه گردووه ، که
 نه هلی هه قه ، به لکو له گه ل موسولمانه کاند له سه ر بنه ماور یبازی
 ئایین ، هه میسه خه ریکی ده مه ته قه و دووان بووه : ته یموور لای
 وابووه ، که نابیی به روا له تی ئایینه وه بنووسی ، به لکو ده بی
 کروه که کی تی بگه ین * . هه ر له م روا نگه یه شه وه شه ر یعه تی به
 ته له که بازی و ده سپزین ناو بردووه ، که به هویه وه - وه ک ئهم
 پیشینی کردووه - تاعوون و برسیه تی بلاو ده بیته وه . وه ک
 ده گینه وه : پیشینی یه که ی (بو روودانی شه وکاره ساتاننه)
 ها بووه ته دی . له سه ر ئه مه سی ۳ سال له مه وه بهر له گرماشمان
 ته یموور یان له سیداره داوه .

له گه ل ئهم نووسه ره کورده " دیده دار " انهدا ، ناوی هه ندی
 له سوفیه ناو داره فارسه گانی وه کو جه لاله دینی رومی و شه مسی

- ۱ - کابرای له مه رمن نه خوینده وار بوو ، نه یده توانی شیعه کانه م
 بو بخوینته وه . منیش به و ده م و ده سته نه متوانی سه ر یان لی ده ربکه م ،
 هه ر چه ند کردم و کوشاشم کابرا پیی نه فروشتم .
 * له هه ندی له ناوچه گانی کوردستانی باشوور پییان ده لین : چا وکراوه ،
 چاوی کراوه ته وه و حقیقه تی دیوه .
 ** ئهم بیر هه ش هه ر له بوچوونی سوفیه کانه وه نزیکه . - و -

ئەوانەى ئىران ھىچ نازانىن . زىاتر مەبەستىم لە ماریفەتەكەيانە* ،
نەك لە داب و نەرىتەيان ، بۆيە دەبى چاوەروانى دەركەسەوتەن و
دۆزىنەوەى ئەدەبى نووسراویان بکەين .

ئەھلى ھەق لایان وایە : روحى شا خوشین ، چەندین جار و لەکاتى
پىویستدا ، لە گىانى ئەم و ئەودا لە دنیادا پەیدا بوو . بـ
نەوونە بابا تاھىر ، کە ھەستى کردووھە ھىزىكى ناٹاسایى و نـ
لە گىانەدا پەیدا بوو ، بەدەمى قودرەتەى خواوھە ھەقى بەھىنان
کـردووھە .

ئەمەيە بە شىوہەيەكى گەتتى بىروباوہرى ئەھلى ھەق و ماریفەتەيان
دەربارەى چوئەتەى ژيان و بەرىوہ بردنى . بۆ ئەم مەبەستەش
" سەرئەنجام " دانراوھە . بە داخوھە ، نەمتوانى لە ئەھلى ھەقەکانى
وہر بگرم . لە دىرى ۱۶ ی " رەمزی باوہر " کەدا ، باسى ئاوى کەوسەرى
بەھەشت و ئەركى سەرشانى مووسا وەك خەزەندارى خوا - کلراوھە .
ھەندى ھىماى دەربارەى ئەوہى خوا لە گوناھان دەپرسیتەوھە تىدايە ،
لام وایە ئەمە تەئسىرىكى باوہرىوونە بەودنيا (۲) .

پرسىارىك دىتە گوپى : ئاىا ھەقەكان كەتتەى ئايىنى پىروۆزى
خۆيان ھەيە ؟ كەبزاى ئەھلى ھەق ناساوى مەدەيووت نىمانە .
لە باتى ئەوھە ئەدەبىكى دەولەمەندو شىعەرى ئايىنى يان بەدىالىكتى
گوۆرانى ھەيە ، كە پەراوۆزىيان بۆ كراوھە و زۆر بەي لايەنەكانى شى
كراوھە تەوھە . مەن بەشىكىم بە چاوى خۆم دىوھە . ئەم شىعەرانە بايەخىكى
ئىجگار زۆزىيان ھەيە ، پارچەكانى تەنانت لەھەنـ

* مەن لە باتى " تەعالىم " ووشەى ماریفەتەم بە كار ھىناوھە . ماریفەتەى
پىر شالىار دەلێن . لام وایە گونجا و بىت ئەم ووشەيە بە كـ
بەپنن ، سەرچاوەكەى ھەرچى بەك بىت .

۲- ئەھلى ھەق بە مەلاىكەى مردن ئىسرافىل دەلێن ماسەف .
لە راستىدا . مەلاىكەى مردن عىزرائىلە ، نەك ئىسرافىل ، كە وا لـ
نەفخى سوور دەدا و دنيا ئاخەر دەبى . وەرگىر .

"ئەللام ئەلىيەن" (د، ۲۱۰). بىي گومان نابىي بە ووشك و برينكى ئەم
مەسلانە لىك بەدەينەوہ . چونكە وەھا لىكدانەوہ يەك دژى پاىيە
ھەرە بەرزى شا خوڭشېنە " (۱)

لەم قسانەى پيشوودا، ريز و دلسوزبىيەكى بە ھيز ھەيە بوئەو
(واتە بو ئىمامى ئەلى)، بەلام قەت ناگاتە رادەى شەوہى، بىيە
سەرچاوە و سەرەتاي خووايەتى بناسرەيت . ھەندىكى تر باوہريان وايە،
كە شاخوڭشېن رزگار كەرى ئەلى و كەسانى ترە . بە تايەتى پاىيە
داوود، يان ئىبراھىميان زور لابرزە . كەواتە ئىستە بوئمان روون
بوويەوہ، كە ووشەى ئەلى دانە پال ئىلاھ ، ئەگەر بە ماننا
حەرفىيەكەشى بە كاربەيت، ئەوالە (جەوھەر) دا ئەلى ھەر لىيە
پلەي يەكەمدانىيە . يەكەمىن خوواوہ نەكارە ، دوواى ئەم بنىامىن،
داوود و خەلكى تر دىن .

ھاتنە دنيا و دەرکەوتنى ئەلى-خووا ، لاي ئەلى ئىلاھى يىيە
ئەسلى يەكان و نووسەيرىيەكانى سوورپا، بە بىي واسىتە و راستە و
خوڭشېن . لەبەر ئەمە جياوازييەكى گەرە و بنەرەتى . لە نيوانياندا
ھەيە (واتە لە نيوان ئەھلى ھەق و ئەلى ئىلاھى و نووسەيرىيەكاندا)،
رەنگە ھىشتا زوو بىيەت بو ئەم بەراودو رادەربىنەسە ،
زانپارىشمان لەم رووہوہ زور نى يە ، چونكە ئەگەر ھەندى شىت
دەربارەى نووسەيرىيەكانى (۱) سوورپا بزائىن ، ئەوا دەربارەى

۱ - رەنگە ئەلى و ئەلو لە بەرانبەرەكدا دانان رىكەوت بىيەت .
ئەو ناوہ بە بىي سەرە بە دوواى يەكدا . ھاتنەى " رەمزى باوہر " ەكە
زىاتر بە رووالەتە و چ پەيوەندىيەكى جەوھەرىي بە ناوہ پوكى
تەعبىرە گورائى يەكان و ئەوانەى قورئانەوہ نى يە .

۱ - لاي ھووات لە گوڭقارى :

"Journal Asiatique , VII serie, tome XIV.

P.P.191-261 "La poésie religieuse des Nosairis" .

باسى ھەموو ئەو سەرچاوانە كراوہ، كەتا سالى ۱۸۷۹ دەربارەى
نوسەيرىيەكانى سوورپا نووسراون .

بېجگه لمه‌ش ، دهر كهوتنى هم رابه‌رانه چهند هوپه‌كي تريشي هه‌بووه ، بو نموونه به گه‌ل شه‌وه‌شدا هه‌موو شاده‌میزاد پي‌ك په‌يوه‌نديه‌كي شاكراي له‌گه‌ل شاخوشيندا هه‌يه ، به‌لام له دنيا دا دووسره‌تاي دوژمن به يه‌كتريش هه‌ن - ژيري و شاره‌زوو . يه‌كه‌ميان سه‌زچاوه‌ي هه‌موو چاكه‌يه‌كه ، به‌لام دووه‌ميان شينسان بو ريگ‌اي خراپه هان ده‌دات ، چونكه مروف تا راده‌يه‌كه له كرده‌وه و كاري خوځدا سه‌ربه‌سته . له شه‌نجامي هم مملاني‌يه‌دا جارو بار سه‌نگه‌كه به‌لای شاره‌زوودا ده‌شكيته‌وه و فه‌رمانی خودا پشت‌گوي ده‌خریت ، مه‌فه‌وومي راستي و چاكه هه‌مووي پيچه‌وانه ده‌بيته‌وه . له وه‌ختی وانا هه‌موار دا ، بو زيندكردنه‌وي ياسا و راستي و چه‌سپاندي بايه‌خي هيژه نه‌مرو پيروزه‌كه ، خه‌لكيک په‌يدا ده‌بن ، كه گيانی شاخوشينان تيدا ده‌رده‌كه‌وي ، شه‌مانه له ره‌شه خه‌لكه‌كه جياوازن ، كه‌ساني وه‌ك (شاورام) ي رزگار‌كه‌ري عه‌لي و هي تريش . شه‌وه مه‌سه‌له‌يه‌ش زياتر له‌وه‌وه هاتووه ، كه شه‌هلي هه‌ق له كوي ژياون و له‌گه‌ل كام باوهر و شايينه‌كاني تودا كه‌وتوونه‌ته به‌ربه‌ره‌كاني و به‌كزي يه‌كدا چون . شه‌مان هه‌ر شه‌منده . عه‌لي له لاين خووايه . شه‌گه‌ر هه‌ر بو شه‌مه‌ش پييان بووتريت عه‌لي شيلاهي ده‌گونجيت ، كه پيشيان بووتريت : عيسا شيلاهي ، شيراهيم شيلاهي ، چونكه لای شه‌مان ، عه‌لي هيچ له عيسا و شه‌ميش هيچ له شاورام گه‌وره‌تر ني يه . له‌م رووه‌وه شه‌هلي هه‌ق به ريك و ره‌واني باسيان ك‌ردوون و هه‌موويان ده‌به‌نه‌وه سه‌ر شاخوشين .

له‌م په‌يدا بوونه به‌رده‌وامه‌ي خووايه‌تيدا له سه‌رزه‌مين ، له سه‌رده‌م و شويني جياجيدا . هه‌نديك به شانازی‌يه‌وه زياني پر له داهيذاني خوځيان ، له فارسي ته‌رخاني دوزينه‌وه‌ي راستي‌كردووه ، هه‌ر بوپه‌ شپوه‌ي جياواز و جوراو جوري هم ريپازه په‌يدا بووه . جياوازي يه‌كه‌ش زياتر هه‌ر شه‌ويه ، هه‌ر كومه‌له‌وه‌كه‌سه‌وه ده‌ر كه‌وتني يه‌كيك له شه‌سه‌كاني له شه‌واني تر لا پيروزتره و به سه‌روكي خوځي ده‌زاني . بوپه ناوي عه‌لي له ناو شه‌و ناوانه‌ي لای شه‌مه‌ دا به‌م شيوانه دووباره ده‌بيته‌وه : " بي گير جه‌عه‌لي شه‌ه‌دي ني يه‌ن " (د ، ۱۸)

خو او وند له هه مووشتیکدا خوئی ده نویتئی .

هه رچنده هیزی خو وایی له هه مووشتیکی دنیا دا هه یه ، به لآم

چارو بار شاخوشین ، له شیوهی ئه م و ئه و دا ده رده که وئ (۱) .

دو وای ئه وه ی دنیا دروست بووه ، له شیوهی بنیامین (د ، ۱۰) پیر دا وود

(د ، ۸) ، مووسا (د ، ۱۰) دا ده رکه و تووه . ئه مانه یاسا

با وهر و ژیان و داب و ده ستووریان داناوه ، به کورتی یه که ی

ژیانیان هی ناوه ته کایه و به ریگای راستا بردوویانه . ئه رکی ئه م

و جووده نه گوږا وانه چی بووه ؟ زانیاریی ته و اویان لانی یه .

له شیعه رکانی لای ئیمه دا : دا وود ، رانمایه ، مووسا ، خاوه ن ده فته ره

هه روه ها ده فته رداری غه بییشه (۲) .

دو وای ئه وه ی ئه م رابه ره خو وایی یانه یاسا و داب و نه رپتینان

بو خه لک داناوه ، ژیانانی دنیا یی خو یان کو تایی پی هی ناوه

چوونه ته وه شیوه ی جارانیان و گه را و نه ته وه سه رچا وه بنه رپه تی یه که ی

۱- کاسی باسی ده رکه و تن هاته پی شه وه ، کابرای ئه هلی هه ق زارا وه یه کی

سه بر (بلباس آمدن) چوونه به رگیکی یه کیکی تره وه ی به کار

هینا . (لای ئه هلی هه قه کانی کوردستانی باشوور - دوونا و دوونسی

پی ده لین - و -) .

۲- لای Gobineau ۱ . ل ۲۴۸ . ئیش و کار و ئه رکیان زور به ووردی

دابه شکرا وه ، هه ر له گه ل ئه واندا شه خسی چو واره میش (پیرۆزه ر) هه یه ،

که هه مان ئه رکه و ده وری هه یه . Pelteman ۱ . ل ۳۶۲ ، هه ر باسی

سئ که سی پیرۆزی بیستووه : بنیامین ، دا وود ، یازکار ، له زاری

وه باسی چو واره میش ده کات . ل ۲۶۴ . هه رچی یاز کاره ، ئه وه

(با وه یادگار) ه ، که له لاپه ره (۳۱ - ۳۲) دا باسی ده که ین . سه ییر

له وه دایه ، له هه ردوو سه رچا وه که دا ، خو وایه تی له که سی چو واره مندا

ده رده که ویت . من لام وایه (پیری پیشنوم) (دیری ۷ ره مزی با وهر)

ها وری ی چو واره می بنیامین ، دا وود ، مووسا بیت . یه داخه وه اکا برای

ئه هلی هه قی له مه ر من ده رباره ی (پیری پیشنوم) هی چی نه

ده زانی و هه روا به نادیا ریی و ته ماوی ده مینیته وه .

تۆ کردوووه و پېی ووتوووه : " قسه کانی تۆ گومرایی و کوفرن، جگه له خوای پاک و ته نیا، خووا یه کی تر نیه ". له کاتی قسه کردندا، حه زه تی عه لی ، موحه ممه دی به شمشیره که ی کردوووه به دوو که رته وه . دایکی موحه ممه د کردوو یه تی به شین و گریان، عه لیش دلی به دایکی سو تا وه و موحه ممه دی زیند و کرد و ته وه . له کاتی زیند و بوون دوه ئه د . دیسانه وه به راشکاوی ووتوو یه تی : " من هه ر سوورم له سه ر ئه وه ی، که عه لی خووا یه و ته نانه ت مردنیش ، له م رایه ی خۆم په شیمانم ناکا ته وه ". هه ر له مه شه وه یه مه سه لی په یدا بوون ، " هه یین" ، عه لی ئیلاهی ، یان نوسه یری ، واته عه لی به خووا ده زانن - په یدا بووه . به لām ئیسته ناوی نوسه یری په یوه ندیی به ئه هلی هه هه قه وه نه ماوه ، ئه مان له گه ل نوسه یری یه کانی " سوریا " دا زۆر له یه ک جیا واز و دوورن . ئه هلی هه ق باوه ریان وایه له سه ره تای (وجود) دا ، جگه له خووا هیژیکی به رزتر نه بووه و له سه ره تا شه دایه زدان له هه یج شیوه یه کدا . خۆی په شان نه دا وه . له پێش دروست بوونی دنیادا یه زدان نه یینی یه ک بووه . ئه مه له دیری ۲۱ ی " ره مزلزی - باوه ر " دا هه یه . ئه م سه ره تایه به (خۆشین) ناوده بریت (د ، ۹) ، شاه خۆشین ، هه وه ندکار ، یان سولتان ئیسحاق (د ، ۲۰ ، ۶) ، (ئه م هیزه خووا یی یه ن) . ماوه یه ک ئه م باره شه قاوه و به شیک له م نه یینی یه له کاتی دروست بوونی دنیادا ئاشکرا بووه و که و توه ته سه رووی بسات * . ئه م مه خلوقات و شتانه ی دروستکراون ، به شیکن له و سه ره تا به رز و په یروزه ، هه رچه نه ده روو له تیکی مه خلوقاتی و هه ختی یان هه یه - به لām له بنه ره تا نه مرن .

ئه م بوونی گه ردی زاتی خۆشینه له هه مووشتیکیدا وه ک ئه هلی هه ق ده لێن (د ، ۹) ، له گه ل بوو چوونی یه کی له و ریبازه سو فی یانه دا ، که تا ئیستاش له ئیژاندا هه یه - یه ک ده گرپته وه . (مه به ست له " وحده الوجود " یه کیتی هه ستیی " بوون " ه - و) . حلوولی یه کان لایان وایه ، چۆن ئاو له گولدا و ئاگر له خه لووزدا هه یه ، ئاوه هاش

* ئه مه ته ئسیرتیکی یان لیکچووینیکی له گه ل هه دیسی قودسی :
 " قد کنت کنزا مخفيا ، خلقت الخلق لکی اعرف " دا هه یه .

له هوکوفئنه ئه حهد زۆر کونه وکی دیویه تی .

بئجگه له (حهز ره تی) عهلی ته نیا په کی تا کانه په کی تر نییه .

له م یوله دم دول دول سواره ن وه له م په کونم خه وه نده کاره ن

(هه رمه به ست له هه زره تی عهلی په ، که شه سپه دول دولی هه بووه)

(خو وای شه هلی هه ق)

ئه للام عهلی په ، نه یینیم سه مه ده ، (سه مه د دیسانه وه سیفه تی خوا به)

له م یوله دم مه ولامه له دوره

(پیغه م به ر ده فه رمو ویت : من کنت موله ، فه د ا عهلی موله) ،

(لای شه هلی هه ق زاتی خو وای له دوریکدا بووه پیش دنیا دامه زران) .

خه یرو لعه مه لم شه و نه زره په له کاتی نیازدا ده کریت .

وه لزا لینه چه پله لیدانه له گه ل ساز دا .

(یان ده فالی دان)

به لئ ؟ (هاورئ یان؟) شه مه یه رازی من

شه مه یه ئایه ت ویا سه ای نو یژی من

هه رچه نده له هه وه له وه هه چم نه زانیوه

به لام هه ر به م شیوه یه نو یژم خو ییند ووه (کرد ووه)

ئا وای شه هلی هه ق ، له دیری یان زه می "ره مزی با وهر" دا ، مه زه به که ی

خو یان به " دینی نوسه یرا " نا وده به ن . شه شیبه نه وه سه ر موحه ممه دی

کوری نوسه یر نا ویک ، که له سه رده می عه لیبی ، زا وای موحه ممه ده

دا . ژیا وه .

موسولمانه شیعه کان وا ده گێرنه وه ، که هه زره تی عهلی له گه ل

سوپا که یدا خو ی کو کرد و ته وه به ره ولایه ک بر و ن . په کیک له که سانی

سوپا که ی شه م موحه ممه دی کوری نوسه یره بووه . له روژی دیسهاری

کرا ودا تووشی نه خووشی په کی سه خت ده بی و پیره دایکه که ی ده نی ریت ته

لای عهلی بو شه وه ئی دا وای لئی بو و زدن لئی بکات ، چونکه هیزی شه وه ی نا بی ت

له گه ل یان که وئ . عهلی فه رمانی ده ر کرد ووه بیه یین بو لای ، له به ر

چاوی خه لکه که چاکی کرد و ته وه . موحه ممه د ، که راست بووه ته وه ، به

ده نگی به رز ها واری کرد ووه : " عهلی خوا به ، شه ینا مر و قسه ی

ئاسایی نا توانئ په ر جوو (مو عجیزه) بنو یئئ " . عهلی رووی ده می

ده قه که به کرمانجی خواروو

(هاوریان؟) گوئی له نوختهی رازی من بگرن ،

با پیستان بلیم شایه تی نویژم ،

قه قامه تی من سلامی جه من ، قامه تم سوچه بردنه بو خادیم

(جهم : لای شهلی ههق واتای جهژن کردن ، یان کوپری شایینی گرتنه) .

(خادیم یه کیکه له کهسه شایینی یه کانی شهلی ههق)

بیسمی لام یه کهم ودووایی هه ریاره ره حمانوره حیمی من خه وه نده کارنا

(شهلی ههق ده لاین : شه وهل یارو ئاخو یار)

(خه وه نده کار - هیژی به رزی خودایی یان خووا خوئی)

مالیکم گه ردیکه له زاتی خوشین یه ومه دینی من پیر بنیامینه

(شاه خوشین لای شهلی ههق له پلهی خوا به تیدایه)

(له ووتاره که دا بانی بنیامین هه به)

شیا که نه عبودوی من دینی ناسره ن

شیا که نه سه عینم شایینی پاکی خوشه ویستی به .

(باسی شه شه هه زدیست)

شیه دینام زیندوو کردنه وهی نوختهی که لاهه

سیراسته له زینم بای سه ره شه نجامه .

(که لام : سه روودو په خسانی شایینی یانه)

(سه ره شه نجام : کتیبی شهلی هه قه)

شه نعه تم مووسای خاوه ن کتیبه عه لیه م ساقی که وسبه ره

(کتیب : ته وراته)

(شادبوونه به ئاوی که وسبه ره)

← کیره کانداه که له سه ره وه دیاره ، نوویمنه وه هه به سه لیه شه هندی

له ته عبیره گووانی یه کان شه وه ندهی بوم راست کرا بیسته وه - راستم

کردوونه ته وه چونکه به راستی شه گه ره مرؤف شاره زاییه کی له نیالیکتبه

که دا ناپیت ، زور زه هه ته له و ئه لفا رووسی په وه جاریکی ترئاهیک

به بهر گووانی شه که دا بکاته وه . هه ره هاده قه کهم کرده کرمانجی خواروو

وله پالیشدا هه ولم دا وه هندی له بیروره مزه کان شه وه ندهی به

لای خوومه وه تییان گه شتیم ، روون بکه موه . شه گه ر کهم و کوورپی یه کی

تیدا . بیت پی شه کی دا وای لی بووردن ده کهم .

(س‌رافان ؟) بیان بشنه فن نوخته‌یی وه رازم

پیتان بووا چوم ئایه‌ی نم—ازم

(قد قامت الصلاة)

قد قامتی من سیلاحی جه‌مه‌ن

قامه‌تم سو‌جوود سو‌جده‌ی خادیمه‌ن

(بسم الله)

بسم‌اللهم‌ئه‌وه‌ل ئاخ‌ره‌ش یاره‌ن

(الرحمن الرحيم)

ره‌حمان و ره‌حیم خه‌وه‌نده‌کاره‌ن

ئه‌رره‌حمان من پیری پیشنو مه‌ن

ره‌حیم داود راه‌نوما‌ی ریمه‌ن

(مالک)

مالیکوم زه‌ره‌ی زاتی خوشینه‌ن

(يوم الدين)

یوم‌الدین م پیر بنیامینه‌ن

(ایاک نعبد)

یاک نه‌عبدووم دینی ناسره‌ن

(ایاک نستعین)

یاک نسکینم دین پاک میهره‌ن

(اهـدنا)

ئیه‌دینا ئه‌حیای نوخته‌ی که‌لامه‌ن

(صراطالذین)

سه‌لات زینوم بای سه‌رئه‌نجامه‌ن

(أنعمت)

ئه‌لماتم مووسا ساحیب‌ده‌فته‌ره‌ن

(علیهم)

ئه‌لیحونم ساقی که‌وسه‌ره‌ن

(له‌کفو احد)

لوی کوف پیشه‌ن ئه‌حه‌د کی دبیه‌ن

بیگر جه‌عه‌لی ئه‌حه‌دی نی‌یه‌ن

(لم یولد)

وه‌لم یولده‌م دول دول سو‌اره‌ن

(لم یکن)

وه‌لم یه‌کونم خه‌وه‌نده‌کاره‌ن

ئه‌للام‌عه‌لی یه‌ن، سه‌مه‌دم سه‌ره‌ن

له‌م یولده‌م مه‌ولام نه‌دوره‌ن

خه‌یرول‌عه‌مه‌لم نه‌زری نیازه‌ن

وه‌له‌ زالینم چه‌پی په‌ی سازه‌ن

ئاری س‌رافان، یه‌یه‌ رازی من ،

یه‌ ئایه‌ و قانون ، یه‌ نمازی من . .

هه‌رچه‌ن ، جه‌یه‌ومه‌م هه‌یج نه‌زانام ،

به‌لی وه‌ی ته‌وه‌ر نماز مه‌وانام *

* ف . ژوکوفسکی هه‌ندی له‌ ته‌عبیره‌کانی قورئانی راست کردوته‌وه‌ ،

ئه‌وانه‌شی راست نه‌کردبوونه‌وه‌ ، من راستم کردنه‌وه‌ و هه‌رله‌یه‌ پال

* ما موستا جه ميل روژ به يانی له و ووتارهيدا ، که له په راویتی زی سره تاي هم ووتاره دائامان زمان بوکرد ، باسیکی له کاکه یه کان (قهلم حاجه کان) ی ناوچه ی منده لی کردووه ، لای وایه بویه سمیل نا تاشن ، چونکه بروایان وایه گوپزان مووی همیره لمومنینی نه برپوه . برپوانه : هه مان سرچاوه ، ل ۴۳۳ . به لام براده ریکی کاکه ییم ، کاکه سیوان عه لی ره زا ، له که سوکاری خوپی بیستووه ، که یه کیک له تیما مه کان کورپکی ده کوژریت ، بیاره دووای کوژرانه که ی لاشه که ی به رباران که وتووه و له جالایی به رگه ردنیدا هندی ئا و کوپووه ته وه . کاتی باوکی ماچی کردووه ، مووه کانی سمیلی تهر بووه ، لیستوویه ته وه و توزیک تینویه ته یه که ی شکاوه . جابویه هه روه ک به رسمیل ناکهن ، له کاتی ئا و خواردنه وه شدا ، ئه و ئاوه ی به مووه کانی سمیلیا نه وه ده مینیته وه نایسرن .

۱- ف . ژوکوفسکی هم په راویتی بو ده که و چونیته ی وه رگیرانه . که ی کردووه :

ئه و نیشانه ی پرسیار دانان و وه رگیرانه ناته واوه ، هو ی نیوه ناچلی و گوژرانی ته سلی ده که یه . ئه گهر قورئان له بهر ده ستدا بو وایه ده توانرا چاکتر سر له ته عبیره عه ره بی یه شیوپنرا وه کسان دهر بکریت . بی گومان ، که تیکسته گوژرانی یه که ش هه لسه و ناته واوی تیدا هه یه . هه رچنده هه ولی زورم دا ، به لام واتنای هندی شوینیم هه ر بولیک نه درایه وه . من دیالکتی گوژرانی نازانم کابرای ته هلی هه قیش هه ره و نده ی لی ده زانی ، که کابرایه کی هه ره مه ی لای خو مان سر له تیکسته سلافی یه ئایینی یه کانی که نیسه دهر ده کات . به شیویه کی گشتی و اتاکه ی لیکدایه وه . به لام نهیده توانی به ووردی مانای ووشه کان روون سکا ته وه . بی گومان ده قیکه راستر و ته واوتر پیویسته و له بهر ناچاری ته مه ی هه شه زیانیک به کاره که ناگه یه نیت . زوربه ی بیروپراکانم من پیش ده سختنی ره مزی باوهر "هکه کو کردبووه و نووسیوووه وه ، هه رچنده ته میش زیاتر به پیوری کردووه و له گه ل هه وو ناته واوی یه کیشیدا . " ره مزی باوهر "هکه خزمه تیکی گه وره ده کات . له کوتاییدا . ده مه وی بلیم (هم پارچه شیعره) " ره مزی باوهره که ، به هیچ شیویه که چ له رووی لیکسیکا و چ له رووی گراماتیکا وه ، نابیته نمونه ی باش و په سندی دیالکتی گوژران .

لیم بدن ته نانت بشمکوژن ، نایه لم دهست بدهنه سمیلم ! * "رهنگه
 ئم سمیله ره مزی هیژیکی پهر جوو ئامیز بیت ، هیژیکی وا ، کسه
 مروّف بگه یه نیت هه قیقه تی ته واو ، وهک هیژی ته لیسم لم قـژی
 سامسوندا . رهنگه ههر له بهر سمیل تاشین بیت ، که به هیچ شیوه یهک
 موحه ممد له ریزی (گهورانی) ئه هلی هه قدا دانانریت . براده ره که ی
 لای من ، که باسی خویانی بو ده کردم ، ناوی عیسا ، مؤوسـا ، داوود ،
 بینامین ، ئیعام حوسهین ، عدلی وکسانانی تری ده هیئا ، که چی قـت
 ناوی موحه ممدی نده که وته سرزار . لیم ده پرسى : ئیوه راتـان
 بهر انبهر به موحه ممد چی به ؟ ! ووتى : " وهک لای ئیمه ئاشکرایه و
 باسی ده کهن ، موحه ممد سمیلی تاشیوه ، بویه ناشی له ریـزی
 ئه هلی هه قدا بیت " . . . ههروه ها ده بیوت : " چوّن ده توانین ته قدیسى
 بگهین !"

وهک روون بووه وه ئه هلی هه ق نوێژ نا کهن ، ئه ی داب و ده ستور
 و تاعه تی ئایینه که بیان چی به ؟ ! ئم پارچه شیعره ی دووا یی به
 نموونه ده یه یئمسه وه (تا سنووریک) وه لای ئم پرسیاره مـان
 ده داته وه . شیعره که به دیالیکتی گۆرانی به ، هه ندی لایه نی ئایینی
 ئه هلی هه قی له ئیوه ی چهند ئایه تیکی پچرپچری سووره تی " فاتحـا و
 ئیخلاس" و هه ندی ئایه تی تری قورئاندا روونکردوته وه (راستی به که ی
 ههر هی سووره تی فاتحـا و ئیخلاس - وه رگیژ) . ئم پارچه شیعره ی
 دهست من که وتوه " ره مزی باوهر "ی ناوه ، له وه ده چی ناته واو بیت ،
 چونکه هه موولایه نه کانی ئایینه که ی روون نه کردوته وه . ناته واوی به -
 که شی ری ئی ده چیت ، له بهر ئه وه ی من شیعره که م له بهر (به یاز)
 ده سنوویکی ئه ده بی نه نووسیوه ته وه ، کابرایه کی نه خوینده واری
 ئه هلی هه ق پیتی ووتوم ، که ته نیا ده یزانی ووشه ی (علی) بنووسیت ،
 ئه مه شی له یه کتی له هاو مه زه به نه خوینده واره کانی خویه وه فیـر
 بووبوو ، ره وانى کردبوو .

نزیکه ی ۴ - ۱۰ دیر له م شیعره پهریوه و دووریش نی یه ،
 ئه و دیرانه ناوه رپۆکیکی گرنگیان تیدا بیت ، له گه ل ئـم
 ناته واوی به شدا شیعره که روونه و مروّف لی تی ده گات . ده قـه
 گۆرانی به که ی به ئه لفبای رووسی ده نووسمه وه و ده شیان کـم
 به رووسی (۱) :

بۆيان گيڭرامه وه ، يه كېڭى ئه هلى هه ق له " شيراز " له به رده م
 مزگه وتي كدا ته زبيحه كه لى ده كه وييت و ده ترسى و هه لى ناگرپته وه ،
 چونكه لاي واده بييت كه وتوته پيسى به رده مى مزگه وت ، له شوپنى ،
 كه مه لبه ندى جنيو فروشتن ، هه لخله تاندىن ، ده ست برين و قليان
 كيشان ، قاچاخ چيه تيه ، پرخه ي خوه له ئيواره وه تابه يانى
 جگه له گه ل ئافره تدا رابواردن ، هه موو نا شه رعى يه كى تيدا .
 ده كريت ، ئه هلى هه ق لايان وايه ، مزگه وتيكي ، كه جيگه ي نويژو
 تاعه ت بى بو خودا ، نابى ئه م شتانه ي تيدا بكرت . يه كيكيان بو
 هاو مه زه بيكي خويى گيڭرابوه وه ، كه جاريك له گه ل موسولمانيكدا
 به ريگادا . روڭشتبوو ، كاتى گه يشتبوونه لاي مزگه وتيكي ، موسولمانه كه
 داواي ليكردبوو ، بو چهنده قيقه يه ك لاده نه مزگه وتكه . ئه م هه ر
 وه لده يشى نه دا بووه وراي كرد بوو ، چونكه مه ترسى ئه وه گرتبووى ،
 نه وه كا يه زدان رقى لى هه لسى . چوونه مزگه وت - لاي ئه هلى هه ق
 به هه نكاويك لادان له ئايىنى ئه هلى هه ق ده ژميردريت ، نه وه كا
 باوه ر به موسولمانيه تى به ينن ، باوه ريك كه له بناغـــــــــــــــــه دا
 دل راكيشه رنى يه .

ئه گه ر موسولمانه كان جه وه ره رى ئايىنى ئه هلى هه ق نه زانن و له
 له هه ندى داب و نه ريتى به هه له گه يشتين ، چاك ئه وه ده زانن
 له ته مه لى و ته وه زه لى يه وه نيه ، كه ئه هلى هه ق ناچنه مزگه وت
 و نويژ ناكن و روژوو ناگرن . هه ر له به ر ئه مه شه ئه هلى هه ق دژى
 ئه وه ن له ژير په رده دا خويان بشارنه وه و به پيوستى نازانن ،
 چونكه سه ر و سيماي زوربه يان به ئاكره هاواري ئه هلى هه قيه -
 تيان ده كات .

ئه هلى هه ق نه سميل ده تاشن و نه هه ليشى ده پاچن ، به تايبه تى
 به ر سميل ، ئه و شوپنه ي فارسه كان پيى ده لين (آب خورى) . ئه وه م هه ر
 بو ساخ نه بووه وه ، بو چى سميل نا تاشن و بايه خيكي زورى ده ده نى
 و ته نانه ت له گلينه ي چاويش زياتر ده يپاريزن . كا براى خه لكى
 كوزيوه ند پيى ووتم : " ئه گه ر هه موو زير و كلوورى دنياشم بده نى ،
 نايه لم كه س توخنى تاله موويه كى سميلم بكه وييت . با ئازارم بده ن ،

له بهر هویهکی تریش، ئەهلی ههق ههز له موسولمانانـ له
 فارسهکان ناکهن. ئەهلی ههق زۆر دڵسۆز و دین قایمن، له جێ بهجێ
 کردنی ئەرکی ئایینی سه‌رشانیاندا تمه‌لی ناکهن، ده‌یانـ هوی
 موسولمانه‌کانیش، ئایینه‌کایان هه‌ر سه‌رزاری نه‌بێ و به‌ کـه‌رده‌وه
 بیسه‌لمینن. که‌چی به‌ هه‌ر لایه‌کدا ده‌پروانی و بو‌ هه‌ر کو‌ی یـه‌ک
 هه‌نگاو ده‌نییت، هه‌ر فیل و ته‌له‌که‌بازی‌یه‌و له‌ قورئان و شه‌رع
 لادانه‌، باوه‌ر به‌ یه‌کتر نه‌بوونه‌، یه‌کتر هه‌لخه‌له‌ تاندنه‌، هـه‌ر
 له‌ پێناوی خو‌ و مه‌به‌ستی خو‌دا. ژیا‌نه‌. ئەمه‌ یه‌کیکه‌ له‌ وسه‌رنجه
 ووردانه‌ی بو‌ته‌ هو‌ی ئەوه‌ی ئەهلی هه‌ق هه‌ز له‌ موسولمانه‌کان نه‌که‌ن*.
 به‌شیکێ زۆر له‌ ئەهلی هه‌ق ته‌نیا له‌ روودا داده‌مینن و بو‌
 ئەوه‌ی تووشی گه‌رو گێچه‌لی موسولمانه‌کان نه‌بن و به‌ بێ دین نا‌او
 نه‌برین، هه‌ندی جار له‌ وه‌ختی مردووشوردندا، یان له‌ کاتی پرسه‌وشایی
 و مامه‌له‌ی زه‌وی زار و ... هتد دا به‌ نابهدلی ده‌چنه‌ مزگه‌هوت و
 جارو باریش تووشی نو‌یژی ناچاری و هه‌لسو که‌هوت ده‌بن له‌ گه‌ه‌ل
 مه‌لاکاندا. به‌ پێچه‌وانه‌شه‌وه‌ هه‌ندی جار له‌ ئەهلی هه‌ق ئەـه‌م
 دوورووبی و درۆیه‌ له‌ گه‌ل خویاندا ناکهن و به‌ ئاشکرا ده‌لین، که
 له‌ روژانی ره‌مه‌زاندا نه‌ نو‌یژ ده‌که‌ن و نه‌ روژوونیش ده‌گرن، چه‌ندی
 ده‌یان‌ه‌وی له‌ تا‌عوون دووربن، ئەوه‌نده‌ش له‌ مزگه‌وتی موسولمانان .

۱- لای فارسه‌کان دوو جور بالنده‌ هه‌یه‌، به‌ گو‌یره‌ی شه‌رع ئەوانه‌ی
 ده‌نوکیان قولایی نه‌یه‌ خواردنیان هه‌لاله‌، ئەوانه‌ی قولایی یه‌ حه‌رامه‌ .
 راستی‌یه‌که‌ی ئەمه‌ - یه‌کیکه‌ له‌ یاساکانی شه‌ریعه‌تی ئیسلام ئیـتـهـر
 بو‌ فارس و خه‌لکی تریش هه‌روه‌ک یه‌که‌ . - و -
 * ره‌خه‌ له‌ هه‌ندی هه‌لی و که‌وتی که‌سانی موسولمان گرتن، مانای
 ئەوه‌نه‌یه‌، که‌ که‌سانی سه‌ر به‌ ئایینه‌کانی تر هه‌مووبی عه‌یبـنـ و
 هه‌موو له‌ ئەمان رێک و پیکترن . له‌ ریزی په‌یره‌وه‌که‌رانی هه‌موو
 ئایینی‌کدا باش و خراب هه‌ن . بو‌یه‌ به‌ یه‌ک چا و سه‌یر کردنی
 موسولمانه‌کان هه‌موویان به‌ خراب ناوبردنیان، هه‌روه‌ها هه‌موو
 مه‌سیحی و ئەهلی هه‌قی‌ک به‌ چاک له‌ قه‌لم دان - راستنی یه‌ وه‌
 واقع دوورکه‌وتنه‌وه‌یه‌ . - وه‌رگیر -

ئایینی تایبەتی و جیاوازییان ھەبە و دەیانەوی ھەندێ لــــ
 داب و نەریت و نھێنی ئایینەکیان لە موسولمانەکان بشارنەوہ .
 ئەھلی ھەق لایان وایە، ناتوانن چا و لەوسەر لێ شیوان بیۆشن ،
 کە موسولمانەکان تووشی بوون، بە تایبەتیش لە مەسەلە ی بوونی
 چاک و خراپ لە نا و مەخلووقات ی خودادا . ئەھلی ھەق باوەریلان
 وایە، ھەموودروستکراویکی یەزدان پاک و جوانە و موسولمانەکان
 لەوہدا راست نین، کە پەیرە و کەران ی قورئان بە پاک و بە ئاین و
 مەسیحی و ئەھلی ھەق بە کافر دەزانن . بۆیە ئەھلی ھەق
 مەسیحی یەکان بە نزیک و ھاو باوەری خۆیان دەزانن خۆشیان دەوین و
 راستی یەکە ی من ئەم شتەم لای کابرای خەلکی کوزیوہ ند ھەست پی
 دەکرد . ئەم راستی خۆی لای من دە درکاند و دەییووت : "جەناب، ئیمە
 و ئیوہ یەکین ." *

ئەھلی ھەق لە بەر ئەوہ ی باووریان وایە : پاک و نا پاک لــــ
 کاری دەستی یەزداندانی یە ، گوشتی بەراز و بەئندە ی دەنووک
 قولایی (۱) دەخۆن و شەراب دەخۆنەوہ و بە گوناھیشی نازانن .
 شاپانی باسە ، خواردنەوہ لای ئەمان سنووری خۆیی ھەبە . بە بەد مەستی
 و سەرخۆشی ھەلس و کەوت و کاری نا شیرین کردن لایان بیــــ
 خراپە . قەتیش چا و لە زۆر خواردنەوہ و بە دەستی نا پۆشن، چونکە
 دەلین : مەرۆفی بەد مەست ، لە بەر شەراب خۆیی لەبیر دەچیتەوہ
 کاری خراپ ، تەنانەت تا وانیشی لێ دەوہ شیتەوہ .

بەم جۆرە ، ئەھلی ھەق تەنیا یەک شت – رەوشتیان لا نا پاک و
 بی کەلکە ، ئەویش ئەوہ یە، کە سەرئەنجامە کە ی خراپ بی و بەکوشتن و
 تالان و برو ... ھتد بشکییتەوہ . بۆیە خۆیان لەم کارە خراپانە
 بە دوور دەگرن، ھەول دەدەن ریزەکانی خۆیان، لە کەسانی خراپەکار
 پاک بکەنەوہ .

* لام وایە ، لیرەدا ف . ژوکوقسکی ، جەوی بو ھەستی مەسیحی
 یانە ی خوی شل کردوہ . ئەینانە بیستراوہ ، ئەھلی ھەق ئەوہ نــــ
 دوژمنی سەرسەختی ئیسلام و دوستی نزیک ی مەسیحیەت بن . ئەم
 مەسەلە یە لە چەندشوینیکی تری ووتارە کەیدا ، بە زەقی دەردە کەویت .
 وەرگــــیر (۱) – لہ لاپەرە ی دوایی دایە

کورت و پچرپچرن، سهره رای شمهش، هندی له ناوهکانی به ههله —
 تۆمار کردووه (راستییهکهی ئاسهوار ههلهکنی به ناوبانگی
 نهینهوا 10PTYC به ههلهی تۆمار کردوون و پیتته رمان —
 دووبارهی کردوونه تهوه). ههروهها راکانی پیتهرمان سهر پی یین و
 زۆر له راستی یهوه دوورن . به پچهوانهوه بو چونهکانی
 گوینیاو به پیز و دهولهمندن، لهگهله و کهرهسانهش —
 دهگونجین ، که لای من ههن و دههوی بیانکم به بناغهمی
 باسکردنی مهزههبی " شهلی ههق " .لام وایه هندی له و بابته تانهی
 لای گوینیاو ههن، شهوانهی باسی درووست بوونی دنیا و بهرپهوه
 بردنی دهکن — که مو کورتن. کاتیکه ده توانین به و راشکاویی یهوه
 دهبارهی مهسهلهیهکی ئاوهها سهرنج راکیش بدوینین — که کهرهسه
 و ماتریالیکی چاک له بهر دهستدا ههن . پشت بهستن به قسه و رای
 سهرزاری کسهسانی سهر بهم مهزه به ، به تایبه تیش مروقیکی رۆژهلاتی،
 که بهرانبهرت دانیشتووه و له ههموو وهختیکدا رای شهخسی
 لای شه و دهوری خۆی دهبینی ، زۆر گونجاو و تهواونی یه .

دهبی پهنا بو دهستنوسی شهدهبی و گۆرانی و شاعر و نامهی ئایینی
 ببریته . چونکه شه بهرهمانه بهری رهنجی چند نهوهیهکن و
 لایهنهکانی شه مهزهههیان به چاکی روونکردوتهوه .

لهوه ناچیت گوینیاو کاتی لهسهر شهلی ههقی نووسیوه ،
 هیچ دهسنوویکی یان بهرهمیکی نووسراوی له بهر دهستدا بوو بیته .
 ههر شهه وای له منیش کرد ، زۆر به پاریزهوه بو مهسهله بجم و هیچ
 بیروراو شهجامیکی گشتی ههچنده من سامانیکی بچکۆلهمه بهستم
 لهو سهی دپره شیعرهیه شک ده بهم . شه شاعرانه به دیالیکتی
 گۆرانین و تارادهیه کیش هندی له رهزهکانی مهزهههبی " شهلی ههق "
 یان روون کردوتهوه .

شهلی ههق ، موسولمانهکان بهگشتی وشیععهکانیش به تایبه تی،
 به شهلی شریعت ناوده بهن ، لهدهلهوه خۆشیان ناوین و رقیانه
 لیان . شه نه یاری و ناحهزییهش گهلیک هوی هیه . یهکه له بهر
 شهوهیه موسولمانهکان پیرهویی شریعت دهکن ، شهمانیش رپبازیکی

قلخانین، که یه کیکه له تیره به ناوبانگه کانی عشیره تی گوران .
 گوران هکان به شیوه یه کی گشتی ئیسته نیشته جی بوون و لسه
 " کرنند " و ده وروپشتی ده ژین و کوچیان ده گاته زه هه لاه و
 خانه قینیش . عشیره تی گوران له م چند تیره یه پیکه اتوو به هواره ،
 بازیانی، قلخانسی ، قالیازنجیری، بیبانی، بادیز لاقین
 (رهنگه باجه لانی بیت - و) . هندی له گوران هکان، له مهلبه ندی
 ئه سلی خویان ، - واته له روژئاوای کوردستانی شیران دوورکه وتوو -
 نه ته وه و چند تیره یه کیان لی جیا بووه ته وه و به شیران سدا
 بلاو بوونه ته وه . بو نمونه پتو له ده یان خیزان، له تیهری
 کوزیوه ند له دیهاته کانی ده وروپشتی " تاران " و به شی هره زووریشیان
 له گوندی " ساخ ره شور " ده ژین .

کورده گوران هکان له بهر دووشت زور جیگای سهرنج و باس و
 خواسن: یه که میان له بهر ئه وهی دیالیکتی تایبه تی خویان، ده سنوسی
 و سامانی ئه ده بییان هیه، که له موزی بهریتانیدا پاریزراوه (۱) .
 دووهم، له بهر ئه وهی ئه مان زور بهی هه لگرانی ئه و ریازه ئایینی یه
 پیک دینن، که من ده مه وی لیان بدویم . به خویان ده لین: " ئه هلی
 هق، یان هه ره هق، هه قیقهت ... ئیمه له سه ره هقین " . فارسه
 شیعه کان به علی ئیلاهی، واته ئه وانهی علی به خودا ده زانسن
 به کورد به چه، یان به که له شیرکوژ ناوده بن . petter mann (۲)
 سالی ۱۸۵۴، به " کرنند " دا تی په ریوه و دمه باره ی ئه م مه زه به
 سهیره، چند شتیکی نووسیوووه . ههروه ها comted Gobinea
 ماوه یه ک دووای ئه و له شیران بووه، ووتار وکه یه کی پر بایه خی لسه
 سه ره نووسیوووه .

ئه گه ره به ووردی سهرنج له راکانی پیتهرمان به دین، ده بینین:

1- Rieu Catalogue of the persian manuscripts in the British
 Museum , 11, 728 - 734 .

له راستیدا ئه وه به شتیکی که می ئه و که له پیوره ئه ده به
 ده وله مهنده یه، که به دیالیکتی گورانی، هیه - و -

2- Reisen im Orient , Leipzig , 1861, B. 11, 263

له سهره تادا كابرآ بى سلهمينه وه و بى پهروا په رهى بـه
قسهكانى ده داك بهلام كه كار گهيشته شه وهى بونموونهى مهسلـه
زمانه وانى يه كه ، پارچه شيعريكى ثابيني لايخوم بنووسمه وه ، كابرآ
زور تيكچوو و قسهكانى برى و به ئاشكرا پيى و وتم : له باتى شه و
پارچه شيعره ده تتوانى شتيكى تر بنووسيته وه .

زور شاد بووم به وهى ، توانيم گومان و گوى قولاخى كابرآ
بره ويئمه وه و پارچه شيعريكى زور گرنگم لى هلكراند ، كه بووه
هويئى شه و ورده سهرنجانم .

شم ده رگاي دل خستنه سهر پشت و بو ساتيك ته وژمى نهيني به ره لـلا
كردنه ، هوى شه وه بوو ، كابرآ ههر چنده زور باوه پ قايـم بوو
بهلام فلاحيكى نه خوئينده وار و ساكار بوو . ههر شه هوپه شه ، كـه
دهورى خوى له كه م و كورتى و ناته واويى نووسينه كه مدابينيـوه و
ناتوانيت وه لامى زور پرسياران بداته وه ، كه له كاتى خوئينده وه دا
قوت ده بنه وه . له گهل هموو كه م و كورتى يه كيشدا ، لام وايـه
بو ميژوو بى سوود نابيت و هه ندى له خهسيه تى نه زانراوى شهـم
مه زه به گونه روون ده كاته وه . به لگه ي واش هه يه ، تا مروف بتوانيت
بليت ، تاماويه كى زورى تريس ههر ده مينيت . ههر چنده به زور شه
مه زه به ده تر نجينـريته چوارچيوه ي وو شكى ئيسلامه وه ، بـه لام
خاوه نانى (شه مه زه به) خويان زور له ئيسلام به دوور ده گرن .

له گوندى "تلحن ده شك" ، كه ده كه ويته باكوورى روژئاواى
"شيراز" وه و ، نزيكه ۳ - ۴ فرسه خ (۱۰۶۰ مه تره) ليـوه
دووره ، ههر توژيك له ولاى باخه قه شه نگه كه ي كامل الملك "عه فينف
ئاباد" وه ، بيجه كه موسولمانه شيعه كان دانيشتوانى كوردى لي هـن ،
سهر به مه زه بيكى ثابينين ، كه هيچ په يوه ندى يه كى ناوخويى بـه
ئيسلامه وه نى يه . شه كوردانه سهر به بنه ماله ي كوزيوه ندى تيره ي

* هه ندى ناوى كوردى ، كه به ئه لفاي رووسى ده نووسرين ، سهر و
گوئلاكيان ده شكينريت . شه ناوانه ي دلنيا بووم وانين راستـم
كردوونه ته وه : بهلام شه وانه ي نه زمانيون چون له ووتاره كه دا ، هه روا
هيشتوومنه ته وه . مه به ستم له گوڤرانى ده نگه كان ، وه ك نووسيينى وا
به ف ... هتد . (وه رگير)

نووسینی ف ۱ . ژوکوقسکی

ئەنوەر قادر محەمەد لە رووسی یەوێ کردووێت بە کوردی و پەراوێزی
بۆ کوردووێ .

هەلکەوتیکی چاک دەرفەتی ئەم نووسینە بۆ رەخساندم . بە هاری
سالی پار ۱۸۸۶ ، لە کاتی کدا لە "شیراز" خەریکی لیکۆلینەوهی
پەکیک لە دیالیکتە زۆرەکانی زمانی کوردی بووم . تووشی کابرایەکی
بووم . لەوێ کەم چاوپێکەوتنەدا ، بۆ پێچ و پەنا زۆر بە توند و تیژی
بیروپرای دەربارەیی موسولمانەکان دەردەبەری . ئەمە زۆر سەرسامیی
کردم و لام روون بوووە ، کە ئەم کابرایە خاوەنی مەزەبەکی تایبەتی
بەلام چی یەو کامە یە؟! کابرا لە کاتی قسە کردندا ووتی: "بە یاسا و
دەستوری خۆمان ، ئێمە شەراب دەخوینەوه *** ، گوشتی بەراز دەخوینو
بە گوناھیشی نازانین ، ئێمە ئەرمەنیمان خوش دەوی ... هـتـدـ" .
هەموو هەول و توانای خۆم بۆ لیکۆلینەوه و ساغ کردنەوهی ئەم
مەسەلە یە (واتە مەزەبەیی کابرا) *** خستە کار ، بۆ ئەوێ کابرا
هەستیش نەکات ، من کە و توومە تە پەیی جۆری بیروباوەرە ئایینی یەکی ،
هەر لەریگی زمانەوانی یەوێ دەچوو .

* - ناو نیشانی ووتارە کە خۆی : ("مەزەبەیی ئەهلی هەق" لـبـیـهـ
پیرسیا) یە . من کردمە ئێران ، چونکە لای خوینەری کورد وەها
روونترە .

** بە شەوێ مەکی گشتی مەی خواردنەوه لە لایان حەرامە ، بەلام لەو
دەچیت هەندێ چا و پۆشی تیدا بیت . لەم روووە بروانە :
محمد جمیل بندی الروژیانی ، بندینجین (مندلی) فی الثاریخ
قدیما و حدیثا ، گوٹاری کوپری زانیاری عیراق "دەستەیی کورد"
بەرگی ۷ ، بەغدا ، ۱۹۸۰ ، ل ۴۳۴ .

*** جاروبار لە باتی پەراوێز لە دوو کەوانەیی گەورەدا هەندێ
شت روون دەکەمەوه ، لە باتی وەرگێریش - وایک دەنووسم .

کولتووری میلله تهکه مان به شیوه یه کی گشتی، باسی زانایانی شاره زای
ئایین و میژوو و ئه ده بی کۆنی رۆژ ههلات ده کریت. به زانایانی
وینهی ماموستا جه میل رۆژ به یانی، سادووا به دووای ئه مان، کادری
تازه پیگه بشتوو و لاو ده توانن پهره ی پی بدن و بیمه نهه جینن.

ئه نهه رقادر محهمه د

* ف. ف. زوگوفسکی. مهزهه بی "ئه هلی ههق" له پیرسیا، سانت پیتربورگ،
۱۸۸۶. ئه مه مهسته لی که له "یادداشتی به شی رۆژههلات ناسی کومه لایه
تاریخی لۆگی ئیمپراتوری"، بهرگی یه که م، چاپی یه که م، ل ۱-۲۴. (به رووسی)
** - ف. ف. مینورسکی. که ره سه ی توژی نه وه ی مهزهه بی ئیرانی
"ئه هلی ههق یان، عه لی ئیلاهی"، به شی یه که م، پی شه کی، تی کس ت و
وه رگی رانی، موسکو، ۱۹۱۱. (به رووسی)

*** محمد جمیل بندی الروژی بانی. بندنیجین (مندلی) فی التاریخ قدیم
و حدیثاً، مجله المجمع العلمی العراقی "الهیئة الكردیة"، المجلد السابع
بغداد، ۱۹۸۰.

**** - محهمه د ئه مین هه ورا مانى: کاکه یی - پشکنین و لیکولینه وه
و توژی هه لدانه وه ی، به غداد، ۱۹۸۴.

قوناغه‌کانی پهره‌سەندنیدا، یاسا و دەستووری فراوان و قوولی هەبووه؟
 ئایا زانیانە و کەسانی گەورە و خۆیندەوار رابەرییان کردووه، یان
 ئایینیکی میلی بووه و خەلکی نیمچە خۆیندەوار رابەری بوون؟ (ئە
 ئەگەر ئەمەى دووایانەچۆن لە ناو لیشاوی فیکری و زەبر و زەنگی
 ئایینەکانی تودا ماوه تەوه؟! بەلای زۆرەوه بیر بوو ئەوه دەچیت، کە
 لە سەرەتاو کاتی گەشەسەندنیدا، وەک هەموو دیاردەیه‌کی فیکـری و
 کومەلایەتی، هەموو مەرجەکانی ئایینیکی تەواوی تیدا بوو بیست و
 کەسانی زانا و رابەرییان کردبیت، بەلام دووایی نوشوستی هینا
 ببت و کەوتبیت بەر زەبری رووداوه‌کانی رۆژگار و هەر لەیادووێژدانی
 کومەلای خەلکی باوەر قائمدا مابیت تەوه. هەندى لایەنى ئەم ئایینە زۆر
 سادە و ساکارە، بوو نموونە: ئیمام و پیاوانی ئایینی تر بە هی خو
 دەزانن. کە چی لە ئایینەکانی تر دا، کە ئاشکرایە بەردەوامی یەکتەری
 کاریان لەیەک کردووه، ئەوشتانەى لە یەکیان وەرگرتووه، وەهــــــــــا
 ساچاندووایانە و تۆندوووه تەوه، کە مەگەر هەر کەسى لى زان و سەر
 دەرکەر، پیاوان بزانیست و دەست نیشانیان بکات. جگە لەم بابە تانەش
 پرسیار و بابەتی دەمە تەقى لە سەر کردن زۆر زۆرن .

مادۆستا رۆژبەیانى باسى ماک و پەيوەندى دابى مردوو ناشتن و
 حەوت فریشتەکەى ئایینی زەردەشتى کردووه، کە چۆن لای ئەهلى هەسەق
 ئەم مەسەلەیه لەو حەوت کۆرەدا، کە دراوونە تەپال سولتان ئیسحاق:
 (بابا میر ومستەفا و سەید موحەممەد ئەبولوہفا و شیخ شەهابەدین
 و حەبیب شاھ و حاجى بابووى) دا سەرى هەلد او تەوه، (ل، ۴۲۸) .
 بى گومان ئەمە بنەوان دۆزینەو یەکی زانیانەیه . لام وایە ئەگەر
 بەشیو یەکی فراوان و هەمەلایەنە لەزەردەشتى یەت و یەزیدی یەت و ئایینی
 ئەهلى هەق بکۆلریت تەوه، زۆر لاپەرەى شارراوەمان بوو روون دەبیت تەوه
 دوور نی یە پەیدا بوون و بەرەو پێشە چوون و سیمای گشتى و لەیەک
 ترازان و جوی بوونەوه و جیاوازیانمان بوو ئاشکرا ببت، کە ئەمەش
 قوناغه‌کانی بەرەو پێشە و چوون، یان کز بوون و چوونە ناو قاوغى
 دنیای روحى کورد دەردەخات .

بى گومان لیکۆلینەو یە لەم بابە تە زۆر ئالۆز و کرانە .
 سەرەتاو بنغە دانان و رووسکردنەو یە زۆر لایەنى جەوهەریـــــــــى

نزیکه . لاشی وایه " دوکان داوود" ی شاسه واری چهرخی مادی هدر "دی اووس= داو" ی پیروزی کاکه سی یه کانه (ل ، ۴۲۶) . له شوینیکی تری و تاره که ییدا شتیکی دی له م بابا ته ده لپهت: شهلی ههق " تناسخ - دووناودوون" ه که ییان بو خوپاراستن له هه لگرانی شایینانی تر ده خه نه کار و موجامه لسه ی موسولمانه شیعه و سووننی یه کانی پی ده کهن ، به وهی هه ندیک له رابه رانی شه وان ده کهن به هی خویان (، ۴۳۱) . شه مه شیان رایه که ی پیشوو تـــری به هیز ده کات به لام هیشتا گومان و دوودلی ده رباره ی هاوتایی پایه ی " تاووس" ی یه زیدی و " داوود" ی شهلی ههق له نارادا هه رده می نی و نارپه ویته وه . ره نگه ماموستا بو شه م پرسیاره ، ده رکه وتنی خو وایه تنی له داوود دا (شه گهر رووی دابیت ؟) بکات به وه لام ، یان شه م داووده ، " داو" نی یه .

ماموستا روژبه یانی پهیدا بوونی شه م شایینه ی گیراوه ته وه پیش سده ی ده یه می گوچی ، بو شه مه شه ده لی ، که مه سهوودی ناوی (کاهکاهی) هیناوه (ل ، ۴۳۰) ، هه روه ها شه جهره ی کاکه سی یه کانی له مه سه له یه کی حیسابیدا شی کردو ته وه و ریک و ره وان ناراستیی مه سه له ی له دایک بوونی سولتان شیحاق (آستیاگ) وبه ستنه وه ی به شیخ عیسی و شیخ موسی به رزه نه وه ... تا دوئه و ماوه یه ی ، که ده می نی ته وه به بو شی ده رختووه (ل ، ۴۳۱) . شه م بو چووانه زور وورد و قوولن ، دوستی کهسانی تازه پیگه یشتوو ده گرن ، ده بنه چراووک و هه ندی په لسه ی تاریکی بی سر چاوه یی و فهوتانی به شیکی زوری که له پوورمان بو ده ره وی نه وه .

ماموستا به راگوزاری باسی له نه خوینده واری شهلی ههق کردو وه ، ده لی: شه مه بووه ته هو ی پچر پچری و شیواوی هه ندی لسه بیروراکانیان (ل ، ۴۳۱) . دیاره لیره دا زور تومه به ستی لسه به رود وواکه وتنی پهیدا بوونی که سه کانه و کورتیی زنجیره ی شه شه جهره یه ش ، که باسامان کرد .

من لای خومه وه و له کاتی خویندنه وه ی تیگسته کانی " سه ره نه جام" دا گه لی شتم به خه یالدا ها تووه شهلی ههق بی کومان ویستویانه کتییی شایینی شه مانیش له هی خه لکی تو که متز نه بییت ، یاسا و به رنامه یه کی ریکی بییت . به لام شاخو له سه ره تای پهیدا بوونی شه م شایینه یه و

له كه له پووری فیکری و گیانی نه ته وه که مان، لاپه ره نه زانراوه کانسـی
روون بکه نه وه. ئایینه که له چ ئاستیکد ابیت، به لگهی شارستانییه تی و
نیشانهی کۆنی و ره سنی میلله ته که مانه. به خوشمان له خه لکی دی باشتو
ساغ ده کریته وه. له گه ل ئه م پیشه کی و سه ره تا هه لچینه شدا، هه ندی شتم
له میشکدایه ده مه وی لیبان بدویم.

له پێشدا ده مه وی بلیم، ئه و چه ند لاپه ره قوول و چره ی ماموستا
رۆژبه یانی سالی ۱۹۵۷ نووسیوونی، کـرۆک و گه لی لایه نی گـرنگی ئه م
ئایینه یان روون کردۆته وه. بۆ چوونه کانی وه ک سه رجه می به ره مه کانی،
زانایانه و قوولن، هه رچه نده هه ندیکي ئه م ووتاره ی پیوستیان به به لگه
و توێژینه وه ی زیاتر هه یه. زانای ناوبراو ده لی، که ئه هلی هه ق سه ره
ئایینه کۆنی کورد "دیو په رستی" ن، له مه شدا له گه ل یه زیدی ومیلله تانی
هیند و ئه وروپایی دا هاو دینن. ووشه ی "دیو" بووه به "دیوا" و
"دیوس"، دووایی لای کاکه ی یه کان بووه به "داو" و لای یه زیدی یه کان
به "تاووس"، (ل ۴۲۸۲). له شوینیکي تـردا ده لی سه ر به ئایینه
کوردی "دیو سنا ئه وداو"، که سووک کراوه ی "دیاوس" ه. لای یه زیدی
یه کان بووه به "تاووس" و لای کاکه ی یه کان به داوود، (ل ۴۱۷۲).

بـی گومان ئه گه ر ته نیا له رووی زمانه وانیه وه، ئه م رایسه
ده ربهرت، جیبی خۆیه تی. به لام شی کردنه وه و لیدوانی زۆرتـری ده وی.
له روانگه ی مـبـژوو ییه شه وه دیسان هه ر لیکدانه وه ی پیوسته. چونکه
له دنیا، لیکولینه وه ی زانستیدا، بۆ فاکت و به لگه ی تر یه خه ت ده گـرن.
لام وایه جیگا و پـایه ی "تاووس" ی یه زیدی له گه ل "داوود" ی ئه هلی هه قدا،
له رووی ده ستلـات و پایه وه به راورد نا کرین، چونکه له "سه ره نجام" و
مه علوماتی تردا، داوود فه رمان جی به جی که ری خواوه ندکار شاه خوشین
سولتان ئیسحاق. هه ت له گه ل ئه مه شدا، له ووتاره که ی ژوکوفسکی
(ل، ۲۶) دا، باس له وه کراوه، که ئه هلی هه ق له کاتی سۆز و حال لیهاتندا،

زیاتر هاوار ئه ه ی داوود! گیان داوود! ده که ن. ئه مه پالپشتیکـی
رایه که ی ماموستا رۆژبه یانی یه، چونکه ئه گه ر (داوود) پایه ی به رزنه بی،
چون زۆر هانای بۆ ده به ن؟ ماموستا رۆژبه یانی لای وایه، کاکه ی یه کـان
به نزیکي و تیکه لی یان له گه ل جووله که کاندایه و به هوی لیکچوونی
له فزی یه وه، داووده که یان قوستانه وه، چونکه له (داوود) ه که ی خۆیا نه وه

من له بهر رۆشنایى ئەم کارانە و هەندیکى لای خۆماندا -
 بە تايبەتى ئەو ووتارە بە نرخى ، کە زانای ديارو ميژوونوسى
 هيژامان ماموستا جهميل رۆژبەيانى ، دەربارەى ميژووى کۆن و
 نوپى مەندەلى نووسيوويەتى و بەشیکى بو کاکه‌پى‌په‌کانى ئەو
 ناوچەيه تەرخان کردووہ ***، ھەر وہا ئەو تیکست و زانیاری‌پانەى
 کتیبەکەى کاک محەمەد ئەمین ھەر امانى "کاکه‌پى ***"، و بىرورای
 کەسانى سەر بەم ئایینە - ئەم پيشەکى يە بچکۆلەيەم نووسيووه و
 ھەندى پەراويزم بو ووتارەکەى ژوکوفسکى کردووہ . بو ئەو ھەى
 پەراويزى ئەسلى ووتارەکە تیکەلى ئەوانەى من نەبن، بە ژمارەن
 و بو ھینەکانى لای خۆشم ئەستیرەم داناوہ .

ئاگاشم لەودەمە تەقى و لە سەریەکتەر نووسینە ھەيە ، کسە
 دووای دەرچوونى کتیبى " کاکه‌پى " ، چ لە نيوان کاکه‌پى‌په‌کان
 خويان و چ لە نيوان ئەوان و دانەردا ، بلاوکرا ئەوہ . ديارە من
 لەم چەند لاپەرە و پەراويزەدا دەر فەتى دووانم لەم ووتارەنى
 دووایى نابى و ئيرە ھەر شوپنى ئەو ھەش نى يە . لە ئيرانىش
 ھەى بۆرەکەيى ھەندى لە دەقەکانى " سەرئەنجام " ي چاپ کردووہ ،
 بەلام نەمدیون .

مەسەلەى تۆزە خو خەرىک کردنىکى منیش بە ئایینەى
 ئەھلى ھەقوہ ، زياتر لە کاتى نووسینى باسەکەمدا لە سەر
 مەولەوى (۱۸۰۶ - ۱۸۸۲) و ئەدەبى گۆرانى يەوہ - دەست پىدە کات ،
 لە فەسلى يەکەمدا بە راگوزارى لەم مەسەلەيە دووام . ھەر
 ئەو کاتەش ئەم ووتارەى ژوکوفسکيم چو بە دلدا و بىر پارم دا
 بیکەمە کوردى . لە دووای وەرگيرانەکەش ، بىنيم دە توانى پەراويز
 بو ھەندى لایەنى ووتارەکە بکرىت ، لەو پرسیارانەى بە خەيالى ئەودا
 ھاتوون ، ئیستە وەلامیان ھەيە . ئەگینا نووسینى قوول و بابەتى و بەر
 فراوان دەربارەى ئەھلى ھەق ، پىويستى بەو ھەخت و شارەزايى و توانايەکى
 تايبەتى ھەيە ، کە لە وزەى مندانى يە . پىويستى بەو ھەيە زوربەى
 دەقەکانى " سەرئەنجام " و دەست بخرىن ، دەپى خويندنە و ارە کاکه‌پى‌په‌کان
 ئەگەر خۆشيان ئەنەنەکن ، قولى دلسوزى لى ھەلمالئ و پارمە تى کەسانىک
 بەن ، کە دەروستى ئەوہ دین ، لە ئایینەکەيان بکۆلنەوہ و وەک بەشیک

مەزھەبی ئەھلی ھەق لە ئێران

ئەنوەر قادر محەمەد

پیشەکی یەك

ھەرچەندە پروفیسور و روژ ھەلات ناسی رووسی بەناوبانگ ف. آ. ژوکوفسکی ووتاری "مەزھەبی ئەھلی ھەق لە "پیرسیا" * سالی ۱۸۸۶ نووسیوو، بەلام نرخ و بایەخیکی گەورە ی ھەب . لە گەل ئەو ھەدا ئەم زانایە ماو ھەبکی کەم خەریکی ئێم مەسەلەبە بوو و دیالیکتی گۆرانیشی ھەا نەزانپو، بەلام زۆر لە بیرو راکانی ووردو قوولن و بە بئ فیزی راستە قینە ی زانایەکی گەورە ھە بۆ مەسەلەکان چوو .

ئایینی ئەھلی ھەق بە مەزھەب ناو بردن رەنگەر است نەبیت، چونکە مەزھەب دەبئ سەر بە ئایینیکی دیاری کراو بئیت . لەو دە چبیت، ئەمە زادە ی ئەو بئیت، کە ھەندئ لە زانایان و خەلک ، ئەھلی ھەق بە عدلی ئیلاھی، یان ریبازیکی سەر بە عدلی ئیلاھی دەزانن . ف . ژوکوفسکی خۆ ی پیش ھەمووکە سیک ئەم رایانە ی رەت کردو تەو و بە دووشتی جیاوازی لە قەلەم داون، وەک لە پاشاندا لە ووتارە کەیدا دەردە کە و بئیت . دووا بە دووا ی ئەم، روژ ھەلات ناس و کورد ناسی ناسراو و دیار ف . مینۆرسکی لە کارەکانیدا دەربارە ی ئەھلی ھەق دوواو، لە نامیلکە یە کیشدا " سەر ئەنجام * * * " ی کردوو بە رووسی و پیشەکی یەکی بە نرخ ی بۆ نووسیوو و پەراویزی بۆ کردوو . ف . مینۆرسکی بۆ چوون و بیرو راکانی ژوکوفسکی پەرە پێداو و بەر فراوانی کسردوون . جیگە ی داخ، کە ئەو شیعەر و پەخشانانە ی بە دیالیکتی گۆرانین و لە " سەر ئەنجام " ە کە داھەن، نەیتوانپو وەک خۆ ی دەلئ ، بیانکاتە رووسی . بەمەش کە لئینیک دەکە و بئیتە وەرگێرانە کە ی ھە .

۱۲ - تایه کله ... = ئەو رسته یه فولکلوری فارسیه و بو ئەوپه پری
شر و شرولی به کار ده هیئری ، ههروهها رسته گولی کرد و خونچه ی
پشکوت ، له فولکلور وهرگیراوه ، بو به کەیفی و سازی به کـــار
ده هیئری ، له چیرۆکه ده یان رسته ی فولکلوری نووسیوه .

۱۳- گه ره کی لوکه ريسان = گه ره کی بووه له قه زوین و دانیش توانسی
فه قیر بوون .

۱۴- شیرى اعراض = له عه جه مستاندا باوه که وهختی دایک شیر به
منداله که ی دعات ، ده بی رووی تیکاو به ده میوه پیکه نی و خوشی
بنوینی که منداله که ساخ و به ده ماخ بی ، ته گهر رووی لی وه رگی پری
و یا بگری ، ده لین ئەوه شیرى (اعراض) ه و مندالی پی نه خووش
ده بی و ده مرى .

۱۵ - هه رگ = قـــور .

۱۶- سازاده حوسه یین = ده لین کورپی ئیمام ره زایه ، گومبەز و بارگای
تایه تی له شاری قه زوینه .

۱۷- بندوک -ورده تووکی سه ری ئافرهت که به ده م شانوه دیته ده ر .

۱۸- دووگ کوژ = نال خسته نیو ئاگر و دووگ کوژی ، فیلی نووشته
نووسانه ، پارچه یه دووگ ته لیمی پرو پوچی له سه ر ده نووسن و ده ی
خه نه ژیر عه رزه وه ، دیاره به چن روژ ده رزی ، گوایه ئەو که سه ش
له و ماوه دا وه ک ئەو دووگه نه خوش ده که وى و ده مرى .

۱۹- ئاوی توربەت = توژی که سه ر گوپی ئیمامان ده نیئى ، له لایان کللیل
داره که سه وه دم فرۆثرى ، بو شیفای ته خوشی و به تایه تی بو به
قه وهت بوونی ئیمان له کاتی سه ره مه رگدا به کار ده هیئین .

۲۰- بالیوه = سه رین .

۲۱- ره وزه = ئەو مه جلیسه یه که ژنان له مالتیکدا کو ده بنه وه و
ئاخوند به گپرانه وه و شیعی گریان خویندنه وه کاره ساتـــسی
که ره لایان بو ده ژینیه ته وه .

۲۲ - مه شهه د = شاری گه وره ی وولاتی خوراسانه ، گوپی پیروزی ئیمام
ره زا له وى یه .

۲۳- فینه = نه وه کلاویکه .

پهراویز

- ۱- برنج = ماده‌یه‌کی زهرده له‌گه‌ل ئاسن و مس‌دا تیکه‌لی ده‌کهن ، زه‌نگۆله‌و زه‌نگی لی دروست‌ده‌کهن .
- ۲- گۆلده‌سته = شه‌و شه‌یه که وه‌ک چه‌پکه گۆلیکی گرد به سه‌سه‌ر مناره‌کانه‌وه ده‌ دره‌وشیته‌وه .
- ۳- خانم گلین و عزیز ئاغا = دو ناوی هه‌لبژارده‌ی نووسه‌ره کهسه گالته به ناوی " گلی خانم" ، و " عزیزه خانم " ده‌کات .
- ۴- که‌ژاوه = له تخته‌و به شه‌ندازه‌سی چوار شه‌وه‌نده‌ی بیه‌شکه دروست ده‌کرا ، له قه‌دیم بو سه‌فه‌ری دوور له پشته‌ی وشتریان ده‌به‌ست و دوو که‌سی تیدا دا ده‌نیشت یا ده‌نووست .
- ۵- هیما = له زاراوه‌ی شه‌رده‌لانی دا مانای هیشتایه .
- ۶- دژوین = چلکن ، له به‌ر چاو ناحه‌ز
- ۷- نه‌وجه = شه‌و شیعرانه‌ن که له ماتمه‌مینی ئیما‌ماندا به شاه‌نگ و ئاوازی تایبه‌تی ده‌خویندیریته‌وه و هه‌ر به‌و هه‌واو شاه‌نگه له سینگ خۆپیان ده‌ده‌ن ، یا زنجیر له شان ده‌ده‌ن ، یا قه‌مه له سه‌ر ده‌ده‌ن .
- ۸- زه‌ریح = که‌ژاوه‌ی سه‌ر گۆری ئیما‌مان که به وینه‌یه‌کی رازاوه و گران به‌ها دروست‌کراوه و له روانگی سنعاته‌وه سه‌رنج راکیشه‌ه ، پوول و پارهی زۆر له کونه‌کانیه‌وه ده‌خریته سه‌ر گۆره‌که .
- ۹- سیدالشه‌دا = له بنه‌ره‌ت دا ناز ناوی حه‌زره‌تی هه‌مزیه به‌لام له ئییراندا به حه‌ز راه‌تی حوسه‌ین ده‌لین .
- ۱۰- گه‌دا عه‌لی = یانی سو‌ال‌که‌ر عه‌لی ، یا سه‌گی عه‌لی ، له عه‌جه‌مستاندا ره‌سه شه‌افره‌تیک تامه‌زروی مندال بی ، ناوی هسه‌وه‌ل کورپی ده‌نی " گه‌دا عه‌لی " ، یا گورگ عه‌لی ، یا سه‌گی عه‌لی ، شه‌گه‌ر له ره‌مه‌زاندا مندالی بووبی ناوی ده‌نی " ره‌مه‌زان عه‌لی " ، هه‌روه‌ها ره‌جه‌ب و شه‌عبان .
- ۱۱- ماست به‌ند = به‌و که‌سانه‌ ئیژن که شیر له دیه‌اتیه‌کان ده‌کرن و ماست و په‌نیر و که‌شکی لی دروست‌ده‌کهن لی‌ره‌دا هه‌وی سه‌سه‌رۆ توانج به کاری هیناوه .

دەزانن ئەو خوشکی باوکی من نەبوو، مێردەکەى ھەزى لى کردم و عاشقم بوو، بوومە ھەوێى شاباجى خانم!!! ئەوەندە لە مالداتەکان و شەکانم دا تا لەرزۆک بوو، رۆژى سەت خەفەتم پى دەدا، دواى ئەوانەش لە رىگادا کوشتم ، لە بەر ئەو ھەوێسى پى نەگات و گشتى بوخۆم پى!!!؟
 ھەزىز ئاغا لە خوڤيان قسەکەى لە دەم پى و پێدەکەنى و فرمىسكى خوڤى دەرشت و گوتى :

کەوابوو ... کەوابوو ... ئىوھش ... ئەپەرۆ خو ئىوھش ... :
 خانم گلین ھەروانەفەسى لە قلیانەکەى دا و گوتى : مەگەر لە پىاى مینبەر دا نەت بیستوھ کە زیارەتجى ھەر ئەو وەختە پنیەتى کرد و کەوتە رىگا، ئەگەر گوناح و تاوانى بە ئەندازەى گەلای داران و رملو زىخى بیا بان پى ، پاک و خاوین دەبیتوھ ... پاک و خاوین
 پاک و خاوین ... ؟

خوینەرى بەرپىز سادقى ھىدايەت نووسەرى بە ناوبانگى ئىران، بۆ مەبەستى تايبەتى خوێ سەردىپى ئەو کورتە چىرۆکەى بھە دواى لى بوردن " ناو ناوھ و منیش لە بەر ئەمانەتى ئەدەبى ھەر بەو ناوھوھ و ھەرم گىپرا، بەلام چەن جارى بە دلما ھات کە ناوى سەر دىپرەکەى بگۆرم و بنووسم " ھەوێ سارى " کە دەردىکە لە دەردەکانى ئىمەش ، کومەلى کوردەوارى، نازانم بىرو باوھەرى تۆ چوونە ؟

عبدالقادى دەباغى

وه سیه تی کردبوو، ئەو وهخته ناو نیشانی تو و مهشەدی رەمەزان
 عەلی یان دامی و لە قەزینەوه ری کەوتین و ئەم کورە کە لـ
 گەلمدایە و پیم دەلی دایە ، هەمان حوسەین ئاغا ی کوری خەجی یە ،
 گوتم لیڤە بجیتە دەرەوه کە حەقاییە تەکەم نەبیسێ و گوئی لیۆه نەبی .
 دانیشتوان گشتیان مات و بی دەنگ گوئییان دا بوو قسەکلانی
 عەزیز ئاغا ، ئەویش فرمیسک لە کالانی چاویدا قەتیس ما بوو گوئی :
 ئیستا نازانم خودا لیم خوش دەبی یام نا ؟ حەزرت تکام بو دەکا
 یام نا ؟

خانم گیان چەن سألە بە ئاواتەوه بووم کە سفرە ی دلّم بکەمە وه و دەردی
 دەر وونم بو کە سی هەلپژم ئیستەکانی کە بو ئیۆم گیڤرایە وه ، چەشنی
 ئاوی کە بە سەر ئاگردا بکری ، ئارام بوومە وه ، کلوکوی دەر وونم
 دامرکا ، بەلام چبکەم لە روژی قیامەت ؟

مهشەدی رەمەزان عەلی خولەمیشی چەپوخەکە ی رشت و گوئی : رەحەت لە
 باوکت ئەدی ئیمە بوچی هاتوینە ئیرە ، سی سال بەر لە ئیستا من لە
 ریگە ی " خوراسان " کالسکەم لی دەخوڤی ، دووکە سی دەولەمە ندەم دەبەردە
 مەشەهد ، لە نیو ریگا دا کالسکە هەلگەرایە وه و یەکیکیان مسرد ،
 ئەوی دیکەشم خنکاند ۱۱۱ هەزار و پانستە تەمەن پوولی نەغدییان
 پی بوو کە لە گیرفانەکانیان دەرم هیئا ، ئیستا کە پیر بووم و پیم
 ناوە ته تەمەن ، کەوتە بیرە بیرە ئەوهکە ئەو پوولە حەرامە ۱۱۱
 هاتە کەربەلا پاکی کەمە وه ۱۱۱ هەر ئەو رو پوولەکەم بەخشی بـ
 یەکی لە ئاغایانی عولەما ۱۱۱ هەزار تەمەنی بە حەلالی دامە وه ،
 دووسەعات زیاتری پی نەچوو ، ئیستا ئەو پوول و پارە یە لە شیری
 مەمکی دایکەم حەلال تر و پاک و خاوین ترە ۱۱۱ ؟ .

خانم گلین قلیانەکە ی لە عەزیز ئاغا وەرگرت و مژی لیدا و قولتە ی
 لی هیئا ، دووکە ئەکە ی لە دەم و لووتە وه بەرە و عاسمان بەرپی کرد ،
 پشوویەکی دا و هەناسە یەکی هەل کیشا و گوئی : خوشکە گیان ، هەر
 ئەو شاباجی خانمە ی لە گەلماندا بوو ، دەمزانی کە تەکلان و
 جوولانە وه ی ئەم ریگا دوور و درێژە ی بو خراپە ، ئیستخارە یثم کرد
 بوو هەر خراپی هیئا بەلام هەر هیئام .

له تاو ههلاتندا كه ههـوو له خهـو ههـستان، چووم درگای وه تاغیـ
 خهـجیم كردهـوه، تماشام كرد وهك خهـلوز رهـش داگیر ساوه و ههـناسهـی
 دهـرنایهـت و لی بوهـتهـوه، شهـوهـنده خوی بهـم لاو شهـولادا كوتا بیـوو
 لیفهـو دوشهـك و بالیوی ۲۰، ههـركوتهـی كهـوتبوه شوینیک، ههـنامهـ
 سهـر دوشهـكهـو بالیوم خسته ژیر سهـری و لیفهـكهـم به سهـریدا كیشا،
 منالهـكهـش ههـردهـگریا .

له دیوی خهـجی هاتهـدهـر و چوومه سهـر ههـوز و دهـستم ناوكیشا، ئانجا
 دام به سهـرخۆمدا و هاوارم كرد و بهـشین و گریان خهـبهـری تالیـ
 مردنی " خهـجی " م بو گهـدا اهـلی سهـرد .

ههـركهـس لی دهـپرسیم خهـجی بوچی مرد؟ دهـمگوت : ماوهـیهـك بوو بوئهـوهـی
 سکی پر بیتهـوه داودهـرمانی دهـخوارد، زوړیش قهـلهـو بیوو، وی دهـچی
 سهـكهـتهـی گرتبی، مهـرگی موفاجا ته ۱۱ .

بهـلام خۆم دهـخواردهـوه، به خۆم دهـمگوت : شهـوه منم كه تا ئیستا سی
 خوینم كردهـوه، سی ئینسانم كوشتوه ، له ئاوینه بالا نوینهـكه كهـه
 دهـمروانیه خۆم دهـترسام، سام دهـی گرتم، ژیانم لی تال و ههـپام بیوو،
 دهـچوومه مهـجلیسی " رهـوزه ۲۱" دهـگریام و فرمیـكم دهـرشت، پیـوول و
 پارم به فهـقیر و ههـزار دهـبهـخشیهـوه، بهـوانهـش دلم ئارامی نهـدهـگرت
 و ههـر ههـراسان بووم .

به تایهـتی كاتی له پای مینهـبهـر دا وهـبیری روژی قیامهـت و گـورو
 شاری قهـبر و لی پرسینهـوهـی نهـكیر و مونكهـر دهـكهـوتم خودا ههـر خوی
 دهـزانی چیم به سهـردا ههـات ۱۱۱ .

شهـوهـخته كهـوتهـبیرم كه واباشه بچهـ كهـربهـلا و لهـوی دانیشم "مجاور"
 بم، چونكه گهـدا اهـلی خویشی نهـزری كردهـوو كه ههـر بچیهـ كهـربهـلا ،
 بهـلام پهـلپ و بیانووی دهـهیناوه و دهـی خسته پشت گوئ و شهـم دهـس و
 شهـو دهـستی دهـكرد و دهـیگوت : سالیکی دیکه دهـچینه " مهـشهـدهـد ۲۲"
 چوونكه شهـو تهـرهـفانه (لای كهـربهـلا)، ئازاری تیدایه، ههـروهـهـا
 خسته پشت گوئی تا عهـمـهـری دا به ئیـوه .

شهـو سال منیش دانیشتم و كلاوهـكهـی خۆم كرد به قازی، گشت دارایی و
 سامانی گهـدا اهـلی م فرۆشت و نهـغدم كردهـوه، لهـبهـر شهـوه خـوی

ثوف خوايا خاک خه بیری بو نه با !! .

له بندوکی ۱۷ تووکه سهری خه جی برپیکم دزی و بردمه لایمه لایر ایلمی
جووله که ، نه و مه لایه له گه ره کی "راه چمان"ی قه زوین به ناوبانگ
بوو ، له و قژه سهره سیحرم لی کرد ، نالم بو خسته نیو ئاگر ،
مه لا برایم سی تمه نی لی وه رگرتم که دووگ کوژی بکا ، ۱۸ قه ولی
دا و سویندی بو خواردم که له ماوه ی هه وتوو یه ک دا خه جی ده مری !!! .
به لام بوو به مانگیک و خه جی چه شنی کیوی ثو خود روژ به روژ قه له وت
و پان و پور تر ده بوو ، به گیانی ئیوه به چاو پی که وتنی
نه و کاره ساته و به نه زموونی خوم ، ئیدی باوه رم به سیحرو جادووو
نه و شتانه ش نه ماوه ، مانگی دوا ی نه وه هه وه ل شهوی زستان بوو ،
شهوی یه لدا ، گه دا عه لی نه خوش که وت ، کتوپر وای لی هات که دوو
جار وه سیه تی کرد و سی که ره ت ئاوی تور به تمان لبه گه رویدا کرد !! .
ئیواره یه ک که میرده کم زور نار ه حدت بوو چوممه بازار و له لای
عه تتاریک نه ختی داره شکینم کری ، هی نامه وه مال و دیزه ی ئاوو
گوشته کم دا گرت و تیکه لم کرد و خسته وه سهر کوانوه که ، بوخوم
تیکی حازریم کری بوو به دزیه وه خواردم و تیر بووم و چوممه وه
لای میرده کم دانیشتم و قسه ی خوشم بو ده کرد ، دوو جار خه جی
ده نگی دام و گوئی دره نگه با بچین شیو بخوین ، گوتم برسیم نیه و
سهریشم زور دیشی ، سک خالی بی باشتره ، توشیوی خوت بخوم ،
نوئی گیانت بی !! .

خانم ، خه جی شیوی هه وه ل و ئاخری خوارد و نووست ،
چوممه پشت درگا و گویم شل کرد من ده نگی ناله و هاواره که ییم
ده بیست ، به لام له بهر سرما که درگا کانیش داخرا بوون ده نگسی
نده گه یشته دهره وه و هاوسی کان نه بیان ده بیست ، به بیان سووی
چاودیری له گه دا عه لی تا روژی پاک له لای مامه وه و نه هیشیت
نه ویش بخه وی ، بوومه لیلی به بیان دووباره به ترس و له رزینسه وه
چوممه پشت درگا و گویم شل کرد ، منداله که ده کرووز ایسه وه و
ده گریا ، نه و ویرا درگا که بکه مه وه ، هاته وه لای میرده کم ، نازانن
چ حالیکم بوو .

زیـاره تی که رهـلا .

سه ری هه شت مانگ و ده روژ خه جی کورپکی دیکه ی بوو، به لام شه مجاره وه کو شتیکی زانی بی، بو چا و ترووکا دنتیک منداله که ی به جی نه ده هیشت، منیش دوو دل پیووم، منداله که بکوژم یا کاریکی وا بکه م گه دا اعلی خه جی تعلق بـدات .

به لام شه وانه گشتیان خه یال پلاو بوون، خه جی دیسانه وه بوو به خانم و که ی بانوو، فه رمانی به سرمد ا دها. که س نه ی ده توانی قسه له قسه ی بکات .

منداله که بوو به چوار مانگه، هه موو شه ویک ئیستخـاره م ده گرت ه وه که مناله که بکوژم یا نه ی کوژم؟ له ئاکامـدا. بریارم دا که شوینی حوسه یین ئاغاش وون کـم و سه ری به بن ئاودا بـکم .

دوو روژ ئیشکم داشت، روژی دوهه م خه جی چوو ده ری که له دووکانی عه تتاری کو لانه که ماندا نه ختی گو له وه نه وشه بکـری، به گورجی چووم به لای لانکی منداله که وه، ده رزی سنجاخه که م له به روکم. ده رکیشا گوتم ده یکم به ته ویلی دا، به لام له کاتـی سه ربیشکه که م لدا، له خه و راجه نی، له جیاتی شه وه گروو بگـری و بگری، به ده مه وه پیـکه نی .

خانم گیان نازانی جیم به سه راهات، موچوو رکه یه که له ته وقـی سه زمه وه هات و له شه نگوستی پیـمه وه ده رچوو، بی ئیختیار ده سـتم هاته خوار دلم نه هات بیکوژم، ئاخه هرچی بی دلم خو له سه برده ئاسن نه بوو. سه ربیشکه که م به سه ری دا دایه وه و ده رپه ریمه ده ره وه، له دلی خو مـدا گوتم: ئاخه شه و منداله به سته زمانه چ سهـووچ و تاوانیکی هه یه؟

ووکه له کوته وه یه، ده بی دایکی مندال له ناو به رم تا به ته واوی ئاسـوو ده بـم .

گیانه ئیستا که بو تانی ده گپـرمه وه گشت ئازای له شم ده له رزی، به لام چ بکه م؟ هه مووی خه تای مپـرده ئاگر گرت ه که م بوو، خانم گیان منی کرد بوه ژپـر ده سـتی که چه ماست به ندیک ۱۱.

شازیز و نازدار و نازهنین بوهوه، گهدا اعلی گیانی به سهر
کورهکهدا دهر دهچوو، وهک گویرهکهی بهنی ئیسراییل دهیان لیستهوه،
خوا به قهومی مووسا گویرهکهی دابوو، بهمانیش کوریکي ژیکهلهی
قز زپریسن،

دوو روژان نهچووه دهری و هدر له مالهوه دانیشته و کورهکهی وهک
چهکگول لهبر دهمی دا دهناو تماشای دهکرد، هیشتا هدر تیبری
ندهخوارد.

دیسانهوه همان چیشته و همان دهفر، گیانه به دهست خوم
نهبوو، چاوم به ههوی و مندالهکهی ههل نه دههات.

روژیکیان خهچی سهری قال بوو، دیسانهوه خوم وون کورد و دهرزی
سنجای گورینم به مهلاشوی مندالهکهی دا کرد، شهویش دواي
روژیک گریان و کرووزانهوه مرد.

همه دیسان شیوهن و گریان و باوهکرو و رولهرو و قور پیوان
کهوته ری، ثم کهرته نازانن خوم چ حالیکم بوو، لهلایهکسهوه
له خوشیان قهند له نیو دلما ده توایهوه و له لایهکی دیکسهوه
بیرم دهکردهوه، شهوه تا ئیستا دوو خوینم کردوه، دوو بی تاوانم
کوشتوه.

به بیانوی مردنی کورهکسهوه هاتبوومه زمان، له سهرو سینگی خوم
دهدا و دهگریام، شهوهنده گریام و قورم پیوا که خهچی و گهداعهلی
دلیان بومن دهسووتا، سهریان لهوه سوورما بوو که من تسیا چ
رادهیهک مندالی ههویکهم خوش ویستوه، بهلام شهوشین و گریانه بو
مندالهکهی نهبوو، بو خوم بوو، روزی قیامت !!! بو گوره و شاری
قهبر بوو !!!

ههر شهوه میردهکهم گوتی: خوا به قسمه تی نهکردوه که من
مندالم بیی، دهبینی مندالهکانم پی ناگرن دهمرن.

پاشچهندر روژیک دیسانهوه خهچی زگی پر بوو، میردهکهم شه کهرته
کهوته نهر و نیاز، گوتی شهگهر کچ بی دهیده به سهیدان، شهگهر
کور بی نیوی دهنیم "حوسهین" تا حدوت سالن تیخ له سهری نادهم
دواي حدوت سال قزی سهری به زپ دهکیشم و لهگهل خوم دهی بهمه

دهرمان خوارد کربوو، خانم گيان هەر شه و شافره ته شروشرو له که بهملي شكاوم خووم چووم و له گهره کي "لوکه ريسانه وه" هينام بداني ژمارد بووم، بهرهورووي ميړده کهم پي ده گوتم: عزيز شاغا بسی زه حمت من ده ستم ناگات تو پيرو پيسه کاني منداله که بشو ۱۱۱ . شهوي که لدهم دهرهات تاورم گرت ، چاوم نوقان و دهم کرده وه ، به بهرهورووي ميړده کهم هه رچي له زارم هاتدهر بسه خوي و منداله کهم گوت ، رووم کرده گه دا اعلي و گوتم: زوکه تلاقم بده ، بهلام شه و بهر حمت چووه ده ستي ماچ کردم ، دهی گوت بو واده کهی ، ده ترسم شيري (اعراض ۱۴) به منداله که بدات ، تو سه بریکه تا منداله که پي ده گري و ده که وپته سر لاق ، بانه ختي له خم بره خسي ، شه و وه خته خه جي تلاق ددهم .

به لان له تاو خه يالات خه وو خورا کم نه بوو ، تا وه ختي ، شاي خواتوبه ، شاي خوا شامان .

بو شه وي جه رگي خه جي بسووتينم ، روژيکيان خه جي خانم ته شريفی چوو بوه همام ، مال چول بوو ، چووم به لای لانک و بيشکه وه منداله که له شيرين خه ودا بوو ، دهرزي سناخه کهی به روکي خووم کرده وه رووم لي وهر گيرا ، به ته واوي کردم به مه لاشوي مندال و به گورجي هاتده دهری ، خانم شه و منداله ده می ليک نه دهنه و دوو شه و دوو روز هه رگرييا ، داو دهرمان و نوشته و دوعا که لکی نه بوو ، بو عه سري دوا روژمرد و عه مری دا به شيوه ۱۱۱ .

دياره ميړده کهم و خه جي ده گريان و خه فه تيان ده خوارد ، بهلام من وه کو تاويکي فينک به دلما کراي کول و کوي دهروونم دامرکا ، ده نگوت لاني کهم تاواتي کورپيان له دلدا مایه وه .

ماوهی دوو مانگيگ به و شيوه ی رابورد ، ديسانه وه گرتي و خه جي خانم شانس بوو ، شه که ره ته نمداناني چ خاکيک به سر خومدا بکه م ، خولي کوئ بکه م به هرگ ۱۵ و بيکه م به سه رما .

گيانه به و شازاده حوسه ينه قه سم له تاو مه راق و خه فه تي خووم دوو دانه مانگي ره بق نه خوش که وتم و له جيگه دا خه وتم . سه ری نومانگه خه جي تره کا و کوريکي ديکه ی خسته وه ، دوو بياره

گۆشتی نوپیی هیناو له نهكاوایش گرتی و سکی پر بوو، خه جی گۆلی گرد و خونچهی پشکووت .

ئیدی میرده کهم ته وای بیر و فکری چوو لهی شهو، شه گهر له چلهی زستاندا بو مهگیرانی و بیزوو داوای بلالوک و گیلاسی بگردایسه، گه داعه لی له بن بهردیش بوایه بو پییدا ده گرد و دهینایه بهرده می، من که و تبوومه بهد بهختی و چاره رهشی بهوه .

شه وانه که ده هاته وه له پيشدا سهری له وده دا و ده سهری حیل و گۆلی بو ده برده وه، منیش به سه ده قه سهری خه جی ی کچی حه سه ن ماست به نده وه ده ژيام، ههر شه و خه جی به کخ وهختی هینامه مالی خوم تايه ک له که وشه کانی ١٢ نه وحه ی ده خویند و تاکه ی دیکه شی سینگى بو ده کوتا، که جی وای لی هات خوی به سر مندا هه لده کیشا، شه کاته ده سستی خوم گه زت و زانیم چ بیجا به کم کردوه .

خانم گیان نو مانگی ته وای ددانم به خومدا گرت، لای ده رو جیران و هاوسی و دراوسی به زلله رووی خوم سوور ده کرده وه. به لام به روژ دا. که میرده کهم له مال نه بوو، خه جیم ده ته زاند، شوف خاک خه به سهری نه داتی، !!!

لای میرده کهم بوختانم بو ساز ده کرد و گوتم: به پیری ناشقی چباو بو قیک بووی، نو مندالت نابی، خه جی له گه ل مه شه دی ته قی که وچک ناشدا ده سستی تیکه ل کردوه و سکی پر کردوه .

خه جیش هه روا قسه ی بو من ساز ده کرد و سهرتان نه یه شینم شه پروکیشه ی ئیمه هه موو روژیک ده ر و دراوسی ی ناراحه ت و جازز ده کرد و له ده ستمان هاتبوونه شامان .

دلّم هه زوه ک سیر و سرکه ده جو شا و قولتی ده خست، ده چووم کتیبیم ده گرتوه، سیحرو جادوم لی ده کرد، شه ی خوا هاوار ١١ .

به لام خه جی ده ته کوت گۆشتی به رازی خواردوه، هیه سیحرو جادوو یه که کاری لی نه ده کرد و روژ به روژ قه له وتر ده بوو، تا دوا ی نومانگو نو روژ و نو ساعه ت خانم زا، شه ویش چی؟ مندالکی نیرینسه، کورپک. به قوربان ت بيم ئیدی من له و ماله میرده یه م سووک و چرووک و بی حورمه ت بووم، نازانم خه جی موره ی ماری پی بوو یا گه داعه لی

به هەر دژوکیان هیئایانهوه مالهکەى خۆیان و بەدهوریهوه کـۆـ
بوونهوه ، پاش ئهوهى دوو چای شیرینیان دەرخوارد دا ، قلیانهکیان
بو چاخ کرد ، وحهسایهوه ، عزیز ئاغا گوتی : بهومهرجه حوسهین ئاغا
بچیتهدەر سەر گوزهشتهى خۆم دهگیرمهوه ، حوسهین ئاغا بو زیارهت
چووهدهر ، عزیز ئاغا قلیانهکەى چاخ کردهوه و کیشایه بهر دهـمـى
خۆى و بهم جوره دهستی به قسان کرد .

گلین خانم گیان ، به قوریانت بم ، دهزانی وهختی میردم کرد و چوومه
مالی خوالی خوشبو " گهـداـ عـهـلى " ١٥ سى سال ههروا پیکهوه بهخوشى و
شادی ژیاين ، به چهشنی سهکینه سولتان میردهکەى خۆى به گهـداـ عـهـلى
دهشکاندهوه ، گهـداـ عـهـلى منى وهک بوتدهپهرهست ، بهلام لهوماوه دا
زگم پر نهبوو ، ههـرـلـهـبـهـر ئهوه میردهکەم دهخزایه بن کلیشهمودههگوت
ئیلا و بیلامندالم گهـرـهـکه ، ئاخـر ئهوه بهدبهختیه که من و جاخـم
کویر بى ، منیش ههـرـچـى داو ودهرمان بوو کردم ، هیچ نهما نهیکم ،
نووشتهو دوعایهکی زۆرم نووسی ، بهداخوه هیچکامیان کهلکی نهبوو ،
مندالم نهبوو که نهبوو ، کورده ووتەنى :

نهنووشتهى مهـلا نهـدـوعـای سهیى هیچیان وهفریای دهردم نهگهیی
شهویکیان گهـداـ عـهـلى میردم دهستی کرد . به کریان و فرمیسکـى
داباراندهو گوتی : ئهگەر تو رازی بى سیغهیهک دینم که ههم
خزمهتی مال بکا و له بهر دهستی خۆتدا بى ، پاش ئهوهى مندالمـان
بوو تهلاقی دهدهم و تۆیش مندالهکه به شیوهى مندالی خۆت قبول کهو
بوو خۆمان گهـوـرـهـى دهکەين .

منی چاره رهش فریوم خوارد و گوتم : زور باشه ، خۆم ئه و کارهت بوو
دهکەم .

ئهو شهوه به خوشى نووستین ، بهیانی دووای نان و چاخواردن چارشپوم
دا به سرماو چوومه خوازبینی خهجی کچی وهستا حهسهنى " ماست لهـندـهـ"
که یه جگار ناحهز و رهش و هاو له روو بوو ، وهختی خهجی هاته مالی
ئیمه شهوهنده شر و شرول بوو ئهگەر ههـرـزـنـت بهسردا بکردایه
دهنگیکی نهده کهوته عهـرـز ، ئهگەرلوتت بکرتایه گیانی دهرده چوو ،
بهلام دووای مانگی ورده ورده ههـلـیـدا ، رهنگ و روویهکی پیدای کرد و

گوڤلاکي به رڼوه بون و رڼچکيان به ستبوو .

کاروان راوه ستا ، مه شهدي رهمه زان و حوسهين ئاغا هاتنه پيش و به يارمه تي نه وان خانم گلين و عزيز ئاغاش له که ژاوه که دابه زين . ئاپوره يه که له و خه لکه هيرشيان هينا و هر پيارچه يه که له نه سپاپه کانين به دهس يه کيکه وه بوو که نه وانين بو مال و مه نزي خوږيان بانگ ده هيشت ، له و قهره بالغه دا . کوتوپر عزيز ئاغاوون بوو هر چي به شوينيد ا که پران و پرسپاريان کرد فايده ي نه بوو .

سهر نه نجام خانم گلين و مه شهدي رهمه زان و حوسهين ئاغا و تاخيکي که سيف و قورينيان له قهراري شهوي حوت (۷) روپيه به کري گرت و دوباره که وتنه که پران ، بو هه وال و قولافي عزيز ئاغا ، ته واوشار که پران ، هه واليان له مجه وري مزگهوت و باره گا و زياره تنامه خوښه کان ده پرسی و ناو نيشانين هه لده دا ، هيچ شوينه واريکيان دهس نه کهوت .

له کاتي خوږئاوادا باره گا که سي چول بوو ، خانم گلين بو جاري نوهم چووه وه بو ژور حهره م ، که جوان روواني و تماشاي کرد ، ديتي نه وه دهسته يه که ئافرهت و ئاخوند به ده وري ئافره تيکه وه ئالقه يان به ستووه و شه ویش قوفلي " زه ريح (۸) " ي توند توند گرتووه و به ئامان و زامان به ري نادا ، ماچي دهکا و هاوار دهکا و هاوار دهکا ، يا ئيعام حوسهين گيان بگه به هاوارم ، فريام که وه ، له سهره و ژيري قهر ، له روژي به قه د . په نجا هزار سال ، له کاتي که چاو گه ل له هه يبه تا ده چنه ته وقي سهر ، چ خاکيک به سهر داکم ، وه ره به هاوارمه وه ، به قورباتت بم فریان که وه ، توبه ، توبنه ، بيجام کرد ، لي م بيووره !! .

هر چي لييان ده پرسی چي قه و ماوه ؟ چ بووه ؟ ولایي نه ده دايه وه ، له ئاکامدا هر نه وه ندي گوت من کاريکي نه و توم کردووه که ده توم " سه ييد الشهدا " نهم به خشي ، لي م نه بووري .

خانم گلين ده نکی عزيز ئاغاي ناسيه وه و چووه پيش ، ده ستي گرت و نيوه زور نيوه نکا کيشايه ده ر و هينايه نيو حه وش (سه حن)

حوسهين ئاغاش په يد ا بوو .

له شاخري هدر شيعر يکيدا زياره تچيهکان به دهنگی بلينند
سهله واتيان ده نارد .

گومبهزی پر شکو و زيرين و منارهی بهرز و قهشنگ و رهنگين ودهدر
کهوتن، گومبهزیکی شای رهنگی دیکهش که هاوتای گومبهزی زيرين و
له نیو خانوه قورینهکان چهنی پینهی ناجور خوی ده نوانند
وهدهرکهوت .

کاتی دووای عسر کاروان گهشته نیو خیابانیک که هدر دولا دیواری
رووخواو و دوکانی پچوکی به قور دروسکراو بوو، لیرهده ا ههشامه تی
خهک قهره بالغیکی سامناکی پیک هینا بوو، عاره بیه قول
ههلمالدر اوهکان به رومایهکی بهروالته ساویلکه و گهوجانسه ،
فینهیان له سر نا بوو بهلام به کهسم و قهلافتهیان ده زانرا که
شاورى ژیر کان ، به دهست و ریشی خهنه لیدراو و سهری تاشلیراو
میزه ری پیچراوه وه ته سبحیان ههله سهوراند ، به پیلاوه سهرپایی
(تابه تی خویان) به عابا و پانتوله وه ده گهپان و سهرییان ده کرد .
به زمانی فارسی وتویژیان ده کرد ، یا تورکیان ده فلتاند ، یا به
عاره بیهکی که له بن گهرو و نیو ریخوله کانیهان وه ده هاته ده و ده دوان
و دهنگیان له ههوادا ده زرينگایه وه .

شافره ته عهزه بهکان به چرو چاوی خال کوتراو وچلکن و چاو گهلی وینه
سووتاو خهزیم له کونه لووت کراو یه کیکیان مهکه ره شهکانسی
خسته بوه ده می مند الیکي دژوین که له باوه شی گرتبوو .

ئه و خهله که به هه موو جوړیک مشته ریان بو لای خویان را ده کیشا، یهکی
نه وحی ده خویند ، یهکی سینگی ده کوتا، یهکی به رده موره و ته سبیح و
کفنی ته به روکی ده فروشت ، یهکی جندوکهی ده گرت ، یهکی نووشته و
دوعای ده نووسی ، یهکی مالی به کری دهدا .

جوله که کهوا شوره کانیش زير و گهوه ر و شتی له میژینهیان له
ریبواران ده کری .

له بهر قاوه خانه یه که دا کابرایه که د انیشتبو ، قامکیکی له کونه
لویتدا بو ، به دهسته که ی دیکه ی چلکی نیو نه نگوستی پای ده رده هینا
و میش و مهگهز له ده م و چاوی ورووژابوون ، سپی به ره و سهرو

دهكهن و دهكه ونه ريگا ټه گهر بيشمرن به خراون !! .

هر وهختي ټم تابووتانه ده بينم له شم دپته له رزين، نانا، مـ
دهمه وي بچمه نيو حهرم، له گهل حزره تا درده دل بكم دوواي ټه وه
له بازار كفن بو ټوم بكرم ، جا ټه وهخته بمرم. دوو ټه و لـ
خه ونمدا. شاباجيم ديت ، دوور له ټيستا ټويش له وي بووي، له نيو
باخيكي گه وړه ده گه پراين، سه بيدكي نووراني به پشتيني سنيه وز و
عاباي سه وز و ميزه ري سه وز و پيلوي سه وزه وه به ره و پيرمان هـ
و فدرموي : يا خوا به خيبر بين، خوشيتان هينا، به ټه نـ
بالاخانه يه كي سه وزي پي نيشان داين و فدرموي : بچن به سينه وه ،
شه كه تيتان ده ركهن ، ټه وه ي كه فدرموو له خه و راپه ريم، خوژگه به
بهخته وه ري خوي .

قافله كه به هه را و هوړياوه ده روپشت و چاوش (قام بيژ) هـ
له پيشه وه ټه و شيعرانه ي ده خوښنده وه :

هه ركه سي هه وه سي كه ربه لاي هه يه بيسمي لا

هه ركه سي هاوړيي هان ده كا بيسمي لا

قام بيژيكي ديكه ولامي دهد ايه وه :

هه ركه سي هه وه سي كه ربه لاي هه يه خوش بي

هه ركه سي هاوړيي هان ده كا خوش بي

قام بيژي هه وه له ده يگوته وه :

چ كه ربه لا ، ټينسانه ي لي به هوش دي

هيما ناله ي زينه بده گاته گوي (٥)

قام بيژي دووه هم ولامي دهد ايه وه :

چ كه ربه لا ، ټازيزان، خوابه نه سيبتان بكا

منيش به قوربان شاي غه ريب بكا

چاوه شي هه وه له ټالاهي ده جووليني ، به ده نكيكي به رزتر هاوار ده كا

ټه و زمانه به پرين چي كه ټه وشانه نه لپت

كه بو محمد خوشه ويستي خوا سله وات

به يازده كوري علي كوري ټه بوتالب

به مانگي روخساري وان، جيا جياسه له وات

بهلام ئه وپو، کاتی که سه رده سته کاروانچهکان چوو سه رته پو لکه
"سهلام" و بانگی گه شتتی دا وئنه نام و به خشیشی له ریپواران
وه رگرت و گولده سته (لا) ریپنهکان ده رکه و تن به گشتی سه له واتیان نارد،
له شی به بار و داهیزراویان سووک بوو، رهنگ و روویه کیان هاته وه
به ر

خانم " گلین (۳) و عهیزئاغا" (دوئافره تی زیاره تچی) به و چارشپوه
وینه عابای بوره وه توزاوی و ماندوو له شاری قهزوینه وه تا شیر
له نیو که ژاوه (لا) که دا وه که مه شکه ژا بوون، هر روژیکیان به سالی
لی رابوردبو، عهزیز ئاغا ته او شهکت ببو، بهلام له بهر خوینه وه
ده بیگوت :

" زور چاکه چونکه بو زیاره ت ده چم " .
عه ره بیکی پی خاوس به رومایه کی رهش و چاوگه لی زه ق وریشی کو سه یی،
زنجیریکی ئه ستور به ده سته وه له برینی رانی قاتریکی ده دا و جارو
بار لای ده کرده وه و ئاوری ده دایه سه ر دانای ریپواران و سه رنجی
ده دان .

خانم گلین به رهنگی په ریوه وه په رده ی بهینی که ژاوه کی لدا و به
عهزیزئاغا که له تای دیکه ی که ژاوه که دا دانیشتبو گوتی : خوشکه
گیان هر له دووره وه که گولده سته که م چاو پی که وت روحم که وت ه
فرین، شاباجی خانمی هزار به قسه تی نه بوو،

عهزیز ئاغا که به ده سته خال کو تراوه کانی، باوه شینیکی به ده سته وه
گرتبو، بو فیئکی، خوی پی باوه شین ده کرد ولای دایه وه و گوتی:
خوالی ی خوشی، هرچی بوو شهلی ئیحسان و چاکه بوو، به لام
نازانم بو چی و له رزوک و ئیفلیج ببوو ؟

له گه ل میرده که ی کیشه یان لی په دا بو، کار که وت ته لاق کاری و
دوای شه وه پیواز به ترشی خوارد و به یانی نیوه ی له شی له کارکه وت
و له رزوک بوو، هرچی داوو ده رماندان له گه ل کرد چاره ی نه بو،
من خوم هی نام و گوتم به لکوو " هه زره ت" شفای بدات و چاکی کاته وه .
وا دیاره جوولانه وه ی ریگای بو چاک نه بووه ؟

بهلام گیانی چوو ته به هشت، ئاخه زیاره تچی له و کاته وه نییه ت

داوای لی بوردن

نووسەر: سادقی هیدایهت نووسه‌ری به داویانگی فارسی
وه‌رگیـر: عبد القادر ده‌باغی

تپ و تۆزی خۆل و رملی بیابان به سزه‌ی بایه‌کی گهرم
ده‌ژایه سەر رومای ریواران، تیشکی به تیئنی هه‌ تاو، ده‌ی سووتاندو
ده‌ی توانده‌وه، ده‌نگی یه‌ک جوهری زه‌نگی ئاسن و برنجی (۱) لاسی
و شتره‌کان له‌گه‌ل پیی و اندا هاوړپیی ده‌کرد و ملیان له‌نگه‌ری ده‌خست
و لمبوزی تووره و لچ و لیوی شوړیان وای نیشان ده‌دا که له‌ به‌خت
و چاره‌نووسی خوێان رازی نین .

کاروان زۆر به‌ هیمنی و وردی له‌ نیو شه‌و تپ و تۆزه‌وله‌و ریگه‌په‌ر
خاک و خۆله‌که‌ره‌نگی خۆله‌میشی لی‌نیشته‌بووده‌رویشته‌و دوورده‌که‌وته‌وه .
به‌ر جه‌وته‌د و دیمه‌نی ده‌ور و به‌ری بیابان و ده‌شتی چۆل و هۆل و بی
ئاو و گژ و گیا تا چاو هه‌ته‌ری ده‌کرد ، یه‌ک سان و یه‌ک جوړ بوو .
ته‌نیا له‌ بره‌ شوینیکدا ته‌پۆلکه‌ی پچوک - پچوک له‌م‌لاو شه‌ولای ریگادا
ده‌بینرا ، چهن رۆژه‌ری ده‌رویشته‌ی به‌ بی شه‌وه‌ی تاقه‌دار خورم‌ایه‌ک
شه‌و دیمه‌نه‌ تیک‌دا ، له‌ هه‌ر شوینیی چالوو یکی بوگه‌نی تیدا بوایه ،
خیزانیک به‌ ده‌وریه‌وه‌ خپوه‌ت و چادریان لی هه‌لدا بوو، هه‌له‌وا ده‌ی
سووتاند و هه‌ناسی به‌ دوواوه‌ ده‌گیپ‌ایه‌وه ، ده‌تگوت‌گه‌یشتوویتسه
دالانی جه‌هننم .

۳۶ رۆژ بوو که کاروان ریگای ده‌په‌ری، ده‌م و زاری ریواران وشک
ببو، له‌ر و لاواز ببون و گیرفانیان پاک تاو ده‌بوه‌وه ، په‌اره‌و
پوله‌کانیان چه‌شنی به‌فهری به‌ر هه‌تاوی عه‌ره‌بستان ده‌توایه‌وه .

تۆم بېر ناچئ ...
شەي دلەكەم :
كاتئ دەنووی ، تاكي چهپی
پەنجەرەكەي ژوورەكەتان بکەرەوه ،
دەرگای دلەت با هەمیشە کراوه بی ،
بەلکو شەوان
فریشتەكەي رووحي شەیدام
بو یەك ساتئ ، بو لەحزەیه
بە هیمنی دیتە ژووری و
دوا هەوالم بو توی ئازیز دینیتەوه
بیرت نەچی
كاتئ دەنووی تاكي پەنجەرەكەي ژوورەكەت بکەرەوه ...

۱۹۸۶ / ۹ / ۲۱

تیبینی : ئەم هونراوہیہ ہەر کۆپلہی ہی روژیکہ

شەھەد عارف

کوردستانی عیراق ۱۹۸۶/۹/۳۰

کاتئی دهستی مالّ ئاوايی هه‌ده بیری ،
 ماسی چاوان دوانیگایه‌ک
 له نیو گۆمی فرمیسکدا به‌پری ده‌که‌ن ...
 خه‌مه‌دیته پیشوازی ده‌ست هه‌لبیرین و نیگا‌کانت
 ئه‌ی خانمه‌که‌م
 راسته‌ چونت
 ساته‌ وه‌ختی ، روژی‌مانگی ، ئاوا ده‌بی
 به‌لام ئازیز
 به‌ر له‌وه‌ی بگه‌رییته‌وه
 هه‌ست و نه‌ستم ، هه‌موو زیانم
 له‌ پیشوازی گه‌رانه‌وه‌ت
 په‌یکه‌ر ئاسا راده‌وه‌ستی ...

* * *

له‌ به‌ر دیده‌ی خه‌یالدا
 ده‌تبینم وا راوه‌ستاوی ،
 روو له‌ ئاسو و ده‌سته‌و نه‌زه‌ر
 چاوه‌پروانی ...
 به‌لکو قه‌ده‌ر گه‌رانه‌وه‌م
 بکاته‌ تاوه‌ بارانی ...
 کیلگه‌ی خه‌می تو بی لانه
 پاراو بکات ...
 ئه‌ی دل‌که‌م ؛
 ئاواره‌یی ناخه‌م ده‌گوشی ،
 غوربه‌ت ده‌مکا به‌ به‌رداشی
 سه‌مه‌ی ئه‌م روژگاره‌ دا ...
 هه‌مووشتی
 بو ئاوا بوون هه‌نگاو ده‌نی ...
 بو یه‌ منیش بو له‌حزه‌یه‌ک

بویه کاتی راست بوومه وه
به دوو چاو ان عهدالی تریفه هی سانگ بووم ...

۱۹۸۶/۹/۲۰

زوریان ده گوت ...
به سه عیشق گمه نی یه ،
روژی دادی له کوره خانه ی عیشق دا
کلپه و گرت ئاسمان ده گری ...
ئه وسا و ئیستاش
هر ده مگوت و ده یلیمه وه ؛
ئه وه ی له ری ی عیشقا نه بی به چراخان
خوا دهیگری ...

* * *

ده لین خه بات
هر له پیناوی خاكا ده گری ...
مروقی که شهید ده بی ،
کفنی ئالی نه مری پی ده بری ...
به لام گیانه ،
من له م ژیانه
گهر خه باتم یه ک لا نابیی
گهر عیشقی توش سه نگهر نه بی
نه پیشمه رگه م
نه کوردستان بو خوم ده که م به ده زگیران

* * *

له کاتی که تو ده پروی
ئاسوی سورخن
تیشکی هه تاو له هه میزی نووستن ده نی ...

روژگار فره ناخوش بووه
 شه مەرگه گه ماروی داوین
 له وانیه چیدی به کتر نه بینین ...
 مەرگ مه ودا نه دا دوا جار
 له شامیزی میهری به کا
 بو یهک ساتی پشوو بدهین ...
 به لام ئیستا ،
 له م ساته پر غوربه ته دا ...
 تو میوانمی ...
 میوانیکی خوشه ویستی خه مه کانی ،
 چاو له چاوت ناگویمه وه
 به لکو کاتی که ده شمرم
 جامه شای له ده ریای چاوه کانی تو
 ده خومه وه ...
 خوشه ویستم ، که ده شمرم
 ژیانیکی تر له پیشمه وه چاوه پروانمه ،
 به چاوانت قه سم له ویش
 بو تو ده ژیم ...

۱۹۸۶/۹/۱۹

به یانی به ،
 تا ئیستا که شن مانگی شه وی شادا نه بووه ...
 شه شه و له بی هاوده منی دا
 تریفه ی مانگ هاده من بوو ...
 شه و نه نووست و من بیدار بووم
 شه و روشن و روناکی به خش
 من دل تنگ و لیو به بار بووم ...
 له دوا بیجا خه و بردمیه وه
 تابه یانی له هه میزی تو ی نازدار بووم ...

شه‌مشه و دنيا كش و ماته
 شه‌ستيره‌كان ، له شه‌مبزي شه‌ماندا ديلائي ده‌كه‌ن
 شه‌م كه‌ژانه بوئي خويينيان لي هه‌لده‌ستي ...
 روژي نييه، شه‌وي نايي
 شه‌م مه‌لېه‌نده ، جوامه‌مه‌رگي
 له خاك شه‌ه‌ني ...
 شه‌ي شه‌ستيره دووره‌كه‌ي من ،
 هينده دووريت
 ته‌نيا مه‌گه‌ر به‌ خه‌وني شه‌وي پيټ بگه‌م ...
 شه‌مشه و هه‌رچه‌ند كش و ماته
 ته‌نيا جريوه‌ي شه‌ستيران دي ...
 به‌لام شه‌وي تاريك له من به‌روژ نايي ...
 بي بالاكه‌ت روژيش شه‌وه ...

۱۹۸۶/۹/۱۵

گونده‌كه‌مان
 سه‌د و په‌نجا ماليك ده‌بي
 له دوولاهه
 دووزنجيره چي‌اي به‌رز
 له هه‌مبزي خويان ناوه
 گونده‌كه‌مان
 پيش چه‌ند روژي
 جه‌ي ده‌هات
 خه‌لكيكي زور
 گوزه‌راني تيدا ده‌كرد
 به‌لام شه‌مپو
 نه‌ك هه‌ر مرو
 شاه‌لېشي تيندا نازي ...
 هاوسه‌ره‌كه‌م :

بهلام نازيز
خوشهويستم، گولي پاييز
هرکه ترمي راده بووري ...
وينهکي تو
هموو چاوم دا دهگري ...

۱۹۸۶/۹/۱۱

که شو دادی
کهون همووی رهش ده نوینی
ناخی منیش چهنی شهوه
دهرون تاریک
سیما تاریک
چهنی تلخی نهرز و ناسمان
هموو شتی هر تاریکه
هموو زیانم چهنی شهوه
نهی نهو کهسی
دهبیه ههتاو
بو تاریکی زینی پر سویم
زووکه وهره
نم ههواره
تاریکهی من روشن کهوه ...
نهکي چیدی له غریبی
چیم بهیلی ...
نم دلّه چکوله یه من
برگهی دووری چاوه کانی تو ناگری
زووکه وهره
نم ههواره
تاریکهی من روشن کهوه ...

۱۹۸۶/۹/۱۲

چەند دەروانمە
 چوار دەورەى خۆم
 غەيرى تەمى غوربە تىكى
 خەست و بە سوئ ،
 چىدى بەدى ناکەم ...
 ئاسۆ لىلە ،
 ئەم ئىوارە
 زىاد لە ھەموو ئىوارە يەك
 غەربى تۆدەكەم و بۆ
 دىد اريكت
 ھەرچى ھەمە
 پيشكەشى كەم ...

۱۹۸۶/۹/۱۰

شەوورۆزى زىانمان ھەموو
 ۋەكو يەكن ...
 " بەيانى ... نيوەرۆ ... ئىۋارى ..."
 كاتى ھە تاو
 دەم دەنيەتە ئاسۆى خوينين
 چوار دەورەمان
 بۆ دوکەل و سوتانى دى ،
 جگە لەو ھەش
 تەرمى نووستوى ئازيزانمان
 شەلال خوينە ،
 كاتى دى ...
 زۆر ئازيزە
 بۆيە لەوى رۆزى كە تۆ چوويستەو
 ھەوارمان چۆل نىيە و نابى

هەر بۆیەشە بو گۆلی دیدارت
 هەردەم هاوارە
 " بەهار بوو فەسلی زستانم ئەگەر یارم لە گەل بایە
 درۆیە گەر گوتویانە بە خۆنچەیهکی بەهار نایە "

دەییـرەوێ
 لەم کەژێ دڵم خۆنچەیی بەهاری بنیرەوێ ...
 ١٩٨٦/٩/٨

خۆشەویستم
 دەشی چیدی لە ژیاندا
 یەک نە بینین ...
 دەشی ئا لەم کیواندا
 هەلبدیتریم ...
 هەناسەکم تیکەل نەبی
 بە هەناسەت ...
 ژیان دژوارە ، ریکە هەلەت
 ئاگر بە چوار دەورەماندا
 دادەباری ...
 ئێدە خۆمان بێر نەماوێ ،
 زۆر ئالۆز و پەریشانین ،
 بەلام سویندەم بە چاوانت
 لە هەموو هەناسەیهکدا
 تۆم لە یاده ...

١٩٨٦/٩/٩

ئیـسـوارەیهو
 ئاسۆی غوربەت
 خۆری تەمەن هەلدەلوشی ...

دہشی ئیمہ سبھی لیڑہ وەدەرکەوین
 کار و گوزەرەن دەرمان پەرینئی
 بە سەر ئەو چیلدا بو و دیوو
 سەرکەوین ...
 ئەگەر نەمرین، یەک دەبینین
 خەم مەخوۆ ئەی خانەکە ی خۆم
 " تۆ لە دوور و من لە دوورم "
 بەلام دلمان پئی بەندە بە یەک ریگاوه
 من بو تۆ دەژیم
 تۆشلە پیناوی من ...
 ھەنگاوه کانت گورج کەرەوہ
 بپوانە بو بەرزی ئاسو
 دنیا لیله، کش و مساتە
 ئەوہی ئومید بەخشە پیمان
 چرای ژبانە ...

۱۹۸۶/۹/۵

خوشە ویستە کەم
 شاگر دەبارئی
 وولات سوتاوہ ...
 رەو رەو شیئر پیاوان
 بە رووی دوژمنان
 شالادیان دەبەن ...
 سروشت خەزانە
 لە پیش خەزاندا
 کەلاریزانە ...
 دوورە وەسیتەم لە چاوی زەشی تۆ
 چلوی زستانە ،

«سۆزی ئاوازیکی پر غوربەت»

ئەحمەد عارف

ئەي سەرچاوەي خەمى تازەم
ئەي ھاوئازى گريه و ناله و هەناسەكەم
ئەي جوانترين ئاوازي دلەي بە سوزم
ئەي هەتوانى برينان و شنهى هوشم
كە روڤىشتى
دواي ماچ و موچ خوٽ ھاوڤىشته هەمىزمەو
يەكتومان توند، توند راموسى
فرمىسكى شاديمان باران
دردى دلان لاي يەك رزان
تو روڤىشتى
دەستى نازت بو ھەل بېرىم
ليوى خەندەت ليك ترازان
روڤىشتنت
بەرەو باوان بو ديدەنى كەس و كار بوو
فرمىسكى چاو، تالپى من و خوڤى وان بوو
روڤىشتى كە زوو بېيتەو
نەت زانى بە شوڤىنى تو دا
رېگا نابى و دەرگاي دلەم
بەكراوھى دەمىنپتەو ھە...

۱۹۸۶/ ۹/۱

هەلکیشین . ئیترە خاکی ئیترانە و دیارە ئەرتهشی ئیتران دەبی روژیک
 بی و خاکی خۆی بگری و ئیمە و دەدر بنی . ئیئەش نابی خۆمان بکەینە
 یەخسیر و گیرۆدە ی زەوی یەک کە مافمان پیوهی نییە و تەنیا ریگایە کمان
 لە بەرە ، ئەویش ئەو یە کات دەرباز کەین تا ئەودە مە ی بە فرو سەرما
 تەوا و دەبی ، پاشان ژن و مندال و پیاو و ئیختیارە کان بنیڕینە و
 عیراق و خۆمان پەنا بەرینە بەر شوورە ی تا ئەو کاتە ی هەلمان بسۆ
 هەل دە کەوی بگەرپینە و عیراق و درێژە بە ئامانجە کانمان بە دەین .
 مەلا مستەفا لە هەمان کات دا دە یگوت شوورە ی جی ئیمە نییە . ئەو
 بو خۆی حکوومە تی شوورە ی بە وشە ی "رەزیل" ناو دە برد و ئەو قسە یە لە
 بیڕی مەلا دا بە مانای وریا ، زیرەک ، ریک و پیک و شتی لە و بابە تە
 بوو . دە ی گوت لە شوورە ی هەرکە س کار بکا پارو و نانیک ی دە سست
 دە کەوی و بو جەماعە تیک شیخ کە لە سەر زگی خەلکی دیکە ژیاون ، ئەو
 ولاتە جییە کی باش نییە ، بەلام جاری تەنیا شوینیکی هیمن کە بو ئیمە
 هەبی و بتوانی بمان حاوینیتە و شوورە ی یە و ئەگەر بمانی شو
 چە کە کانمان بیاریزین و روژیک لە روژان بە قازانجی حکوومە تی
 سەر بە خۆی کوردستان دە کاریان کەین دە بی بجینە شوورە ی .

* پاشا مەوی ئەو نووسراوە تان لە ژمارە ی داها تووی هـ یـ و
 دا پیشکەش دە کـری .

هموویان قه نطی عام کاو بیان هموویان گمارو دا و به توبزی له
 خاکی ئییرانیان دهر کاو به ره و عیراق بیان ره تینی .
 به روالهت ئه رتهش له و سه روه بندی دا ریگای هه ره ژیرانه ی
 هه لیزارد . ئه رتهش تازه ها تبوه تازه ربا یجان . هیشتا گیروگرفتیکی
 زوری هه بوو . ده بوو ده گه ل پاشا وه ی فیرقه ی دیموگراتی کوردستان
 حیسابی خوی بکا ، مه جبوور بوو له پیشتا جه بهه و پشتی جه بهه پاک
 کا ته وه و دوا به له مه ر بارزانی به کان بپریار بدا .
 ئه رتهش هه ر شه و کاره شی گرد ، ده گه ل بارزانی به کان که وه ته وت
 و ویژه وه . ئیمه تازه له نه غده نا وه ندی خیلی قه ره په پیساغ
 دامه زرابووین . نه غده له سه ر ریگای مه باد بوو شنویه . سه ره ننگ
 غه ففاری نوینه ری ئه رتهش بو وت و ویژ ده گه ل مه لا مسته فا ها ته
 نه غده و مه لای بو وت و ویژ بانگ هیشتنی تاران گرد . مه لا مسته فا
 دوا ی پرس و راویژه شیخ شه صمد شه و بانگ هیشتنه ی سه لمانند و
 ده گه ل دووسی که س له شه فسه ره کورده عیراقی به کان به ره و تاران
 وه ری که وت . شه و کاتیک گه یشته مه باد ئه رتهش شه وی دا گیرکرد بوو
 و سه رتیب هوما یوونی فه رمانده ری ستوونی ناردراو بوو کوردستان
 له وی ریژه ی به ئه رتهش دمه کرد . له وی مه لا له لایه ک و قازی محه صمه ده
 له لایه کی دیکه لای سه رتیب هوما یوونی ریژه ی ئه رتهشیان ته ماشا
 کرد . مه لا دوا به بوو خوی به سه ره ها تی شه و ریژه به سه فه ری خوی بوو
 تارانی بوگی پرامه وه . مه لا مسته فا و ها وسه فه ره کانی و بیابه فرپوکه
 برده تاران . له وی نزیکه ی بیست روژ ده گه ل کار به ده ستانی شه و کاتی
 حکومه ت دیتن و وت و ویژی کرد . مه به ستی ده ولت شه وه بوو که به
 خو شی و هیمنانه بارزانی به کان چه ک کا . له شوینیک له ئییران ، گویا
 له ده ورو به ری هه مه ده ان ، وه کوو په نابهر دا بیان مه زرینی . ده ولت به
 روالهت ناماده بیی خوی پیشان دا بوو که شه و که سانه ی که له عیراق
 مه حکومه تی سیاسی یان بووه وه کوو په نابهری سیاسی وه ربگری و
 زه وی و سه رما یه ش بدا به پاشا وه ی خپله که که خه ریکی کشت و کالین .
 مه لا مسته فا ده ی گوت ئیمه خه یالی شه رمان ده گه ل ده ولت ته
 ئییران نییه ، ئیمه له ئییران خاکی که ان نییه که به مانه وی به رگری
 لییکه یین ، دژمانا به تیشمان ده گه ل که س نییه که به مانه وی چه کی لی

شپست نهفهره سرگورد نووری له ئەفسەرەکانی ئەرتەشی عێراق بوو .
لهو ئێبوو که دهگه‌ڵ مه‌لا مسته‌فا بوومه ناسیاو .

ئهو بارزانی‌یه‌کانه زیاتر له سێ مانگ ده‌رفه‌تی فێر بوونیلان
نه‌هینا و شه‌ری نیوان ئەرتەشی ئێران له‌لایه‌ک و فیرقه‌ی دیموکراتی
ئازهربايجان و کوردستان ده‌ستی پیکرد که مه‌لا مسته‌فا دیسان هاته‌وه
ته‌وریز و نه‌فه‌راته‌که‌ی خۆی نارد هه‌به‌هی (سه‌را) له‌ نزیک سه‌قز .

ئهو شه‌وه‌ی که ئێه گه‌یشتی نه‌ مه‌هاباد چاومان به‌ مه‌لا که‌وت که
به‌ فه‌و‌لی به‌کێک له‌ دوسته‌کانم وه‌ک پیه‌غه‌مه‌به‌ریک ئومه‌ ته‌که‌ی له
ده‌وری خۆی کو‌کرد بووه و فیشه‌کی له‌ نیو داوه‌ به‌ شینه‌وه . مه‌لا مسته‌فا
پیشنیاری به‌ ئێه کرد که ده‌گه‌ڵیان که‌وین . ئیمه‌ش موافقه‌ ته‌تی
خۆمان راگه‌پاند و له‌گه‌ڵ ئه‌وان ، به‌ شه‌و به‌ره‌و نه‌غه‌سه‌ده‌ وه‌پری
که‌وتین ، به‌لام به‌ر له‌وه‌ی ری دا بگرین هیندی له‌ سه‌ربازه‌کانمان
ده‌گه‌ڵ چه‌ند بارزانی‌یه‌کان کرده مه‌ئمووری بارکردن و راگو‌یز ته‌نی
توپه‌کان که ئه‌وانیش بو‌ به‌یانی به‌که‌ی ئه‌و رۆژه له‌ ریگادا گه‌یشته‌وه
ئیمه .

شنو جاری ناوچه‌یه‌کی هێمن بوو . بارزانی‌یه‌کانیش بریاریمان
وابوو بچنه ئه‌وی . شیخ ئه‌حمه‌د پیشتر چوو بووه ئه‌وی . ته‌مه
شارو‌چکه‌یه له‌ سێ سووچی سنووری ئێران و عێراق و تورکییه
هه‌لکه‌وتوو و ئەرتەشی ئێران جاری نه‌گه‌یشتیوو ئه‌وی .

بارزانی‌یه‌کان خه‌یالیان وابوو که پیش له‌ ئەرتەشی ئێران
خۆیان به‌هینه ئه‌وی و بو زستان و خوراگرتن له‌ به‌ر سه‌رمادا له‌ به‌ک
به‌یینه‌وه .

ئەرتەشی ئێران له‌ حاست بارزانی‌یه‌کان سیاسه‌تیکی تایبه‌تی
ده‌کار ده‌کرد . به‌ رواله‌ت چ چاره‌یه‌کی دیکه‌شی نه‌بوو . ئەرتەش له‌و
هه‌لو مه‌رجی دا به‌ هاسانی نه‌ی ده‌توانی بارزانی‌یه‌کان سه‌رکوت کاو
ئه‌گه‌ر تێیان هه‌لچووبا خه‌ساریکی زۆری وێده‌که‌وت . سه‌ره‌رای ئه‌وه‌ش
ئه‌گه‌ح سه‌ریش که‌وتبا ، له‌ به‌ر ئه‌وه‌ی که بارزانی‌یه‌کان ئێرانیه‌
نه‌بوون ، چ ریگای بو‌ نه‌ده‌ماوه جگه له‌وه‌ی که وه‌ک په‌نا به‌ر وه‌ریان
گری ، دا یان مه‌ز زینی یان ته‌حویلی عێراقیان دا ته‌وه که ئه‌وه‌ش گه‌یرو
کێشه‌یه‌کی زۆری بو‌ ساز ده‌کرد . له‌وانه‌یه چاره‌یه‌کیش ئه‌وه بوو که

ره زیل، فیل بازو به هوش بوو. به هاسانی بروا به عینسان ناکهن. بو راکیشانی سهرنجیان و بو شهوهی متفانیهیان پیت هه بی ده بی زورکاران بکهی که ئەمن له دهستم نهد هات و پیم نهده کرا. ئەمن نوکهر یا جاسوس نیم. ئەمن نوکهری خیلی بارزانم، نوکهری ئومده تی خۆمم. له گهل شهوه شدا. ئەو توانیبوو متفانهی شووره وی بهکان به ره و لای خوی راکیشی.

خیلی بارزان له شهری دژی عیراق دا ده شکێ، چونکوو شه و ده می به شیک له شهرته شی ئینگلیس به یارمه تی فروکهی هاریکه ن ناوچهی بارزان ئاور تیه رده ده ن، زه وی و زار ده سووتینن. له ئاکامی شه و دا بارزانی بهکان پاشه کسه ده که ن و دینه نیو ئیران و په نابو حکومه تی نیشتمانی کوردستان دینن.

مه لامسته فا له قازی محهممه د زویر بوو. ده ی گوت له وه ده ترسی من جی بگره وه. بو لاواز کردنی ئیمه، خیلی بارزانی به ده سته ی زور پچووک دابه ش کرد. و له سهرانه ی کوردستان، له قسه راغ ده ری اچه ی ره زائیه وه تا شه و په ری میانداواو، له ساین قسه لا، دای مه زراندن و به شیوه یه کی وا که له هه ر دی و لادییه ک زیاتر له پینج شه ش مالی نه بی. ته نانه ت شیخ شه هه د سه روکی خیلی بارزانی به ده. بیست مالیکه وه ناره ده دزه" له لادیکانی ده ورو به ری ره زائیه. ئاخه که ی شووره وی بهکان ده فریامان هاتن و به گویره ی راسپلازده ی شه وان بوو که حکومه تی نیشتمانی ئازه ربا یجان مانگی شیست هه زار ته نه ی بو موخاریجی خیلی بارزان برپیوه و ده ی دانی. جل و به رگ و چه ک و ته قه مه نی شه وانیشی دا بین ده کرد. (شه و بوچوونه ی مه لا مسته فا سه باره ت به پیشه واقازی محهممه د و کورده کانی ئی لران زور بی عینسافانه یه - وه رگی ر).

له شه ریوه ری ۱۳۲۵ (خه رمانان - ۱۹۴۶) روژیک مه لامسته فلا بارزانی که ئیستا بیوه شه نه رال ده گهل ۶ بارزانی دیکه هاته سه ربا زخانه که ی ئیمه له ته ورپیز. شه وانی هینابوو بو شه وه ی چلونا یه تی توپ ده کار کردن فی ر بین. شه و لاوانه ی وا نه خته سه خویندا وه ری یه کیان هه بوو ناردرانه زانسته گی شه فه ری و مه یر منداله کانی ش چوونه خویندنگه ی ناونجی سه ربازی. فه رمانده ی شه و

-سەربەخۆی کوردستان دامەزرینی .

خەڵکی کوردستان چ لە شار و چ لە دی، دلیان بە عیشقی سەربەخۆیی کورد دەکۆرکینی، دیاره لەوانەیه سەربەخۆیی لە زەینی ئەوان دا مانایەکی تایبەتی هەبێ بەلام ئەوان عاشقی سەربەخۆیین. روژیک ئەمن لە یایەکی تیگەشتووی کوردم پرسی مەبەست لە ئازادی و سەربەخۆیی کوردستان چیه ؟ ولای دامەوه : ئازادی ئەوێه که ئەمن ئازادیم لە هەرچیەکی پێم خۆشی مەرەپەکم بلەوه‌رینم، بە چەندی پێم خۆشی بێفرۆشم، شیرورۆنی خۆم بە هەرکەس و هەر مەزەننەیه‌کی که بمەوی بەهەم و حکومەتی ناوەندی حەقی بەسەر منەوه نەبێ. دیاره که کومەلانی خەلک سەربەخۆییان بە مانایەکی دی لیک دەداوه، بەم پێیه وشە سەربەخۆیی بە بێ ئەوهی که مانایەکی وردی هەبێ هەر لە مندالی را لە گوێ کورده‌کان دا دەزرینگی‌ته‌وه و ئاواتیان ئەوه‌یه که روژیک تەنگیک وەدەست بێنن و لە رۆی سەربەخۆیی کوردستان دا خەبات بکەن .

